




- **DÎ DÎROKA ME YA NÊZÎK DA BÛYEREK GİRÎNG:**
BÛYERA SEÎD ELÇÎ Û DR. ŞIVAN
Şakir EPÖZDEMİR
- **HASENÎKO**
Silêmanê DERÎHESÎNÎ
- **ROMANNÎVÎSÎNA MEHMED UZUN**
Remezan ALAN
- **ETÎMOLOJÎYA ZÎMANÊ KURDÎ**
Abdurahman UÇAMAN
- **ROMANA KURDÎ**
Naci KUTLAY
- **CÎN Û PÎRHEVOK**
Fikret SÛHREWERDÎ
- **ATASÖZLERÎ VE ETNİK SATAŞMALAR:**
AYRIMCI RETORİK ÜZERİNE
Rohat ALAKOM
- **GOTÎNEKE PÊWÎST: Destnivîsarên C.BEDÎRXAN**
Mehmed UZUN
- **FERHENG-VAJNAME: Kurmancî -Hewramî-Dimilî-Senendajî**
A. UÇAMAN - Seîd VERROJ
- **"YİĞİTLİK İNKÂR GELİNMEZ"**
Şeyhmus DİKEN
- **SERBİLİNDÎ Û SERKEFTÎNA ROMANA KURDÎ**
Maruf YILMAZ
- **LEYÎSTİKEKE RÎTÛEL: KOSEGELÎ**
Lal LALEŞ
- **BABA TAHİR URYANÎ (HEMEDANÎ)**
BARAN



* War, warê lêgerîn û lêkolînê liser çanda kurdî ye.



* War, navnîşana ziman, dîrok, folklor, edebiyat û hûner e.



* War, bi amac û seretayên xwe, ji bo lêgerînan û lêkolînvanan warekê teze û nû ye.



* War, nav û dengê çandeka bindest û qedexekirî ye.
* Bi gulekî nabe bihar, bêxwendinê ava nabe WAR.

Kovara Lêkolîn û Lêgerînê

WAR

Araştırma - İnceleme Dergisi



Kovara Lêkolîn û Lêgerînê

WAR

Araştırma - İnceleme Dergisi

Sê Mehan Carekê Tête Weşandin
Üç Ayda Bir Yayimlanir • 2.000.000. TL.

**KOR Reklamcılık Basın - Yayın
Tic. ve San. Ltd. Şti. Adına**
Sahibi ve sorumlu Yazışleri Müdürü:
Kamber SOYPAK

Dizgi-İç düzen
AYFA

Baskı ve Cilt:
Özener Matbaacılık Ltd. Şti.

Kapak Tasarım:
WAR

Yönetim Yeri:
Kazım İsmail Gürkan Cad. Hamam Sk.
Yavuz Han No: 2 Kat: 3/3 Cağaloğlu - İstanbul
Tel.: (0.212) 522 21 02

Abone Koşulları:
1 Yıllık Yurtiçi: 8.000.000. TL.
Yurtdışı: 100 DM
(Veya karşılığı bulunduğu ülke parası)

NAVEROK - İÇİNDEKİLER

- **Pêşkêş** 5
 - **Di Dîroka me ya nêzîk da bûyerek Grîng:**
Bûyera Seîd ELÇÎ û Dr. Şivan 7
Şakir EPÖZDEMİR
 - **Hesenîko** 27
Silêmanê DERÎHESÎNÎ
 - **Cîn û Pirhevok** 38
Fîkret SÛHREWEDÎ
 - **Leyîstîkek Rîtûel: Kosegelî** 57
Lal LALEŞ
 - **Jibo Etîmolojiya Zimanê Kurdî Çend Gotîn** 66
Abdurrahman UÇAMAN
 - **Ferheng - Vejname:** 85
Kurmancî-Hewramî-Dimilî-Senendajî
 - **Dosya Romana Kurdî: Memed UZUN** 124
 - **Romana Kurdî** 125
Naci Kutlay
 - **Romannivîsîna Mehmed UZUN** 135
Remezan ALAN
 - **Serbilindî û Serkeftina Romana Kurdî** 155
Maruf YILMAZ
 - **Atasözleri ve Etnik Sataşmalar: Ayrımcı Retorik üzerine** 169
Rohak ALAKOM
-

- **Gotinek Pêwîst: Destnivîsarên Celadet
BEDÎRXAN**178
Mehmed UZUN
- **“Yiğitlik İnkâr Gelinmez”**185
Şeyhmus DİKEN
- **Diyarbakira Şewitî**191
Silêmanê DERÎHESÎNÎ
- **Baba Tahir URYANÎ (HEMEDANÎ)**194
Baran
- **Folklora Kurdî V-VI:**
Gotinên Pêşyan; Ceribandin û Şîretên Bav û Bapîran . .198
Seîd VERROJ
- **Lêkolînên Li Ser Helbestên Cizîrî**214
Hozanê DÎLZAR
- **Heger Em Kurd in Divê Em Bi Kurdî
Binivîsîn**219
Zînorê XAMO

Pêşkêş

Xwendevanên birûmet,

WAR, bi derketina hejmarên xwe yên 5-6'an, şeş mehên din li ser jiyana xwe ya weşanê dirêj kir. Me divê bi alîkarî û piştgiriya we jî, wê gelek gelek 'şeş meh'an derbaz bike û derçuna xwe berdewam bike. Li pêşberê me pirr dijarî û astengî henin. Lê belê ev nayê vê manê ku ev bendana derbaz nabin. Eger em dilxwaz, bi xîret û xebat bin dê bend û astengên pêşberê me jî nizm û sivik bibin.

Her wekî ku berê jî me gotîbû û we agahdar kiribû; ji salê carekî em dê di derheqha mijarek de "dosyakî" jibo we amade bikin. Di vê hejmarê de em gotina xwe tînin cî; "Dosya Romana Kurdî" dibe dosya me ya yekemîn. Ji piştî wê ra jî, di derheqha helbest, çîrok, ziman û wd. de her sal em dê babateka nû bibijêrin û hazir bikin, pêşkêşê we bikin. Herkes dikare bi nivîsar û xebatên xwe beşdarê dosyayê bibe.

Xwendevanên birûmet, hunê bibînin ku ev hejmara WAR'ê bi nivîsar û nivîskarên xwe hîn bi xeml û rengîn e. Jibo vê yekê morala me jî hîn zêdetir û xurtir e. Piştgiri û nêzikayiya we çû û halanê dide me; hîn bêtir me diherikîne û tan dide me. Em bawer in ku WAR bi dilxwazî û alîkariya nivîskar û xwendevanên xwe, jibo çand, ziman û dîroka Kurdistanê dê bibe warekê teze û nû. Jibo vê yekê, em ji xebat û xîreta taybetî ya hin dost û hevalan ra pirr sipas dikin û wan jî weke hevpar û kedrijên vê keda pîroz û giranbiha dibînin, dihesibînin.

Tevî vê hejmarê hunê bi rêzenivîsareka nû nasyar bibin û cara yekemîn di nava rûpelên WAR'ê de bibînin û bixwînin. Ev keda pîroz û nivîsara birûmet (Etîmolojiya Zimanê Kurdî), berhemê bîst salan yê Seydayê Mele Evdrehmanê rehmetî ye. Bila cîhê wî fire û gorna wî bihişt be, ku hostayê zimanê kurdî ji me ra vê berhemê birûmet hiştiye. Bi tevî vê hejmarê, refê nivîskarê me yên domdar (payidar) dewlemendtir bû. Silêmanê DERÎHESÎNÎ, dê bi terza (tehera) xwe ya xwerû û zimanê xwe yê dewlemend, di navbera we û çanda gelêrî da bibe pirekê zexm û xurt. Carde Mehmed UZUN, bi belgeyên digel xwe (ku heta nûha nehatine weşandin) dê di her hejmarê de rûpelên WAR'ê bixemlîne û rengîn bike.

Em dizanin ku di vê hejmarê de ji jiber sedemên tenîkî û aborî dê hin kêmasiyên me hebin. Lêbelê rewş û mecalên me berbiçav in, jibo vê yekê divê hun me bibexşînin.

Jibo WAR'ekî baştir û rindtir, em ji hemu rexne û pêşniyazên we ra vekirî ne.

Bi hêviya hevdiîtina di hejmareka nû, di nav xweşî û rindî de bimînin.

WAR

The first of these is the fact that the...
the second is the fact that the...
the third is the fact that the...

The fourth is the fact that the...
the fifth is the fact that the...
the sixth is the fact that the...

The seventh is the fact that the...
the eighth is the fact that the...
the ninth is the fact that the...

The tenth is the fact that the...
the eleventh is the fact that the...
the twelfth is the fact that the...

The thirteenth is the fact that the...
the fourteenth is the fact that the...
the fifteenth is the fact that the...

The sixteenth is the fact that the...
the seventeenth is the fact that the...
the eighteenth is the fact that the...

The nineteenth is the fact that the...
the twentieth is the fact that the...
the twenty-first is the fact that the...

DÎ DÎROKA ME YA NÊZİK DA BÛYEREK GİRÎNG: BÛYERA SEÎD ELÇÎ Û DR. ŞIVAN

ŞAKİR EPÖZDEMİR

27 sal di ser vê bûyera çepel û dijwar da derbaz bû. Qetilkirina *Seîd Elçî* û hevalê wî *Mihemedê Begê* di sala 1971'ê da şoqek mezin xwiliqand û serê hemî Kurdên welatperwer tevlihev kir. Her wisa girtin, mehke-mekirin û înfazkirina *Dr. Şivan. Çeko* û *Birûsk* jî gelek serê Kurdan tevlihev kiriye. Di derheqa vê bûyerê da kêmtîşt têtê zanîn û di derheqa qewimîna vê bûyerê de kêmtîkes hin tiştan dizanin. Ji ber kû ev pîrsgirêk nehat zelalkirin, bi salan ma tabû. Ji ber kû kesî rastî nego, an hisaba kesî nehat ku li rastiyê bigere.

Erê, "Rastî tal e". Rastî tal be jî divê bê gotin. Emê niha perdê rakîn û bûyera *Seîd Elçî* û *Dr. Şivan* ya kû sala 1971 ê qewimî, bidin ber çavên xwendevanan. Hîvîdarim kû ji bo me Kurdan ev bûyer wê bibe ders, bibe eqil û tecrûbe.



Seîd Elçî û Dr. Şivan

Mêhvanê me yê kû di dereca yekemîn da, yek jî şahidê zinde yê vê meselê ye, **Şakir Epözdemir e.**

Kek şakir, di sala 1938'a da li navça *Bayikan*, li nehiya *Minar* hatiye dinê. Temenê xwe 20 sal li gund, 10 sal li Diyarbekir, 15 sal li Tetwan û evan 15 salên dawî li Enqerê derbaz kiriye. Li gor gotina wî, bi têkilî û pêşniyaziya Ş.E. ketiye nava xebata partiyê; bûye damezrenêr û endamê koma navkom.

Ev berpirsariya wî ya partî û endamiya wî ya koma navkom, heya *Tebaxa* Sala 1971 ê dajo. Teqriben di xilasiya vê heyvê da xwe bi xwe biryar dide kû siyasetê terk bike. Ji wê rojê û pêda di tû rêxistinana da cî nagirtiye.

Damezirandina “Partiya Demoqrat a Kurdîstana Tirkîyê”

Pirskar: *Kek Şakir, ji kerema xwe ra hun dikarin bi kurtî bahsa damezirandina Partiyê (PDKT) û xebatên xwe yê destpêkê bikin?*

Ş.Ep: –“Roja 11'ê Tîrmehê sala 1965'a me 5 kesan, li Diyarbekir, *Koşka Gazî* li binê darêka mezin a çinarê sond xwar û “*Partiya Demoqrat a Kurdîstana Tirkîyê*” danî. Em 5 kes evan bûn: 1- Seîd Elçî (Serok), 2- Dûrnas (Sekretar), 3- Şakir Epözdemir (Mûhasip) 4- Dervîş Akgül (Aza) 5- Ömer Tûrhan (Aza).

Roja 23'yê Tîrmehê, dîsa li Amedê, li *Otêla Tûrîstîkê* me civînek çêkir û Rehmaiyê *Faîq Bûcaq* da sondê anî partiyê. Faîq Bûcaq bû Serekê Partî û Dûrnas, ciyê xwe da Seîd Elçî.. Pêşgotina Program û Nîzamnîya PDKT'yê Faîq Bûcaq nivîsî û ev bernavkên hanê ketnê binê programê:

Zinar: (Serok), Pêşmerge Welat: (Sekreter), Evîndarê Welat: (Muhasisib) Dûrnas (Aza), Jîrek (Aza), Bendeyê Welat (Aza) Ev 6 kes heya Qongra PDKT'yê ya yekemîn û 1973'yan di ciyê xwe da man. Jiber kû damezrandokên partî ev kesin, divê heta hetayê dîsa ev kes bin. Lewra partî carêk tê danîn.

Di sala 1966'an, heyva Tîrmehê da Faîq Bûcaq hat kuştin. Ji vir pêde serokatiya partiyê hat rakirin û me tenê bi sekreteriyê partiyê meşand.

Ji roja tesîsa (damezirandina) partî û pêda me dest bi xebatê kir. Li piraniya welat me xîmê partiyê avêt. Xebata me ya xwurt di payiza 1967'an despê kir. Di vî warîda “DOĞU KALKINMA MİTİNGLERİ” jî pir feydeyêk hêja da me. PDKT'yê, herçend îlegal bû, belê ronekbîrên Kurd pê dihisîyan. Ji ber vê ronekbîrên çep, xwestin kû partiyek alternatîf danîn. Di sala 1966'an da “*Partiya Demokrat a Kurdên Tirkîyê*” danîn û belavokêk weşandin, belê nekarîn bibin serî.

Mîtingên 1967'an, Girtin û Sûrgin (neffî) Kirina Seîd Elçî

Sala 1967'a salekê dîrokî ye û di dîroka Kurdên Tirkîyê'de ciyê vê salê pir girîng e. Herkesî xwe di neynika meydanên mîtingan da dît. Em



Yên Rûniştî: Zibeyr YILDIRIM, Şefik ISSI, Ömer TURHAN, Şakir EPÖZDEMİR,
Nezir AYDIN,

Yên li Piyan: (ji milê çep) : Abdurrahman UÇAMAN, M. Sıddık GÜL, Şükrü
ALPERGİN, Seid ELÇİ û Derviş AĞGÜL

PDK-T yê jî bi xwe hisiyan kû ev potansyela Kurd divê bi zûyî va bê honandin û tenzîmkirin. *Seîd Elçî* di mîtinga Diyarbekir de hat girtin û wî şandina sirgûna 49'an kû diva vê sirgûnê li *Kutahya* biborîne. Şol kete ser milê min, Emer û Derwêş. Di wê navê da Partiya Kurdên Sûriye, ya *Hemîdê Hacı Derwêş û Cigerxwîn*, em dawetê, Kongra Partiya xwe kirin. Emer û hinek endam çûn li vê Kongrê beşder bûn. Kongra PDKS qerar da kû di hemî delavî da me destek bike, ji me ra kadro rêke û tenzîma partiya me bi rêk û pêk bîne ser hev. Li ser vê, ji Suriyê *Reşîdê Hemo* hate Diyarbekir û me ji 15ê heyva 12'an, sala 1967an heya roja 19 heyva 1'an sala 1968an xebat û tevgerek xurt ajot.

Operasyona Liser PDKT'ê

Manewiyata me gelek xwurt bû. Me teklîf dibira ba kî, ji me ra nedigotin "na". Tam di vê niqteyê da MÎTê operasyonek giran li ser me pêk anî û li *Amedê, Batmanê, Tetwan û Patnosê, Sîlwan, Qurtelan, Nisêbîn û Qiziltepê* di şeva xwe da dor li me girtin. Destê girtinê danîne ser 16 kesan, belê 11 kes tewqîf kirin û avêtine hepsa Diyarbekirê. Em 5 roj li MÎT'ê man, Partî deşîfre bû. Ewra û mohra Partî tev hatin girtin. Me morala xwe xira nekir û em sews nebûn. Beriya kû em bên hizûra hakim, li emniyeta Diyarbekir me anîne cem hev. *Seîd Elçî* hê li *Kutahya'yê* bû û *Dervêş Akgul* hê berdest nakiribûn. Ji komîta merkezî ez û rehmaşîyê Emer bûn. Me biryar da kû emê Partî û programê Partiyê biparêzin û bi vê partiye îtiraf bikin û me wisa jî kir. Ew roj em 8 kes hatin tewqîfkirin û çend kes hatin berdan. Piştra *Seîd Elçî* ji *Kutahya* anîn, *Derwêşê Sado û Zibeyr Axayê Omerî* (Zubeyir Yıldırım) yê rehmetî jî anîn cem me.

Em 27.1.1968 ê hatin tewqîfkirin. 70'ê roj li Diyarbekir man. Piştî kû me birne *Entelyê*, zemanek dût û dirêj me dernexistine mahkemê. Lê geriyan kû me nerm bikin û em parastinek siyasî nekin. Sawciyê *Entelyê Ahmet Özsan* vê teklîfê çend car anî ba rehmaşîyê *Seîd Elçî*. Gava kû eqlê wan nebirî di 27.9.68 ê de me deranîne mahkemê. Tam 8 heyvên me qediyabûn. Di vê mehkemê da 6 heval berdan, em 5 kes man girtî. Piştî vê celsê her heyv em derketin mahkemê û 25.2.1969'anda me jî berdan. Ev dawa dirêj bû gaha 1974'a û kete ber efûya meşhûr a *Bilend Ecewîd*. Di vê navê da dawê çu DGM'a İzmirê, qerara paşî vê mehkemê da û em tev bi 3 sal hapis, 3 sal sirgûn kû ji aliyê mehkema *Entelyê* hatibûn cezakirin; vê DGM'a İzmirê 21.8.1974'a xiste ber efûyê û teblixê me kir. Ezê rojhejmara dosya *Entelyê** bidim; yên mereq dikan bila biçin li dosyayê binêrin. Lewra ez baş dizanim ka ev dosya çiq paqije. "*İzmir DGM Esas No 1974/7, Karar No 1974/8 C. Savcısı EVRAK No 1974/8*"...

* Parastina Şakir EPÖZDEMİR, destê me da ye û heta nûha nahatiye waşandin

Pirskar: *Birêz Ş. EP. ez dizanim; ev pirs, pirsêkê pir zor e; belê bivê nevé wê ev pirs bê vekirin. Hûn di nava vê bûyera çewt û bê melêz da şahidêk zînde û bê teref in. Tû hevalê Seîd Elçî'yî, lê Dr. Şivan û Çeko jî ne dûrê tene. Tû li pey şoparêça Seîd'ê rehmetî çûyî cem Dr. Şivan, li meqerê wî 20 roj mayî, di texliya meqer de, eşkerekirina bûyerê da, girtin û birina Dr. Şivan û hepiskirina wî û hevalên wî da, tû şahidêk zinde yî. Jibo eşkerekirina vê bûyera kanbax, û bi vê yekê ve grêdayî, jiber niyeta te ya paqij tû ketî rewşekî mûşkul. Çewa tê gotin kû, tû hem ji aliyê berpirsyarên PDK-I'ya û hem ji aliyê hevalên Partiya xwe va xelet hatî famkirin. Li ser vê, serê te dikevê gêjiyê û dibe sebebê siyaset berdana te kû, tû tûcar di tû rêxistinî da cî negrî. Vê qedexeyê jî te bi xwe daye ser xwe. Ev daxwaza min û hemî welatperweran e, kû perde ji ser vê bûyerê rabî, me divê kû hûn bîranînên xwe yên di dereqa vê bûyerê de ji kerema xwe ra vekin.*

Ş.EP.: Gelek spas dikim. Bi rastî vekirina vê pirsgirêkê pir zor e. Dibê “sotin nayê gotin”. Vaye 32 sale Kurdan ciyê **Faîq Bucak** û 27 sale ciyê **Seîd Elçî** tijî nekirine. Çewa kû ciyê van pêşkêşan tijî nebûye, her wisa ciyê **Dr. Şivan** û **Çeko**’jî nehatiye tijîkirin. Ew sekan in, sermiyan in, serek in, pêşkêş in û lîder in. Milet hero lîderan naxûlqînê. Heroj diyên me çok nadin erdê û lîderek naynin.

27 sal di ser vê bûyera kanbax da hat û buhorî. Belê rojekê kû ez li ser vê bûyerê neponijim û neşewitim di ser min da neborî. Çewa kû we emir kir, ez di nava merkeza bûyerê da bûm. Belê tû mecbûriyetekê kû Dr. Şivan Seîd Elçî qetil bike bi serê min nakevê. Gelo bo çi? Bo çi? û dîsa Bo çi?. Ev pirs di mejiyê mînda tim digêrê. Ez û hevalê Doqtor yê herî nêzîk Soro, 30-40 roj li *Hacîumranê* li Otêlêk û di odeyêk da li cem hev razan. Min rojê çend car dipirsî “Gelo çewa Dr. Şivan vê xetayê kir, bi çi eqilî û ji bo çi?”. Soro cewaba kû dida min, li xar û jor ev bû: “-Wî werimandin, pîhpihandin yanê bi tirkî (dolduruşa getirdiler)-gotin ma hemî lîder dikuji, kiye kû nakujê? Wî xapandin. Ew jî însan e -wek kû dibên (beşer şaşar)- ma Şivan jî meriv e; însan şîrê xaf xwariye; lê diva kû vê xetayê nekira,”. Erê, bila Soro li qisûrê min mêze neke kû ez ji devê wî dinivînim. Tiştê kû a niha dibêm, ev gotinên soro di bîranînên *Dr. Naci Kutlay*’da derketine. Min ji Soro dipirsiya, min digo gelo kî doqtor xapand, an ji rê bir, lê şihitand? Digo: “-**Îsa Swar**.”. Soro vê jî di bîrnama *Kek Nacî*’da beyan kiriye. Ew beyana Soro’ye û çi pirs hene di nava wê da veşartî ne. Ez hîvîdarim tiştên kû ev heval dizane hê kû saxe -emrê wî dirêj bî- binivîse û bi xwe ra nebe gorê (*Dr. N. Kut. Hat. 201*)

Bûyer 15’yê Tîrmh’ê(1971) eşkera bû. Ji 17’ê Tebaxê heya serê Êlûnê ez û Soro (Nazmî Balkaş) man li ba hev. Di vê navberê da tê bîra min, 2 caran Îsa Suwar hate *Hacîumranê*..

Min di heqê Doqtor da bîranînên *Cudî, Necmeddîn Büyükkaya, Mehmûd Osman*, Xwendin. Di kitêba *Rafet Ballî*; “*Kürt DOSYASI*”da min Şerefeddîn Elçî xwend. (Rafat Ballî Kürt Dosyası S. 599-613).

Dr. Şivan Partî Didamezrîne

Tiştêk xerîb û balkêş kû serê lodê digrê, lêkolînekê Mehmûd Lewendî ye, kû di *KOVARA ÇIRA*, Hejmar 8, Zivistan 1996'da derketiye. A balkêş ewe kû Dr. Şivan Sala 1968'a paseport girtiye, di vê salê da carek çûye Yunanîstanê, carek jî çûye Beyrudê. Dîsa di wê salê da (1968) çûye Kurdîstana Başûr. 29.6.1969'an da li Enqerê, li "*Gazi Mahallesi*" di malek da bi 14 kes-hevalên xwe va "*Partiya Demokrat a Kurdîstan Li Turkiyê*" damezrandî ye. Yanê beriya kû bi arîkariya PDK-T derbazî Başûr bibî, carek çûye Başûr û beriya kû here Başûr kadro bighîne, bo **PDKT** xurt bike, Partiya xwe ya kû navê wê PDKT ye, damezrandiye, an wekî kû *Mehmûd Lewendî* dibê "ava kiriye".

Hevalek, kû bi Doqtor ra çûbû û nekarîbû pêra bimîne, jê qetiyabû; ew jî weka *Dr. Şiyar û RONÎ* xwe bi selamet jê dîr kiribû; *Reşo Zîlane*. Ev hevalê hêjayî pesnê û zmanzanê bi nav û nîşan, gelek alîcenab e. Li Îsweçê, li Upsela'yê dimîne. Sala 1993'yan ez û ew û bi birek heval û dostan va li mala Lûtfî Baksî, li Stolkhom'ê bihev xweşbûn. Şevborka me bi guhdarîkirina Televizyonekê Tirkîyê û "Basın Toplantısı ya İsmet Sezgin" "kû li ser agirbesta PKK'ê bû, heya derengê şevê ajot. Piştî kû civîna *İsmet Sezgin* qediya; *Reşo Zîlan* 2 seeta behsa Dr. Şivan û çuna wana Başûr ji min ra kir. *Reşo Zîlan* vê meseleyê bi taybatî bo min vekir. Go: "Ez dizanim kû tû rûyekê vê pîrsgirêkê dizanî, belê ev mesele dî rûyê xwe hene. Min divê vê jî bizanî." Ev xebardan jî balkêş û girîng bû.

Reşo Zîlan daxil, hemî hevalên doqtor yên kû min ji wan pîrs kiriye, dibêjin: "Dr. Şivan di havîna 1968'an da an 1969'an da hat filan bajêrî teklîfa xebatêk tenzîmî ji min ra kir.". Şivan ji wan ra gotiye kû "PDK-T'yê, wê referans bide me emê derbazî Başûr bibin, li wê cî bigrin, kadro û profesyonan perwerde bikin û partiya Seîd Elçî fesih bikin, partiyêk nûh saz bikin û riya micadeleyê di rêxistinek xweser ê Kurdî da bajon" mehmud Lewendî jî dibê Şivan 29'ê Hezîrana 1969'an Partî ava kiriye.

Têkiliyên Me (PDKT) û Dr. Şivan

Cara yekemîn kû ez pê hisiyam û tê bîra min, doqtor di 27'ê Êlûnê 1968'ê hat li mehkemekirina me "ku celsa yekemîn bû" bejdar bû. Di celsa didûwan da, (piştî heyvêk) dîsa hat beşdar bû û piştî kû em ji mehkemê zivirîne hepsê, hat hepsê, wî û *Seîd Elçî* hev dîtin û gazî min û *Derwêş* û *Emer* û *Şefîq Issî* jî kirin, em muayene kirin, pîrskir ka nexweşiyên me henin an na. Ji vir pê da 3 celsên mahkemeyê çêbûn, di van celsan da û di dervê mehkeman da dihat bi *Seîd Elçî*'ra hev dîtin diki-ra. Hevdîtin bi me tevan ra yek neqlek bû kû min li jor gotibî.

Têkiliyên bi *Dr. Şivan* ra, *Seîd Elçî* û xasima *Feqe Hûseyn* danîbûn, melûmateke hindik didana me yên berpirsyarên Koma Navkom û hew çend. Ew dîtî û lihev hatinên nav herdû *Seîd'an* li hepsê bicî bû. Belê şexsen, min, piştî kû em serê Adar'a 1969'an texliye bûn, piştî vê texliyeyê min daxwaza xebata partî kir, *Feqî Hûseyn* vê meseleyê ji min ra waha vekir. *Feqî* go: -Emê Doqtor û birek hevalên partî bişînin *Başûr*, me hemî îmkanatan hazir kiriye, em vê pir xef bi rêva dibin, me divê kû bê qeza û bela em wan derbaz bikin. Armanca me eve kû em kadro û profesyonelên li wê derê bidin perwerdekirin û ev kadro dagerin nava tabanê partiya me, partî û tenzîma partiyê xurt bikin.

Ev çûn, ev şiyandin û lebat heya payîzê ajot. *Feqî* qe tû melûmat nedida. Wî û rehmetyê *Seîd* vê wezîfeyê dabûne xwe û wan bi serê xwe vê pîrsê dajot. Di derbazkirinê da, bi gumana min ji *Kurdên sînor* istifade kirin. Li *Eruh (dihê)*, *Şîrnex* û *Silopiya* bingehe partiya me hebû; wê demê bi rehmetyê *Emer* ra minasebetêk danîn. Netîceten *Şivan*, *Soro*, *Çeko*, *Reşo*, *Şîyar*, *Ronî* û belkî yek didoyên dî jî hebin kû ez nizanim "wek *Brûsk* û *Welat*"; 7-8 kes hatin derbazkirin.

Ew sal, sala 1969'an borî, zivistana 1970'a da sar û bihar hat. Bihara 1970'a di 11'ê Adarê da aştîyê anî *Başûr*, *Mela Mistefa* otonomiyê stand û *Kurdistanek* azad derkete holê. Xebat û fedekariyên van hevalên kû 6 heyv berê darbaz bibûn, bû sebebê kû ji wan ra hat misedekirin da kû li wê cî bigrin. Hevalê *PDK-T'ê* tenê *Ronî* bû. Berê *Ronî* şandin *Fransa*, piştî *Reşo* û *Şîyar* şandin *Ewropa* û ji wana *Şivan*, *Brûsk*, *Welat*, *Soro* û *Çeko* man.

Feqî û *Seîd* bi biharê ve û bi netîca şerrawestî û Otonomiya *Kurdan* va ketne mitala. Belkî di wê navê da bi ber guhê wan ket kû doqtor ne li ser hisaba wan çûye. Ji me ra vê venakin. Cara ewil *Feqî* çû *Başûr* heyva *Nîsana* 1970'an. Çû û hat û tewrê Doqtor di guhê me da xwend, Doqtor bi partiya me razî nîne, Di nava me da *MÎT* û ajan hene, em deşîfre bûne, divê kû em xwe tesfiye bikin û bikevine binê hikmê şivan an li mala xwe rûnin.

Piştî bi bayê bezê *Seîd'ê* rehmetyê çû. Wî jî tişteyê nekir. *Reşo Zîlan* vê hevdişîna herdû *Seîdan* bi xwe dîtiye û şeva *Stolkhom'ê* ji min û birek hevalan ra qise kir. *Seîd Elçî* û *Dr. Şivan* gelek hev êşandibûn. *Şivan* wek kû pir bi ser *Seîd* va çûbû. *Şivan* pir sert û heşîn bû ye. Dûr û dirêj bi hev ra mineqeşe kirine. Çend roj *Seîd* maye li mintîqa *Behdînan* û xatir ji wan xwestiye kû biçe *Gilale*, ji bo pîrozbahîya *Mela Mistefa* û pîrozbahîya Otonomiyê. Têkiliyên xwe ji hev qut nekirine. Di dagerê da hatiye *Zaxo* û şandiye pey *Şivan* kû carekê dî hev bibînin. Çewan kû *Reşo Zîlan* digo; hevalên doqtor dixwazin kû yek dido bi *Şivan* ra herin, ji bo kû doqtor merivek hişke. Belê doqtor tenê diçî, hevdişîna bi *Seîd* ra

dike û dizivire Meqer. Hevalên doqtor jê dipirsin, dibên “we çikir?” Bersîwa Şivan kine û ne gotinek delale. Dîsa heval jê dipirsin, dibên hûn heya kîja niqteyî hatin? dibê kû Seîd Elçî yek tiştêk xwestiye, min wê daxwazê jî red kiriye; ew jî ev e: “-Seîd xwest kû berpirsariya Polîtûroyê hilde destê xwe û dû endamên vê Polîtûroyê hevalên wî bin.” “Şivan vê daxwazê jî red dike. Piştî dagera Seîd Elçî, me hev li *Diyarbakir*, li mala wî dît. Hûr û kûr li ser vê pirsê nesekîn. Digo: Doqtor li me qelibiyê. Bi xwe va çû. Kesî da di ser xwe da nabînê. Li wê cî girtiye. Dibê ez û ji xeyrî xwe kes qebûl nake. Em lê digerin kû riya diyaloga xwe nebin, heya yekitiyê bi ser bixin.” Ev dîtina me havîna 1970’ê bû. Ez dibê me heyva tîrmehê an tebaxê bû.

Erê, çewa kû Reşo Zîlan ji devê Dr. Şivan neqil dike; Seîd Elçî ji Şivan tenê Polîtbro û dû hevalên Polîtbroyê xwestiye û gotiye “wekî dî Partî li ber te, tabanê partî ji te ra.” Doktor vê daxwazê red kiriye û Seîd Elçî dilşikestî şandiye.

Serê sala 1971’a li me derket. Bi gumana min heyva Sibatê bû. “*Şark Yayıncılık ve Gazetecilik A.Ş.*” civînêk li dar xist. Seîd Elçî gazî me jî kir; em ew kesên kû di merkeza PDKT’ê berpirsîyar bûn, em giş bejderê vê civînê bûn. Seîd Elçî ew şev me civand. Civîna me ji serê sala 1968’a kû em hatin girtin, heya sala 1971’a -yanê piştî 3 salan- pêk hat. Ew civîn jî civîna pîrsa Dr. Şivan bû.

Seîd û Feqî li ser çûyîna xwe ya Başûr û hevdiştinên bi Dr. Şivan ra, dûr û dirêj melûmat dane me. Seîd Elçî wek kû Reşo Zîlan jî ji devê Doktor dibê, tenê Polîtbroyê xwestiye. Dr. Şivan wî red kiriye. Belê Seîd Elçî ji me ra nego kû xwe û dû hevalan ji bo polîtbroyê teklîf kiriye.

Li gora gotin û geneeta herdû hevalan, Dr. Şivan bi xwe va çûye, Pozê wî bilind bûye. Bûye xweyî meqerû îmkân Şorişa Başûr wî digrê. İhtiyaciya wî bi me tine. Di vê civînê da em her pênc kesên kû me partî damezrandibûn û Feqî Hûseyn’va 6 kes bûn. Teklîfa min li xar û jor ev bû: “-Niha em bo çî serê xwe bi Doktor ra evqas diêşînin. Gelo roja ku me vê partiyê danî, me cesaret ji Doktor stand.? Doqtor û partiya xwe bila xebata xwe bikin. Ez hîvîdarim kû bi serbikevin, rojêk zû bighên armançê. Armanca me ew e; kû milletê Kurd rizgar bî. Ha me rizgar kir, ha Şivan.” “-Niha Pêşniyarêkê min ji we ra heye; kû eva serê 3 salane ez li peyî vê û xweyê vê pêşniyarê me. Ez dibê me xebatî partiya xwe bimeşînin. Em hemî giraniya xwe bidine tenzîma partiyê. Partiya xwe xurt bikin. Kû me partî xwurt kir û em bi ser ketin., wê Şivan jî me qebûl bike û dinya jî me qebûl bike. Kû em partiya xwe xurt nekin, ne rol me û neji siyanet û rûmeta me dimînê.”

Hevalekê me -Kû ez navêm, navê wî bidim- pişgiriya min kir. Go: “-Şakir rast dibê. Bi rastî ez neketime nav xebat û tenzîma partiyê. Îsal 4 sale kû ez ji we dûr ketim. Niha jî ne wek endam û berpirsyarekê partî, lê wek dostekê teklîfa min ewe; “kû hûn xebata xwe bikin û bi Dr. Şivan ra nekevin berberiyê. Lewra, ji gotinên we kifşe kû Şoriş’a Başûr pişgiriya wan dike. Wexta kû Başûr pişgirî li Şivan bike û em pêra bikevin rekabetê wê em perîşan bibin. Ez Dr. Seîd Qirmizitoprak qenc nasdikim. Ew, hevalê min e. Min tû însanî wekî wî, muhterîs nedîtiye. Hele kû firsatekê waha bi destê xwe xistibî, dinya tev bibî yek ew nayê rahê.”

Teklîfa min qebûl bû. Derwêşê Sedo go: “-Tiştêk heye”. Hevalan go: bêje ka çiye? Go: “Merivekê min heye mehkûm e. Me divê kû li ser tewsiya partî em wî bişeynin Başûr û nameyêk ji wan ra rêkin, li ser merivêk kû me bihîst ji hecê dageriyaye wê û ew meriv merivêk xetere ye, em wan îqaz bikin”.

Li ser vê jî hinêk teredit çêbûn, bi taybetî DURNAS, vê teklîfê xweşê xwe nanî, belê li ser îsrara Derwêş û Seîd Elçî ev pêşniyar hat qebûlîkirin.

Min bo çi vê meseleyê dirêj kir? Lewra tofana me û Dr. Şivan bi vê destpêkir. Piştî 15-20 roj ez li Tetwan im, Feqî ji Diyarbekir hat go: “Ew merivê kû name bir başûr, nameyê biriye daye *Îsa Siwar*. *Îsa Siwar*, name tîşkiriye û gotiye “bila carêk jî Seîd Elçî û Derwêş name û merivê xwe bi van aqaran va neşeynin. Lewra kû em wan nasdikin. Em Şivan û partiya wî dipejirînin.

Tam di vê navê da Seîd Elçî bi Feqî ra xeber şiyand, kû vê carê divê min bişînê cem Dr. Şivan. Seîd Elçî nedixwesta kû diyaloga me û Doqtor qut bibî.

Sala 1971'ê, piştî 12 Adarê, bi gumana min Nîsan an serê Gulanê ye. Ez roja kû ji Tetwan derketim, ew roj *Ûrfî Îdare* (Sikî Yönetim) li Diyarbekir û der û dorê wê hat îlankirin. Min li Diyarbekir Seîd Elçî'yê rehmetî dît. Min pirsî ka tawsiyên wî çine. Seîd Elçî yê çêkirinê bû. Digo: “Dinya neyarê me ye, em nebin dijminên hev. Neyartî tû kar nade vê dozê. Me Doqtor rêkir; Bi referansa me gaha vê niqtê. Niha xwe daye ber siya hêzêk çekdar û bi devê *Îsa Siwar* tehdîdan bi ser me va dişeynê. Divê em jî fena *Sûryeyî* nebin dûbendî.” Hingî tê bîra min; tewsiyên rehmetî ev bûn: “- Em çûn- ez û Feqî-me û Doqtor bi serê hev nexist. Tû jî here temasêk bike, bila riya diyalogê qut nebe, em jihev cuda jî xebatê bikin, bila dostaniyêk di nava me da hebî.”

Di beriya çûna xwe min îrtibatê bi wesita *Mela Ebdilkerîm Ceylan* danîbû, ka ezê di kîjan rê û bi çi paroleyê derbazbim. Min vana dizaniya. Ez çûm Cizîrê. Min slamên Rehmetiyê Seîd ji DURNAS ra bir. Min

mesela çûna xwe jêra vekir. Wî ji min ra dîa kir, û go: “ez Şivan qenc nasdikim, Şivan ne mimkine gavên qenc bi aliyê me va bavê, lê ka here, qe nebe em dijminiya hev nekin”.

Ew şev min şiyande malêk li *Silopî*, serê sibê min ji wê malê li cîpêk siwar kirin, birin nêzikê sînor, li vêdê hevalek dî hebû. Wî xwe da naskirin û go: “kekê Şakir tû bi xêr hatî, ez Çeko me.” Min navê Çeko bihîstibû lê ew gav min wî naskir.

Ez bi Çeko ra derbaz bûm. Li Zaxo em çûn Partî, Lecna Mihellî ya Zaxo em bi **Osman Qazî**’ra mişeref bûn û derbazî meqerê wan bûn. Em çûne meqer kû Şivan hê ji Tirkîyê danegeriyaye û ciwabê rê kiriye kû ez jî bi Çeko ra bizivirime Tirkîyê. Em di ser riya Hekkarî da dagerîn hatin Tirkîyê. Ji min ra gotin: wê Doqtor li te bigerê. Bi rastî çend ro şûnda Doqtor hate *Tetwan*. Ez û Feqî û Doqtor şevêk heya serê sibê ketne minaqeşê, me tiştêk bi serê hev nexist. Di netîcê da tewsiyeyêk Diqtor hebû; Digo: “bila Seîd Elçî bê Başûr li Meqerê rûnê û ji me ra meznayî bike. Ew kekê me ye, emê bikevine binê emrê wî; lê ne mimkine kû em partiya xwe bifeşlînin û bikevin partiya we. Lewra Partiya we wextê xwulîqiye, yanê ji diya xwe ra bûye, mirî xulîqiye. Ev partî hê di zikê diya xwe da miriye. Ne mimkine kû em vê partiyê ji nûva vejînin. Di dervê vê da hûn hatin girtin, hûn deşîfre bûn, xebata bi we ra tehlîke ye. MÎT we gişî nasdike. Iddiaya *Mela Hemdî* -Mela Hemdî berpirsyarê istihbarata Mela Mistefa yê taybatî bû- ew e, kû tiliya MÎT’ê di nava we da heye”.

Dr. Şivan me mirand, me xista MÎT û deşîfre bûyina me bû qisûrekê mezin. Ev îddia tam pûç bûn, min ew şev jî van îddiayan pûçkir, lê gava çavê gur li xwarina berxikê bî, çi ji destê berxikê tê. Partî ne kû mirî zabû. Wextê ev Partî za, li ber serê wê partiyê, bijijkên ji Doqtor mitehesistir hebûn. Ev partî eserê *Fehmî Bilal*, *Faîq Bûcak*, *Kemal Badillî*, *Seîd Elçî*, *Emer Turhan* û ewên kû em niha hê saxin. Belê malesew em hê di hepsa Antalyayê da, Dr. Şivan vê partiyê fetisand, me jî jiber kû xebata partî 3 salan rawestand, me dest ji tenzîma partî kişand û tabanê xwe teslîmê Şivan kir. Dr. Şivan bila pîrsa “JÎR”* ji Mela Hemdî bikira. Jîr, yê nêzikê nêzik bû li ba Şivan.

* JÎR, bernavê Kemal Kaçmaz e, katibê Şivan ê meqerê bû.

Tewsiya û gotina paşî ya Şivan ew bû kû: “Çi azayên Qomîta me ya Merkezî henin, ev aza azayên Qomîta Merkeziya Partiya wî nin. Seîd Elçî jî hem kekê me û hem jî mezinê me ye. Lewra kû ji me ra lazim e. Bila Seîd bê li Meqerê rûnê, em tev di emrê wî da ne. An bila biçî li Ewropa me temsîl bike, an bila li mala xwe rûnê.”

Dora şevê êvarê Feqî hate mala min. Me qerar stand kû Feqî biçî Diyarbekir bi Seîd ra û bi Derwêş ra dîtî bike; ezê jî herim Emer û Dûrnas bibînim, ka emê çewa bikin.

Seîd Elçî Winda Dibe

Dû sê roj hê derbaz nebûbû; Feqî gote min Seîd Elçî ciwab ji *Nisêbînê* şandiye gotiyê: “bihemhal” bila bê kû em derbazî *Îraqê* bibin. Min jî jêra gotiyê: Ew meriv hate vir, me dîtî kir, bihemhal derbaz nebe, divê em hev bibînin. Me qerar da kû emê dora rojê biçin hevlan bibînin. Serê sibê meşhûr “**Balyoz Herakati**” girtina kû bi navê hereketa balyoz tê zanîn avête ser me. Feqî hate girtin, ez revîm çûm *Edenê*.

Li *Edenê* ez û *Derwêş* rastî hev hatin. Em qederêk li *Edenê* man. Em li wê hîrabûn kû Seîd Elçî derbazî *Suriyê* bûye. Pîreka Seîd *Saîme Xanim* û zarokên xwe hatibûn *Edenê*, mêhvanê *Bahaddîn Seydaoxlu* bûn. Pîreka wî ji me ra go: Elçî derbazî *Sûriyê* bûye. *Derwêş* teklîf kir, bo em jî biçin derbazî *Suriyê* bibin. Birastî min neva kû *Derwêş* bitenê bimînê û madem Seîd jî li wêdê ye, belkû em muşkula navbera xwe û Dr. Şivan jî hebikin. Li ser vê niyetê em derbazê *Sûriyê* bûn. *Derwêş* rojêk beriya min derbaz bûbû.

Ew kesên min derbazkirin, raste rast min birine gundekê nêzîkê sînor ku navê gund *Mezrê* bû *Cigerxwîn*, *Hemîdê Hacî Derwêş û Reşîd Hemo* li wî gundî hetibûn pêşiya me. Çewa ez çûm hindur, *Derwêş* mesela windabûyina Seîd Elçî ji min ra go. Li ser vê, me şande peyî *DURNAS*. Ew şev hate cem me. Derdekê mezin ji me ra çêbû. Me qerer da kû *Mela Unisê Tetwanî-Kû* bi min ra hatibû. -here *Zaxo*, *Mela Unis* çû *Zaxo* û di nava 3-4 roja da dageriya. Em li *Qamişlo* man li bende *Mela Unis*. *Mela Unis* gava çûbû *Zaxo*, hatibû girtin, dîgo: *Osman Qazî*, gazî kir, min parole jêra go, li ser vê *Osman Qazî* min berda, ez çûm min *Mela Mihemedê Paloyî* dît. *Mela Mihemed*, Seîd li *Lecna Mihellî ya Zaxo* ziyaret kiriye. Seîd 3 roj li vira mêhvan maye. Paşê li pîkabek siwar kirine û ew pîkab bi aliyê *Batufan* û *Meqerê Şivan* va çûye, piştî 3 seetan pîkab dageriyaye. Melûmat ev çend e. Di vê navê ra *Ehmedê Hîso* jî *Gilale zivirî* hat, me hev li *Qamişlo* dît. *Ehmed*, ji *Diyarbekirê* jî *Bismîlê* ye. Seîd’ê rahmetî wî jî bi xwe ra biriye. Ji ber kû *Paseportê Ehmed* hebû, *Ehmed* di deriyê *Mosilê* de derbaz bûbû. rehetiyê *Seîd û Mihemedê Begê* bê paseport, bûn

mecbûrê riya Zaxo bûbûn. Bi gumana min, dîtina me û Ehmed li dora 18'ê Hezîranê bû. Çire kû ez qenc dizanim, ez û Derwêş di 20'yê Hezîranê da derbazî Başûr bûn. Seîd Elçî 23'yê gulanê diçe Zaxo û 25'ê gulanê Çeko, Brusk wî ji Zaxo dibin. Ehmed û Seîd qewlê xwe dikin kû li Mosilê bighên hev. Ehmed, 15 roj dimînê hêviya Seîd. Di van rojan da pir lê digêrê.

Reîsê Istihbarata PDK-Î ê wê demê *Şekîb Eqravî* ye. bi alîkirina Şekîb, Ehmed xwe davê *Gilale*. Li Gilale jî serê wî dikevê gêjiyê. Dîsa Şekîb wî xilas dike. Ehmedê Hiso ji Şekîb jî rica dike ka salixê Seîd bidin, belê malesef Reîsê Istihbaratê jî nekariye hîra bibî. Tiştêk balkêş jî ew e; kû Ehmed û *Ziya Şerefşan li Navpirdan* (ciyê mekteba siyasî) hev dîtin e. Hewadisêkê ku Ehmed wê demê digo, min divê neqil bikim. Ew ji Şekîb hîn bibû. Wî go: ez jê hînbûm e. Ehmed nêzikê 10 rojan bûbû mêhvanê Şekîb.

Ev nîr û dema em niha dijtexilin, dema Ûrfî Îdare û *Cunta 12'ê Adarê 1971'a* ye. Di heyva Hezîranê da midetê Ûrfî Îdarê dirêj kirin. *Îsmail ARAR* sebebê (gerekçe) dirêjkirinê gelek werimend û waha go: “Çar milyon Kurd çekdar bûne wê bi nêzikayî dest bi şorişê bikin.” Ev beyanat li dinyayê şoqekê mezin çêkir. Radyo û Telewizyon û rojnama vê nûçeyê xiste serecema nûçan. Tam di van rojan da, li dora 20'ê Hezîranê heyetekê leşkerî diçî Serok Barzanî îqaz dike û dibê: Hinêk ji Tirkîyê hatine li nava axa te ya otonom, bûne xweyî cî û meqer û karê xwe dikin kû bi çekdarî berê xwe bidin me. Ji Serok daxwaz dikin kû ev tiştên waha divê neyê kirin û ev hareket bê tesfîyekirin.

Serokê Rehmetî ji wan ra dibê: “min rê nedaye tû kesî kû bên li vir bibin xwedan cî û meqer û ji bo şerê we bikin, perwerde bibin. Tiştêkê waha tine. Hebe jî ez nahêlim kû şaşî bibin. Tû teredut nekin. Belê hûn jî bes zilm û heqsizî bikin. Li Kurdan werin rehmê. We gelêk Kurd dîsa girtiye avêtiye hepsê.” Serok van dibê û heyet paşkî dizivirê. Li gora dîtina min a wê gavê, piştî kû ew heyet dagerî Tirkîyê, birêk Kurd ji bin çav hatin berdan, weka gruba Tetwan.

Piştî kû *Mela Unis* hat û *Ehmedê Hiso* van hewadîsan anî, me yeqînkir kû Seîd girtî ye. Diva kû em li pey herin. Bi rastî min şibhe ji Îsa Siwar dikira, belê min nedigo kesî; belê şibha Derwêş li ser Şivan bû. Em çûn cem *Qiyada Muweqet* kû serokê wê *Dehamê Mîro* bû. Deham nayê bîra min, lê *Kenanê Egîd* min û Derwêş û Mela Unis li cîpa xwe siwarkir anî *Tilefrînê*. Ji *Tilefrînê* pêda em bi wesîten amî çûn *Mosilê*; li Mosilê riya me û Derwêş ji hev qetiya. Derwêş çû *Gilale*, ez jî kû herim *Meqerê Şivan*. Gava me xatir ji hev xwest; Derwêş gote min: “neçe, bi xwedê tû herî wê Şivan te jî bikujê”. Min gote Derwêş “Kuro bi xwedê min wisa

dizaniya kû tû bi aqilî.” Derwêş vê ciwabê da min: “-Tê niha kifş bibî ka ez bê eqilim an tû.”

Pîştî kû ez ji *Derwêş* qetiyam, ez û *Mela Unis* hatin Zaxo. Em çûne cem *Mela Mihemedê Paloyî*. Bi rastî niyeta min wisa pak û paqij bû kû, min digo gava kû ez Doqtor bibînim, wê Doqtor bi lez û bez bikevê peyî Seîd û emê bi hevra rûnin yekîfî û birayetiye di neqeba xwe da sazkin. Ji ber wê min diva kû seetêk zû ez bighêmin Şivan.

Min ji *Mela Mihemed* pirsî; ka ezê çewa xwe bighînim Doqtor? *Mela Mihemed* go: “bizanîna min Doqtor li Gilale ye.”. “-Başê ezê çewa bikaribim herim Gilale?” Go: “-Tû nikarî herî Gilale. Encax Osman Qazî destûrname bide te, tê bi vê destûrnameyê karibî biçî. Min *Mela Unis* hişt û bi lez ez çûm *Lecna Mihellî ya Zaxo*. Osman Qazî ne li Lecnê bû. Mala wî şanî min dan, ez çum mala wî, li derî da, ji min ra gotin “nivistiye”. Min go: pir girîng e, çûn wî şiyarkirin, ez derketim cem Osman. Min jê rica kir kû bi çî kul û halî dibî bila bî, bila min û Dr. Şivan zû bighîne hev û min çîroka windabûyina Seîd Elçî jêra qisa kir. Wî gote min “Te xelet bihîstiye, Seîd nehatiye Lecnê, bihata minê bibihîsta, ez Seîd nasdikim. Tiştêkê waha ne mimkine.” Min go: niha hun ji kerema xwe dikarin min bişeynin Gilale. Hûn dibên wê Şivan heya hefteyek bizivirê, hefteyek dirêj e, Ez ditirsim siyaneta Seîd bê şikênandin, an xeletî çêbin wê gavê yekitiya me û Doqtor ne mimkine. Tû jî dizanî kû berî çendekî ez bi Çeko ra hatim, min we ziyaret kir. Ez hevalê Seîd im. Ji bo yekitiyê, me û Doqtor hevdiyê û em nêzîkî qonaxek qenc bûne. Ez dîsa hêvî dikim kû hûn min bi zûyî va bighînin Şivan. “Osman Qazî pîrsa Seîd kir, go; li Tirkîyê Seîd pir tê hezkirin. Min go: li Tirkîyê dar û devî jî ji Seîd Elçî hezdkin. Osman li ser vê waha gote min; Bi serê Kurdîstanê hayê min jê tine. Em niha edemêtehrir (destûrname) nikarin bidin. Rê xweş nînin û nava me û Bahsiya ne qence. Ezê te bişeynim meqerê Şivan, heya sê-çar rojan wê Şivan bê.”

Ez rast hatim cem *Mela Mihemed*, min go ez çewan dikarim xwe bigihînime Dewrêşê Sado. *Mela Mihemed* ji kîsê min kuryek peydakir û min nameyek ji *Derwêş* ra rêkir. Min go: “- Vaye ez diçim meqerê Şivan. Osman Qazî bi serê Kurdîstanê sond dixwe kû Seîd Elçî nedîtiye. Hay ji xwe hebe û di dijê Doqtor da tişt nebêje.”

Ez û *Mela Unis* li pîqabek siwar bûn, me berê xwe da Meqerê meşhûrê *Dûşêşê*. *Mela Unis* pir kêfxweş bû, ketibû erdekê azad, ji firariya xwe ya bisalan xilas bûbû. Em çûn Meqer kû *Mela Ebdilkerîm* û hevalên din li wê ne. Min ji Seyda pîrskir, lê Seyda ciwaba min rast neda. Go: “-Welleh min hay ji Seîd Elçî nîne. Dibe kû dageriya be Tirkîyê.

Rojek dido şûnde Şivan hat. Şivan min tenha kir û pirsî ka hûn li çi digerin. Hûn li Sûriyê bi Cigerxwin ra civînan çêdikin, gavekê we li Gilale ye, yek li Zaxo ye. Min go: birayê min bihêle ez pirs bikim. Me li Sûriyê di derheqê windabûyina Seîd Elçî melûmat hilda. Me tesbîtîkir kû sê roj li Lecna Mihellî ya Zaxo maye û wî li pîkabek siwar kirine, pîkab bi alî meqera te va hatiye û sê seet şunda ziviriye. “-Niha ev tiştê kû ez ji te ra dibêim ne ez û Derwêşê Sedo tenê dizanin, hemî rêxistin û siyasetzanayên Sûriyê dizanin.” Doqtor pir hêrs bû. Go: “-Başê hûn li pey çiyê Seîd digerin, ew meriv nîvmeriv e. nexweş e, kêr xilasiya Kurdistanê nayê, ev dawa bi nexweşa naçe serî; ez nizamim we çi li ba vî merivê nîvmeriv dîtiye, kû we hemî umida xwe pêva girê daye.” Ez kenîm. Min go:” Doqtor: Ma tû bo çi hêrs dibî? Em rêxistinekê siyasî ne, Seîd Elçî Sekreterê Partiya me ye, Sekreterê me winda ye û em lê digerin, gelo eybek di vê derê da heye kû tû hêrs dibî. Binêr Doqtor, em û te li Tetwan gahane delavekê lihevhatinê, belê wextê siyaneta Seîd bi qasî zereyêk bişkê, em li qiyametê jî nabin yek.” Doqtor nerm bû. Mêkmêkê wî sekînîn. Bû merivê helîm û selîm. Go: “- Başê, tû heqliyî, niha ez bi serê xwe, bê qerara hevalên xwe nikarim bikevîme peyî vê pirsê. 10-15 roj şûnde wê hevalên min ên Qomîte Merkezî bên bicivîn. Ez dizanim kû niha hûn nikarin dagerine welat. Tû ji xwendinê pir hez dikî. Birêk kitêbên Kurmancî li vir hene. Hemî faskulên *Hewar’a Celaded* jî hene, heya te divê bixwîne û istrahat bike. Heya heval tên, eme qirar bistînin û li Seîd bigerin.”

Ez 20 roj mam li meqer. Di vê navê da hevalên Şivan yên merkezî û herêmî çi hene hatin. Semîneran çêkirin, konferansan dan, xebat kirin û herkes belav bû cî û warên xwe. Ez dengê xwe nakim, hêviya Dr. Şivan im, ka kengê dora min tê. Şevêk, pêşmergeyekê kû nobetê digirta, xelkê Sûriye bû, hat min ji xew rakir go: Dr. Şivan gazî te dike. Ez û Mela Unis li cem hev di odeyek da radiketin. Ez rabûm çûm kû Şivan û bi heyeta xwe va rûniştine. *Çeko, Soro, Zendo, Kurdo* û *Şivan* rûniştibûn. Doqtor gote min: “-Min bi hevalan va qarar girt kû em teklîfa xebata partî li te bikin. Heval dibên kû di herêmên *Bedlîs* û *Sêrtê* da rolekê te yê xwurt heye. Ka tû çi dibêjî?” Ez gelek şaş mam. Hinek sekinîm, ponijîm û min berê xwe da Doqtor go: “-Doqtor, tû qenc dizanî kû ez ne dîplomat û xwedan qaryerek bilindim, ez ne dewlemendekê bê henpa me, ez ne şêx im ne jî axa me; niha çewa kû we go, kû bi rastî di hinêk herêmên Kurdistanê da rola min hebî; ev rol dewle li serê fidekariya min e kû min tûcar menfîetê xwe yê şexsî li ser milê kesî ne parastiye û pêl siyaneta kesî nekiriye, kesî nekiriye pêlpêlok. Ez, bû bîst roj li vir hêviyê me kû ev hevalên te bên, tû wan bibînî û gazî min bikî, pîrsa Seîd Elçî çareser bikî. Seîd

Elçî Sekreterê Partiya min e. Winda ye. Ez li peyî hatim e. Niha ezê wî bihêlim û bêm bikevime nav xebata Partiya te...” “-Binêr Doqtor, tû ji vê Duşêşê heya Gilale tiştê dizanî. Weka kû te ji min ra go” Derwêşê Sado bi Mela Mistefa ra 4 deqîqe hevdiştin kir.” “Pekî bo çi tû ji vir û Gilale dikarî deqîqeyên Derwêş bihejmêrî, û çewa Seîd Elçî tê Zaxo, hevalên te Çeko û Brûsk tên wî ji vir hiltînin tînin bi aliye Meqerê te va û tû nizanî ka çi hatiye serê Seîd Elçî? Niha ezê gotina paşî bêjim; eger Seîd Elçî di binê erdê da bî jî tû dizanî...” Min berê xwe da Mela Ebdilkerîm “-Pekî Zendo: *Eshed Xoşewî* li ber min ji te pirs nekîr, ka Seîd Elçî li kû ye, û ne gote te kû Çeko û Brûsk wî ji Lecnê hilanîne birine?” Zendo go “- Belê Willeh raste Eshed vê yekê go.” Min go “-Pekî Seyda, vaye Çeko li cem te rûniştiye, qe nekete bîra te kû tû pirsê Seîd bikî? Qey Seîd pişikêk bû, winda bûbû.? Ev Soro’yê kû niha saxê; wexta kû *Ebdilkerîm Ceylan* gotinên *Eshed Xoşewî* dûbare kir, xeberê Ebdilkerîm da birîn û waha go bi tirkî “-Eğer Eshed bu lafları söylemiş ise, buraya bir nokta koymak lazım.”

Ew hevalên Qomîta Merkezî bêhis bûne, guhdarî dikin. Doqtor berê xwe da Çeko û Go: “-Tamam, madem kû tû evçend îsrar dikî, emê te bibin cem Seîd. Bila heval ji Mosilê dagerin emê we bi hev rûbar bikin. “Wexta kû Doqtor van tiştan dibê û li Çeko mêze dike, berê min jî zivirî Çeko, min di kû Çeko gotina Şivan dipeşrîne, tesdîq dike. Ez pir bextewar bûm, ji kêfa ezê bifiriyam. Min pirsî ka ev heval kengê diçin Mosilê û çi wext wê dagerin. Çeko û *Elîşêr* wê biçûyan û roja dîyemîn wê bizivriyana. Min Seeta xwe da Çeko kû li Mosilê temîr bike û min xatir xewest çûm oda razanê. Ew şev têr razam.

Sibê piştî nîvro kû siya *Çiyayê Dûşêşê* da ser Meqer: Şivan û hevalan weleybol leyiztin. Hebû 2-3 seet leyztika wan dewamkir. Ez jî yek ji temaşevanan bûm. Leyztik qediya; Doqtor hat cem min, go: “-Te divê em qasek bigerin?” Ez û wî derketine berwarekê bi dar û devî û bi çiya va bilind bûn. Bi qasê seetek em geriyan, zivirîn. Di vê seetê da Doqtor hindêk tişt ji min ra got Ez hêja jî merheze dikim; gelo bo çi; herwekî wesiyeta xwe dikira, min di hinek delevan da hişyar dikira, an serê min tevlihev dikira; behsa partiya xwe, felsefa partî, yekîtiya me, sebebê em nebûn yek kêmasiya Seîd, qerekerê berpirsyar û serekhêzên şorişa Başûr. *Mela Mistefa, Idris, Mesûd, Eshed, Selîm, Îsa* û birek însanên gerandekar û revebir anîn ziman. Di dijê wan da nebû. Pir bi pesin qala wan û Şorişê dikira. Pir ji Serok, Mesûd û Eshed razî bû. Mesela yekîtiya me vebû. Min tiştêk go:”-Divê hemî Kurd lê bigerin, xwe bigihînin armançê, bighên nefîceyêk, ya girîng ewe kû Kurd xilas bibin, rêxistin wesîte ne bo armançê.” Xeberdanê min di vê dozê da, wî xeberê min birî û go: “-Aha.. İşte Sait bunu anlayamadı.” (Ha.. Seîd vê yekê fêm nekîr.) Ez veceniqîm.

Min bê hemdê xwe qîr kir “-Çewa? Qey Seîd ne li heyatê ye?” Wî xeber-dana xwe zivirand û go: “-Yaniş hat fahmkirin. Seîd sax e. Bila heval bên emê dîtina we temîn bikin.

Doqtor ji dûrva çiyayêk bi dar û berên gumre û keresî nîşanî min kir. Ev çiya diketa piştê *Qumriyê*. Behsa avên sar û şênbûna wê derê kir û go emê rojêk herin wê derê pezek şerjêkin û roja xwe li wê derbazkin. Divê navê da yekî ji dûrva gazî Doqtor kir, Doqtor bilez da rê, ez jî ketim pey em berjêrbûn hatin Meqer. Li Meqer Pêşmergeyek li hêviya wî bû. Pêşmerge nameya **Eshed Xoşewî** dirêjî wî kir. Name xwend û berê xwe da hevalên xwe-Xasima Zendo-go: “-Neviyê Kek Eshed nexweş e. Divê biçim. Aletên xwe yên tibbî hilda û li hêstirê siwar bû, xatir xwest û bi rê ket. Navbera Duşêşê û *Bamernê* bi hêstirê, bi hêz, lez û bez kêmi 3 seetan nebû. Ew heya gihane *Bamernê*, şevê da ser wan.

Kuşîna Seîd Elçî Tête Îlankirin.

Dora rojê li rojgermê, çaxê dana çend pêşmerge hatin, nameyek dirêjî Zendo (Ebdülkerim Ceylan) kirin. Zendo name xwend, reng avêt, name ji Dr. Şivan hatibû. Doqtor di nameyê da gatibû kû, ciyê me hatiye tesbîtîkirin, divê kes li wir nemînê, tû tiştî ji ciyê wî hilnedin û bê çek hûn çî henin werne *Bamernê*. Em tev ketin rê. Yek-dido kulek hebûn wek *Zendo* û *Dijwar*, diva kû siwarî bên. Pîreka Bruska û Bruska jî piştî me hatin. Tû fikrekê xerab ji kesî, ji me ra çênebîbû. Em wek herin dîlanê, hevrazê çiyayê Metîna bûn û bi serê çiya ketin; ji serê çiya berjêrê *Bamernê* bûn. Ev hevraz û berjêr bi seetan dikşînin.

Pêşmergeyên kû bi me ra bûn, me birne avayiyek, xaniyekê bi heybet bû. *Mala Şêx Ebdilla'yê Bamernî* bû. Ev mal kiribûn malê şorişê. Wê gavê xweşê me jî dihata kû mala Şêx bûye malê mîrî. Em bi kêf û laqirdî ew şev li wê man. Sibê di tavgermê da, *Mela Hemdî* û Çend hevalên Doqtor kû li Qerargaha Eshed diman bi hevra hatin, me deranîne banikê ber derê tekyeyê û *Mela Hemdî* bi dengê bilind û heyecan dest bi xebêra dijwar kir û malwêraniya Doqtor vekir. Operasyon bi ser ketibûn. Guneşkar tesbît kiribûn. Şahidê bûyerê şahdeyîya xwe dabûn, micrima cirmê xwe îti-raf û qebûl kiribûn, gor hatibûn vedan û mektûl hatibûn tesbîtîkirin. Tû şik û şibhe di vê malkambaxiyê da nema bû.

Ne hewceye kû meriv bêje ka ev menzere çî qeder qirêje, pîs û çepel û dijwar e.

Piştî kû *Mela Hemdî* gotara xwe qedand çû. Pêşmergek hate pey min. Eshed Xoşewî gazî min kiribû. Ez çûm kû Kek Eshed û *Mela Hemdî* bi tenê rûniştine li bende min in. Eshed go: “- Hûn hevalê Seîd Elçî ne, waye Doqtor dibê Seîd Casûsê Tîrkan e, ka dîtina te çiyê?” Min go: “-

Ez fêm dikim ka Doqtor bo çi Seîd Elçî kûşt, dixwesta kû reqîbê wî tinebin, lê ez ecêbmayî dimînîm kû mêr mêra dikuji û bi kuştinê jî qayîl nabin; bêbextiyê davên sitwê hev.”

Min mesela Şivan û Seîd û derbazkirina wan û çiroka Şîvan ji Eshed Xoşewî û Mela Hemdî ra vekir. Tesbîta min ew bû kû: Doqtor merivek muhterîs bû, kesî di ser xwe da qebûl nedikir û bi kuştina Seîd Elçî bi serê xwe dima û dibûya pêşkêşek bê reqîb. “Kû reqîbê meriv xayîn û casûs bî, ma hewceye kû mirov cirmekê waha bike, ji xwe milletê Kurd wê Seîd Elçî ceza bikira. Reqabeta navbera partiya, bi xiyamet û casûsiyê divê neyê tabîrkirin. Vaye ez hevalê Seîd Elçî me û dibêmin Doqtor kû vê yekê kiribî micrim e, qatîl e, lê ne casûs e, ne xayînê welat û milletê kurd e.” Eshed bi xebirdanên min pir kêfxweş bû. Bi min şah bû. Ji min daxwazkir kû ez raporek li ser têkiliyên navbera Partiya me û ya Şivan da derbazbûyî binivisînim. Go “-Ji kerema xwe tû bêje, bila katibên min binivisînin. “ Min hinêk kaxîs jî sitand û êvarê li qonaxê kû em lê diman, min nivîsand da Kek Eshed.

Hevdîtina Min û Dr. Şivan

Kûrê Eshed Xoşewî. *Selîm Xoşewî* hate ber guhê min go: “Doqtor dîtî-na te dixwaze. Kû te bivê, ezê te bibim cem.” Ez qasek ponijîme û min qebûl kir. Divê meriv di bûyerên dijwar da bînfireh bî. Tirk dibên “soğukanlı”. Ez û Selîm çûn wê mala kû Doqtor û hevalên xwe liwê girtibûn. Odeya kû lêbûn odeyekê biçûk bû. Raxistî bû. Doqtor û hevalên xwe yên qomî-ta merkezî û hinek hevalên din jî liwê bûn. Selîm Xoşewî selam kir, kete hindir, ew tev ji berva rabûn, Selîm derbazbû li ser sendoqêk rûnişt, ez jî li tenîştê li ser dikê rûniştim. Şivan bi Tirkî-jî bo Selîm nizanbî em çi dibên- waha dest bi xebirdanê kir: “-Ez dizanim kû tû niha min pir dijwar rexne dikî.” Min go: “Doqtor, ez qaraqar û qîreqîr û qirênê nakim, ezê kurt û niha kû ez di vî derî da ketim hindir û çi hatibî bîra min ezê wê bêjim û bes. Niha kû ez ketim hindirê vê odeyê, min ji xwe ra go xwezî ew roja kû Seîd Elçî û hevalên wî hatin kuştin, ez jî bi wan ra bûma, bihatima kuştin û niha di binê axa sar da bûma, lê min we di vî halî da nedîta. Lewra Doqtor! Tû dizanî kû te çikîr? te tenê Seîd Elçî nekujt, te xwe bi xwe jî kuşt û ji holê hilanî. Te tenê bi kujtina Seîd Elçî; xwe û Seîd Elçî ji holê hilnanî, te dû hereketên siyasî fetisandin. Te partiya xwe jî fetisand û te ya me jî fetisand. Niha ezê çewa bikim û çi bêjim kû berge bigrê.” Bi rastî jî min ji vê pêva ji Şivan ra tû tiştê nego û min carek dî minaqeşe nekir. Şivan go: “- Ez divêmin ji te ra hinêk tiştan bêjim. Ez nebêjim kû tiştê min kiriye rast e. Ez li pey îddiayekê waha nînim. Ez jî niha vê kirinê xelet

dibînim. Ez vê mineqeseyê nakim. *Seîd Elçî, Ehmedê Hiso û Mihemedê Begê* roja kû hatine ber deriyê Mosilê kû derbazê Îraqê bibin, di wê rojê û wê seetê da *Ziya Şerefxan* ji *Beyrutê* bi teyarê hat li Bexdayê peya bû. Li gora îstihbarat û tesbîta kû min kire, Ehmedê Hiso çû *Beyrûdê*, *Ziya dît*, xebera wan bû yek, wê *Ziya û Seîd* li *Gilale* bigihîştina hev, *Seîd Elçî, Ziya xistibû dewreyê*, kû biçin giliya me ji *Mela Mistefa* ra bikin û me ji vira rakin, hereketê me bafêşîlînin.

“Seîd Elçî û Mihemedê Begê, ji ber kû Paseportê wan tine bû, mecbûrê riya *Zaxo* bûn. *Şerefxan* di roja randewiya xwe de hat *Bexdayê* û derbazî *Gilale* bû. *Seîd* li *Zaxo* bû, mêhvanê *Lecna Miheliya PDK-Îê* bû. Di navbera me û teşkilata *Zaxo* da protokolek heye, li gor vê protokolê, ew meriyên kû li *Tirkiyê* derbazî vî alî bibin, heya xeber nedine me nikarin wana bişeynine ciyek. *Mektûbek* ji min ra hat kû *Seîd Elçî* li *Zaxo* ye, ez û hevalên xwe civiyan, me qerar da kû em wî bînin li *Meqer mêhvan* bikin û nehêlin biçî *Gilale*. Ez û *Çeko* û *Brûsk* bi hevra çûn *Zaxo*. Ez neçûm *Lecnê*, lê *Çeko* û *Brûsk* çûn *Seîd dîtîn*; *Paşê* me *Seîd* ji *Lecnê* hilda û ez jî gihome wan, me dûr û dirêj vê pirsê minaqeşe kir. Min pîr hêvî û zarî kir kû neçe *Gilale* giliya me neke, min wî nanî rê tû çare nema,”

“Rast weya xelet, di baweriya me da, me li vir darek danîbû, wê ev der hêşin bibûwa û fêkî bida. Me digo kû emê *Kurdîstanê* azad bikin. *Seîd* jî projeyê me serûbin dikira. Em mecbûr man, min û *Çeko* qerarê kuştina wan da û da înfazkirin. Lewra ez *Sekreterê Polîtbroyê* me û *Çeko* jî *Aza* ye. Em herdû bi serê xwe dikarin qerarê waha bidin. Ezê tişteke din jî bêjim, kû babê min bi xwe li pey *Seîd Elçî* bihata, minê babê xwe jî bikûşt, rast an xelet. “Tîr ji kevan derketibû*”— (Ew jî ez bûm yê bihata kuştin, şeva kû go emê te bibine cem *Seîd* û berê xwe da *Çeko, Çeko* jî tesdîq kir, ew qerarê kuştina min bû).

Doqtor, piştî kû vê senaryoyê dûr û dirêj vekir û raxist, bi min xwest kû hinek gunehê xwe biweşîne, hindêk jî avê li ber me şîlo bike. Zivirî hevalê xwe û ji wan ra hinêk tişt go: Wek: “Divê hûn xebera *Şakir* kû dibê ev partî ji holê rabûn bixne guhê xwe. Divê bi hindikayî hûn 4 salan siyaset nekin. Min dizaniya kû rojek wê me rawestînin, lê ne hevçend zû. Bi min wê yek weka *Dihamê Mîro* ji me ra jî peyda bikin. “Wextê kû xeber dida bi taybetî berê wî li *Soro* bû. 2-3 caran tekrar kir û ji *Soro* dipirsî: “-Îsa çi dike? Cara paşî kû pirsî, *Soro* go: “-Ez çi zanim ka çi dike.”

* Yanê bi *Tirkî*: “Artık Ok Yaydan Çıkmıştı”

Binçav Kirina Dr. Şivan û Hevalên Wî

Selîm Xoşewî rabû piya, ez jî rabûm û ez ji oda girtiyên ser doşekan derketim. Wê şevê min heft per raporek nivîsî. Xwezî niha ev rapor ji arşîvên PDK-Î derketana. Bi min ez wan rojan îdî siyasetzan bûm. Sibê ez çûm min raporê xwe da Kek Eshed'ê rahmetî, jî min ra sipas kir û daxwaz kir kû ez bi Doqtor Şivan û hevalên wî ra biçim Gilale. 3 heb Landrower hatin. Mela Hemdî û 2 Landrowerên teji pêşmerge heya Dihokê me teqîb kirin. Li Dihokê Mela Hemdî ji me qetiya, ez, Şivan, Çeko, Soro û Selîm Xoşewî û mihafizên wî bi yek Landrower ketne riya esfaltkirî ya Hemîlton û me berê xwe da Gilale, em birin Hacîûmranê li Otêla Kak *Ebdillâhê Sorî* kirin mêhvan. Ez pir reht û bê xew bûm. Li Şeqlawaya me xwarin xwaribû. Min bi kinca va xwe avête ser qaryolê û di xew da çûm. Min çavê xwe vekir kû tavê daye. Ez û Soro bi tenê mane. Min pîrsî ka Şivan û Çeko? Soro go: “-Bi şev hatin gotin li Mekteba Siyasî gazî we dikin û wan birin, di çûnê da Doqtor Qaryola te hejand tû şiyar nebûyî.” Jê pêva min Doqtor û Çeko nedît. Wan avêtine hepsa “RAYET”. Vê hepsê Inglîzan çêkiribû. Li ser devê riya Hemîlton bû. Pir mezin nebû. Di navbera *Navpirdan û Hacîûmranê* da bû.

15'ê Tirmehê bûyer li Bamernê pişkîfî, di 16'ê da me anîne Bamernê, roja 17'ê Mela Hemdî hat vê bûyerê ji me ra qisekir. 18'ê Temmûzê em çûn Hacîûmranê. Ew şev Dr. Şivan û Çeko xistin hindirê Hepsa Rayet. Di navbera 18'ê Tirmehê û serê Êlûnê 40-50 roj ez û Soro di vê Otêlê da man li cem hev. Dû neqil bi *Dr. Mehmûd Osman* ra û 2 neqil bi *Berêz Idrîs Berzaniyê* rahmetî ra dîtînen min çêbûn. Herdû neqlên kû Idrîs min qebûl kir, Soro bi min ra bû. Ez niha jî nizam ka bo çi me bi hevra qebûl dikira. Bi Mehmûd Osman ra jî cara pêşî Soro hazir bû. Ez li Hacîûmranê xelet hatim famkirin. Bi rastî hevalên min jî ketne dijê min.

Min diva kû ev mesele baş bê kolandin û tehlîl kirin, ka gelo Doqtor vê cesaretê ji kû stand û bo çi vê şaşiya mezin kir. Rehmetiyê Idrîs nexwest kû bînê heyeta teşkîl bike û ev komîsyon meseleyê bikolin, tetqîq bikin û dirêj bikin, dîgo mesele kifşeye, Şivan ji ber Quminîstiya xwe, casûsî û bi pera vê yekê kir. Min jî vana red kir. Bi tenê kû rehmetiyê Idrîs bi ya min û arznameya kû min nivîsî teqdîmê wî kir bikira, niha di heqê wan da wê hin rexneyên neyînî (rexneyên bêsesil û estar) çênedibûwana û zîmanê gelek însanan kurt bûya.

Kû arşîvên Şorişa Pîroz wînda nebîbin, bila ji kerema xwe arzname min derînin û bibînin, ka di sala 1971'an da min rewşa pêvajoya siyaseta kurdan çawan diye û min çi gotiye. Ez li ser 2 tiştan sekinî me. Ya yekemîn, ji bo rêxistina Kurdên Tirkîyê, ez piştevanîyek xwurt ji wan

dixwazim û dibêem heya em nekevîne pêşîra Tirkî, Tirkî nahêlin hûn li vir bibin dewlet. Ya dîyemîn, ez dibêem kû ev bûyera Şivan neyê analîzkirin, texlîlkirin û rastiya vê dernekevê holê, wê siba Kurd bêjin “yek bi destê yekî dan kuştin û yê din jî wan kuşt.” Tabîr tam ev e. Gotin û daxwaza min ya ew roj ev bû. Dibe kû ez wê demê 33 salî bûm, xwîna min germ bû. Ez niha dibêem kû PDK-T xwurt bibûwa; bi riyek pasîf Tirkîyê mecbûrê demokratiyê bikira, ev xwîn nerijîya, peymanî Cezayîr jî nekaribûwa Otonomîya Kurdan ser û bin bikira, ma ne qenctir bû.

Belê ez niha dibêim kû herekat ne besîtin û li tû derê dinê ne bi serê xwe ne. Divê em diwariyan nekin, hev gunehkar nekin û rehmê li hevkin. Zilma neyaran besî me ye. Em zilmê li hev nekin. Di dilê min da jî azadî, serfirazî jîyanekê însaniyê ji bo kurdan, di serê hemî rêxistin û însiyativ û welatperweran da jî ev heye. Lê me çî ji heve. Em bo çî xwe di hev da dixwînin.?

HESENÎKO

Silêmanê DERÎHESÎNÎ

Hesenîko! Li welatê Serhedê bi koçerî çiya nema me lê danenîn.
Kanî nema, me jê av neanî
Ji berê ve û heyane îro, ji hezkirina qîz û xortan re zêde qedexe kirin
tune bû.
Ji siûda me re, ji evîna ciwanan re sucdarî zêde bûye ji wê yekê,
bila qeda bê li bengîtiya jiyankên vî zemanî.
Ax were, were lê melulê Asê!

Hesenîko dilê mino, kel û kela vê gêrmîyê
Tu yê bire bide ber kaniyê,
Wexta ku sar bû, bila sar bibe
Lê ku sar nebû, tu yê bigire bide ber Muradê li vê Palî'yê.
Ax were, were lê jarê Asê!

Hesenîko bihar e, vê Muradê wîle, wîle
Îro xilas nake deve û fîl e
Ezê nizamim halê dilê te çawane?
Dilê min ji te ra mîna sêniya qelakirî, to liser e.
Ax were, were lê bêhevalê Asê!

Hesenîko bihar e, qanz û qulingan hatin li mêrgan danîn.
Welatê Serhedê heft mehan di bin berfê de dimîne.
Jibona domandina jiyana xwe û malbata xwe, Hesenîkê min,
sibe da rabû tîfînga xwe girt û rê hilanî.
Hesen lawo tu vegere, ez xezal û tu nêçîrvanî
Ax were, were lê bêhogirê Asê!



Kelekvanên li ser çemê Dîjleyê

Hesenîko dilê min mîna vê Muradê lem û leme.
Îsal heft salê min qediyane, ez pawoka bejna te me.
Kelekvano belkê Hesenîkê min jibona min, hate ber Muradê
ku derbaz be,
diravên xwe tune bûn, tu yê Hesenîkê min derbaz ke(bike)
ez kefilê heqê te me.
Ax were, were lê rebenê Asê!

Hesenîko dilê mino ji te maye,
Tu yê were malê barke, min jî bi xwe re bibe zozanên jorîn ba
Riza ye,
Wexta ku gelê wê deverê heyirî ma, gotin va çiye, çi tewa ye?
Tu yê bêje min rebena Asê, parda xwest û qelend daye.
Ax were, were lê bêdilê Asê!

Hesenîkê min çûbû Erzeromê kavir kirrî ,
Devê min nagere ku ez bêjim te tilî firrî,
Heyanî ku Hesen ji kavila Erzeromê vegeryaye hatiye malê
Rebena Asê bazor dane, qelen birrîn.
Ax were, were lê tengezarê Asê!

Hesenîkê min çûbû şewitiya Erzeromê jibona pez e,
Ez nikanim bibêm; Hesanîko pez li canê te bibe merez e.
Heyanî Hesen ji Erzeromê ziviriye hatiye malê,

Bêkesa Asê bazor dane, kirine bûka teza
Ax were, were lê bêgengazê Asê!

Hesenîko dilê min mîna kara gîskan
Ezê heyânî sala çunê vê çaxê di mala bavê xwe da bi
sultana serê xwe û hezkiriya Hesenîkê xwe bûm.
Îsalî di mala lawê Hesê Xello Xirnikê pîsê heram da
Tilî û pêçiyê min qerimîn jiber hingilîskan*
Ax were, were lê ronediye Asê!

Hesenîko minê li vê Muradê ava sar e,
Gulleyên ku Xirnoyê(kê) pîsê heram ji bêxewîr da
li Xamêlê berra Asê dane.
Tengezara Asê birîndar e.
Jiber êşa birîna xwe dike hawar û zare zare.
Ax were, were lê xêr nediyê Asê!

Hesenîko ji vê Muradê heya vira,
Xwîna heyî û jiyana Asê rîjiya liser ax û kevîran.
Hesenîkê min bila dunyayê dilokî tune bûya.
Te ji min ra bigota Asê xwengê, min ji te ra bigota Hesen bira
Ax were, were lê bêdawiyê Asê!

DÎROKA EVÎNA HESEN Û ASÊ

Çaxa ku em zarok bûn, di nava gel da ji pîr bûyeran dihate bahskirin. Mijara van bûyer û gotinan cûre cûre bûn. Ji vana hinekên wan mîna çîrokan dihate peyivandin. Dihate zanîn ku vana bûyerên civakî yê pîr kewn bûn. Bi van gotinan re tewr û tîmşêtên însanan digewirîn. Kelij liser ruhê însanan rûdinişt. Çavên gotar û gohdaran ji aliyê der û hundir ve rê dikirin. Însan diketin bandora keserkûriyê. Yên cixarekêş qutiyên xwe ji berîka(cêba) xwe derdixistin, cixareyên xwe dipêçan û bi hesteyên xwe vêdixistin û kûr kûr nefes lê dixistin. Em zarok bûn jî, di wan tewran da, di zikê me da jî liki-mandin çê dibûn. Dilê me jî jan dida, mîna yê mezinan.

Dihate fêmkirin ku ev meselana hêjî perçeyekî jiyana gel bû, ya me hemûyan bû. Dihate zanîn ku ruh û dilê însanên me, mirovên me û gelê

* Hingilisk: Gustil.

me, bi van gotinên bi vî awayî, jîr û qewîn dima. Van gotinan dibûn pêgirtiyên mirov û jiyana mirovan. Dibûn hîmê pêwendiyên kesan. Van galgalan, domandina jiyana însanan ya şexsî û civakî diedilandin.

Ji van qalekana yek jî, mesela evîna *Hesen û Asê*- Asyayê bû. Jibona wanan tiştên ku qise dikirin, devkî bûn. Însanan bi tevayî xwendin û nivîsandin nizanîbûn. Welatê me, welatê Serhedê bi tevayî hemû wisa bû. Kêm merivan xwendin û nivîsandina wan hebûn.

Jibona vî awayê, neqilkirina bûyera wan û kilama jibona wan, li her derê wekî hev nedihate gotinê. Her meriyekî goraî zanîn û rûh û hîs û qabiliyet û ziman û îfadekirina xwe şor dikirin û distiran.

Qasî ku tê bîra min, di wan çaxan û deman da xemgînî bi tevayîti bû. Kesertijî bûn, dil helûk bûn, dilra bûn, rûh lemî lemî bûn, taybetî û nemazetiya însanan bû. Ewaha bûn, bingehîna kûrahiya hundirê hemu merivan bû. Wexta ku ev mijaran beşdarî dihatin peyivandin, gotar û gohdar hemu bihevra diketine rewş û tevgereke dinê.

Wê tawê ez zaro bûm jî, lê zik û dil û mêjiyê min jî tijî dibû. Hejandin li can û cededê min çê dibû. Di heyîya min da birûsk lê diketin. Dibû şîrçe şîrqa wan. Ez bi tevayî dihatime hejandin, lerizandin û dihatime vejandin. Sorbûn, sotbûn û germbûn û geşbûn di min da xwe nîşan dida. Qasê ku ez diketim binî, daha hîn zêdetir hêz û armanc û pêşketin bûnê xwe di rûhê min da didomand. Coşeke tîr di canê min da xwe diyar dikir. Wê geşcoşiy ez dorpêç dikirim.

Ew çi halê me bû? Ew çiqas zor û zerb û tenganî- tengasî û bêkesî bû liser jiyana me hemûyan bandor dikir. Di vî awayî da zordariya biyaniyan û nezanî û xizaniya me, ku liserê me bûbû teyrê ecelê- qasidê mirinê çawa dihate rakirinê. Van tiştên neçê, bi her awayî em şunda xistin- xistibûn. Em bi hemû awayî wezalok ketin- ketibûn. Hevgirtin û peywendiyên pehet jî, di nava me da nedihate dîtin. Malxirabî û ocaxkoriyê di naveroka navenda jiyana me da hêlîn çêkiribû. Têde, di nav da qurt bûbû. Têda liser pûnikê sekinî bû, rûniştibû. Jiyana me ji xelîtiyê, ji neponijandina baş, ji tarîtiyê, ji bêraman û bêarmanciyê, ji serhişkiyê, ji hûndirê xwe da dîl hatiye, ... avis bûbû. Gelo awakîno dibû?

Ez kurekî koçer bûm. Jiyana me di navbera gund û bernî û zozanan da derbaz dibû. Rêwîti û koçeriya me jî, perr û baskê wê jiyana me bû. Bi deh rojan koçerî rê û dirb dihata kudandin. Xêncî kêmasiyên me yên dinan, pîr caran nigên- lingên min xwasî bûn. Di nava heyîyê de me tuneîyî dikişand.

Diya min her timî ji jiyana xwe ya qewimî û serpêhatiyan qise dikir. Vana yên şexsî û malbatî û eşîrtî û civakî û gelêrî bûn. Wexta ku ji van serdrbazbûyiyan/serbihuran dipeyivî pirir helûk dibû. Pîr caran xwe nedigirt digirya. Lemî lem lê diket, mîna ava Muradê diwêliya û diwêland û dilorand. Agir bi dil û kezêba min diket, ez jî bi wê ronedî û belengazê ra digirya. Wê dema hanê can û cesed û rûhê min dikete nava agir, dişewitî. Mîna sewafa êzingan xirtinî û qirçinî jê dihat.

Dayika min, heyânî roja mirina xwe jî ev rûhê kelîjî bi xwe ra domand. Nod salî zêdetir payan kir, qet tişt jîbîr nekiribû. Tiştên ku bihîstibûn, tiştên ku jiyabû pirr xweş, fireh û rast- birastî dahanî- dihanî ziman. Ji *"Tertela Fillan"*, *"Tevkûjiya Fillan"*, *"Seferbêrlîk"* ê, *"Hatîna Êris"*, *"Hedîsa Efendî"*, *"Mesela Dêrsim"*, *"Mesela Gûrûbê"*, *"Bîrçûî"* û *"Xela'yê"*, û jî pirr tiştên cûr be cûr- cûre cûre xeber dida. Qezîkirina wê tev bi axîn û waxîn û keser û heyifandin û hesretên kûr derbaz dibûn. Jiyana *"ronedî"*yan bihevîre pêgirtî û girêdayî ye. Lewra ku tev bihevîra jî kaniya rojnedîtiyan avê vedixwin. Bi hezaran sale li welatê hanê, bi her awayî, kesayetî di binê kotekiyê da tê kudandinê.

Bi van gotinana û jiyana me da ez, zêdetir bi bûyera *"Hesen û Asê"* û yên mîna wana yên dinê pêgirtî dibûm. Evê weha diketine nava rûh û canê min û tede şax davêt, reh didan. Dibûne hîmê rûh û jiyana min û yên mîna min. Ji van sedeman peywendîke zexm di nava min û bûyer û kilama Hesen û Asê da çê bûbû. Bi vê yeka jî nemabû. Pevgirêdana navbera min û welatê me yê *Serhedê*, *Murad* û *Ferat* û koçeriyê û jiyana însanî û jiyana serhedîti da jî pêk hatibû. Vê pêvebûna hanê, xwe avêtibû dîrok, tevgerî û civakiya welatê çiya, welatê rojê- Serhedê. Çiyayîti, zozanîti û Serhedîti bû rewşa min, bû hêsinê min. Vê yeka van timtêlana di rûhê min da zîl didan. Mîna giyayê Serhedê di bihara nû da , di bîngeha rûhê min da serîdan, pişkuvî, şax avêtin, pel dan, pêl dan, lem dan, perçav bûn, berdarî dan. Bûne heyîya xweser, bi serê xwe. Ez bûme meriyê, merivê- mirovê peyayê Serhedê. Bi rûh û can, dil û mêjî û dilêriya peyayekî serhedî, bi doza bûyera serhediyê xwe ketim. Bîngeha jiyana wan û min û me yek bû. Qurmê heyîya me yek bû.

Min bi deh salan binaxa bûyera wana jî pirr kesan pirsî. Di nava derfetên xwe yên kêmi ve pê ketim. Liser wana fikirîm. Gengazên min yên zêde, fireh tunebûn ku di demeke kurt da, jibona bûyerê bizêdeyî agahdar bibim. Kilama wana di hate gotinê. Ez jî bi gotinan wê hîn bûm. Min gewşînek dabû kilamê. Di deng û dîlana min da awartî hebû. Min jî vê kilamê ra meqamekî nû afirandibû. Wexta ku min ev kilam digot, ew mercên ku bûyer afirandibûn dibûn hêsinê min. Her ku zeman diherikî, derbaz dibû, ez û bûyer û kilamê lihev dihatine şidandinê. Hîn zêdetir alîgiriya Asê ketibû hundirê min. Ez jî bi evîna wana ve têkildar bûbûm. Ez bi dil û rûhê Asa ronedî ra her demê heval bûm. Ji rûhê wê yê ku di bedena wê da di girtîgehê da bû, alîgir û parastvan bûm. Astengiyên ku li rûhê wê, li evîna wê hûmetê neyînî çêdikirin, bi wê ra li min jî kar dikirin. Jibona vê yekê jî bi min hînbûyîna bûyera wana pêwîst bû. Ku mesela wana bi bîngehî neyê zanînê, kilama wan jî, bi erênî nayê fêmkirin û hilçînînê.

Gotar, guhdar, dengbêj û sitranbêj ku bûyera kilamê zanibin, hîn kilam tê famkirinê. Cewher, armanc û bîngeha wê gora eslê wê tê hişyarbûnê. Wexta wan tiştana, raiş û tevgera serhedîyan bi tengasî û

maciriyê ve, bihevra neyin fikirandin û darezandinê, kilam ji ruhê xwe yê eşlî, resenî, ji wateya xwe ya bingehîn tê xericandinê.

Qasê ku hatiye zanîn, evîna **Hesen û Asê** awha bişkuviye û şax avêtiye:

Hatiye gotin ku Hesen xortekî cindî, çeleng û zîrek bûye. Ji malbateke Hesenî bûye. *Endamekî eşîreta Hesenan* bûye

Asê jî keçeka, qîzeka liser xwe bûye. Xweşik û sipehî bûye. Rind û rengînî bûye. bejinxweş û navkêl- navend zirav bûye. Rû û sûret û hinarê wê narinc û gozelî bûye. Çavên wê mîna zok kaniyê di ber hev da ji bin zinarekî Zozanê Şerevdînê derket û herikin bûye. Çavên wê belek, zelal û şewledayî bûne. Dev, poz, lêv û didanê wê hûrmetê lihevhatî bûne. Qirika wê gewr û dirêj bûye. Taxima sing berê wê mîna gelî û bilindiya çiyayên serhedê pirr saxî û xalî bûne, rind bûne, hêvî mayîn bûne. Eslê wê ji maleka *Zirrkî* bûye.

Herdu jî gundî- koçer bûn. Ji der û dora Melazgirê bûne. Di serê sedsala bîstemîn de herdu jî xort û xama bûne. Berzewac, bermiraz bûne. Dilê wana lihev hebûne. Ji hevûdu hezkirine. Malbata Hesen çend caran hatine, ji malbata Asê wê xwestine. Lê aliyê Asê qîza xwe nedane. Gotine em keça xwe ji nava eşîreta xwe dernaxînin. Lêbelê bi nedayînê, hezkirina wan nehatiye birrînê. Evîna wana timî lê zêde bûye. Eşqa wana xurt bûye. Bi deng ketiye. Liser hevûdu kilam gotine. Evîn û evîndarî wana, bengîtiya wana belav bûye. Kilama wan bihêz pêl daye. Roj bi roj qewîn bûye. Mesela evîna wana bi deng ketiye. Li her derê hatiya xebirdanê. Kilama jibona wana her derê hatiye sitranê. Kilam û dengê eşqa wana bûye mijara qisedana însanên herêmê. Dengê kilama wan li welatê serhedê li her derê şax avêtiye. Di civatan da mesela wan hatiye nirixandinê. Biye mijara mijulayiyê.

Vê wezîyet û tewra wana heft salan kudandiye. Malbata Asê li goranî tore û adetên welat eşyane. Xwe di tengasiyê da dîtine. Di aliyê namusê da ketine binê giraniya kelem û tore û astengiyên civakî. Jibona vê yekê ji xwe ra çareserkirina vê bûyerê fikirîne. Biryar dane ku Asê bizewicînin. Bi vî awayê, Asa reben bi darê zorê dane lawê *Hesê Xello Xirno* yê pîsê heram, ji eşîreta xwe.

Asa reben bi zewaca bêxêr, bi xwesî ketiye gornê(gor nîne, gorn e) . Halê wê ne tû hal e. Ev wezîyeta wan 6- 7 salan dikudîne. Sê heb zaroyê wan çê dibin. Kilama wan, kilama Hesen û Asê li her derê belav dibe, tê gotinê. Ku eslê xwe da vê kilama Asê liser Hesen gotiye. Gotinên vê kilamê li Xirno tû bandor nake û nekirine.

Herba, şerê cîhanê yê yekemin dest pê dike. ûris di sala 1914 an da ji aliyê Qersê ra dikeve welat. Ro bi ro berve navîna Serhedê tê. Di

sala 1916 an da xwe digihîne derûdora Bîngol û Şerevdînê. Li wan zozanan bi çendemî sekan dibin artêşa wana.

Di vê pêvajoyê da gelê Serhedê jiber hatina ûris macir dibe. Ji van însanana hinekê wan welatê xwe, erd û gund û avayiyê xwe terk nakin. Evana dibêjin; em çi bikin, çi tê serê me bila bê; em dimirin û têne kuştin jî bila li welatê me biqewme. Hinek jî jiber bêkeysîyê jî şuna xwe naleqin. Beşek ji wana berve hêla sihêl, aliyê germ, germê rêwî dibin. Koçberî berve hêla başûr diherike.

Ev koçerî, koçberî û rêwîtî ya ne bi kêfî ye, ne jî bona îdareya jiyân û dinyayê ye. Rêwîtî û rêbûhurtîke pêwistî ye. Armanca vê yekê, bi destên leşkerên ûris neketine. Di war û ûrt û gund û welatê xwe yê şêrîn de dîl neketine, nekuştine, zar û zêç, erz û eyal ji talan û tecavûz û binpê kirina biyaniyan parastine. Jibona vê yekê bar dikine, rêwî dibine.

Mirovên wî welatî di jiyana xwe ya civakî û dîrokî de pirr bûyer û bêtorê ewha bi çavên xwe dîtine û bihîstine. Bi sed sal û hezar salan best û tevger û domandina jiyana wana werre qelibîne.

Bê dilxweşî ro derbas dibin, koçeriyê jî hêla rojhelat da dest pêkiriye. Berê wana berve hêla rojava ye. Jibona wê yekê yên ku koçer dibin, tên di ber yên ku goranî wan rojava nin ra derbaz dibine. Wana jî ji tiştên nebaş xeber didine. Tirs, êş, elem, tevdanî, tengasî, tenganî, gef, tehdît, xeter, tewatîlî û her neqencî bi nava hev ketine, lihev dikevîne. Van bûyer, tewr, timşet û tevgerana liser rûh û can û bedena merivan bandor kirine. Tirs û jê xilasbûn, bi diwariyeke mezin xwelî ser heyîya kesan nîşan dide. Însan ji xwe revok bûbûn. Tirs bûbû her tişt û ketibû nava her tiştî. Tirsê û bêewleyiyê mêzîn û wezin ji navendê rakiribû, qewitandibû, ratorandibû, heyîwandibû. Tirs û bêbawerî bûbûn mîna wêneya hawirdorê.

Bêkêrî, bêkesî, bêhêvîtî û girêdandina, dorpêçkirina rûhê kesan weqas hatibû navendê, vê weqas pençe dabû, hej û pej dabû nedihate navandinê.

“Terq” li însanan ketibû. Mîna terqa ku birr û keriyên deveyan diketin, terq li însanan jî ketibû. Terq li jiyânê ketibû. Rev, qet û qetbûn û qutbûn bûbû rêk û pêkê nû. Qut û qutbûn ne disekinî, ne ditewitî, hûr dibû. Dibû mîna aringê, mîna ard. Mîna teyrên kombûyîne, bêxewîr ku di carek de xeter lê çêdibe, çawa pirrêbûn lê dikeve, însan jî wisa bûbûn.

Yên derfetên xwe hebûn û ji çûyinê ra daxwaz bûn bi xemgînî bar dikirin. Di dinyayê de ji tiştên pirr zor yek jî ewe/eve ku, însan bi bêhemdî ji erd, war, ûrt, cîh, cangî û welatê xwe koçber be û biqete, qut be. Di dîroka însanan da hatiye dîtîne ku di wan tewr û timşetan da birçîtî, xela û nexweşîn jî xwe nîşan didine. Hatiye zanîn û çavkirin ku di van demên weha û awakîno da dê/dayik weledên xwe davêjin. Heta

dibêjin hinekan ji birçiyar goştê zarokên xwe jêkirine, birijandine û xwarine. Di van tewrên han da dêya/dayika însan û însanetiye, mirovahiy û kesayetiyê tê gîrandinê. Van rojên bêhed, bi zor û zerb li dinyayê neyin serê tû însanan. Lê însanên vî welatî pirr caran bi hûr û kûr û dûr van tiştana, bûyerana, qewimandinana di jiyana xwe da dîtine. Jibona vê yekê bi xwe dîtine, lê naxwazin neyarê wan jî bin, kesek li rûyê erdê nebînin. Bi vî awayî dilxwaziye diyar dikine.

Bagêr û bahoz û balîstok ji jiyane rabûye, lê daketiya reh û rîçikê jiyane rakirin, armanc bûye. Feleka xayîn û malxirab li van însanan neyartiyê girîng xwiya kiriye. Însan bi heyî û jiyana xwe ve liserê xwe bûne ezab û bela. Siûda gelê welatê Serhedê dîsa çep filitiye. Her tişt tevlihev bûye. Kêm tişt û însan weke xwe yê berê di dewsa xwe da mane. Hinek însan û tiştan qîmet û rûmet wenda kiriye, hinekan jî zêdetir rexbet girtiye. Hinekê wan bi şewle tarî bûne, hinekên tarî diçirûsine. Hinek mîna şêran dihatine zanîn, xwe xeripandine, hinek bûne mîna roviyan. Hinekên ku berî vê wextê mîna roviyan dihatine dîtî û zanîne şewq dane, hêz û berradan ketine, weke şêran xuya dibîne. Hewar û fîgan e. Evana bûne mîna birûsk ji navenda ewr, asîman û ezmanan vedane. Li navenda wê herêmê, wê hêlê, wê der û dorê xistine. Pergal û raîş hejiyaye. Însan hatine badandinê. Li binê çeng û guhayê hevûdu ketine.

Asa reben çi bike, çawa bike. Tû tiştek ji destê wê naye ku ji çarenusa xwe ra rêyek bixetine. Pê keve, hewl bide xwe û wê rê bidomîne. Jiyana wê weke hebê genim di binê kevirê aşê da tê hûrkinê. Çarenusa wê qewinîne, qewimandine. Bîr, hiş û biryar nîne. Destên wê da jibona wê û berjewendiyên wê tiştek tunîne. Siûd û çarenusa wê hûmetê ji berê de çewt û tewş lêketiye. Roja ku heskiriye, evîndarê wê Hesenîkê delalî bêhêvî kiribûn û bi destê zorê kiribûne ber Xirno. Wê demê xiştik û birûsk lê ketibû. Hatibû hejandin. Bêhiş bûbû. Vê bûyera hanê jî jêra bûbû derdê liser derdan, kul û keder û mereza giran. Bûbû barê liser baran. Di binê bîreke kûr de careke dinê binbîr bûbû. Tewr di erdê de çubû xwarê. Mêjiyê wê tingînê jê dihat. Îstiqameta wê xêza wê wenda/winda kiribû. Rûhê wê dêşiya. Dilê wê hatibû guvişandinê.

Xirno jî lihev ketibû. Ji merivekî neçar bû jî, ne dewlemend bû. Tiştên wê yê pêgirtî tunebû. Di gund û wargeh de merg û zevî, erdê xwe yê dinê tunebû. Ajalên xwe jî zêde nebûn. Wî jî biryara barkirinê daye. Hinek tiştên ku heyânî wê demê di kesên dinê û wî da nexuyayî bûn, di xwe da nedîtibûn, pêda berçav dibûn. Di binê postê/çermê wî erdonekî, ne tiştêkî de jî têt û bijuyê şêr, piling, şepal, keftar, gur û hinek dirindeyên dinan bişkuvîn û serî dan, serî rakirin. *Xirno* jî ji barkirinê ra xwe heleste kir.

Rojeke navenda payîzê bû. Lawê Hesê Xello “Xirno” jî barkir. Koç bi rêxist. Lê rêwitiya wana ne bi êlayîti bû. Mala “Xirno” tenê bû. Sê

heb barbirên wan hebûn, mal li sê bargiran/bergîran bar kiribûn. Barek fîraq, fol, ard, arvan, hûr û mûrê lazimî bû. Barek jî têr, tûr, şo, berşo, berr, gelt, carcim û xaşî bû. Barê sêyemîn jî nivînê wan bû.

Nivîn li bergîrekî sernerm û herdu zarokên mezin liser wî barê nerm, di nava lehîfa duqatî da bînteng kiribûn. Wê demê wan zaroyana yek pênc salî, yek jî sê salî bûye. Zarokê sêyemîn jî yek salî bûye. Asê ji roja ewilî da vayê piçûk/qicik bi çarşefekê li pişta xwe girêdaye û serê hespa ku herdu zarokên din lê siwar bû dikişand.

Vana bi vî awayî rêwî bûne. Berê xwe dane hêla welatê xwe yê dinê. Berve başûr, *germistanê*, deştê, berriyê, *Herranê*, *Amedê*, *Rûhayê*, *Sirûcê*, *Mêrdînê*, *serêkaniyê*, ... ciyê ku ji bandora herbê, ya leşkerê ûris dûr û zivistana xwe bi nermayî derbaz dibin, diçin.

Zarok qicik in, haya wan ji pirrê tiştan û bûyeran tû nîne. Dizanin di jiyanê da awarteyî çê bûye, lê pirr pê nehesyane. *Xirno* û *Asê* jî ciyê ku berê xwe danê navên wana, wan derana bihîstine, lê bi çavên xwe nedîtine.

Bi barkirin û danîn, koç bi hefteyan rêgir dibin. Di geverê/gedûkê *Solxan* da diqelibin. Ji *Çawaxçurê* re dibûhurin. *Kaniya Yado*, *Sargehê û Mendo* şunve dihêlin. Di qeverê xezikê ra xwarî/ xarî aliyê Depê dibin. Bi derbazbûna darabestê ve berve *Palli* yê derin. Li ber *Palli* yê (Palu/Palo) pirek heye, bi nav pira *Palli* yê ye, liser wê re *Murd* a renginî derbaz dibin. *Çemê Behro* yê û Maden ê li pêşiya xwe zirav dikin. Hinekî rê dikudînin, têne gundekî. Navê wî gundê *Xamel* e. Li wirê xaneke bazirganiyê kevnareyê kevirî jî heye.

Dikevine evrazekî, berwarekî, berpişteki, berpalekî birrekê dimeşin. Herdu bargirê dinê wekî her demê li pêşiya wana ne. Asê jî mîna her rêwitiyê zaroka biçuk li piştê ye. Ev zarok li piştê bi çarşevê girêdayî ye. Asê mîna her demê serê hespa zarokên dinê dikşîne. *Xirno* jî li dawîya wana ye. Wê tawê nixêl bûne û bîponijandin dimeşin. Di jorê wan de, dengê dengbêjekî tê. Guhê xwe didinê destana ku Asê liser Hesên gotiye ev e. Ku şivaneke dibêje. Li bilindê rê kerîk, birrek pez e. Belav bûye, rev avêtiye, hêl daye, çeng daye diçêre. Şivan jî kêfa wî xweş e. Li hêla pez kilama *Hesênko* bi dengê bilind dibêje.

Wê demê rûhê *Asê* diheje, dilerize, serûbinî dibe, lihev dikeve û dihêrife. Bi birûskan, xişkan, xiştikan û çekên giran tê agirikirin. Dikeve binê xişim û barana vana. Lê di nava vê dilsotî, diljana bêsînor da kêfxweşî jî heye. Vê gavê hezkirin, keser û evîna wê ya jibona Hesên dîsa serî hildide û ji nû ve tîr dibe.

Lê *Xirno* jî wê çaxê hejandineke mezin di rûh, dil, mêjî û canê xwe da hest dike û dibîne. Ev *Xirno* yê ku heyânî wê kêlê, wê seetê, wê tawê, weqas, bi salan ew sitrana jina wî liser merivekî, liser evîndarê xwe Hesên gotiye, guhdarî kiriye bédeng maye. Wê demê di wê taxê ra, jibona wê yekê, wê bûyerê teng dibe, bêxulq dibe. Pirr û pirr

li hal dikeve. Ji derve û hûndir de heyîya wî , rûhê wî tê gullebaran kirin. Rûhê wî di bedena wî hilnaye. Bêhesab zora wî diçe. Di dilê xwe da dibêje “Hela li min û vê ecêba giran, derdê min ji min ra bes nîne, di vî halî de, ez bi weqas rojane ji cih û cangiyê xwe ewqas dûr ketime, ewqas diltengiya min heye, lê wirê ji ev kilama tê gotinê. Min digote ka ev kilam li cihê me hebû. Li wê derê dihate gotin. Li wir ma? Ez dibînim û dibihîsim ku heyânî vira jî hatiye. Ma qey li her derê jî ez ji vê kilama xilas nabim?”

Wê demê “**Xirno**” dibe asêyekî mezin. Dibe serî rakirê birra û tûj. Dibe mêrîkuj. Dibe rûhistîn. Rûh û dilê wî tê gewirandin. Dibe tolhildêrê jiyana xirab. Ewê ji kê tolê hilde? Xencî Asê kesek heye? Lê dîsa jî bê pirsîn û bê bersiv, bê merc nabe. Merca tolhildanê di bersiva helwesta Asê da ye. Gulle ketiye xizna çekê, linga wî kişandin maye. Ev jî di pirsîn û bersivan da ye.

Xirno mîna mêrîkuj û ajalên dirinde diqelibe ser Asê. Bi helwest û dengêkî jê nedîtî ji Asê dipirse. Dibê: “Asê! Ewê va sitrana heyânî çi wextê û kê derê bê gotin?” Asê di kêlekê da bersiva wî dide, dibêje: “Heyânî dinya û însan hebin, ew li her derê û her wextê dê were gotin.”

Ji Xirno ra, ji aliyê Asê va bersiv hate dayin û helwest hate diyar kirin. Va yeka ji aliyê Xirno ve neyînî ye. Pêwist e, kuştin çê bibe. Xirno biryardar e, kiryar e.

Xirno ji xirnotiyê der dikeve . Her tiştî li cîh dihêle. Bi tenê kuştina Asê biryar dike. Biryara bêhed, bêsînor tîr dibe. Weqas tîr dibe, têde şik namîne.

Şeşagira wî gulle têde ne, li piştê ye. Dibe: Asê cihê van zarokan li ser hespê xirabin, evê ku li piştê te ye, wî dayne, emê bihevra ciyê zarokan bidedilînin. Asê mîna gotina wî dike. Zarokî ji piştê xwe vedike, datîne. Asê wê kêlê amaca Xirno hest dike nake naye zanînê. Tête gotin Asê bêxewîr e. Xirno liser hev sê gullan berra Asê dide. Sê caran şeşagirê liser Asê diteqîne. Asa bêdil dayî, Asa ronêdî ji pêda ket. Bi timşêteke civakî û dîrokî dêla bi hezarên yên mîna xwe va jî, bi hawar û zarîn li erdê ramediya, dirêj bû û vezelya. Xwîna wê wanan/ ewên mînanî wê liser erdê şeridî, nuqûtî, çizirî, ... Hê! Hey! Te dinyayê! Te felekê! Te xayînê! Te wêranê!

Nezanîn, jarîn, bêhêzî yeknebûn jehra/axûya jiyânê ye. Xirno cenazeyê, cesedê, meytê laşê Asê di xwînê da daçikandî li erdê dihêline û rêya xwe didomîne.

Asa reben, xênedî ji aliyê toreyan û jiyana eşaîriyê û çanda wakînoyê de bêkes, bêxwedî, liser erdê, liser xwezayê ma. Birînên wê hurmetê sar bûn. Ji qol û refên jindaran, jiyankokan qetiya, derket. Ji jiyânê, ji Hesenîko, ji zarokên xwe, ji hevalên xwe, ji merivên xwe, ji gelê xwe, ji jîndaran, ji kesayetiyê, ji mirovahiyê, ... ferikî ma. Kete xewa bêdawî. Erd bû doşeg û palifa/balgiya wê, ezman bû lehîfa wê. Mirîbû. Navbera

erd û ezman bûbû gorna wê. Bi her awayî gorneke fireh, kûr û bilind. Gorna civakî, dîrokî û kesayetiyê. An jî gorna bêkesîtî û bêkesayetiyê.

Meta/metika Seyrê digot: "Rojek ji nava demsala payîzê bû, hewa hênîkayî bû. Kîşwer baş derbaz dibû. Jixwe em koçer bûn. Goranî raîşa koçeriyê di dawîya payîzê de em diçûne berriyê. Wexta me hatibû. Demsalê pêwistî xistibû holê. Em berve berriyê koçber* bûbûn. Êla me, şênîyê me 8- 10 mal bûn. Me heywanên xwe barkiribûn. Em dimeşyan. Me barbirên xwe dajotin. Em ketine nava erdê *Xamelê*, di nava erdê wî gundî de, di evrazekê de, di berwarekê de em bi koçayî diçûn. Em pê hesiyan, bîhneke pîrîr giran, tûj û nebaş hate pozê me, bîvila me. Em bi tevayî veciniqîn. Me bi destmal, pêş û pêşmalên xwe pozên xwe girtin. Me jihevra got'va çiye, çi awa ye? "Barbirên, bergîrên, hespên me yên pêşiyê serê xwe rakirin. Fûrriyan. Ji rê xericîn. Me nihêrî ku jineka bi timşêta welatî, serhedî qasî 80- 100 mîtroyî li pêşiya me, liber rê ye. Li erdê razandiye. Perçifiye. Va bîhna xiraba hanê ji wê, ji termê wê tê. Me got ev çi kare? Çawa dibe? Çima, jibona çi nekirine gornê. Eliyê birayê min got ku, xebera min jê heye. Ev pîreka hanê mirî, li erdê, ew Asa ku kilam liser Hesen gotiye, ev e. Du roj berê, mêrê wê Xirno bi sê gullan ew livira kuştiye û çûye. Jibo ku em hîn zêdetir bîhnê negrin, ji rê fireh ketin, veqetyan. Em careke dinê li pêşiyê ketine ser rê û me koça xwe domand. Em çûn. Meyt li wê derê ma."

Me li jorê jî got, qasê ku hatiye dîtî nê termê Asê neketiye gorna taybetî. Mîna gornên dinan. Jixwe qasê ku ji bûyerê tê famkirinê, Asê di van gornan da mîna gornên dinê yê taybetî da nedihate hemilandin û hewilandinê jî. Gorna Asê pîrr fireh bû. Ji xwe wexta ku însanên me ji meriyekî, kesekî xweş bin, di mirina wî da dibêjin: "gorna wî fireh be". Asê jî bi xwestinê nema, bi rastî werre bûbû.

* Koşber: Koçer

CIN Û PÎRHEVOK

Fîkret SÛHREWERDÎ

Ez gihîştîm dema şevbihurkên germ û nerm. Jiber ku televizyon hêja neketibû nava malên me yên belengaz. Ji wî, dema saet ji qonaxa êvaran derbaz dibû û berê xwe dida şevê, dinyaya min a zarokî jî berê xwe dida hikayat û çîrokên *Rûstemê Zal*, *Harûn Reşît*, *Mîrza Mihemed*, *Memê Alan*, cin û periyên. Min hefsarê hişê xwe bi wan çîrokan ve diberda.

Di qezayê(bajarok) me de, hin malbatên bextfireh xwediyê wê qutiya esrarengîz bûn; û dema hevsaletên min ji bo dîtina wê qutiye dibûn mêvanên bêdawetê wan malan, ez melayîm melayîm dibûm guhdêrê çîrok û meselên bav û pîrika(dapîra) xwe; û bêtir jî yên *Pîrê Şarê*. Bi awayekî, ez xwedî talih bûm; çimkî di wextê hewcedariya şîrê dayikê de, ez xwediyê çend dayînan bûm. Lê ya ecêb, ew ecêb bû ku, di wan dayînan de bala muhayyîla min liser yên vekêşanî û tirsî bû: **Pîrhevok!*** an, ez bêjim, ewan min meraqdar dikir.

Di wan efsanan de yên ku liser pîrhevokan dihatin gotin ku jiyane hembêz dikir, aliyek hebû. Di wan efsanan de, navên hin kesên ku diboriyan, nas bûn; an kalikê nasên der û dora me bûn. Taybetiyeka îrsî ya wan kesan, bi nifirên(bêdia) pîrhevokekê dihata girêdan. Yeka dî, di nav wî jiyana rojane de ihtimaleka dehşetengîz hebû ku, ew ihtimal, her wext dikariya bi rastîne re cî biguharanda. Min jî, ji vî aliyê wan pir hez dikir. Ku eger li ciyekî xalî, bi dilqekî nenas derketana pêşiya min (jibo rastîna wan ev bes bû), dê heycana min biketa liser rêya baweriyê. Min jî wê demê, vî tiştî pir dixwest.

Ew şiverêyên ku weke marekî dikêşyan gundê me, min pir diperoşandin wî wextî. Jiber ku, ew şiverê, di ser çîrokên pîrhevokan de gav didan. Li binê zinarekî 60- 70 mîtro, ku biharan bi dengê gurr diherikya çemek hebû û li ser serê çem, girekî nêzîkê 150 mîtro bilind dibû. Ervazê wî girî de, ku weke devekî tarî vebûbû şikeftek hebû. Roja ku rêya me li wê diket, hebûna wê şikeftê, ji me re dibû tirsek. Ew tirs û lerz, di wê rêyê de eger em bi serê xwe bûna, dibû sê-çar (qat). Qey te digo Pan⁽¹⁾, pif li piştê stûyê me dikir. Me ecele dikir ku em ji menzîla wî devê tarî derkevin; me tirsê xwe bi firûzî û stranan dixwar.

* Ev gotin li aliyê Sêrt û Batmanê, bi navê "Pîrhevok", li aliyê Diyarbekir, Siwêreg û Bîngolê bi navê "Pîrabok", "Pîraboçik", "Pîspatik" tête navkirin. Ev tişt, mehlûqeke por-gewel, memik mezin û çavsor e.

1. Mitolojiya Yewnaniyan de Pan, xwedayê ciyên beyaban û xalî ye. Di wan rêyên bêdeng de, ew tirsê ku meriv diqewme û mûyên meriv gizre dike, ji vî xwedayê e. (Bnr. Halîkarnas Balıkcısı: "Anadolu Efsaneleri" r.100)

Em çima ji wê şikeftê ditirsiyan? Ew tirs ne bêsedem bû. Çîrokên ku ji me re hatibûn qisetkirin, di serê me de cî girtibûn. Taybetî jî ev qiseta ha bûbû hevalê wan çem, dehl û şiverêyan: Zemanekî, li **Kelha Ricalan****, pîrhevokek hebûye. Însan û karwan bi destê wê hatine helakê; ew rê haram bûye. Kar û şixul nîvçe mane; îhtiyac weke ava sikran berhev bûne. ... Jibo kuştina vî rêbirî, Alî Axa- ku kesekî cesur û jêhatî bûye- derketiye pêş. Rojekî, xwe û mehîna xwe zirx kiriye û jibo cengê qîrek daye pîrhevokê. Pîrhevok derketiye ber qula xwe(şikefta ku di hindirê wî de dijiya), bi çavên sor û tûj li wî faniyê nihêriye û bi kêfxweşî porê xwe yê gewel-gij ba kiriye, memikên xwe yên mezin avêtiye ser milan û berê xwe daye wî siwarî.

Pîştê bîstekê di navbeyna wan de cengeka yeman dest pê kiriye. Lê ne Alî Axa û ne jî pîrhevok serdest ketiye. Kêliyekî, pîrhevok lê nêriye ku zeya mehînê bêzîrx e; firset ev firset e gotiye û di wî ciyê de dest avêtiye kezeba mehînê, derxistiye. Alî Axa jî di wî keysê de bi şûrê xwe yê tûj, derbeka xweş li pîrhevokê daye. Mehîn miriye, lê pîrhevok jî ji taqet ketiye û hilweşiye erdê. Gotiye, tu bi xêra xwedê derbeka dî jî li min bide. Lê wî zanibûye ku careka dî lê bide, pîrhevok dê dîsa sax bibe û dê êdî bibe yeka nebez. Ji wê yekê ez, ji mala yekderban im gotiye Alî Axa. Pîrhevokê jî bi hêrs vê nifirê lê kiriye: Xwedê bikim dûnda te, tu car ji yekê nebore.

Pîştê wê rojê dîsa xweşî hatiye li wî deverî. Êdî tu kesî pîrhevokê nedîtiye. Lê dibêjin dûnda Alî Axa jî ji yekê zêdetir nebûye.

Ev e, ev çîrok bû ku dê me daxilê efsanê bikira, an jî efsanekî dê îkamê jiyana me bikira. Pîrhevok belkî hêja jî dijiya û eger ku birîna wê cebirîbûya(halbikî ev îhtimal nîn bû; çimkî jibo selahiyeta me Alî Axa “derbekê” lê dabû; lê me her car vê teferuatê jibîr dikir.) dê dîsa derke- ta meydanê. Lê ji bo rastiya wê çîrokê tenê ne ez, bawerke zarokên din jî dixwestin pîrhevok dîsa sax bibe!

Ku eger îro dîsa berê min ketîbî efsanên pîrhevokan, sedem, germa wan rojên zaroktiyê ye. Lê tenê jî ne ji bo xatirê wan rojan e, ev tiştên ku me li jorê anîn ziman. Piştî çendekê, dema me taybetiyên van efsanan rêz kir, hûnê bibînin ev teferuat dê bibe taybetiyeka navendî. Piranî min xwest ez vê eşkere bikim.

Lê beriya efsanan, em dinya wan bidine nasîn

Rêçên Jiyaneka Arkaîk:

Cin, perî, ejderha, dêv û hwd. rûyekî pir kevin ê însaniyetê ne. Zemanekî, bi tevgerên wan şikl distand dinya û di wê dinyayê de insan dibestê çarenûsa xwe bû. Her wext di bextê wî de derzek, terkek

** Girekî muhkem e û şikefta(qula) Pîrhevokê têde ye.

dikariya serî derxista. Ew demeka *senkretîk* bû; hêja rastî û xeyal ji hev neqetabûn. Berberiya navbeyna van hebûnan de, xwe li ser tewereya “pevcûn” ê çerx dikir. Di vî demê de însan, hêja xwezayê nas nedikir. Xweza hêja di bin çengê desthilata însan neketibû. Dinya jî bi xeteran tijî bû û her xeter, cengek(herbek) derpêş dikir. Pevcûn, berhemên gotinê yên vî zemanî *senkretîk* de, bi sembolan xwe êşkere dikir. Yanî dinya efsanan, tenê ji figûrên folklorîk pêk nedihat. Lê tiştê balkêş, ew dinyaya ku ji figûrên folklorîk pêkdihat, dibû bervajiyeka mezin a efsanê. Çimkî lehengên van efsanan weke *Mistefayê Ezo, Hacî Emîn, Abdilqadir Efendî, Lezgîne Osê, Faris Axa* û hwd. jiyabûn demekê û kesên xwedîdûnda bûn hêja jî.* Li aliyekî, xwediyê hêzên sihêrîn, kezebxûr, çavsor, porgewel, memik mezin aferîndeyek (mehluqek); ji aliyê din ve weke min û te însanek! Ev berevajî(tezadî), di arkaîkiya efsanê de dibû noqteka şikestî, û ji rasthatina “mêj” û “îro”, “duh” ek (*passê-rêçant*) ava dikir.

Lê ev rewş jî, dîsa dibû deşîfra hin taybetên efsanan û rêberiya me dikir. Jiber ku herkes pê eyan e, du tişt digot wan efsanan:

1- Efsane, heqîqeta jiyane qiset dikin.**

2- Efsane, bûyerên fewqalede(anormal) ku rabirdûyeka nêzîk de borîne, qiset dikin.

Ev taybetiya dawîn, di navbeyna efsane û mît(mythos) de ferqeka girîng e. Çimkî mît, rîtûelên demeka xumam in; lê efsane, gora mîtan, hîkayetên demeka sayî ne. An em bi devê **Mircea Eliade** bibêjin, efsane, weke mîtan ne “mînak- model”ên **zemanê destpêkê** (in illo tempore) ne⁽²⁾. Lêbelê zemanê van efsanan- qey em jê re bibêjin **zemanê efsanî** dê çi be!- ne zelal bûn; bêtir diman mijên newal ên payîzkî. Çimkî tu qisetvan jibo zemanê efsanî tişteki vebirî(qatî) nedigot.*** Tenê tabîrên wek “*beriya çend salan*”, “*beriya pêncî/sed salî*” an “*bapîrê babê min/ bapîrê dapîra min*” bikardianîn. Ev, elbet teferuteka pir balkêş bû; lê jibo ku di navbeyna min û kesên çavkanî(qisetvan) de “*bêbaweriyek*” bejin navê-je, rastîna wê rabirduya-nêzîk, bi gotineka din, wî zemanê kronolojîk, min nikarîbû bikola. Çimkî qisetvan ji çîrokên xwe pir bawer bûn; pîrseka şikbir, dikaribû wan bêkêf bikira.

Aliyekê din dinya vê rabirduya- nêzîk, di nav efsanan de, yekitiya motîfan pêktanî. *Wek Sêrt, Batman, Bîngol, Diyarbekir, Siwêreg* jihev dûr/nêzik li herêman, însanan, jihev bêxeber, lê bi eynî **kodan** diramiyan û digotin. Yanê qalibê çîrokan hema hema weke hev bûn. Yek kêr, yek zêde, bi eynî motîfan digîhiştin hev. Ew pêşaniyên elîpsî bûn. Yanê

* Heta çar efsanê, ji efradên wan malbatan hatin darêjkirin.

** Hewayekî ciddî dihata li ser rûyê qisetvanan; yên pîr çêtir bi çîrokên xwe bawer bûn.

2. Eliade, Mircea: “Mîtlerin Özellikleri” çeviren: Sema Rifat, Semavi Yay. 1993, (s.17).

*** Ji kasên çavkanî Gulbeyaz Çelîk, Musa Akbuğa, Hasan Demir xwestin ku vî zemanê Kronolojîk bibêjin, lê bi sarnaketin.

zemanê efsanî jî, eynî weke **zemanê mîtî** xwe dubare dikir. Ev taybetî ji bo arkaîkiya zemanê efsanî serrişteyeka baş bû. Lê bila xelet neye fêmkirin, zemanê efsanî, weke zemanê mîtî, ji tekerrûra dahatûyê re nedibû dergûş. Tekerrûra(dubare) ku bi xêra mîtê dibû, çawa Eliade jî gotî, ihtiyaca zayîneka nû bû û ew, bi peryodîkî pêkdihat û bi wî awayî, zeman îlga(îmha) dikir.⁽³⁾ Halbikî di efsanan de îmhakirina zeman nîne. Çimkî di modela çîrokê de, behsa teqlîdkirina dema-niha û afirandina modelêka peryodîkî nayê kirin. Bi vî awayî ve zemanê efsanî, weke zemanê mîtî payîdar nîne û ji tevger û ritûelê dûr e. Ew hiş e di nav zemanê kronolojîk de; lê dê tu car neyê tespîtkirin. Ku em bi gotineka rafîne(dawerîwandî) bibêjin, zemanê efsanî, zemanekî kronolojîk yê ku destpêka wî nediya e.

Niha ev teferuata balkêş bila ji nivîseka din re bimîne û em werine li ser efsanên pîrhevokan bisekinin.

Ceribandina Dabeşekê:

Li piştê Kongireya Budapeştê, efsane, bi awayek hatin dabeşkirin. Ev awa bû pîvaneka navnetewî. Efsanên babeta vê ninîsê, bi sernama “Efsaneyên Hêz, Hebûn û Kesên Fewqalede” hate topkirin. Ev sernama bû navê tevan.

Lê ezê li vir dabeşeka din biciribînim, ku eger bikaribim. Ezê motîfan û têkiliya hebûnên efsanan daynim ber xwe. Ya rastî, pîvana min dê “erk” (fonction) be*. Rêgeza erkê, dê firseta dabeşa ceribandineka atomîze bide.

Mînak û darêjan, şeş kom tîp dan destê min.

TÎP I : Di van efsanan de pîrhevok, pê bi derziyek/merxezek/şûjinek tê girtin. Kesê ku ji vana yekî pîsera pîrhevokê de bike, dê wê ji xwe re êsîr(dîl) bike. Piştê dîlîtiyê, pîrhevok hêzên xwe yên sihêrîn winda dike û dibe xizmetkareka pak a wê malê. Çend sal bi vî halî dijî. Ji wî halî xelashûn bi du awayî ye:

a) Pîrhevoka dîlketî, yekî ku ji derziya pîserê bêxeber(bûka teze, yekî biyanî û xerîb) peyda dike.

b) Rojek malbat diçe kar, lê zarokek tenê li malê dimîne. Pîrhevok bi alîkariya wî zarokê bêfêm ji derziyê xelas dibe.

Bi van awayan serbest û azad dibe pîrhevok. Lê beriya çûyinê, ji jana salên dîlketî, tol distîne. Tol standin jî bi du awayî pêk tê :

3. Eliade, Mircea: “Ebedî Dönüş Mitosu” İmge Kitabevi, 1994 (s. 88).

* Samuel H. Hooke, kitêba xwe ya bi navê “Middle Eastern Mythology” de dema ku mîtosan dabeş dikir, ji pîvana “erk”ê hereket kiri bû. Dê emê jî wê pîvanê ji bo efsanan biemilênin. Ji bo vê teferuatê binêrin wergera Alaeddin Şenel, (s. 9).

a) Pîrhevok, ferdekî malê dike. Kuştîyê wê zarokek e. Lê ew zarok ne yê ku wê azad kiriye.

b) Pîrhevok nifir dike û ew jibo wê malbatê, heta qiyametê(?) dibe zehmetiyek.

Çend mînakên vê tîpê:

Malbata Mistefayê Ezo û Pîrhevok^{a)}

Zivistanê; şeva ku bibûya sayî, xelqê ji xwe re pale digirtin û diçûn helizê, sibehan.

Wisa sibehekî, hêja stêrk li esmanan, hatiye deriyê Mistefayê Ezo daye pîrhevokê jê re gotiye: “Rabe em biçin, xelq tev çûn helizê û wexta bîn; ez û tu man. Eve ez çûm, tu jî were.”

Mistefayê Ezo jî radibe, werîsê xwe hiltêne û dikeve pê pîrhevokê. Wextê diçine binê dêza helizê, Mistefayê Ezo lê dinêre ew kes ne însan e, pîrhevokê e. Zehf tirsaye, lê belî nekiriye. Ji pîrhevokê re gotiye, “tu here serê dêzê, ezê jî li vir xwarê piştîyan çêkim”. Pîrhevok qebûl kiriye û çûye li serê dêzê û helizê avêtiye. Mistefa jî wan kiriye piştî. Dema ku pîrê hatiye xwarê Mistefa şûjinek ji ber pišta xwe derxistiye û pîsera pîrê re kiriye. Sêhra pîrê betal bûye. Mistefa, piştîyan hemû daye piştê û berê xwe dane gund. Dema hatine gund hêja nebûye sibe.

Wextê ku gundî bo helizandinê tên gaziya Mistefa dîkin, lê dinêrin ku dêza helizê li ber derî ye. Lê diînin heyirî. Dibêjin, “kuro, te çi wextî çû helizê anî?” Mistefa dibêje, “ka werine hundir, ezê çi bidim nîşanî we!” Wan dibe hundir û pîrhevokê nîşanî wan dide û hal- hewalê xwe ji wan re qiset dike.

Dibêjin piştî wê rojê pîrhevok bûye qerweşa wan. Nan pehtiye, zarokan xeytî kiriye, malê paqij kiriye. Çend sal wisa boriye. Mistefa jî şîretan li maliyan kiriye ku tu kes wê şûjinê derneyne.

Lê rojekê herkes çûye îş. Li malê, zarokekî bêfêma maye. Pîrê jê re “pîrê heyran! Ka wî tiştikê ha ji pîsera pîrika xwe derîne,” gotiye. Ewî kurikî jî şûjinê derxistiye. Pîrê serbest bûye.

Dema ku millet ji îş ziviriye, lê nêrîne ku pîrhevok ne li malê ye; lê hevîrê ku kiriye li wir e. Maliyan çiqas pehtîne ew hevîr xelas nebûye.

Mistefayê Ezo bi çiyê ve çûye û deng li pîrê kiriye; “Pîrê, ew hevîrê ku te kiriye em dîkin nakin xelas nabe. Ka bêje emê çi bikin?” Pîrhevokê gotiye: “Girika ewil ku we destê xwe de westirand*, gilolika serê wê ji girikê hilkin û bi teştê xwe din; dê hevîrê we bêbereket bibê û zû xelas bibe.” “Lê piştê kêliyêkê vê nifirê jî li wan kiriye.” Mistefa! Xwedê bike hûn têr kur bin, kêma keç bin û qirşik jî ji mala we kêma nebin!

a. Gulbeyaz Çelîk, Sêrt-Şêrwan-Hirçin, 76 salî, kêbanî, nexwendî ye.

* Westirandin: Bi destan şikil dayîn.

Heqet jî ev mala ha pir kur in û kêr keç in. Qirşik jî, li malê wan kêr nabin. Dibêjin nifira pîrhevokê bi wan qebûl bûye.

Malbata Hacî Emîn û Pîrhevok^(b)

Hacî Emîn li sibehekî zû rabûye ku here bîstanê xwe. Di rê de rastê xerîbek hatiye. Qasekî bi hev re çûne. Dema ku çavên Hacî Emîn bi nigên wî xerîbî ketine, fêr kiriye ku pîrhevokek e ew. Çimkî berûpaş bûne nigên wê. Hacî Emîn bi hêdika derziyê derxistiye û singa pîrhevokê re kiriye. Pîrhevok ketiye şiklê xwe, lê sehra wê betal bûye.

Hacî Emîn, wê aniye malê. Pîrhevok heta çend salan bûye qerweşa wê malê, îş kiriye.

Rojekê, bi destan de sîtil û firaqên avê, rêya kaniyê girtiye pîrhevok. Li ser kaniyê rastê bûkeka teze hatiye. Pîrhevok nêzikî bûkê bûye û gotiye: “Ka xêra xwe vê derziya pêşîra min derîne”. Bûkê jî deraniye, pîrhevok dişa bûye weke berê. Hatiya mala Hacî Emîn vî nifirî lê kiriye û çûye:

“Xwedê bikim eşyayên we tu car ne li ber destên we bî!”

Dibêjin ew kesên ku ji malbata Hacî Emîn in, eşyayên xwe winda dikin; “eşyayên me cin dibin.” dibêjin.

Malbata Dawut û Pîrabok^(c)

Beriya çend salan, cinan, gundê Çinarê, Xanik ê, mesken girtine. Bapîrê min Dawut Efendî yekî dewlemend bûye. Çend kerî pez û heywanên wî yên mezin hebûne. Du heb jî hespê bijarte... Yekî jehr xwar û mir; yê dî jî, ji mirinê fil-iti. Gora qisetan, şevêkê, ew hesp kiriye hîre hîr û ji tewle derketiye çûye. Çend rojan nehatiye malê. Bapîrê min çûye wî dîtiye û aniye, da kiriye. Lê hesp di tewlê de ne rehet bûye. Bapîrê min meraq kiriye, çûye tewlê. Mêzekiriye ku hesp, di nav xwêdanekê de ye û yala wî hatiye honandin. Bapîrê min çûye li qata jorîn derziyek aniye û di piştî hespê re kiriye. Wî çaxê pîrabokeya porgewer, memik mezin derketiye meydana. Bapîrê min wî biriye qata jorîn û çûye ku xeberê bide xelkê gund.

Eve hingê mamê min û pîrabokê tenê mane. Pîrabok pir xembar bûye, çimkî dizaniye ku derzî ji pêşîrê dernekeve, ew dê çend sal bibe kole. Ji mamê min rica kiriye ku derziyê derxe. Mamê min ê ji dinyayê bêhay jî derziyê derxistiye. Pîrabok ji ber çavan wenda bûye.

Piştî wê rojê berdaq û kefçiyên bapîrê min û yên me jî wenda dibin. Loma însan dibên “pîrabok, herhalde bêdia li we kiriye.”

b. Ayşe Erdem, Batman - Bişêrî, 50 salî, kebanî, xwenda ye.

c. Musa Akbuxa, Diyarbakır-Çinar-Xanik, 67 salî, cotyar, xwenda ye.

Pîrabok^(d)

Ev mesele, di 1885 an de, ji serê bapîrê min Hûseyîn Beg (Demîr) û dapîra min Şerîbe Xanim de bihûriye. Wê demê bapîrê min 35, dapîra min jî 33 salî bûye.

Wexta dirûnan, dapîra min çûye zeviya pembûyê. Bapîrê min Hûseyîn Beg jî li malê bûye. Wextekê tî bûye bapîrê min û çûye ji bîrê av kişandiye. Dema ku sîtila avê biriye devê xwe, pîrabokek xwestiye wî li ser avê de bikuje. Lê bapîrê min pê hesiyaye û ji serê caketê xwe derziyek derxistiye û li pêşîra pîrabokê re kiriye. Pîrabok hilweşyaye erdê; dema dapîra min hatiye, Hûseyîn Beg hal hewalê xwe jê re qiset kiriye. Dapîra min Şerîbe Xanim pir kêfxweş bûye, çimkî piştî wê rojê karên malê ketiye stûyê pîrabokê.

Rojekê dapîra min li ber tenurê bûye; ji wir ve bapîrê min hatiye û jê re wisa gotiye: “Qey em wê bernedin?” Ev xeber ne bi dilê dapîra min bûye, lê heya wê rojê gotineka mêrê xwe nekiriye dido. Ji wî, “tu dizanî”, gotiye. Bapîrê min gaziye li pîrhevokê kiriye û jêre wisa gotiye:

“Ezê te berdim. Lê tuyê tu zirar nedî min, jin û zarokên min; tamam? Tu soz didî?”

Pîrabok jî soz daye. Bapîrê min baweriyê lê aniye û derziya di pêşîra wê de derxistiye. Pîrabok dema ku azad bûye, “zarokên te na, lê ezê neviyekî te bikujim” gotiye û wenda bûye.

Dem, dewran sal bihûrîne. Neviyekî Hûseyîn Beg û Şerîbe Xanimê çêbûye. Navê wî Îbrahîm danîne. Lê Îbrahîmê bêtalih dema ku neh salî bûye, pîrabok jî hatiye wî fetisandiye. Piştê, xwe nîşanê bapîr û dapîra min kiriye û “min neviyê we kuşt û tola xwe hilda,” gotiye û çûye.

Emê niha motîfên vê tîpê rêz bikin. Ji bo vî karî, emê ji berhema “**Motîf Index of Folk Literature**” ya **Stith Thompson**’ê alîkarî bigrin. Ya rastî ev berhem, hema hema ji bo edebiyata gel a her netewî berhemeka bêhempa ye.

Eve motîfên **Tîpa I:**

- 1- K 1889. *Xapînokên di şiklê xeyalan de (Di her çaran de)*
- 2- D 1181. *Derziya sihêrîn. (Di her çaran de)*
- 3- R 111. *Dîlîtî(Esaretî) (Di her çaran de)*
- 4- D 765. 1. 2. *Sêhra ku bi derzî derxistinê betal dibe. (Di her çaran de)*
- 5- F 361. *Tolhildana periyan. (Di yekî de: “d”)*
- 6- M 411. *Nîfira ku qebul dibe. (Di, sisêyan de: “a, b, c”)*

d. Hasan Demir, Diyarbekr - Kewsan, 77 salî, Serbest, ne xwanda ye.

TÎP II: Di vê tîpê de pîrhevok muselletê axurê dibe û heywanan-piranî jî hespan- aciz dike. Xwediyê heywanan dixwaze hîn bibe ka çima heywanên wî roj bi roj kêr dibin û ji taqet dikevin! Loma jî dapikek(feq) pêktîne: zemq/ zîft/ benîştê reş li ser piştê hespa xwe dide û li cîkî xwe diveşêre. Pîrhevok bi wî awayî dikeve dapikê(dafikê). Xwediyê malê dema ku wê êsîr(radest) dike, tîne malê. Weke Tîp I'de pîrhevok dibe xizmetkareka sadiq. Lê di ber de jî pir xemgîn e, çimkî bêriya malbata xwe û zarokên xwe dike. Ji wî derzî, ji pêsîrê tê kişandin û pîrhevok serbest dibe.

Pîrhevok bi xwediyê malê re tê qeraxa golekê/çemekî/seravekê; û gelemperî weha dibê:

“Eger rûyê avê sor bû; bizanibin min kuştin; na eger wesa nebû bizanibin min efû kirin” û pişt re xwe davêje avê. Lê tevahiya vê tîpê de eynî encam xwe eşkere dike: *Rûyê avê, diqulibe ser rûyê xwînê!*

Divê meriv behsa vê baweriya gelêrî jî bike: Cin, cinên ku alikariya însanan kiribin û bibine koleyê wan, efû nakin û wana bi mirinê ceza dikin.

Pîrhevok- cinên vê tîpê re em bibêjin “periyên avê”, dê xelet nebe. Çimkî ji kuderê hatibin girtin bila bîn, dema têne serbest kirin, berê xwe didin ser avekê. Li vir dîsa em dibînin ku dinya avê jî, afirînendeyên nêr û mê pêkhatine. Lê ewên ku hatine girtin tev mê ne. Aliyekî din ev cinên ha, weke **nympha** yên mîtolojiya *Yewnanî*- ku *Homer* jî wan re *Qîzên Zeus* digota-ne spahî ne.⁽⁴⁾

Çend mînakên vê tîpê:

Pîrabok (e)

Bapîrê min Abdilqadir Efendî, alimekî mezin bûye. Di rêwîtiyek da, pir tî bûye. Çûye li ser bîrekê. Wî kêliyê da yek hatiye balê. Ji hereketên wî, bapîrê min fam kiriye ku ew pîrabokek e. Hema hingê derziya liser xwe deraniye û singa pîrabokê da kiriye. (dibêjin dema ku meriv derzî bi wan ra bişêlîne, nikarin xwe tev bidin!)

Cin ji heşê xwe çûye; bapîrê min çûye wê rakiriye û aniye malê. Jê ra nivînek raxistine. Dema bûye sibe, taştiya mêvanê aniye xwedîya malê. Pîrabokê, deqîqekî da tebeqan daye bayê, paqij kiriye. Xwedîya malê şika wê biriye û vê weziyetê jî zarokên xwe ra qiset kiriye. Zarokan jî, ji bavê xwe ra gotine. Bapîrê min fahm kiriye ku nikare wî sirrî veşêre, her tiştî jî wan ra qiset kiriye. Ev xeber demeka zû de belavî gund bûye.

4. Binêrin: Erhat, Azra: “Mîtoloji Sözlüğü” Madda “Nympha” yê.

e. Rabia Sati, Diyarbekir- Xanî, 55 salî, kebanî, xwenda ye.

Dapîra min, dê rojekê li tenûrê nan bipêjanda. Lê pejikên wê nîn bûye. Zarok û pîrabokê şandiye li çiyê, pejikan. Her kesî li gora qeweta xwe hilgirtiye, lê barê pîrê, hingê yê çend kesan bûye. Ewê, têra çar- pênc mehan dar û pêj aniyê. Piştî wê rojê pîrabokê weke ferdekî îş kiriye.

Lê ferdên malê dîtine ku pîrabok, ji heyata xwe nememnûn e. Pîrabokê bêriya mala xwe dikir. Ji wî rojekê bapîrê min, derziya singa wê drxistiye û wê aniyê li ser wê bîrê. Pîrabok ketiye şiklê xwe û xwe avêtiye bîrê. Piştê kêliyekî av sor sor bûye. Çimkî hevalên pîrabokê, bîhna însanan jê girtine; loma wê kuştine.

Pîrabok^(f)

Xwediyê hespekî pir spehî bûye, zilamek. Hesp şeveqan li mêrg û çîmenan diçêra û êvaran dihata malê. Lê her car di nav xwêdanekê de dihata. Piştî çend rojan, xwediyê hespê welîh îşek di wî îşî de heye gotiye û hespê xwe taqîb kiriye. Dema hesp hatiye hindavêkê, pîrabotîkeka sik û pordirêj xwe avêtiye serê û çend saetan wî bezandiye. Zilam ji xwe re heyirî maye û tiştek nekiriye.

Roja dî zilam, zift li ser piştê hespê kiriye û bi xef pê ve çûye. Dema hesp hatiye eynî hindavê, ew cin dîsa derketiye û xwe avêtiye ser hespê. Zilam jî derketiye meydanê û şûjinekê di pêşîra pîrabotîkê de kiriye. Wekî zarokekî bêquwet bûye pîrabotîk, zilam wê aniyê mala xwe.

Gora rîvayetan ew cin çend salan bûye xizmetkara wê malê. Xwarinan çêkiriye, cil û kincan şûştiye.... Lê tu car rûyê wê nekeniye, her wext xembar bûye. Ji wî, zilam şûjinê derxistiye û wê azad kiriye.

Pîrabotîk û zilam hatine qeraxê goleke. Pîrabotîk, “dema ez ketime golê, eger rengê avê biqulibe li ser rengê xwînê bizanibe ez hatim kuştin; na eger rengê avê mîna berê ma, bizanibe wana min efû kirine.” Gotiye û xwe avêtiye golê. Lê rûyê avê sor û sor bûye; çimkî cinên din wê efû nekirine.

Pîrabok^(g)

Pîrabokek, muselletê heywanên axayekî bûye. Heywanên axê wisa ji hal ketine ku, nikarine tu îş bikin. Axa rabûye piştê heywanên xwe tev zemq kiriye. Dema gund xew ra çûye, pîrabok jî ketiye axûrê û dîsa bi heywanan leyistiye. Hingê axa ketiye hundir; pîrabok nikaribûye bireve, jiber ku bi piştê heywanekî va zeliqiye. Axa jî çûye derziyê di sînga pîrabokê da kiriye. Pîrabok bûye koleya wî.

Sal bihurîne. Rojekê, pîrabokê ji bo berdana xwe ji Axê lava kiriye. Axa jî hatiye însafê û wê serbest kiriye. Bi hev ra hatine li ser çayekî. Pîrabok, ku hêj xwe navêfî çayê, ji axa ra wana gotiye:

f. Beyaz Yoldaş, Ruha-Siwerek-Darbî, 68 salî, kebanî, mezûnê dibistana pêşîn e.

g. Lamiha Adıyaman, Diyarbekr, 26 salî, kebanî, mezûnê dibistana pêşîn e.

“Eve çend sale ez neçûme malê. Belkî mêrê min, min efû neke, tol bistîne! Dema ez ketim avê, eger av sor bû, bizanibe mêrê min, min kuştîye; eger av sor nebû, bizanibe ez sax im.”

Pîstre xwe avêtiye avê. Lê li ser avê belênêkên sor çêbûne. Çimkî ew hatiye kuştin.

Pîrhevok(x)

Hespekî hêja yê Alî Axa hebûye. Lê ew hespê spehî, roj bi roj kêr dikir, ji taqet diket. Ji bo hînbûna wî rewşa hanê Alî Axa seferber bûye; çavên wî her li ser hespê bûye; çavên xwe ji hespê neqetandiye.

Êvarekê lê nihêriye ku hespê wî di nav zeviyekê de diçe û tê, pîhînan dide. Alî Axa çûye lê nihêriye. Çi dîtibe baş e? Pîrhevok! Pîrhevok dema ku Alî Axa ditiye, çirp û bazdaye û ji ber çavan wîndayê bûye.

Roja dî Ali Axa piştî hespê xwe zîft kiriye û li ciyekî xwe xef kiriye. Piştî bîhnekê, pîrhevok hatiye û li hespê siwar bûye. Alî Axa ji ciyê xwe kişyaye û hatiye şûjinekê di pêşra pîrhevokê de kiriye. Koletiya pîrhevokê wisa destpêkiriye.

Dibêjin pîrhevok çend salan bûye xizmetkara mala Alî Axa. Wextekî Alî Axa bawer kiriye ku dersekî baş daye pîrhevokê. Ji wî yekê qerar daye ku wê berde. Pîrhevokê aniye li ser kaniyekê û şûjinê derxistiye. Pîrhevok xwe berdaye gola avê û wîndayê bûye. Lê dibêjin ava serkaniyê bûye weke xwînê. Jiber ku cinên dî bêhna însanan jê girtine, wê kuştine.

Motîfên TÎP- II ev in :

- 1- F 360. *Pêriyên xayîn ên ku xirabî dikin (di her çaran de)*
- 2- F 230. *Şikl û şemalê pêriyan (di didoyan de: e, f)*
- 3- D 1181. *Derziya sihêrîn (di her çaran de)*
- 4- R 111. *Dîlîtî(esaretî) (di her çaran de)*
- 5- D 765. 1. 2. *Sêhra ku bi derzî derxistinê betal dibe (di her çaran de)*
- 6- Q 211. *Bi mirinê cezakirin (di her çaran de)*

TÎP- III: Di beşa destpêka vê tîpê de, dengine xerîb bi guhê kesekî dikeve. Ew kes an li aşekî ye, an jî di ciyekî bêdeng û xalî de dibore(derbaz dibe). Li pê dangan dikeve ew kes; lê dinêre yên ji me çêtir dawet dikan. Cin jî wî kesî daxilê dawetê dikan. Dixwin, vedixwin. Wextê reqsê tiştêkî ecêb dibîne ew zilam. Li ser cinekê, fistanê jina xwe / keça xwe/ bûka xwe / cîraneka xwe, dibîne. Şaş dibe; ev çi ye, çi tişt e, dibêje ji xwe re. Dawiyê, îşaret li paşiya fistanê dixê.

Roja dî, an piştê çendekê, ji xeynê xwe tu kesî nabîne li wê derê. Tê malê û ji xwedîya fistan re dibêje, ka filan fistanê xwe bîne.(Lewra di serê wî de hin şaş û şik hene.) Gava fistan ji sandoqê tê derxistin, lê dinêrin ku îşaretek bi paş ve ye.

x. Ayşe Erdem, Batman - Bişêrî, 50 salî, kebanî, xwenda ye.

Di nav van efsanan de belkî jî ya herî bêzerar ev e. Têde tenê şaşiyek û nepenek heye. Zîra dawiyê de ne cezakirinek, ne nifirek, ne jî kuştinek heye. Tenê encameka nependî heye. Ez jî divê tam hingê parantezek vekim.

Heta demeka nêzîk jî, li gundan, însanan, derzî şûjin, an jî hesinek datanîna liser cil û bergên xwe yên di sandoqan de. Wisa guman dikim, belavbûna televîzyonê, têkçûna wan sandoqên spehî yên cihazan û bêtir jî, germbûna têkiliya gund û bajaran, vî bawerîya kevnare, ji holê rakir. Lê bi temamî jî ranebûye, loma ji qisetvanan Gulbeyaz Çelîk, Ayşe Erdem, Beyaz Yoldaş, gotin em hêjî parçek hesin dafînîna liser cilên xwe yên sandoqan! Li gora bawerîya wan, cin ji van tiştan(hesin, derzî, merxez) ditirsin û nikarin nêzîkê sandoqan bibin; Lê dema tiştek li ser nîn bî, cilan dibin û diemilînin cin. Nitekim nivîskara “Diyarbakır Efsaneleri” Muhsîne H. Yavuz, di cîkî de behsa vî bawerîyê dike:” Ji gundê Bîsmîl- Kamîşî yê Kamîle Çelîk (47 salî - kebanî) got, eger meriv perçekî hesin, an derziyek daneyne liser cilên ku sandoqan de dimînin, cin, şevê tîn wan dibin li xwe dikin û qirêj dikin.⁽⁵⁾

Jibo vî tîpê, lê tenê jibo vî tîpê em dikarin vî bibêjin: Meriv dikare nerênîtiya mînak- model a ku di zemanê efsanî de pêkhatiye, bi rîtûleka şexsî(kesane) ji holê rake. Ferqa vî tîpê, ev aliyê tevgerî- rîtûelî ye. Çimkî însan, ji tevgerên hebûnên xirab, xwe û eşyayên xwe, bi vî rîtûelî dîr dixin.

Eve çend efsaneyên vî tîpê:

Cin û Cil^(h)

Merivek, mala xwe li ciyekî ku têde cin hebûne, çêkiriye. Ji wî, xelkê malê car bi car dengên esrêrengîz bihîstine.

Êvarekê, cinêk hatiye cem jina wî merivî û gotiye, “qet dengê xwe meke; eger tu baş bî, emê jî têkiliyê te nebin” jinikê jî gotiye, “temam.”

Piştî çend rojên dî, êvarekê, du- sê cin hatine malê û jinikê dawetê dîlana xwe kirine. Jinik jî çûye. Lê mêzekiriye, liser cineka ku dîlan girtiye, fistanekî cîraneka wê heye. Jinik bi xef, hinek hene li paşîya fistan xistiye.

Roja dî çûye mala cîrana xwe û gotiye, min divê ez filan fistanê te bibînim. Cîrana wê jî çûye ji sandoqê fistanê xwe derxistiye, anîye. Lê mêzekirine, bi paşîya fistan ve leka heneyê heye.

Cin û Cil⁽ⁱ⁾

Li gundê Hirçîn ê zilamek hebûye. Navê wî Feyzo bûye. Dibêjin Feyzo şevêkê li aşê maye; jiber ku îşên wî xelas nebûye. Şev nîvê şevê hin pêjn û

5. Yavuz, Muhsîne H: “Diyarbakır Efsaneleri” Doruk Yay. 2. Baskı (s.322).

h. Lamiha Adiyaman, Diyarbakır, 26 salî, kebanî, mezunê dibistana pêşîn.

i. Gulbeyaz Çelîk, Sêrt-Şêrwan-Hirçîn, 76 salî, kebanî û nexwenda ye.

miremir hatine guhê wî. Pê dangan ve çûye. Tu nebêjî daweta cinan bûye! Cin bi Feyzo hesiyane û çepilê wî girtine, birine dawetê. Feyzo hinek şaş û hinek jî kêfxweş ketiye ber bayê dawetê...

Wextek li ser yekê fistanek dîtiye; şika fistanê bûka xwe biriye. Ji xwe re gotiye, “we heye ev fistanê bûkê bî!” û paşî destê xwe bi toza erdê daye û li paşiya fistan xistiye.

Dema ku roj hilhatiye, ne cin, ne dawet, ne jî tu kesî dîtiye Feyzo. Ji xwe re “herhalde min xewnek dît” gotiye. Kar û îşên xwe xilas kiriye û berê xwe daye malê. Lê ew tiştên ecêb ji hişê wî dûr nebûne. Ji bûka xwe re, “ka fistanê xwe yê nî bîne,” gotiye. Bûkê jî çûye fistanê nî ji sandoqê derxistiye û aniyê. Dema lê nêrîne, rêça destekî bitoz dîtine.

Cin û Cil⁽ⁱ⁾

Hesen Beg, bi hespê xwe, ji Bişêriyê diçûya Sêrt ê. Di hingura sibê de ji xeynî wî kes di wan rêyan de tunebûye. Wextek, çawa wekî dengê saz û mazan hatiye guhê wî. Dema bala xwe dayê, hînbûye ku ji zinarekî tîn ew deng. Meraqê , bi wî girtiye. Berê xwe daye tehtên li wî zinarî. Li wê derê dîtiye ku “yên ji me çêtir” dewetekê dar xistine.

Cinan Hesen Begê dîtine û wî birine deweta xwe. Bi wan re xwariye û vexwariye

Hesen Beg. Lê tiştêkî ecêb li ber çavên wî ketiye. Li ser cineka ku bikêf direqise, fistanekî qedîfe yê qehwerengî dîtiye. Bi hêdîka parçekî ji paşiya fistan biriye û wisa îşaret kiriye.

Dema bûye sibe, li dora xwe tu kesî nedîtiye. Hatiye malê. Ji jina xwe re gotiye, “ka wî fistanê xwe yê qedîfe bîne.” Jina wî jî, ji sandoqê fistan deraniye û aniyê dayê. Hesen Beg lê nêriye paşiya fistan piçikek hatiye birrîn. Fêhm kiriye ku tiştê di serê wî de hatiye rast e.

Cin û Cil^(j)

Demekê, li Siwêreg ê serkarwenekî pir zengîn hebûye. Navê wî Hacî Ehmed bûye.

Şevêkê, li ciyê êwrê, hin deng hatine guhê wî. Meraq li Hacî Ehmed kar bûye, berê xwe daye dangan. Di besta newaleka bêav de, cinan, liser dîlanekê dîtiye. Du cin jî wî dîtine û hatine herdu çepilên wî girtine û birine dîlanê. Devê Hacî Ehmed ji heyretan maye vekirî. Çimkî li ser cinekê fistanê qedîfe yê keça xwe dîtiye. Hinekî hena li paşiya fistan xistiye.

i. Ayşe Erdem, Batman - Bişêrî, 50 salî, kebanî, xwenda ye.

j. Beyaz Yoldaş, Ruha-siwêreg-Parbî, 68 salî, Kebanî.

Roja dî ji bilî xwe kesî nedîtîye. Ji xwe re “herhal min xewnek dît,” gotiye. Malên xwe firotiye û berê xwe daye malê. Lê hişê wî, li ser wê şevê bûye. Ji ber wê yekê, ji qîza xwe fistan xwestiye. Qîzik jî çûye aniye. Li paşiya fistan, hinek hena dîtine.

Motîfên TÎP III ev in:

- 1- F 32I. *Periyên(cinên) ku însanan dibin warê xwe (di her çaran de)*
- 2- F 22I. *Cih û warên periyên (di her çaran de)*
- 3- (T) NH 119. 3. *Bi paşiya libas îşaret xistin.(di her caran de)*

TÎP IV: *Di vê tîpê de, rêza bûyerê, hema hema wisa ye: Pîrhevok(cin), sibeheka zû, tê deng li bermaliya malê/bûkê dike û dibêje: “Herkes çû beravê, tu dereng mayî”/ “De rabe, jinên gund tev çûn deravê, ez û tu man ...” Pîrhevok bi vî awayî jinikê dixapîne. Jin/ bûk jî dibê, “qey cîranek e ew”; ji wî radi bê, hinekî bi lez û bez, pê wê kesê dikeve. Carna jî pîrhevok, êvarê dibihîse ku jinên gund dê herine beravê. Li ser wê xeberê ew jî kevnika xwe tevin dike.*

Dema jinik tê ciyê beravê, lê dinêre ne kes heye, ne jî ewa pê re cîrana wê ye. Fêr dike ku ew pîrhevokek e, cinek e. Tirs xwe lê kar dike, lê tîrsa xwe nîşanî pîrhevokê nade û ew jî fenek girê dide. “Pîrê, ezê serê te bişom” dibê û dawiyê pîrê îkna dike. Dema pîrê tê rayê, bi keysekê ava kelişî ya qazanê, di ser pîrê de guş dike. Pîrhevok dibe leşekî mirî.

Lê dîsa hema hema bi tevan de, jin/ bûk, ji bandora vê bûyerê, bi taya mirinê digrin û piştî çend rojan jî dimirin. Di dawiyê de “tirs” ciyekî girîng digre. Tîrsa keysê, tîrsa ciyên xalî, tîrsa mexluqekî sik, tîrsa tenêtiyê.... Ew tirs, dibe sedemê mirinê; carna jî (mînak di L de) zehmetiyek pêktîne.

Jibo vê tîpê eve çend mînak:

Pîrhevok, Tirs û Mirin^(k)

Bûkeka mala Emînê Reco, niyet kiriye ku şevqê here beravê. Pîrhevokek di şev de hatiye, gotiye “dê rabe, herkes çû beravê, ez û tu man. Eve ez diçim agirê neqlê dikim, tu jî were, tamam!”

Çavê bûkê li tava heyvê dikeve, dibêje, “rast e, sibe ye”; radişe, cilan lihev dide û derdikeve. Dema tê ciyê beravê, lê dinêre pîrê neqlê kelijandiye jî!... lê dema ku spehî lê dinêre, dibêje “keziya min kur bûyî, willeh ev pîrhevok e!”

k. Nafya Çeçen, Sêrt-Şêrwan, 66 salî, kebanî, nexwenda ye

Tirseka mezin digre, lê belû nake. Pîrhevok dibêje. “dê, dê, dê ecele bike, were ezê serê te bişûm.” “Bûk dibêje”, qey wisa dibe, tu ji min mezintir î; pêşî ezê serê te bişûm. Pîrhevok dike nake, bûk li ber de nayê. Welhasil bûk serdikeve û pîrê li ser firşê serşuştinê rûdine. Neqla avê jî nêzikê wan bûye. Bûkê heta xwedê taqet dayê, dehfek li neqlê daye û li ser pîrê de wergerandiyê. Pîrê bûye qirik!

Bûk direve tê malê. Ta digre. Malî dibên, “keçê! Çi ji te bûye?” Bûk dibê, “herne kaniyê, hûnê bibînin.” Gava malî têne kaniyê lê dinêrin ku pîrhevok bûye leş. Heta têne malê, lê dinêrin bûk jî miriyê.*

Pîrabok, Tîrs û Mirin^(l)

Li gundekî, sibeyeka zû, bangê jinikekê dike pîrabokek. Dibê. “De rabe, em terin beravê.” Jinik jî dibê, “qey cîranek e” û radibe, dikeve rê. Li cihê beravê adir dîkin, av kel dîkin. Jinik kincên xwe dişo, serê xwe dişo. Pîrabok jî wisa dike. Jinik çer dike, pîrabok jî wer dike. Jinik dema ku karê xwe diqedîne dide xwe, radibe. Pîrabok jî radibe ser xwe û vana dibêje:

“Gemî vennî sibeyî, hîva ronî çardeyî”** Û paşî jî xwe darêje bîrê.

Jinik ditirse, pîr ditirse. Bi rev tê malê. Lê piştê sê- çar royan dimire.

Pîrabok, Tîrs û Mirin^(m)

Li gundekî, her sibe jin berhev dibûn û diçûn cil şuştinê. Rojek pîrabok dikeve şiklê jinekê û diçe gaziye Wesîle yê dike. Dibêje, “Wesîle! Cînar tev çûn cil şuştinê, tu dereng mayî!”

Wesîle, bi ecele radibe kincê xwe dide hev û bi zarokên xwe ve dikeve rê. Hinekê bi rê diçin, Wesîle ya li paş xwe mêze dike ku çi bibîne. Ew pîrabok e! Lê qet natirse û dengê xwe nake. Li ber çem av germ dîkin. Pîrabok dibêje, “bihêle zarokên te ez bişom.” Wesîle, “na, ez dikarim bişom, tu aciz mebe. dibêje.”

Pîrabok dike nake nikare Wesîle’yê îkna bike. Wer aciz dibe, wer aciz dibe, wexta biteqe! Lê Wesîle ji xwe bawer e. Pîrabok lê dide diçe, lê belê bi wan çavên xwe yên sor li zarokê mîze dike.

Dibêjin ew zarok, heya çend salan, ji tirsan lal maye.

*. Demekî li gundî Hirçinî kî “agirop” bibûya, diçûn xweliya mala Emînê Reco dianîn û pîrzen xwe didan û pê jî baş dibûn. Digotin ewî malê pîrhevok kuştîye, lama xweliya wan derman e. (ji qisetvan).

** Vê hevoka Dimilî ye.

l. Mevlûde Ayaz, Diyarbekr-Erxanî-Kalleş, 45 salî, kebanî, nexwenda ye.

m. Lamiha Adiyaman.

Pîrhevok, Tirs û Mirin⁽ⁿ⁾

(Dibêjin li gundekî Hawîl'ê, di serê jinekê de hatiye ev waqîe.)

Jinan bi hev re gotine, em sibê herne beravê. Pîrhevokek jî, gotinên wan sehkiyê. Şeveqê, ku hêj stêrk nehedimî, pîra gewr hatiye deriyê Emînê daye. Gotiye, “Kezî kurê! Jin tev çûn beravê, ez û tu man. Dê lez ke!...”

Emîne jî gotiye, “Tu bi rê keve, ez jî tîm.” Pîrhevok li pêş, ew li paş, rê ketine. Dema ku hatine ciyê beravê, berê pîrhevokê ketiye Emînê. Xof û sawayeka mezin Emînê girtiye. Çimkî rûyekî wisa ewê tu car nedîtiye. Ji xwe re gotiye “ev çi bû?”

Pîrê, neqlan daniye ser êgir û avê kelijandîye. Bûye bir bira avê. Pîrhevokê tot daye û destê xwe bîriye koşa xwe, gotiye: “De were koşa pîra xwe, ku te bişû.”

Emîne, pêşî, çawa ku lal bibe, lê paşî xwe daye hev û gotiye: “Nexêr, qey dibe! Pêşî ezê serê pîrika xwe bişûm.”

Hatiye, nêzikê pîrhevokê bûye û pêşî bi saro-germo çend tasan serê de kiriye û paşî girtiye çembilê neqlê di ser pîrê de kiriye. Pîrhevok bûye leş, Emîne hema bi rev hatiye malê. Çend roj, di nav tayekî de leriziye, lê baş nebûye. Dibêjin ji sawa wê meselê miriye.

Motîfên vê tîpê ev in:

1- K. 1889. *Xapînokên di şiklên xeyalan de (di her çaran de)*

2- F. 360. *Periyên(cinên) ku xerabî dîkin (di her çaran de)*

3- F. 230. *Şikl û şemalê periyên (di didoyan de, “m,n”)*

TÎP- V: Motîfên ku Stîth Thompson “K 1889 Xapînokên di şiklê xeyalan de” û “D 699 şikl guhertin” bi nav lêkirî, ser- rêgezên vê tîpê ne. Çimkî cin, sibehêkê, êvarekê, an jî li êwreka xalî, bi şiklekî xwe nîşanî yekî dide. vekêşana çîrokê li ser “rasthatinekê”ye.

Pîrhevok(cin), xwe dixê şiklê hewalekî. Ew kes, ancax di dawîya çîrokê de bi fena pîrhevokê dihesê. An jî em dikarin bibêjin, rastî, xwe bi du awayî diyar dike:

a) Pîrhevok, “bêaqilo, te dît, min çawa te xapand!” dibêje.

b) Ew kes, dema tê malê fêr dike, ew tiştê ku dîtî xeyalek bû, cinek bû, “yekî ji me çêtir” bû.

Di vir de em dikarin bibêjin weke çûka şivanxapênok e; ew jî merivan dixapîne û dibe merivxapênok. Lê her çiqas pîrhevok weke xewneka şevan bî jî, di bûyerê de bi hebûneka şênber xwe eşkere dike. Ev taybetî, xêzeka efsanê ye.

Jê çend mînak:

n. Hemdî Aydin, Sêrt-Hawîl, 47 salî, serbest, mezûnê dibistana pêşîn e.

Fenên Cinan (o)

Bavê min li bin Minara Çar ling, li benda hevalekî xwe bûye. Dê biçûna hemamê. Wî kêliyê de, li binê minarê di xew re çûye bavê min. Hevalê wî hatiye, “de rabe em biçin hemamê” gotiye. Bavê min rabûye û bi hev re rêya hemamê girtine. Di navbera wan de 7-8 gav hebûye. Qederek bi rê de çûne û rastê tatlîciyek* hatine. Hevalê wî ji bavê min re tatlî** kiriye. Dîsa bi rê ketine. Wextekê bavê min nihêriye, li serê zinarekî ye; eger ku gavekî din avitibûya dê biketa û heta Dîclê bigindira. Hawayekî lerezê bavê min dikeve, mûyê serê wî radibin. Piştî xwe ve nedinêre hevalê wî ji wir ve tê. Hevalê wî çawa ku ji xevek rabîbî, “tu min kûve dibî?” dibêje. Bavê min jî “esil tu min kûve dibî, îşê min li serê vî zinarî çî ye?” dibêje.

Herdu bi şaşî lihev dinêrin. Bavê min, “qey te ji min re tatlî nekirî?” dibêje dîsa. Hevalê wî jî “qey te ji min re tatlî nekirî?” dipirse. Herdu dîsa şaş şaş lihev dinehêrin û berê xwe didin hemamê. Rokî ku vê serpêhatiya xwe qiset dikin, alimek, “willah, du cin we xapandine û bi we leyîzîne,” dibêje.

Fenên Cinan(®)

Dibêjin li Diyarbekirê, zemanekî pîrabokek xwe xistiye şiklê hevalekî Mehmet Emîn Efendî û bi wî re çûye qeraxê Dîcle yê. Gotine em biborine wî milê avê. M. Emîn Efendî bihûriye milê din, lê yê dî maye û di şiklê xwe yê esas de xwe eşkere kiriye:

“Te dît, min çawa te xapand?” gotiye pîrabok û winde bûye.

Fenên Cinan(®)

Rokî, apê min di ber çem de dibuhûre. Lê dinihêre Hesênê Hemîşê di orta çem de rawestiye û ziloq ziloq li apê min dinihêre. Apê min ba dike: “Heseen, Heseenn!”

Lê Hesên deng nake û bi wî şiklê dîsa li apê min dinihêre. Dema apê min aliyê çem ve sê- çar gav diçe, Hesên ji ber çavan wenda dibe.

Apê min tê malê. Lê dinihêre ku Hesênê Hemîşê li mala wî ye. Apê min dibê, “Gidî! Min îro ewqas gazî te kir, te çima caba min neda?”

Hesênê Hemîşê, “Welle ezxulam, îro ez ji malê derneketime û eve bo bîstekê ji vir ve hatime,” dibêje.

Apê min wî çaxî fahm dike ku ew tiştê dîtî cinek bû.

o. A. Baqî Gündûz, Diyarbekr, 50 salî, Terzî, mezûnê dibistan navîne.

*. Şiranîfroş. Ji Tirkî'yê boriye zimanê me.

** Şiranî “ “ “ “

p. Saliha Aylak, Diyarbekr, 28 salî, kebanî, nexwenda ye.

q. Henîfe Altun, Diyarbekr- Çinar, 80 salî, kebanî, nexwenda ye.

Fenên Cinan^(r)

Rojekê pîrabok xwe dixê şiklê cîrana jinekê û diçe bang dike: “Erê, tu nayê em herin êzinga. Waye stêrka sibê jî hilatiye; wext e, em herin.”

Jinik jî werîsê xwe digre û dide pê. Derin, derin, derin... Çavê pîrabokê lê ye ku wê bibe û di zinarekî de hilşîne.

Şev e, lê hîv ronî ye. Jinik, di bin şewqa hîvê de ji lingê pîrabokê hay dibe. Fam dike ku ew pîrabok e.***

Hema hêdîka vedigere, berê xwe dide ber malan û direve. Pîrabok jî berdide pê; digihên nav malan. Kûçikên gund li pîrabokê wardiqilin û berdibin pê. Pîrabok direve, diçe. Jinik jî wisa xelas dibe.

Motîfên vê tîpê;

1- K 1889. *Xapînokên di şiklê xeyalan de (di her çaran de)*

2- D 699. *Şikl guhartin (di her çaran de)*

TÎP- VI: Zarokên pîrhevokê birçî ne. Pîrhevok ji wan re “zar zar nekin, ezê biçim ji we re kezêba filankesê derînim û bînim,” dibê. Heta, di hinekan de, ka dê vî karî çawa pêk bîne jî qiset dike. Lê kesê ku van gotinan dibihîse (malxwê malê, an jî şivan) dek û dolabên pîrhevokê betal bike. Ew kes- kî tevgera wî, di tanga lehengekê de ye- pîrhevokê, di hebanekî de hepis dike û bi vî awayî wê dikuje.

Çend mînakên vê tîpê:

Lezgînê Os û Pîrhevok^(s)

Lezgînê Osê, şivanê gund bûye. Li ber bihurê, wekî dengê girînekê hatiye guhê wî. Bala xwe dayê xwediyê deng wana dibêje:

“Negrîn zarokno, negrîn! Ezê vê êvarê bibime mûyek û herim bikevim nav şorba jina axê. Dema jina axê şorbê xwar, ezê jî bikevime hundirê wê û kezêba wê derêxim, ji we re bînim.”

Şivan aliyê tehtekî ve çûye, dîtiye ku, xwediyê dangan pîrhevoeka memik mezin e. Hema hêdîka ji wê derê hatiye û berê xwe daye gund. Dema gihiştîye ber deriyê mala axê êvar bûye. Bi qîrîn, “Mîrza Axa, Mîrza Axa!” gotiye. Axa jî derketiye ber derî û “çî ye, te xêr e? otiye. Şivanê bêhnçikyayî derancan derketiye û hal-hewalê xwe jê re gotiye.

Herdu derbazê hundir bûne. Heqîqet jî şîv, şorbenîsk bûye. Dema şorbê rû dikin, lê dinêrin, di tê de mûyekî sor heye. Şivan dibê, “em vî bixine hebanê.”

r. Emîne Çaçan, Diyarbekr-Eyintirt, 58 salî, kebanî, nexwanda ye.

*** Dibêjin lingê pîrobokan berûpaş in, tilî li paş, pahnî li pêş e.

s. Beşîr Tatlı, Batman, 48 salî, Tamîrkar, mezunê dibistana pêşîn e.

Hebanê tînin, mû dixînê û devê heban hişk girêdidin. Piştî wextekî heban weke balonekê pif dibe, terq û diteqe.*

Faris AXA û Pîrabok^(§)

Gundekî pir dûr û asê hebûye. Faris Axa, axayê wî gundî bûye. Însanekî pir qenc bûye. Tu car neheqî nekiriye.

Rojek ji rojan, li wî gundî dewetek çêbûye. Dewetek pir xweş... Lê di binê mala xwediyê dewetê de cinek hebûye. Ew cineka pordirêj bûye û 32 kurrê wê hebûne. Wê rojê, zarokên wê pir birçî bûne. Diya wan, Hiş bin, megirîn! Ezê êvarê bibime muyek û herim bikevim nav qedeha bûkê. Dema wê av vexwar, ezê bikevim hundirê wê û kezeba wê derxim, ji we ra bînim, gotiye.

Faris Axa li ber dîwar bûye û van xeberan bihistiye. Bi lez hatiye ji xwediyê malê ra gotiye, “bila bêtî min tu tişt nedin bûkê, ha!..” Gotine “baş e” axayê min.

Bûye êvar. Dema bûkê av xwestiye, gazî Faris Axa kirine. Faris Axa hatiye û li qedehê nihêriye. Hebanekê xwestiye. Ji qedehê muyekê spî girtiye û xistiye hebanê; dawî, hebanê piv daye. Heban werimiye, werimiye û bi dengekî gurr teqiyaye.

Gotine “ev çi bû?” Faris Axa kite kit ji wan ra meselê qiset kiriye.

Feyzoyê Hirçinî û Pîrhevok^(†)

Feyzoyê Hirçinî dê biçûya aşê. Gava tê hindava *Kevirê Helewê*** hinek bêhna xwe dide. Wî çaxî pêjnek tê guhê wî. Bala xwe didê. Xwediyê pêjnan, ji hinekan re, vana dibêje:

“Razên, razên zarokno! Bûka Feyzoyê Hirçinî ketiye ber hewlê. Dê xwedê zarokêkî bidê. Malî, dê jê re hêk çêkin. Ezê ji xwe bikime muyek û herim bikevime vê hêrûnê. Dema bûkê xwar, dê ezê jî kezeba wê ji we re derînim û bînim.”

Feyzo hema li Kevirê Helewê dizivire. Gava tê malê dibê, “bûka me hemla xwe daniye? We tiştek daye?” Malî dibê, “belê, xwedê kurrek dayê û me jî jê re hêrûn çêdikir... Qey tuyê neçûyayî aşê, te xêr e?”

Feyzo, “pîrs nekin, ezê ji we re bibêjim pašî. Lê hûn niha bê min tiştek nedin bûkê!” dibêje û diçe ji kîlerê hebanê tîne. Mû, ji hêrûnê dikşîne û dixê hebanê de. (Malî bi şaş lê dinêrin.) Feyzo devê hebanê hişk girêdide û li serî rûdine. Heban pif dibe, diverime û bi dengêkî gurr diteqe.

Yên li wir dibêjin “kurro, ev çi bû?”

*. Dibêjin ev terqîn, îşareta mirin a pîrhevokê ye. Dema heban diteqe, pîrhevok jî di qula xwe de dimire (ji qisetvan).

§. Hayriye Tekin, Diyarbekir-Qulp, 60 salî, kebanî, nexwenda ye.

†. Gulbeyaz Çelik.

** Ev nêzikê gundê Hirçinê ye; keviye mezin e û li serê hin efsane tîne gotin.

Feyzo rûdinê û lib lib mesela xwe ji wan re qiset dike.

Motîfên vê tîpê jî ev in:

1- 699.Şikl guhartin (di her sisêyan de)

2- 589. Zayîna zarokê.(di yekê de; “t “)

3- N 856.3.Şivanê(kesê) ku alîkarî dike. (di her sisêyan de)

4- R 48. 1. Di nav ciwal(heban) de hepiskirin. (di her sisêyan de)

5- F 230.Şikl û şemalê periyên(cinan). (di didoyan de; s, ş).

Leyîstikeke Rîtûel: Kosegelî

Lal Laleş

Divê şanoya Kurdî nûjen bibe; netewî bibe. Ji bo vê jî dîrok divê. Dîroka şanoya Kurdî. Bi vê armancê emê Leyîstika Kosegelî bînin sahnê û emê bi hev re leyîstikek tijî lêkolîn û lêgerîn bileyzin.

Sahne: Mezrabotan

Leyîstikvan : Ez

Temaşevan : Hûn

Pêşanîkar: Kosegelî leyîstikeke rîtûel, efsunî û erotîk e. Di nava wê de bereket, pirrbûn heye. Hatina sala nû heye. Başî, ronahî heye. Leyîstika Kosegelî, wata wê tekoşîna bi tariyê re ye; bi reş re şerbûn e. Pîroza Newroz'ê ye.

Metin And, di pirtûka xwe yî bi navê "*Oyun ve Büyü*" de dibêje ku *Leyîstikê gundan, an jî şanoya gundan di bin bandora şamanîzm'ê de ye. Taybetî jî di bin bandora Şamanîzma Altay'ê de ye.*⁽¹⁾

And ji bo ku rawêja xwe li rastiya bigerîne, mînakek ji şaxa Kosegelî ya Qers'ê dide.⁽²⁾ Şaxa kosegelî ya Qers'ê çawa tê leyîstin û rawêja Metin And çima ne rast e?

Varyanta Qers'ê bi çar leyîstikvana tê leyîstin. Ji vana du heb jê birayê hev in. Yek ji wan li ser derpiyê kin ê spî eyarekî miyan ê spî li xwe dike. Piştî xwe xûz kiriye. Ji devla hespê êzingek xistiye nava lingên xwe. di destê wî de "qemçî" heye. Destê wî, lingên wî, wechê wî bi komirê hatiye gonî (boyax) kirin, paçek li serê xwe gerandiye.

Zilamê duyemîn, birayê zilamê yekemîn e. Qemçiyê wî tune ye. Her du bira jî, gonî kirîne. Kesê sêyemîn *Zenne* ye; qîza zilamê yekemîn e. *Zenne*, zilamek e ku xwe xistiye dilqê jinekê. Wechê wê bi desmalê hatiye veşartin.

1. And, Metin: "Oyun ve Büyü" İstanbul, 1974 (r.85-90)

2. And, Metin: "Geleneksel Türk Tiyatrosu" İstanbul 1985 (r.12)

Ya çaremîn beraz e. Di nav betaniyê de, li erdê ye. Leyîstik bi *bara giranî* (ağır bar) dest pê dike. Wexta ku bar tê leyîstin, qîza zilamê yekemîn (zenne) tê revandin. Ji ber vê bûyerê herdu bira bi hev re şer dikin. Zilamê yekemîn, birayê xwe dike. Wî çaxî muxtar, yê ku qîz revandibû ji nav temaşevanan derdixe, tîne. Zilamê yekemîn mafê xwîna birayê xwe dixwaze. Bijîjk tê li ser birayê zilamê yekemîn; lê belê wî nikare sax bike. Zilamê yekemîn kerb dibe, diqehire û qemçiyê xwe li birayê xwe dixwe. Birayê wî radibe ser xwe û sax dibe. Bi dû saxbûnê re def û zirne lê dikeve û leyîstika "*qîza çaçanê*" tê leyîstin. Birayê ku sax bûye, dibê, "ev îro sê roj e ez birçîme". Wê çaxê, wî êzingê ku di şona hespê de kartînin, dikin çifte û beraz dikujin. Goştê beraz li hev payê dikin û bi hev re **bara laza** dileyzin. Leyîstik wisa dawî dibe.⁽³⁾

Ev varyanta (guhêrbarî) Kosegelî Metin And pêdandiye. Lê ez dibêmin di pêdandina wî de çewtî hene. Rawêja wî û nerastiya wan ev e: And dibêje ku di şona hespê meriv dar têxe nav lingên xwe, qemçî, mirîbûn û saxbûn; reş û spî jî rêgeza şamanî, yê ye!...

Emê van bersîvan bidîne:

1- Darê ku di nav lingê Kose de, ne hesp e, **phallus** e; yanê "nêr-lebat"e. di leyîstikê de vatiniyê vî aksesuarî heye. Yek me go plallus e; yê din jî çawa varyanta Dêrika Çiyayê-Mazî de tîfing e, di şaxa Qersê de jî çifte ye. (Li ser phallusê emê bêhenka din bisekinin.)

2- Mirîbûn û saxbûn ji xwe ji mîtolojiya mezrabotan tê. Bingeşa xwe ji rîtûelên "*Dumuzî*" distîne.

3- Spî û reş, bingeşa xwe ji çand û ola Mezrabotan distîne.

4- Beraz, di leyîstika Kosegelî ya esil de tune ye. Belkî varyanta Qersê de hebî; lê belê nayê vata ku ji Şamanizmê hatiye. Eger ji Şamanizmê hatibûya, wê di varyanta Azerbeycan de hebûya. Lê belê her çiqas Azerbeycan nêzikî Asyaya-Navîn e jî, li wir tune ye.

Ku eger niha em li ser taybetî û rastiya vê leyîstikê bisekinin, dê rewşa wê zelaltir bibe.

Ciyawaziyên Leyîstika Kosegelî:

Ev leyîstika gundan bi navê "Kosegelî", an jî "Kose" tê naskirin. Kurdên *Kirşehîrê* jê re dibêjin "*Gerandîna Kose*". di leyîstika Kose de, Kose û Bûk (Zenne) cihekî girîng digre. Wekî din jî leyîstikvanên ku alîkariyê dikin, hene. Kosegelî di nav *Persiyan*, *Azriyan* û *Kurdan* da tê leyîstin. Leyîstika Kose li anatolia berê, di nav Ermenan de jî dihat leyîstin.⁽⁴⁾ Lê di destê me de tu varyantên *Ermenan* tune ye.

3. And, Metin: "Geleneksel Türk Tiyatrosu" (r.16)

4. And, Metin: "Geleneksel Türk Tiyatrosu" (r. 135) ji Btayanî, "Hay Zaghovgtagen Khogher" Erîvan, 1968 (r. 23-42; 88-89; 97)

Di Kosegelî de phallus, yanê nêrlebat, cihekî girîng digre. Ev sereta jî rîtûelê **Dumuzî** maye. S.Mihotulî di pirtûka xwe yî navê "*Arya Uygarlığından Kürtler*" de li ser vê mijarê disekine û dibêje vata bêja Dumuzî "du nêrlebat" e. Dîsa ev rêgez, di *Dînonisos* de jî derbas dibe. Vata phallus, leyîstika Kosegelî de bereket e. Ji xwe bi biharê re dinya xweş dibe; fêkî û xwarin pîr dibe; lawir dizên; erd hêşîn dibe. Ji alikî din phallus seretayek erotîk e. Carna di leyîstikê de Kose û Bûk jî hevdu re naz dikin û dora hevdu derin û tîn. An jî wexta Kose dimre û şûnde Bûk û Kosê din xwe davêjin ser hev û hevdu ji raketinê tînin ser sahnê.

Kosegelî de mirîbûn û saxbûn seretayek qedirgiran e. Bi vê motîfê jî, dixwazin guhertina salê û demsalê nîşan bidin. Yanê mirîbûn û saxbûn sîmge ye. Ev sereta jî bingeha xwe jî rîtûelê Dumuzî distîne. Her sal Dumuzî dimre, dikeve bin axa reş; bi mirina wî re lawir êdî nazên; kêf namîne; jiyan bi ber nebaşiyê ve dere. **Îştar**, berî ku here ava jiyanê (abî hayat) dihat şûştin. Ku wexta Îştar û Dumuzî tê, xweza hişyar dibe. Ji bo Dumuzî mersiyan dibêjin, şînê digerrînin, heya meha temmûzê (dumuzî). Bi vê mehê re herkes bi kêfê dikeve; bi rîtûelê, heykelê Yezdanê mirî dişon. Dû de dumuzî tê. Bi hatina wî re her tişt zêde dibe, bereket çêdibe.

Ji xwe leyîstika Kosegelî de "hinek varyantan" de ku bi mal mal digerin, Kose xwe li ber deriyê malê diavêje erdê. Xwediyê malê ku hinek şekir, rûn ya jî emê bêjin pere didayê, ew jî radibû ser xwe.

Di Kosegelî de motîfa reş û spî jî heye. Ka em parikî li ser vê mijarê jî rawestin.

Rû û rîha Kose reş e. Ew, nebaşiyê temsîl dike. Yê ku bi Kose re digere, di hinek leyîstikan de birayê Kose ye, di hinekan de jî hevalê wî ye û bi mal û mal pê re digere. Mînak di şaxa *Dêrika Çiyayê Mazî* de rîha Kose reş e, qoçelê (sitrî) wî heye. Yê ku bi Kose re jî digere, ji wan re jî dibêjin Kose; lê rîha wî kesî tune û negonîkirî ye, rûspî ye. Yên ku Kose re alîkarî dikin, rû tenîne. Kose yê ku rûyê wî spî ye qenciye temsîl dike û başî û nebaşî bi hev re pevçûnê de ye. Vê motîfê, em alên Mezrobotan de dibînin.

Mînak; ola **Wayû** de şerê başî û nebaşiyê heye. Ev ola, olekî gelê Mezrobotan e. *Wayû*, Yezdanê ba û hahozê ye. Her wiha Yezdanê mirin û jiyanê ye jî. Gora efsaneyan *Wayû*, bi bayê xwe bahozê dawî dike, berfê dihelîne û havînan jî, hênikahiyê tîne. Di vê de jî dualîzmek heye. Mirin û jiyan, zivîstan û havîn, başî û nebaşî... **Zervan** de jî jiyana abadîn û pîroz heye ⁽⁵⁾.

Ev sereta, *Zervanê Yezdan* de jî heye. Wî olê de jiyana abadîn û pîroz heye. Dîsa di vî olî de ronahî û reşahî, an jî başî û xirabî, pevçûna vê dualîzmê de cihekî girîng digre. Gora ola Zervaniyan du lawên

5. Şanak, Musa: "Mezopotamya'da dinlerin doğuşu ve Gelişimi" jst. 1997 (r.17)

hene. Yek ji vana *Orimîsîd* e û yê din *Ehrîman* e. Di navbera herdu birayan de şerekî ku heta ebediyetê didome, heye. di encamê de Orîmîsîd bi ser dikave. Di vî şerî de tiştê ku dixwazin bînin zimên, tekoşîna başî û nebaşiyê ye (6).

Ola *Mîthra* (metran*) de jî, "roj" cihekî qedirbiha digre. Roj sîmgeya *Mîthra*'yê ye. Gora ola *Mîthra* roj ji rûyê erdê xela, xizaniyê, nebaşiyê, sermê û tariyê radike. Adaniyê, çêbûnê, ronahiyê tîne. Lê belê di vî olê de jî yên ku bi navê "*Deyowa Yesna*" yê tî naskirin baweriya xwe bi *Ehrîman* tînin. Bawerî ya wan eve: Di navbera *Mîthra* û *Ehrîman* de şerek heye. Kesê ku ji *Deyowa Yesna* bawer dikirin, ayîn û rîtûelên xwe tariyê de dikirin û êrîş dibirin ser tabeyê *Mîthra*'yê û hacetên wan dişkênandin. Gel ku nikaribûya, erdê xwe biçanda û bajota. Yanê bi Kurtî *Deyowa Yesna* ne dixwest ku *Mîthra* serkeve (7).

Eshat Ayata, pîrtûka ku ji Swêdî wergerandibû Tirkî di "*Zerduşt Spîtmâ*" de dibêje ku *Ormazd* jiyane, *Ehrîman* mirinê dibijêre. *Ormazd* erşê, *Ehrîman* dogehê; *Ormazd* başiyê, *Ehrîman* nebaşiyê dibijêre(8).

Dawiya nebaşiyê yan dogeh e, yan jî ev e: *Ormazd* û *Ehrîman* herdu jî wînda nabin, herdem dê hebin. Lê belê *Ehrîman* dê betal bibe û nebaşî bertaraf bibe(9).

Ahuramazda, ji hêzên nebaş hez nake. Di *Yesna* sêyemîn de weha dibêje: Hêzên nebaş ji ber ku xwe îkna kirine *Daewayan* tu carî di nav herdu hêzan de "çê û neçê" ya rast nebijartin. Wan wexta ramanên nebaş bijartin dest bi nebaşî û xirabiyê kirin û bi wê bijartinê cîhan û mirov di nav keser û xeman de hiştin(10).

Encam: Di vî navberê de emê li ser pêvandiya motifên ola şamanîzmê û leyîstika Kosegelî analîz bikin. *Metin And* forma ku herêma Qers'ê tete leyîstin şanî biraz (kulta lawiran) û başî û nebaşiyê dide. Lê ola Şamanîzm'ê de dawîbûna giyanên nebaş heye. Şaman reqs û tevgera xwe de giyanên nebaş diqewirîne. Lê di ola *Zerduşt* de giyanên nebaş her daîm in. Giyanên nebaş yên ku nûnerê wan *Ehrîman* e, hertim heye û namire û pê re lej (pevçûn) jî nabe. Şamanîzm'ê de giyanên nebaş dijmîn e. Balkêş e ku leyîstika Kosegelî de Kose şexsiyetek bi tirs û hov e, lê leyîstik bi xwe kêf û şahî ye.

Leyîstika Kosegelî Kengê Tê Leyîstin?

Kose an jî Kosegelî li sersalê tete leyîstin. Ji xwe ev leyîstika piranî ji bo sala çû biqewrînîn, ji bo sala nû re bêje "*tu bi xêr hatiya*" tete leyîstin. Li her herêmekê, li her welatekî dîroka leyîstina wê cihê ye. Li

6. Şanak, Musa: b.n.w.d. (r.18)

* Bi navê "metrano" kilameka Kurdî heye (N.W.)

7. Şanak, Musa: b.n.w.d. (r.19)

8. Ayata, Eshat: "*Zerduşt Avesta*" (s.15)

9. Bilgin, M. Siraç: "*Aryan Mitolojisi*" (s.105-106)

10. Bilgin, M. Siraç: "*Zarathuştra Gathalar*" (s.47)

mezrabotanê di çile de, meha reşemî de têtê leyîstin. Li Wanê 20'ê reşemiyê, li Bazîdê 17'êyî reşemiyê têtê leyîstin û 3 rojan berdewan dike. Di cejna Newroz'ê de jî têtê leyîstin. *Cemşîd Bender*, di pirtûka xwe ya bi navê "*Mitolojîya Kurdan*" de weha behsa Newroz'ê dike: Zagmukê (Newroz), Kurd li mabeda *Esagîle* de pîroz dikan. *Zagmuk* hem destpêka serê salê tê hesibandin, hem jî destpêka bereketê ye. Ji ber ku 21'ê Adarê re tev hêşîn dibin, gulên daran dipişkivin. Di vê demê de ji bo însan û gelan gîring bû sersal. Bender dîsa dibêje, di nav *Kurdên Êzîdî* de Zagmuk'ê re dibêjin sersal.⁽¹¹⁾

Ji xwe meriv naveroka Newroz û Kosegelî binêre, armanc yek e.

Li her dugelan (dewletan) ji bo qewrandina zivistanê çalakî çêdibin. Giştî çalakî ev e: Ji bo demekê, qiral, an jî walîkî derewîn dibijêrin. Hêza wan demeke kurt de derbas dibe. (du-sê roj). Dû de mafên wan ji wan distînin, ji bo ku em qewrandina zivistanê û mijara qiral, mîr, an jî waliyê derewîn fam bikin, emê mînakekî ji Kurdîstanê bidin, ji herêma **Mukrî**yê.

"Li Îranê, li herêma Kurdîstanê li **Mukrî**. "*Cejna Mîrê Derewan*" li bihasrê têtê pîroz kirin. Ji bo sê rojan gelê Mukrî, an mîr, an jî walî hildibijêre. Mir wan her sê rojana tiştê ku dixwaze dike.. Mir têtê bijartin û pê we em ji xwe re azayan dibijêre. Zabitan jî dibijêre. Hawayekî debdebe û rewnek li bajêr digere. Li her derî wek waliyekî hurmetê dibîne û dibe darast û li dawan dinihêre. di dema kevnar de dîsa li Mukrî Merasîma (mîrê derewîn de) zilaman çê pû rast xwe girêdidan û di ber mîrê derewîn de derbas dibûn. ⁽¹²⁾

Dîsa li Îranê di van merasîman de qeşmerek hew rojek dibû mîr û cezê peran dibirî.⁽¹³⁾

Li Azerbeycan û Kurdîstanê çarşema dawî ya salê de rêvebirê dibistanê leyîstikeke pêkenîn derdixistin. Ji nav wan yek dibû **Şêxê Kurdan**.



Ji Herêma Serhedê (Bazîd) Kosegelî
(Ji pirtûka Metin And.)

11. Bender, Cemşîd: "Kürt Mitolojisi" (r.59-60)

12. And, Metin: "Geleneksel Türk Tiyatrosu" ji "Demorgan, Misian Scientifigeen en perse" Paris 1894-1904 II.

13. S.G. Wilson: Persion Life and Custumes Edinboughr, London 1896 (r.102)
ji Metin And

Kiraseki dirêj li xwe dikir û fesek dixist serê xwe û ji pembu rihek çêdikir. di destê şêx û hevalê wî de şûr û dar hebû. Cezê peran dixwest; ku bi perê distend jî diçû pê şekir dikirî.⁽¹⁴⁾

VARYANTÊN KOSEGEÎ

Varyant -1 (Dêrika Çiyayê Mazî):

Leyîstikvan: Kose, Bûk (Zenne), Serkose, Koseyên din.

Kose: Rîhek reş ji hiriye ji xwe re çêdikir. Şalwar lê bû, qoçelê wî hebû, kefiya reng û mengû didan serê xwe. Zengil bi xwe ve dikir. darek di destê wî de bû, wî darê wek tîfingê bikardianî. Eyarê mihê bi xwe dikir. Li piştê wî tûrkek bi tijî xwelî hebû.

Bûk: Zilamekî xwe dikir bûk; kitan dida serê xwe. Temezî dida ber eniya xwe. Zêr bi dora enîya xwe ve dikir. Rûyê bûkê vekirî bû. Kiras an jî hûçik li xwe dikir. Di bin hûçik de jî deling lê bû. Sola pîrekan dixist lingên xwe. Kincên wê rewş bû; emê bêjin sor.

Serkose: Çekê xweşik li xwe dikir. Şalwar lêbû. Mezhan dixist lingên xwe. Boçika meshê hebû. Tûrek li piştê wî bû. Wexkta bi mal mal digeriya xwediyê malê tişteke bida wan, ewî dixist wî tûrikê li piştê xwe. Di destê Serkose de jî darek hebû. Wechê wî spî bû û rîha wî jî tunebû.

Koseyên ku alîkarî dikirin: Wana jî wechê xwe tenî dikirin. Lê wekî Kose rîha wan tunebû. Wan jî Şalwar li xwe dikir û tûrikek tijî xwelî diavêtin li piştê xwe. Darek di destê wan de bû.

Leyîstok: Serêsalê, li zivistanê dihat Leyîstin. Leyîstikvanan hem li gundê xwe û hem jî li gundê dora xwe li derveyî gund, li meydana fireh dileyîstin. (Ez bawerim ku wexta bûkên hev direvandîn, diçûn derveyî gund, yanê li ber deriyê gund dileyîzîn.)

Kose, Serkose, Bûk û Koseyê ku alîkarî dikirin mal mal digeriyan û deriyê malê dixistin. Ku xwediyê malê derdiket malê û pê ve Kose û hevalên xwe "dûrik"* digotin û govend digerandin. Dû de Kosekî darê destê xwe de nîşan dikir û digot: "çuf çuf" bera hevalê xwe dida û dikuşt. Heya xwediyê malê xelatiya wan, neda wan ji ber derî nedîçûn û li ser hevalên xwe dikirin "haho" û dûrik digotin.

Kose, wexta ku gundî dihatin cem bûka wan xwelî diavêtin wan. Xwediyê malê tişteke bida wan, wî tiştî serkose distend. Wek hejîr, gûz, pez, kulav, zêr... Paşî van tiştan li hevdu payî dikirin.

Kose wexta ku di nav mala digeriya, an jî ji gundekî diçû li gundekî din, rastê hev bihatana şer dikirin. Carekê li herêma Dêrikê ev bûyer qewimiye. Wî çaxî 15-20 hep Kose hatine kuştin. Niha ji wî cihê re dibêjin "Mezela Kosan"; ev cî li Dêrika Çiyayê Mazî ye. (Wexta gundê Qetaro derbas dike li serê şahrê li binya Emikê, ji Beyrokê virde ye. Li ber serê wan jî dareke zeytûnê heye.) **

14. Ji Metin And b.n.w.d. (r.245)


* Celebek Staran e.

** Çavkaniya vê Agahdariyê Pîra Bedrê bû, ku emrê wê 65 bû.

Varyant-2 (Bazîd):

Li herêma Serhedê çile, bi hatina biharê re û di Newrozê de tête leyistin. Di vê leyîstikê de sê tîp hene. Peyv tê de tune ye. Yê ku leyîstikê dar dixwe carna carna dipeyve. Ji van leyîstikvanan yê li pêşî tê cihekî girîng digre, Kose ye.

Kose: Di serê Kose de maskek ji kulav heye. Du hep qoçelê wî jî hene. Kose tiştê ku ji mûyê nêrî hatiye çêkirî, davêje li pişt xwe, yanê li xwe dike. Ev kincên wî bi berê reng reng hatiya hûnandin, tê xemilandin. Hin benikana wek rêşyan pê ve tê berdan. Di bin wî kincî de, kincekî din jî lê ye û dibin wî kincî de jî derpî lêye. Kose hêrsok e. Êrîş dibe Dora xwe. dora xwe bi hovitiya xwe ditirsîne. Di leyîstikê de hev Kose tînê regezêk "fêls" e. Di dora maskeya wî jî ji kulav rîha dişibe, rîya nêrî heye. Û bin dewa wî de phallusek ji keçê (kulav) heye.



Ji Herêma Serhedê Lîstika Kosegeli ye. (Ji pirtûka Metîn AND.)

Jina Kose: Kincên pîrekek Kurd lê ye. Nazdar û dilbaz e. ji bo ku xort ji rê derxe, cîlve dike. Wechê wê bi paçek sor hatiye nuxumandin.

Xort: Kincên xort ê rojane ye. Yanê wê wextê xortên Kurd çî li xwe kirina, wî jî ew xwe dikirin. Xort, Kose diqehirand û har dikir.

Li Bazîdê Kose wisa tête leyistin:

Kose û jina xwe bi leyîstikekê dest pê dikin. Leyîstik piranî bi defê dest pê dike. Talîyê, jina Kose ber bi leyîstikvanê xort ve dihere. Kose dide dû jina xwe. Xort direve. Xort bi vê tevgera xwe dixwaze Kose har bike. Wexta ku ev leyîstik tête leyistin, ku herikandina leyîstikê neyê xerakirin, leyîstikvan dikarin **tuluat** bikin. Kose ji qehran dimre. Dû mirina wî re xort û jina Kose, destê xwe didin hev û dest bi leyîstikê dikin.

Leyîstik, bi temaşevanan re tê leyîstin. Yanê bi temaşevanan re diyalogek bê peyv heye. Ev diyaloga jest û mimîkan e.*

Varyant-3 (Rewan):

Li Rewan'ê (Îxdir), di dawîya "Çileyêbiçûk"*** de tête leyîstin. Kose eyarê miyê li xwe dike, hêla hirî ji derve dimîne. Ji kulav kumekî dixist serê xwe. Arvan li sûretê xwe dikir. Li navtenga xwe rêşî lê digêrîne; tişteki dixe piştî xwe; xwe pê xûz dike. Rîheke rêş ji mûyê bizinê ji xwe re çêdike. Leyîstikvanek jî weke jinan, çekan li xwe dike û dibe bûk. Li ser Kose zingil hene. Leyîstikvanek jî li heban (tulum) dixe; kerek û yekî alîkariyê dike, yanê bi giştî bi pênc heban tê leyîstin. Ev pênc hep(kes) mal mal digerin cure cure leyîstikan dileyzin, peran û xwarinan didin hev.⁽¹⁵⁾

Varyant-4 (Wan):

Leyîstika Kose li 20'ê Sibatê tête leyîstin. Ku tête leyîstin û pê ve xwedêgiravî serma kêmbûnê û dinya xweş dibe. Leyîstin bi çar kesan tê leyîstik. Yek ji wan eyarên lawirên dirinde li xwe dike; kumekî ji kulav dixe serê xwe.

Rîha wî ji hirîyê ye. Wechê xwe bi arvan gewr dike. Teriya rovî xwe ve dike. Di bin çengê wî de bermalekek, di destê wî de jî zingil hene. Zilamekî jî çekên pîrekan li xwe kiriye. Ji xeynî van leyîstikvanan du kesê ku li erbanê dixin hene. Ev kes di şiklê gur, rovî û wawîkan de ne. Bi şev mal mal digerin, zilam û jin dileyzin, her du ku xwe şibandîne gur, rovî an jî wawîk, li erbanê dixin.

Baweriyek werê jî heye: Kose ewilî bikeve mala kê bereket dikeviyê. Diherin kîjan malê, xwediyê malê geştê leyîstikvanan dide wan. Ev geşt, pere ye, rûn e, hêk e. Di vê leyistikê de li ber her malî, leyistikek cuda tête leyîstin. Kose û Bûk gora kêfa xwe çî dixin nava leyistikê dixinê. Lê vatawê naguhirin. Carna jina Kose direvînin. Kose dixwaze jina xwe xelas bike, ji bo were jî dide dû gundiyan û gundî jî direvin. Hema çî bigire, gundî gişt dikevin nav leyistikê û leyistik bi kêf derbas dibe. Vata vê leyistikê jî ji xwe xuyaye ku hatina biharê ye, destpêka sala nû ye.⁽¹⁶⁾

Varyant-5 (Hemedan):

Kosegeliyên ku li Hemedanê tête leyîstin ev in: *Ahutepe, Heydarî, Sûleymanabad, Qasimabad, Meryanay.*

Ji serê sibatê heya 10'ê wê tête leyîstin. Şivanek ji kulav abayekê li xwe dike; benekî li navtenga xwe girêdide. Bi vî benî ve zingil girêdayî ne. Kumekî ji kulav-ku nîv mîtro ye- dixe serê xwe. Ev kum, wech

15. Metin And "Geleneksel Türk Tiyatrosu"

16. Kaya Vahap: "Türk Folklor Araştırmaları Dergisi" Ocak 1970 Sayı 246

** Piştî 21'ê Berçîlêyê 40 rojan re dibên çileyê mezin, dû wê re jî 20 rojan re dibên çilêyê biçûk.

* Çavkanî: Bengîn Amedî. Li Dîyarbekrê dijî, şanogerek e; 29 salî ye.

û stûhê wî vedişêre. Hilma xwe ji qulikê li ser kum de distîne. Du hep qilôç çêdike di kumê xwe de; bi perîk û darikan. Û quloça xwe ve neynikek biçûk û hestiyekî miyan pê ve girêdide. Di destê wî de darekî şivanan heye. Li *Ahutepe* ev şaxa Kose parikî ji yên din cuda ye. Ji kulav maskeyekî dixê serê xwe. Û cihê tê rasta devê xwe diqetîne û şeş hep diranê ku ji dar hatine çêkirin, pê ve dike. Du hep pîvazên gulover gunek û ji hiriyê jî kêrek çêdike û ber xwe ve dike.

Bi pîrekê re mal mal digere. Kose her ku tê ber malekê deriyê malê pihîn dike. Ku xwediye malê derî vedike, Kose wek miriyan xwe diavêje erdê. Ji bo ku sax bibe her malek birinç, rûn, mewij didinê. Ew jî ji hinek rîha xwe û hinek ji qoçela xwe dide xwediye malê. Xwediye malê jî dere wana jî bi deriyê gova xwe ve dike.

Ev leyîstik cihê ku pîr lawir hene tete leyistin.⁽¹⁷⁾



Ji Herêma Hemedanê Lîstika Kosegeli
(Ji pirtûka Metîn AND.: Geleneksel Türk Tiyatrosu)

17. Ji Seyyîd Ebdulqasim Encavî bi navê "Cejna ve Adap ve mutekedat -0 Zevîstan" Tahrân, 1976 (r.170-174)

JİBO ETÎMOLOJÎYA ZÎMANÊ KURDÎ ÇEND GOTÎN

Seydayê A. UÇAMAN, Jibo destpêka xebata xwe ya “*Etîmolojiya Zîmanê Kurdî*” nivisarek gelek dirêj difikiriya. Wî digote ezê liser rêzimana Kurdî hinek dûturan diyar bikim û dûr û dirêj liser wan rawestim. Bi gotina wî, vê nivisara destpêkê dê 40-50 rûpel bigirta. Lê hezar mixabin ku ûmrê Seydayê me qîmê vê yekê nakir, ji nivîsarê jî xûya dibe ku ev nivisara destpêkê nîvçe maye. Di vê nivîsarê de kelmeyên **mê** û **nêr**, bi herfên “m” û “n” hatine nîşankirin. Ew kelmeyên ku Dimilî ne, li pey wan bi tîpa “D” hatine belîkirin. Hin gotin Jiber ku pişkafîna wan çê nebûye, îzaha (şirove kirin) wan nehatiye kirin. (Seîd VERROJ).

A. UÇAMAN.

Jibo ku ez ji maleka bav, bapîr û dapîr de rêz mela bûm, bav û diya min jî xwestin ku ez jî wek pêşiyên wan di medresan da bixwînim bibim mela. Tevî ku xwendina medresan bi resmî hatbû hilanîn û tiştêkî bêqanun bû. Dîsa jî melayên Kurdistanê di gelek gund û bajaran da bi dizî li ciyên penî bi Kurdî ders didan.... Ez jî ketim medresê. Ji ber ku mala me ne maldarbû, min ji nîvê payîzê heta nîvê bûharê di medresê da dixwend, û ji nîvê bûharê heta nîvê payîzê jî ez dixebitîm. Çend sal bi vê kerencaliyê çun serî.

Piştî ku min ji xwendinê bes kir, min li ser piştî xwe barekî giran dît. Ew bar ev bû: Min ji xwe ra digot: Ew mêrik û jinika gûndî ku, ardê Şêx, Beg û Axa bi şeşene (ji şeşan yek) diajot, hatina wî çi bûya, ji dehan yek jî zekat dida. Hela ew qut û putê nemir bi çi zorkêşiyê dibû malx: Cotkirina bi gayan, tov kirina bi mistan, çînîna bi das û tar û destan, şixre û gêreya bi toz û duman,... Hela kevaniya reben, hem, bi malxweyê xwe ra rêncberî fikir, hem jî kar û bar û alaqa malê ji wê dihat xwestin. Tevlî vê yekê ewan însanên pirr hêja tucar di xizmeta xwarin dayin û cil şuştina me da tû diltengayîkî rava nedidan. Gerçî ewan însanan vê xizmetê bi hêviya xûdanxêrîti jî dikirin, lê dîsa jî min xwe ji wan însanan ra deyndar didît -Ez hêjî ji wan ra deyndarim- û ez tim difikrim, min ji xwe ra digot: Gelo ez dê bi çi hawayî vî deynî hinkî sivik bikim?

Min li ba xwe weha dît ku; Evan însanan perçekî ji xelkê Kurd in, em vî jî dizanin ku paşve mayîna xelkê Kurd, ji ber bêpar hêştina zîman û çandîya wî (Kultûr), ji defter û qelemê ye. ...Min biryar da ku ez dê bi zîmanê Kurdî, bi devê însanê nexwendî, ku herkes lê bibane ji kekoyê bajaran hata kevaniya gûndî.

Di vê navê da şevekî min gohdariya radyoka derve dikir, xebereka weha derbas bû (Di nava qîlasîkên dinyayê da, kitaba "*Kelîle û Dîmne*" ji hemîyan pîrtir puan (qîmet) girtiye), ez ketim pey şopa wê kitabê, min Arabî û Tîrkîya wî peyda kir, min xwend, bi min gelek xweş hat, min dest bi wergerandina wê kir bi Kurdî (Kurmancî), hem jî bi qafiye û bi zaravayê Kurdên gûndî. Ji ber ku giraniya barê malê li ser min bû, bi hindikî diva ez rojê dozde seet bixebityama, jiber vê yekê ez hêdî hêdî pêda diçum, min qedand.

Di 24.01.1968'an da polîs avête ser mala me, 84 cild kitab û wê tercemeyê digel hinkî tiştên dî jî, min bi tevî deh hevalan avêtin girtîxana Antalya'yê. Dawiyê mahkemê dest da ser kitab û nivîsan û alavên me yên dî.

Em ji hepsê derketin, min dest bi nivîsana zimanê Kurdî yê pişkafî kir. ... Dozdeyê Eylulê wek kabus li ser me rûnişt, ... Ew jî çar nûsxe yê daqîlokerî bûn. Ew jî çun.

Min diberya 1970'an dest bi tercema *Qur'anê Kerîm* kiribû, dema ku 12 Eylulê hat li dora 17 cûzwî qediyabûn. Bi tirkî dibêjin: (kambersiz düğün olmaz) min wê tercemê da ba hevalekî. Hewa parî nerm bû, min xwest ez wî 13 cûzwê jî terceme bikim, min nihêrî ku ew 17 cûzwî jî wenda bûye. ...

Jibo çi min berê rahêla ziman? Sebebê wî ev bû: Sal 1972, em li dora sed kesî li Diyarbekir di mahkemeyek xas da dihatin mahkemekirin. ... Rojekî ji nava dosyayê hakîm raporekî xwend: ... *Kemal BADİLÎ, Abdurrahman UÇAMAN, M. Emîn BOZASLAN*, li Tatwanê di malek da civan danîne, ... Badilî gramera Kurdî, Abdurrahman fîlolojiya Kurdî, Bozaslan jî elîfbaya Kurdî girtiye ser xwe, ewê binivîsin. ... Sal 1994 e, min Tatwanê hêjî nedîtiye. Lêbelê ev rapor û ew haway mahkemê çingîn ji serê min hanîn, ez weha fikirîm, min got ku: Gerçî ev tiştêkî aqademîk e, bi xebata însanekî bingeha tû zimanî nayête dîtin, dîsa jî bi hindikî, nîv şopenasîkî jibo gihîştina bingeha zimanê Kurd divê bête danîn. Min bala xwe da ku jibo xebata li ser ziman, ji hepisxanê çetir tu cîkî tûneye. Lewra ji her herêmê însan hene, hela jibo diyalektolojiya bi dest nakeve. Min di dawîya 1972'an da di hapîsxanê da dest bi xebata ziman kir. Di sala 1974'an da ez derketim, min bi alîkariya hevalekî jî heta 1980 qedand. Wek min lipêş gotibû; Lehîya 12 Eylulê wî jî bir.

Berê min milê xwe dabû ber vî karî, jibo ku min wî ji xwe ra bar didît, ev nebes bû vê carê li min bû rik jî. Tevî ku ev îş jibo yekî wek min bargiran û destteng ra gelek bêkeys bû jî. lê êdî min rîka wî girtibû, diva min li vî îşî xwe bişemiranda.

Jibo ku min ahd kiribû; heta nivîsandin û xwendina Kurdî ji esaretî der nekevin, ez yek rêzeka aqademîkî bi zimanekî dî nanivîsim. Ez xwe nakim rêza wan xwendayê Kurd yê ku bi hezaran kitab û defter bi zimanê Arabî û Tirkî û Farisî nivîsandine. Heta mektub û belgeyên xwe jî, eger

her yekî ji wan rûpelekî bitenê li pey xwe ji me ra bihêştana, dê nûha bi sedan kitêbê me jî hebuya, zimanê me jî ev çend kin nedibû, ... hêjî xwendayên Kurd -Çend xort netêda- ne li xwe ne li zimanê xwe ne jî, li çandîya xwe xwedî der nakevin. ... Wekî ku ev nebes bûye, ew hêjî bi zimanê efendiyê xwe difikirin, diricifin, dilerizin, li pey hinkî tiştên meyvayî negirtî dibezin, ew di neyariya bi nezanî da, xelkê Kurd jî bi wan ra digevizin, ew kesê ku çu em nadin du, vanê hene ew jî ne malê me ne. Eger di nivîsarên min da kêmanî hebin -Ewê hebin jî- bira bi tenê ji min bibûhurûn (min efo bikin) lingê ser medrexê, destê ser lewlebê, piyê xwasê liber kar û berxan û çavê li pey temuzîkî.

Di nava kitêbên kalê min da kitabekî hebû bi dest hatibû nivisandin, ne xweşxwîn bû, nivîsar di dawîya wê da rêzekî nivîsandibû, digot: (Ez nanê xwe dixûm bi avê, min mineta kesê navê) ê min jî wek wî.

Rojekî dê bi serê xwendayê Kurdan da bête ew tiştê ku bi serê xwendayê Fîn da hat.

ZÎMAN

Jibo ku em dê di van çend rûpelan da ji bingeş û hîmê hinkî kelîman mijul bibin û em vî jî dîzanin ku kelîme jî ji dengê bimovik têtin çêkirin. Deng jî ligora wan niqr û nîçikê (Frequans) movikan; (Ku bi alîkariya qirik û zîman û dîndan û lêvan) gelekî şekil digre.

Ji wan tiştên ku însan bi wan jî birayên xwe yê haywan vediqete, yek jî dengê bimovik e. Hate zanîn ku; Divê em bizanibin deng çiye? Movik çiye? Niqr û nîçikê movikan çine?

Deng: Ji perçeyên zereyan taa bi hevrêzên felekan heçî tiştê ku navê wî madde ye, ew bi çend hawayan digere û bi dora xwe ra jî bi ceng û şer, heçî tiştê ku ciyê xwe bigûhêre - bigere bivê nevê ew dengekî derdixe, lê bitenê ev heye: Jibo ku gûhê me însanan bitenê ewan dengê ku di nava 16/c saniye û 20 hezar/c saniye da ne, dikane bigire ji van herdu nûqtayan jêrtir û jortir tu dengekî dî nayête me, gûhê me wan dangan nabihîsin. Mela di dîwanê da dibêje: *Ellah ellah ku di ûmrê xwe tû carek nebihî/Çi sseda tete ji vî kûmbetê dewwarê hûdus/ Tu jiber perdeyê wehmê were der da bibihî/ Çi newa tete bi ssed nexme ji ewtarê hûdus.* ... Ji îro (1994) şeş asir berê; mela bi van dû malikên pêşîn ttevezê xwe bi me dike, yanî dibêje ku: Ev jibo we gelek kêmaniye, ku difure ji vî kûmbeta asîman ku karê wê gerr e. Mela piştî ku ttevezê xwe bi me dike, dilê wî bi me dişewite, bi wan herdu malikê paşîn; riya bihîstina dengê kûmbeta felekê ravay me dide, dibêje: Tu, xwe ji bin perdeya nezaniyê (cahiliyê) derxîne kû tû bibihîsê (sahbikî) bisedan wan senfoniyên kû hildibin ji wan peykê felekan û herçî tiştê peydabûyî. ...

Em ji felekan dadikevin zereyan, em li wê derê jî dibînin (Bi çavê labratuwarê alimê rezonansa manyetîka nûklûerê) ku dengê tîrêj û rengan bi hezar hezaran saz û senfoniyan dibîra me tînin. Em evan dengên hanê bispêrin Melayê Cizîrî û labratuwarê alimên atoman. Bila ew gûhdariya wan dengan bikin. Li vê derê em bitenê ji wî dengê ku di meydana gûhê me da ye mijul bibin. (16 H/c. s- 20H/c. s). Piştî ku gûhê însan û deng; di nava van herdu nûqtan da bihev dîkin, divê ku em berê jî bibînin ku evan dengan çawa çêdibin? Her tişt xwe serbest dixwaze û li ciyê fire digere. Dema ku cî lê teng bibe, dengê jî nava wî û ewî tiştê ku dixwaze ciyê wî teng bike, tete der, ew deng jî li gora sertî û nermî, mezinî û biçûkî, hêdî û hijdîtiya wan herdu tiştan bi ton û freqansan digûhûre, wekî wê baruta ku di nava lulê da agir digre dibe duman ciyê wê teng dibe, nikane bicive ser hev, divê were ciyekî fire. ... Fîşekê pêşta dipekîne, fîşek û duman bi lez û bez di devê lulê da dema ku dertêtin hingî ku bi sertî li hawayê derveyê ber devê lulê dikevin, qîrekî ji wan diçe ku ew ji wî dengî ra dibêjin **teqîn**. Nefesa çûkîkê jî ku di nava kertê qirika wê da pêlbîpêl têtin der, ew jî ligora tengitî û firetiya kertikan û vanê dî dibe deng. Em herdu destê xwe lihevdirin, em nûkuka xwe li erdê sert bixin, em kefçiyê li sêniyê bixin, em gûhê bidin dengê çivîkê, berxikê, pisingê, ... Gedeyê sawa deme ku di nava girînê da memika diya xwe bimije, gedekî, golîkekî, karîkekî pîrr birçî; dema ku nû bimije di wê helezê da dengê mijîna wan. Teyrekî ku ji nişkava bifire dengê lihev kutana baskê wê, ... Ketin, qetbûn, çîrbûn, gêrbûn, lulbûn, şuşbûn, çikbûn,... Em dikanin gelek dengê weha rêz bikin.

Ji Wan tiştê ku em û birayê xwe yên haywan biwan jihev diqetin, yek ji navajo (sewqa tabîî-îçgûdû) ye. Ev navajo (Ez ji wî ra dibêjim sazger), em jî dibînin: Ew însanê ku nû tete dinyayê, ew jî wek têtîkê haywanan bi navajoya xwe (sewqê tabîî) tevdigere; bêders û hînkirin dimije, di nava zeman da hêdî hêdî ji derûdora xwe hinkî tişt hîndibe, ew hînbûna wî hingî ku pêşta diçe navajoya wî ko dibe, ... Jiwan tiştê ku ew ji derûdora xwe digire, yek jî dengê sadeyê bêmovîk e, yanî dengê girînê, dengê şîrînê, şîrqînê, nuzînê, repîn, tepîn, ... Dengê haywan û dar û bayê însan jibo ku haywanekî komalî ye; lê pîrr xwepêrest û çavbirçî ye, pîrr xwejîn e, bi ez 'ezî' ye. ... Bi ezîtiya xwe ya duyemîn vî dibîne ku ew bi serê xwe tenê nikane xwe bipê û her daxwazê xwe pêk bîne, jibo ku evan kêmaniyê xwe bi dora xwe bide zanîn; radibe movîk li dengê tabîatê sadeyê yekrû dixîne.

2. Eger em hinkî jî kûr bifikrin, em dê vî bibînin ku wan pêşiyên me; kelîman ji dengê tabîatê ku di meydana bihîstina gûhê însan da ye, çêkirine. Lê ew çêkirina wan ne bi fikir û bazar û haydariye, belki bi giraniya heycana ihtiyacê ji xiyalê di dev da diferiqize. Ev dengê ku em navê wî datînin dengê tabîatê, ew jî şaxê wî hene; yek jiwan dengê haywana ye, yê dî ji dengê lihevketina hinkî tiştê dî ye. Ev herdu ne, xocayê me yê ziman. Ev dengê tabîatê sade yê yekrû, gelo çawa bûye dengê bimovîk? Berya her tiştî em di xiyala xwe da dû tene însanê ku ji makzayî da kor, kerr û lal bin çêkin, wekî dî tû kêmaniyekî di wan da tûne

be, em evan herdu însanan ji yekrojiya wan, xwarin û vexwarinê bêtêkil-bûna wan bidin ber wan û wekî dî em têkilê tû tiştêkî wan nebin, bitenê ji durê da em nehêlin ku nexweş bikevin û hew. Bi vî haway ew bihevra bibin bîst salî, eger herdu jî keçik bin yan jî herdu jî kûrik bin yan jî yek keçik be yek jî kûrik be, eger em yekrojan xwarina wan bibirin û paşê jî em hindik xwarin bidin ber wan. ... Ewê destdirêjayiya cinsî di nava wan da çê bibe yan na? Li ser xwarina hindik ewê şer bikin ya na? Eger yekî bitenê yan jî sed kes bin gelo ewê tevgerê wan çawa be? Eger ewan însanan sade kor bin yan jî sade kerr bin û ji hev pêve dayin û sendinkî nebînin û nebihîsin gelo? Tevgerê wan însanan dê bi paştamayî-na navajoya (sewqê tabîî-îçgüdû) wan bêtin pîvan? ...

Em ji dengê pêşiyên xwe yên pêşîn mijul dibin. Dengê tabîîatê sadeyê xwerû çiyê? Ew dengê bêmovikê ku ji însan û haywan û lihevketina hinkî tiştan têtê der. Wek: Qîrîn, girîn, kenîn, evana; hinkî dengê bêmovikin ku ji qirika însan û qirika hinkî haywanan têtin der. Lihevketina dar, kevir, av û agir, bi sedan deng dertînin, evan dangan; jibo ku di mêjiyê herkesî da wekhev nayêtin xiyalkirin; Bi hinkî şeklê nêzîkê hev lê newekhev têtin teqlîdkirin. Em dilopa avê bigrin destê xwe; Ji qatiyê xanî dilopekî av bikeve erdê, ewan çend merivê ku dengê wê dilopê diçe wan û heryek ji wan dixwaze ku wî dengê dilopê bi devê xwe bibêj e yan jî jibo ku zerareka mezin di hatina dilopê da dibîne heycan wî digre, ew jî dixwaze ku derûdora xwe bi hatina dilopê haydar bike, ew daxwaz û heycana wî, di potansiyela elektrîka xiyala wî da, bi zemanekî pirr hindik gûhartineka pirr zêde çêdike. Wek biruskê, di wê gavê da xiyal, wî dengê ku ji ketina dilopê têt, “Jibo ku bi dev bi hinkî însanê din bide zanîn” dike şeklekî ku di xiyala wan kesê gûhdar da jî dilop jê têtê zanîn. Tevlî ku ewan însan berê jî dengê dilopê hatiye wan, jibo ku ew heycan ew potansiyel di wan da çênebûye, ewan wî navî lê danîne. Em bi kurdî dibêjin: **Dilop**, Îngilizî: **Drop**, Tirkî: **Damla**, Firansizî: **Goutte** (ji kût têt) û bi Arabî: **Nûqt**, ... **Qet**: Eger em hinkî kûr bifikrin em vî dibînin: Dema ku tiştêkî hişk, sert jihev bişike dengêkî derdixe, ew deng jî di xiyala me da şopekî dihêle, ew deng ji xiyalê dema ku were devê xeberdanê dibe **qet-qût-qit**. **Qet**: Perçe. **Qût**: kin. Dawî (tiştê ku bişike yekparetiya wî qût dibe) ev kelîma **qet** e. Bi zimanê Arabî **qatî’î** () jibo ku Arebistan îqlimekî gelek germ e, boxaza (gewriya) însan bi xeberdanê ziwa dibe, di hinkî qolê zimanê **Samî** da, wek “Arebî û Îbranî” () hatina çêkirin. Ev **qet**; jibo vî di Arebî da bû **qetî’î** ()... Haywanekî kovî ya bi bask, dema ku em nêziyî lê bikin ew jî bi baskê xwe bihawa bikeve, gelo em dê navê wî dengê ku ji lihevketina baskê wî derdikeve, çi daynin? Ya em dê bibêjin **pirr** yan jî em dê bibêjin **firr**. Dema ku em herin ber kenarê golekî yan çemekî, ewan kusiyên avî ku likenarê avê xwe didin ber tavê, di serhev û berhev da dilezin û dibezin, ew dengê ku lihevketina qalikê wan têtê, di serhev û berhev da dilezin û dibezin, ew dengê ku lihevketina qalikê wan têtê gûhê me, eger em ji wî dengî ra nebêjin **req**, gelo em

dê bibêjin çi?... Ewan balonikê tijî hawa, ya av, ku liser tiştêkî dibin qûpik, dema ku dîteqin dengêkî ji wan têt, eger em navê wî dengî bidev bibêjin; gelo ji **xûrr, xûrp, xûrb**, ... pêve em dê wî dengî çewa bi dora xwe bidin zanîn? Ava ku di nava kevîran da nerm dakeve, giyayê sap û dirêjê gûrr dema ku ba lêde û ew jî bi serhev da pêl bide, haywanekî ku di nava pel û puş û xwişola hişk da bigere,... Ew dengê ku ji van tiştan derdikeve, eger em navê wî **xûşş** daynin, qey em kêmaniyekî têda dihêlin?... Kezeba sipî, dema ku giraniyekî were ser wê, ew heway nava wê di wan kûnikê wê da, bi derve da dipejîqin, dengêkî derdixin, eger em wî dengî bi nav bikin, gelo ew dihêle ku em ji **pişş** pêve navekî dî lê dayinin, kezeba sipî navê xwe ji wî dengî girtiye; **Pişik**. ... Kezaba reş jî rengê xwe. ... Em li vê derê viya bibirin, lewra em dê di nava rûpelê ferhengê da bigihin gelek kelîmen.

Ji van çend kelîman jî hate zanîn ku bingeha xebardana însan; teqlîtîrîna dengê tabîîatê ye. Yanî ew dengê sade yê bêmovîk ku ji tabîîatê bakîre difure û di gûhê însanan da diçe xaneyê bihîstina mejî (pişkafîna îşê nava mêjî ne îşê me ye, ew îşê mûhendîsê mejiyan e. Bi tenê em vî dibînin:) ew dengê sade yê bakîre, dema ku di wan bêjîngê mejî da derbas dibe, bala însan dikşîne ser xwe, jî pirr jî hindik tîrsekî, karekî yan jî zirarekî ravayê însan dide. Însan jî, ewê kar zirara ku ji wî dengî famkiriye, dixwaze bi dora xwe bigihîne. Jibo vî; Ewî dengê sade yê ku di bêjînga mejî da derbas bûye, çawa kar û zirarekî daya nîşandan wesa jî di xiyalê da jî dengêkî çêkiriye. Ez vî bi şeklekî xiyalî bibêjim: Dû însanên me yê beriya dîtina xebardane di şikêrekî da dijîn, pêşiya şikêrê bi kevîrê bêteşe dîwarekî çêdikin, ew dîwar jî di çend rojan da carekî xirabe dibe, ew dengê; **xûr, xir** ji gûhê wan nakeve. Rojekî yek ji wan ne li malê ye dîsa jî dîwar dikeve, ewê ku limalê ye diçe nava satar ku xeber bide ewê dî, ew dengê xirabebûna dîwar hingî di wan da jan daye (Divê ku dîwar jî berêya tariyê bête çêkîrin) jî tîrs û helezê; ew dengê xirabebûna ku di xiyala wî da ye, werdigere dibe dengê bimovîk û ew jî hevalê xwe ra dibêje: **Xir, xir, xir**. Eger hevalê wî limalê bûya, wî jî dê ji lez û helezê vî dengî derxista. Dîsa jî ez dibêjim ku her tişt eger bi hînkîrîna hînkî dî û kitabîna be, însan jî parra dimîne, divê ku herkes bi qandî xwe bifikre, hînkî tiştan jî ew bibîne, bi dora xwe bigihîne.

Em vê xebardane weha bibirin: Zimanê **Anatolîk**.

Ziman goştêkî nermê pahnê ferfî ye, dirêj e, bidamar û bêhestî ye. Binêzikayê nivê wî di nava dev da serbest e. Evê mayî jî bi zengilokê ve zeliqandiye, wek melêbê xwarinê di nava dev da liber didanan werdigêrîne û paşê wê xwarinê di qirikê da dadixîne.

Xebardan: Ew dengê ku tabîîat (xweza) wî dibêje, zara gûh wî diwêje, mejiyê însan wî dipêje û devê însan wî dibêje. Ji vî hate zanîn ku; gerçî xebardan bi dev tete kirin jî, lê ji gûh da dest pêdike.

Çend Dûstûrê Kûr, Ku Ji Bîr Pêbirina Nivîskarê Zimanê Kurdî (Zarava Kurmancî) Mane Dûr.

Ji hemî lehceyê (zaravayê) zimanê kurdî; Di kurmancî û dimilî da, nêrza û mêzayî heye. Ez vî dibînim ku nivîskarê Kurmancî; bi nezanî yan jî bi bêbalî (bêdîqetî) pirr gûh nadin vî haway, hela wan gotinê ku bi manakî nêrza bi yeka dî mêza ne. Wekî: Dar, erd, heval, mal, nan, nav. **Dar**; gava ku navê dara fêkî be; dara guzê, dara sêvê, dara tûyê,... Wê demê ew mê ye; Ez bi darê da hilkişyam, dara guzê pirr bilind e, ... Dar li vê derê mêza ye. Darê destê te zirav e, Darê nede destê neyar, gûliya darê dahatiye xwarê, ew erdê ber gund pêge ye, ... Ev darê li vê derê nêrza ye. Ev mêrik hevalê min e, ev keçik hevala min e, ev keçik bi salên xwe hevalê min e, ... **Heval**: dema ku dostaniyê yan jî bermalîtiyê bide zanîn, jibo ku ew mêza ne, heval jî dibe mêza. Jibo ku sal bûye pirranî, di pirranî da jî nêrza û mêzayî tûneye, ewan tiştên ku nêrzayî û mêzayî têda tûnebin; ewan tiştan bi nêrzayî têtin gotin. Jibo vî em dibêjin ev keçik bi salên xwe hevalê min e; em nabêjin hevala min e. Ez vî malî nakirim, ev mal kevn e. **Mal** li vê derê bi mana milk e, nêrza ye. Ez diçim malê (xanî), Mela Mistefa ji mala Barzaniya ye, ew maleka mezin e. Li vê derê **mal**; Bi mana malbatê ye, li vê derê jî mal mêza ye. ... Eger tû vê malê (xanî) difiroşî ez dikirim û ez malê te jî (mûlk) naşikînim. **Mal** di firotinê da: Xanî-mêza ye- di kirinê da: mûlk nêrza ye. Nanê genimî çêtir meriv digire, par nanê me kêmbû. Li vê derê **nan** bi mana qut e, ew jî wek qut nêrza ye. Filan jinik ji cîraniyê ra nabe, nana bi deyn nade cîranan. Li vê derê nan, kûnda hevîra pahnî pehtiye, ew jî wek kûndê mêza ye. **Gûlok** mêza ye. ... Keçê navê te çiye? Navê min Zerkezî ye. Kî vî navî li te danîye? Bavê min. Evya navê pîra wî ye. **Nav** li vê derê nêrza ye. Nava min dêşe, ez ketim nava bajar, em ketin nava wan me wan lihev hanîn, ... Ev nav mêza ye.

Nêrzayîti û mêzayîti, di hemî sîfet û rewşên wî navî da xwe rava didin: Ew jinika rebena bêkesa xizana bêwara ber dîwaran. ...Ew mêrikê rebenê bêkesê xizanê bêwarê ber dîwaran.

Mêzayî û Nêrzayî

Mêzayî û nêrzayî di hinkî zimanan da heye di hinkî zimanan da tûneye. Bi dîtina min: Ewan zimanê ku ev hawa di wan da tûneye, ewan zimanan ya pirr dereng hatine çêkirin ya jî di wan da hatiye jibêrkirin. Lewra nêrêti û mêtîti, jibo ku ji tariya dîroka ziman têt, divê ku bi çêbûna ziman ra hatibe danîn, em vî dibînin ku nêçîr di berya ziman e, lê kedîkirina haywanan jibo şîr û goşt û çermê wan, ewî bi ziman ra dest-pêkiriye û jibo ku zêdeyî di piraniya mêyan da hatiye dîtin; jiber vî '**mê**' rûmet girtiye û hatiye veqetandin. ... Di nava haywanê ku hatine kedîkirin, **mî** pirr bi zêdeyî bûye. Miyê navê xwe ji dengê xwe girtiye (me e e), piştî ku hatiye kedîkirin, jibo ku pirr bi zêdayî ye, di nava zeman da '**mî**'

hatiye firekirin û bûye navê tiştê tersê nêr. Evî tiştî mêmîtiya xwe ji ku girtiye; Di însan û haywanan da beliye, yanî ji cinsê xwe girtiye: mêmî-jin, dîk-mirîşk(marî), hesp-mehîn, nêrî-bizin, ... Lê ewan tiştê ku cinsê wan yê zêdebûna bi zayînê tûneye yan jî ne liber çav e; nêrîtî û mêmîtiyê wan gelo ji çi hatiye? Gerçî biser min nakeve ku ev nêrîtî û mêmîti jî anîmîzmê hatiye (her tişt rûkî wî heye, ewan rûyan; hinkî aqîfîn (lipêşîn) hinkî pasîf in), lewra wê gavê; îşê însan bi sêsed-çarsed kelîman diqediya, paşê bi zeman kelîme jihev hatin çekirin, bi sedhezaran nav hatin çekirin, dîsa jî hinkî **mê** hinkî jî **nêr** hatin ravedan. Ya ew dînê xiyalî-anîmîzim-rast dibêje. ... Ez livêderê çekirina navekî jibo we bibêjim: ... Min cilê xwe wer-girt ezê herime dikanê, ez çûm nava derî, keçika min ya pênc salî lipey min gazî kir: ‘baba, baba! dijmêra te vaye’. Ez zivîrîm ku tespîhê min waye di destê wê da ye. Ez mat mam. Ez fikirîm: ev tesbîh kelîmeka Arebî ye, derbasê kurdî bûye û di kurdî da nêrza ye, em dibêjin (tesbîhê te). ... Vê keçikê kelîma dijmêrê jî nebîhîstîye, ewê, vî navî; ‘ji leyiztina dest û pêçiyê min yê bi tesbîhê’ çekiriye. Ev rast e, lê çima negot “dijmêrê te” yanî bi nêrzayî negot? Ez fikirîm min got: Gelo para keçikê di vî hawayê da tûnebe? Eger law bûya jî ewê dîsa jî bi mêmîti bigota yan na? ... Min ji çend însanê nexwenda, vê pîrsê kir: Eger navê vî tesbîhê “**dijmêr**” bûya, te jî ji min binavê wî bixwesta, te dê bigota çi? Teva jî gotina me dê bigota: “Hela wê dijmêra xwe bide”. Min bi xwe bawer kir ku: Ev nêrzayî û mêmîti ya tiştê nezayî, ne tiştêkî zanyarî ye, ew dîtîneka zewqî ye. Ew jî ne jibo herkesî ye, bi tenê jibo wî kesê ku dîtîna serê wî û gotina devê wî zimanê wî yê makzayî ye.

Nêr û mê; Di tiştê bi zayîn û zêdebûn da, ji tevgerê wanê jihev veqetandî hatiye. ... Hê jî di nava însanan da, hinkî îş û kar hene ku divê jin wan pêk binin; pahtin, şuştin, malîştin. Piştî ku mêmî hebin, rençberiya çandiniyê û kêmaniyê malê peydakirin barê ûstûyê mêmî in. Hêjî bi piranî; wergirtina jin û mêmî in jihev in. Ewan cihêbûnan, di wan nav û lêker û demîran (zemîran) da jî dîtîna wan ne tiştêkî tûhaf e, belkî bi vê nevê ye jî. Ev hawa jibo însanan tiştêkî normal e, em bibêjin ku însan vê nêrîtî û mêmîtiya xwe, da haywanan jî, lewra însan bi birayên xwe yê haywan ra di nava cergûbezekî da dijiyan... Baş e, lê ewan tiştê ku wekî însan û haywan bi çêle hanîn û zayînê zêda nabin. ... Em bibêjin ku: Dar jibo ku fêkî dide, di zayînê da dibe weka jin û mêmî û mirîşkê. ... Jiber vî haway ew jî mê ye. Lewra dema ku dar dibe çogan; jibo ku êdî fêkî nagire, mêmîtiya wê jî diçe û dibe nêr. Dara hêjîrê, ... Darê destê ... Dara biyê jibo ku fêkî nagire, ew jî dibe weka jinika bî (bêmêr), bêmîtiya wê ji wê ra dibe fêkî, jibo vî ew jî weka wan fêkiyê dî li dara xwe dîtewe: Dara tûyê, ... Dara biyê. Ewan darê dî yê bêmîti jî di ciyê fêkî da navê wan wekî fêkî li wan dîtewe: Dara çinarê, dara guzê.

Gelo ewan tiştê ku di çekirina cinsê wan da zayîn û mirin û fêkî-girtin tûneye, ewan nêrbûn û mêmîbûna xwe ji ku girtine? Ewan perçeyê ku gewdekî jiwan hatiye çekirin, ew bi xwe hinkî mê ne, hinkî jî nêr in; Enî, poz, çene, çaq, çîp, ling, ...mê ne. Gûh, çav, sing, dev, ...nêr in.

A

A : Di zimanê dinya'yê da bi piranî li serê alfabayan da **a** tête danîn. Cîgirtina **a** yê di serê alfabayan da; ji ber ku **a** bê kert, teqil, birr û çengê nefesê hem jî bê livandina lêv, ziman, çene û dindanan ji valayiya qirika însanan û gelek birayên wan yê heywan bi hêsayî tête der. Ew **a** ya ku em û hinkî birayên xwe yên heywan têda bi pirranî digihin hev, ne ew **a** ya ku di serê kelîma **ax**, **av** û **arê** da ye. Belkî ew **a** ya ku di kelîmeyên **wek ba, ka, bara, garan** û her **wekî** dî. Ew **a** ya ku di serê kelîmê da **têt**, **destpêka** dengê wî navê **a'yê** ye. Jiber wê **yekê**, ewan kelîmeyên ku bi **a'yê** destpêdikin di wan da **a** bi navê xwe û kar û peywîrên xwe rava dide. Awan **a** yên ku di nava kelîmê da yan jî di dawîya wê da cî digrin, ewana tenê kar û peywîra xwa da xwe rava dide. Ev şop (metod) ji tîpên bêdengên mayîn ra jî pêwîst e. Her **wekî**; ewle, êvar, êrîş, insan û îstêrk (istare), orispî, ûstun, umar (ev gotin Dimilî ye, mana wê ya kurmancî, jimartin e.) û hwd.

A di zimanê kurdî da jibo gelekî mana tête karanînê; **1.** **a** di zimanê kurdî de jibo nîşandana tiştên xuyayî û cînavka (zemîrê) nîşandana tiştên mê. **Wekok**; Ev **a** ha keça apê te ye. Ev **a** ha bizina mala xalê min e. Ev palasa reş gelek bi kerg (neqîş) e.

2. Dema meriv bixwaze ku gotinekî nas bike; ku ew mê ye yan nêr e, meriv ji wê ra tewangekî (îzafet) tîne, wê demê **a** di nava tewandinê da der têt holê: mala me dur e, siya dara biyê hênîk e. Ava kaniya gund sar e. **3.** Ji bo wî tiştê ku meriv naxwaze levzê wî bigre devê xwe: filan kes **a** nebûyî bi serê wî da hatiye, Filan kes **a** bûyî ye (di têkilîya cinsî da yê pê bûyî). **4.** Ji bo mezinatî û pirraniya tiştan: **abur** (bûhûr, derbasî), ev gotin ji bo hînek heywanên ku bi refan jiber bilindî daketina dereceyê serma û germê cihê xwe digûhêrin -deşt û zozan dikin- **wekî** **abura çivîkan**, **abura zerzuran**, **abura kûlîyan**, ... bn. **Aburî**. **5.** Di dawîya hinkî kelîman da **têt** û wî **wesfî** di wan da rava dide yanî wan digerîne **xwedan rengdêr**: **zanîn-zana**, **xwendin-xwenda**, **westin-westa**, **hêyîyê-hêsa** **wendabûn-wenda**. **6.** Nîşana hayret û gazî ye. **a!** çiqas rind e. **7.** Di Dimilî de fiil'a alîkar e: Ez **a**, ti **ya**, a **ya**. **8.** Zerf û mekan (zerfê cih), dema ku bi tiştêkî ve bête girêdan, bi girtina **a** yê pêşîya xwe hinkî ji mesafeyê dûr dixîne: **ver-aver**, **cêr-acêr**, **pey-apey**, **cor-acor**, **daşt-adaşt**. Ji van

vekokan hate zanîn ku **a** di cihê **ve-** (ku di Kurmancî da lêkera alîkar e) ya kurmancî digre: **vekirin**, **vebûn**, **vedan**. **9.** Bi dawîya hinkî wesfa ve têt û taybetîkî dide xwediyê wê wesfî. Her wekî, xam-xama, xam wesfekî fire ye, dema ku **a** bi pey wî ve dibe ew dibe wesfa keçika berzewac. Weki ko têtê gotin, filan keçik xama ye. **10.** carna **a** bi dawîya navekî ve têt, ewî navî digerîne lêkera alîkar. wek: Av, dema ku **a** bi dawîya wê ve bête danîn ew dibe ava, wê demê mana lêkeriyê dide. Wek: Kela Gêlê avayiya bapîrên me ye. Kalê min vê xanê ava kiriye, mala wî ava be.

Wekî ku ji wekokên me jî hate zanîn ku evan qayde û hawayan gelek kêman têne xebitandin, yanî ji bo hinkî kelîmeyên taybetî têne xebitandin.

abur/m : **a+bûhûr**. Heywanên kovî û teyrên ku bi piranî ji ber kêman û zêde bûna serma û germê cihê xwe digûhêrin, deşt û zozan dikin. Wek gûr û roviyan ku di zivistanê serma zêde be ew bi celeban ji cihên sar xwe ber didin cihên ku ji wan ra bi kêr têt; wekî quling, zezur û kermêşan. A 'ya li serê aburê da jibo piranîyê ye. Bi ya min **eber**'a Erebî jî ji vê aburî ya Kurdî hatiye girtin.

aburî/m : **a+bûhûr+î**. Ji ber ku alavê bazirganiyê(tîcaretê) bi dewar û piştan dihatin gerandin, xwediyên wan xwedî cihekî belîkîrî nebûn. Biçuna kê derê alavê xwe vedikir, berçav dikir. Ji wan der û doran ji kê ra çî lazim bû, dihatin digirtin û mêrikê bazirgan dibûhûrî diçu. Ji ber vê yekê navê vî karî bûye aburî (aborî). Ji ber ku bi kêmanî ev bazirgan dihatin hinkî ciyan, ev dayînûsendin jibo gel gelekî girîng bû.

abûn/m : Her wekî me berê gotibû (di tîpa **A'yê** da), tiştê ku di kêmanî û zêdayiyê da gelek girîng be, dema ku meriv nexwaze ji ber giraniya wî bi dev bibêje, di beriya wî da **a** tîne. Wekî ku li vir em dibêjin abûn yanî ew tiştê pîsê ku em naxwazin bi dev bibêjin. Em vî jî dibînin ku hinek jinên sert dema ku nîfiran li yekî bikin dibêjin: a nebûyî bi serê teda were; ew tiştê ku heta nûha bi serê der û dorê teda nehatiye. Filan kes **abû** ye, yanî hatiye tecawiz kirin.

açik :

ada(1)/n : **av+de**. Ew reşayiya ku di nava avê da ye. **av+de> ada, ade**. Girav.

ada(2)/m : **a+da**. Ev **da** ji dayinê ye. Ada ciwanmêrî (sexawet) dayina ku têt **dike** û nabe bar û minet.

adan/m : **a+dan**. Tiştê xwarinê ku di wan da zirê (enerjî) tune be,

ji wan tôte gotin bêadan. Li vir da **A'**ya pêşiya danê ji bo girîngiyê ye.

afer :

aferîn :

agah/m : **a+gûh> agah.** Ji bo firekirina bêhayî bûnê. Dema ku bête gotin tu agahdar bî li vî îşî, wekî ku bête gotin bila gûhê te li ser vî îşî be. **A** li vê derê di cihê pirr dîqetkîrin û hayîdariyê da ye. dema ku tê gotin, agahîya min ji filan îşî yan jî tiştî tune ye, wekî ku bête gotin ji pirr û hindik tiştek bi ber gûhê min neketîye.

aheng/m : **a+heng.** Heng di zaravayê dimilî da navê mêşa hingiv e. Ew tiştê ku bi hevrêz be (sistematik) ji wî tiştî ra tôte gotin ev tişt, gotin bi aheng e, yanî ew weka kewara mêşa ye. çawa ku di kewara mêşan da parvekirina kar heye; yanî hinek îşçî ne, hinek tiral in, li benda mêşa mak in ku ew wê bi dol bikin, jibo ku ew jî di wan çavînekên ku bi xebata wan îşçîyan hatiye amadekirin da hêkên dolkirî bike, ... Eger ne bi vê ahengê (sistemê) be, kewar şitil nade û mêş nikane dolê xwe bidomîne. Ew îş û karên ku di wan da sistema kewara mêşan hebe, ji wî îşî ra tôte gotin ew îş bi aheng e. Ji vî hate zanîn ku **a** hatiye serê **hengê**, ji wê bûnê heng bûye navê kar û barê bi hevrêz û li hev danîn. Bn. Hengê.

ajal/m : **a+ji+al.** Tiştêkî ku jihev ketibe, perçe bûbe ji her perçekî wî ra tê gotin ajal. Ev **a'**ya ajalê ji bo pirr perçebûnê ye. Bn. ji û al.

ajar/m : **a+ji+ar.** Ev kelîme navê dermanekî ye ku însanê berê dema bixwestana ku purt û mu'yên ser çermê heywanan rakîn, evî dermanî dixebitandin. **A'**ya pêşiya vê kelîmê ji bo pak kirina bê kêmanî ye. **Ji** kelîma veqetandinê ye (jêkirin, jêbûn). **-ar** ji bo çêkirina nav ji wesfê. wekî, dîyar. Bn. Ji, ar.

ajdan/m : **A+ji+dan.** Movikên pel û gulên ku nû derketine û hê nepişkîfine, ku ji wan ra tê gotin pindik û pişkoj. Jiber ku jiyana dar û çandîya bi bizir, fêkî û pelên wan in, navê van movikan ajdan hatiye danîn.

ajotin/m : **A+cot+in.** Cot, hejmara yekê ku heval girtibe, ew herdu bi hevra dibin cot. Însan dema ku runiştiye û ji erdê zevî veqetandî ye, Ji bo ku, aletê ku bi wan çandî dike dest-pêkî (îptidayî) bûn, bi heywanekî şuv çê nedibûn. Ji ber vî, bivê nevê bi hindikî gerek du heywanan bixista milê hev. **A** jibo ravadana mezinatiya vî karî ye. **in**, in'a ku di

dawîya kelîmê da ye ew jî bo çêkirina fîl'a ku "cot"e. cotin> jotin. "Çift"> cot.

- al(1)** : Teref, kenar. Dema ku al bi mana teref û kenar be nêr e. Wek: Dîcle li aliyê rohelatê Amed'ê ye.
- al(2)** : **Destek, piştgirî.** Bi piranî fîl'a alîkar digre, ku kirin û girtin e. Wek: alîkirin û alîgirtina dostan jibo hev bivê nevê ye. Di vê derê da al, bi kelijandina kirin û girtinê dibe mê.
- al(3)** : Navê bayraqê ye. Ji berê da di kenarê sînore dewletan da bayraqê wan hatine çikandin. Al dema "ku navê bayraqê be, mê ye. Wek: divê her dewletekî ala wê di nava sînore wê da çikandî be.
- al(4)** : Al bi mana pîroziyê tê gotin. Wek: Ev tişt li we bi xêr û ala be.
- alag-alak/m** : **al+a+k.** Ev gotin tê bi mana lihev danîna der û dorê. Wek: filan kes bê alag e, yanî tiştên ku ew ji wan berpirsyare, ne di ciyê hêjayê xwe da bin, ji wî ra jî tete gotin bêalag.
- alandin/m** : Alandin tê mana pêçandinê. Ala ku bi kenar û teref bû jibo ku meriv her ciyê wî bigre binê tiştêkî, ji zêrê ku ala ye, fîl hatiye çêkirin. Al bûye alandin. Ji alandinê emrê bi- çêkirin û wê demê dibe bialîne. Dema ku em dibêjin vî tiştî li vîya bialîne (bipêçe), yanî vî tiştî li her aliyê viya bibe û bîne.
- alav/n** : **al+hev.** Ewan tiştên ku meriv yan jî mal (aîle) bi wan hev-girtî ye, ewan tiştan bi malê re dibin yek, ku di her gavê da ji kesên wê malê û dora wî ra bivê nevê ne. Wekî: Firaq, cîrax û xûrekên rojê.
- alaw/m** :
- alax/m** : **alî+ax.** Ew giya û çandiyê ku li erdê tê raxistin û dipelixe, jibo ku ew êdî bi kêrê xwarina heywanan nayê, ew dibe aliyê axê, yanî di nava axê da ew jî dibe ax. Bn. palax.
- alet/n** : **alî+ti> alet.** Ewan tiştên ku karker û hûnermend ew îş û karên ku bi destan tenê nayine kirin, bi wan pêktînin. Wekî: Gîsin, das, qelem, bêr, nîr, tevşo û hwd. Ev kelîme bi vî hawayê xwe di Arabî da weka ku ne hevdundanî (mûrekep) be, yanî li xweser tete dîtin. (Ew 't' ya ku bi dawîya aletê ve ye ku "al bi wî bûye alet", ne 't' ya mênîyê ye. Divê meriv bifikre di wê gotina ku bi pêxemberan ra tete gotin, yanî pêxember û alê wî).
- aloq/m** : **a+loq.** Ew dengê ku ji daqurtandina xwarinê di qirikê da tete der. Aloq, ji vegirtina a'yê û loq'ê hatiye çêkirin. Loq dengêkî tabîi ye. A hatiye serê wî bûye navê wan

behîvekên rast û çepên qirikê. Ji ber vê yekê, ew heywana ku di meşa wê da lûkûm û kert hebin jî, ji wê ra tê gotin diloqe. Ji vî seriyê (rêzê) ye: Leq, leqadin, loq, loqme û hwd. Bn. leq.

- ama/m** : **a+ma**. Ama, qertafa veqetandinê ye. Di axaftinê da dema ku meriv bi gotina xwe ne bawer be ku ewî bi tevayî were cî, jibo ku ewê bi tevayî were cî, jibo ku meriv wan astengan bigre ber çav, bi ama'yê meriv xwe ji bin barê lomeyan derdixîne û dibêje; ama... Wek: Yek bibêje ku, 'ez dê evro biçuma bajêr ama, ji ber ku baran û berfê rê neda, ez neçum bajêr. 'Lewra, tu fikrekî bê asteng û sade nabe, ji ber ku gelek tişt ji dervayê daxwaza meriv, li ber bi cihanîna fikrê meriv dibin asteng. Meriv ji wê fikrê ra dibêje: a+ma, yanî jibo vê fikra min ew astenga ku ne hatibû fikirandin, dibe ku ew bê daxwaza me derkeve pêşiya fikra me.
- amac/m** : **ame+ca**. Di zaravayê Dimilî da "ame" tê mana "hatin"ê. "Ca" ya Dimilî jî di Kurmancî da tê mana "şun"ê. Amac: Ameya ca. Dema ku kesekî ji bo xwe hedefekî bigre û bigîje wê hedefê, tête gotin ew gihîşte amaca xwe, yanî ew hedef hate cî. Amacê wek "armanç" gotin û nivisandina wê çewt e.
- amade/m** : **ama+de**. Ev "ama" jî wek "ame"ya amacê ye. Bi mana "hatin"ê ye. "de" zerf e. Dema ku em dibêjin ev tişt hatî ye, berferman e. Wî ciyê ku divê ew li wir be, ew li wê derê ye, hazir e. Di hinek zimanên arî da wek levzekî (gotinekî) sade tête karanîn.
- aman-amên/n** : **a+ma(mayin)+în**. Ew tiştê ku bê wî guhartinekî di cinsê wî da çê nabe, dema ku neyête hilanîn wekî mast, hevîrtirş û hwd. Eger kevaniya malê mast biqedîne ew nikare şîrê xwe yê roja dî bike mast. Ji wî ra heyvan û mayan jî tê gotin.
- ambar/m** : **hem+bar> ambar**. Di xan û karwansarayan da ewan cihê ku dihatin amade kirin jibo parastina alav û barên karwanan. Wek emanetxaneyên otêl û termînalên evro.
- ameyn/n** : Bn. aman, amên.
- amoş/m** : **ama+hiş**. Ev kesê ku hêrs dibe, dixeyide, bêhawa xeber dide dema ku meriv bi lavayî û gotinên xweş wî biseknîne, tê gotin ku ew hatiye amoş kirin. Heywanek jî dema ku di dotin û şîrdayinê da serserîti bike, çêlika xwe ne mijîne û nehêle ku bête dotin, bi hinkî tevgeran dema ku ew bête berdest kirin, wê demê jî tête gotin ku ew hatiye amoş kirin-amoş bûye. Ew amoşî jî ji amoşiya însanan hatiye girtin.

- amrez/m** : **ama+rêz.** Ew însan û heywanên ku ji hawa û dîtîne dora xwe derdikevin û piştî ku bi hawakî bêne normal kirin, tê gotin ku “amrez” bû, yanî hate rewşa normal. Bn. rêz.
- amyar/m** : Ew tiştê ku ji wê rêya ku divê ew têda be, dema ku ji wê rêyê averê bibe, piştê ku ji wê rêyê bête zivirandin, tête gotin amyar bû.
- an** : **ha+enî>han-an.** Dengê ku dema bihîstin yan jî dîtina tiştê ku ji der û dorê ra anormal be, însan bê haya xwe wî dengî derdixe. Di nava zeman da di ciyê heyret û ecêb mayînê da hatiye xebitandin. Her wekî ku em dibêjin: An jibo filan kesî, ku wî wan bêkeysîyan bihêsayî derbas kir.
- ana/m** : **an+a (ha).** An, dema pirr teng û kin e. Dema ku em dibêjin “ana” wekî ku em bibêjin “anha”. Anha> ana. Wek: Ez ana tê me. Ez ana diçim.
- ane/** : Ane, di dawiya roj, hefte, meh û salan da têt, ji bo belî kirina wan ku di her qedandina wan da bazar û hesab diqede û ji nû ve dest pê dike. Wek: Ez vî karî bi rojane, mehane, ... pêk tînim. Yanî her rojekî bi ev çende û ... Ez di her rojê da bi kêfa xwe me. Kîjan rojî bixwazim dikarim berdim.
- anî/m** : Ev gotin jibo bîranîna kes û bûyerên ku dema wan bûhûriye, kevin bûye. Ji ber ku, ewan liser di mêjiyê meriv da kar kirine, tu car nayêtin jibîr kirin. Jibo ku meriv ewan tişt û zemanan dîsa jî bibîne û di serê xwe da xiyalê wan tim taze bike, meriv wekokê wan datîne holê. Dawe ku neyêne jibîr kirin.
- anzêl/m** : **xazil> anzêl.** Bi pirranî havînan di herêmên germ da ji zilan holikên bilind têne çêkirin ku bi roj di siya wan da tête runiştin. Bi şev ji ber kûrm û kêzikan erdê ku meriv neêşînin, liser wan tête razan.
- ar(1)** : 1. Bi dawiya hinek kelîman ve tête danîn ewan kelîme û gotinên ku navin, dibin zerf (zerfê cih). Wek: xir**ar**: xûr+ar; cihê xûrekê. 2. Carna jî ji navekî navekî dî çê dike, bi tevî zerfitîya wî dide zanîn. Wek: gû**har**. Gûh û ar bi hev girtine û bûne navê wî xişrê ku bi gûh ve tête daleqandin. 3. Carna jî bi dawî hinkî mestaran ve têt (di şuna edatê mesterê da), wî mesterî dike kirde. Wek: nivisîn- nivîsar, diyin- diyar.
- ar(2)/n** : Bi serê xwe tête mana agir.
- arank** :
- arinc/m** : **a+renc.** êşa mezin, diwar. êşa xaşeyên (bez) lenfan. Bn. bergorim, vergorim (D).

- aring/m** : **ar+î+in+k**. Ew xweliya(arî) ku ji şewitandina cûrekî êzingan tête bi destxistin. Di hilkirina muyê postê ku dibe meşk da tête xebitandin.
- arastin/m** : **a+rêz+t+in**. Ew gotin ji zerfê bûye lêker (fîl). Rêz-rêstin. A, di serê vê gotinê da ji bo piçukatiyê ye. Rêstin, tişteki li pey hev bi rêz (sere) kirin. Bn. ristin, rêz
- arav/m** : **arîav> arav**. Di beriya dîtin û li hercî belav bûna sabûnê û hwd. da jibo pakişkirina ku evro bi sabun û deterjanan tête kirin, arî (xweliya agirê êzingan) dihat xebitandin. Kevaniya ku kincan dişuşt, avxweliya şuştina pêşîn ne dirêt, hinkî kincê dî ji bi wê avê şil dikir û di nava wê da çend car digûvaşt û paşê ji nû ve bi hinkî av û aravên dî pakiş dikir. Bn. arî.
- arî/m** : **ar+î**. Ew xweliya ku ji ber şewata tiştan bimîne.
- arşîn/m** : **a+ra+şehîn> arşîn**. Aletê kêşan û pîvanê. Li vê derê “a” jibo rastî û diristiyê ye. “Ra” ji bo nîşandanê ye. “şehîn navê mêzinê ye. Ji vir hate zanîn ku arşîn navê wî aletê ku pîvanê bi diristî rava dide. Di nava zeman da derbasê zimanê Osmanî bûye, sade ji bo dirêjayiyê hatiye karanîn ku li dora heftê cm. ye.
- arut/m** : **a+rut**. Ew êzinga ku pîjik û qaşikê şewitîne bi tenê kakûta wê nîvşewitî maye. Ji ber vî hewayê ji wê ra tête gotin arut.
- arûdu/n** : **ar+û+du**. Agir û ewan tiştên ku li du agir tèn. Dema ku yek bêje, arûduyê me tune ye, weka ku bibêje: agir û ew tiştê ku ew lu du wî têt, tune ye.
- asa/m** : **hêz+a(asan)> asa**. Ji wesfê wesfeke dî çê bûye. Ev tişt asan-asa (hêsa) ye, yanî dibin hêza kesan da ye. Pêkanîna wî ne tişteki zor e.
- asayiş/m** : **asa-hêsa+îş**. Ev tişt îşekî hêsa ye. Bn. asa.
- asik/m** : **a+zik**: mîde. Bn. a, zik.
- asîk/m** : **a+sî+k**. Ewan ben û xalên ku di canê însan da dixûyin û şuna xwe sî dikin, yanî rengê canê saya hinkî vedişêrin, ji ber vê hawayê ji wan ra tête gotin “asîk”< asiyik.
- ask/m** : **a+hêz+k**. Kevirê ku însan bi hêza mil jibo sporê diavêje. Di Dimilî da ji vê sporê ra tête gotin “şêl”.
- asirm/m** : **a+serma**. Sermaya mezin.
- aso/m** : siya tişteki ku di nava ronahiyeka hindik da bête dîtin û baş nayête naskirin, ji wê ra tê gotin “aso” a+>aso,ufuq... Şev bû, baş nedihatîn dîtin, liser banê asoya însan hebû.
- aspar/n** : **asp+rê**. Rêya bi hespê. Ev kelîme hatiye gûhartin, bûye “siwar”. Bn. siwar.

- aş/m** :
- aşî/m** : Kesê xeyidî çawa ku bi wî ra dayin û sendinekî nayête kirin, bi tenê piştî ku bête aşkirin hêja bi wî ra dayin û sendin çê dibe. ewan darên ku bi rewşa xwe bi tenê fêkî nagrin ew jî wekî wan kesê xeyidî ne. Lêbelê dema ku ewan daran tene lul kirin (aşî kirin, li piştî wê da hêj nû fêkî didin. Wek wan însanên ku hêrsa wan dakeve û werin ser hişê xwe, hêj nû bi wan ra dayin û sendin tete kirin.
- atun/m** : **atîn> atun.** Kureya ku di wê da kirêç tete çê kirin. Ciyê pehtina cerr, kuz, den, kiremît û hwd. ye. Bn. A, tîn.
- aşîkar/m** : **aş+î+kar.** Ew tiştê ku însan bi çavê xwe yan jî bîra xwe bi wî ra yekîtî û girêdanekî dayne, ew tişt ne penî û xeydan e, tete gotin ku meriv bi wî tiştî ra di aşitiyê da ye. Ew tişt jibo ku ne penî ye û berçav e, kelîma “karê” digre dibe aşîkar. Yanî karê wî aşitî ye, ne veşartî ye. Bn. aşî, kar.
- aşk/m** : **a+hişk> aşk.** Ew werîsê ku bar bi wî tete şidandin, dema ku sist be yen jî fire be, bi darekî du bihûst tete şidandin ku ji wî darî ra dibêjin aşk. Ji ber ku ew wî werîsê sistê nerm hişk dike. Navekî aşkê yê di “fatul” û “pêç” e.
- aşnê/m** : **aw+şinê-av+çuyin.** Çuyina di avê da.
- aştî/m** : **aştî+tî.** “tî” ya li pey “aşî”yê hatiye, jibo ku ji wesfê mester bête çekirin. Bn. tî, aşî.
- aşujin/m** : **a+şujin.** Ew şujina ku zêde dirêj e, di hinkî ciyê ku derzî û şujin bi kêr nayên da, tê xebitandin. Bn. şujin.
- atir/m** :
- av/m** : Di şaxê zimanê Arî da wek av, aw, ab û hwd. tete karanîn. Tenê her bi A’yê dest pê dibe.
- ava/m** : **av+a.** Însan piştî ku xwe naskirî ye û xwestiye ku xwe ji hinkî zor û êşan bipê; ji xwe ra hêlîn çekirî ye. Ji ber ku vê yekê dîtiye, di piştî hawayê da av jêra tişteki pirr girîng e. Ji vê bûyinê hêlîna xwe nêzîkê avan çekirî ye. Ji ber viya, navê hêlîna wî bûye avayî, yanî ew tiştê nêzîkê avê. “Ev” a Tirkî jî, bi kelîma “avayî” yê ve girêdayî ye. Ava tê manê şenayiyê.
- avarê/m** : **a+ve+rê.** Ew tiştê ku ji rêya ku divê ew têda be, ji wî dûr keve jêra tete gotin: Ew “averê” ye, yanî ji rêya xwe bi tevayî veqetyaye. Bn. ve.
- avayî/m** : **av+a+î.** Ew xaniyê ku jibo têda bi cîbûn, runiştin û razanê hatibe avakirin. Carna ev gotin jibo rez, bexçe û bostanê ku lê xwedîtî tete kirin û tete lihevdanîn, jibo wan tê xebitandinê. Bn. av, ava.

- avêtin/m** : **a+ve+hatin**. Di vê gotinê da **a** jibo bi hêz kirin (zexim kirina) mana lêkerê ye. Ev gotin jî yek ji wan kelîman e, ku di nava wê da **"H"** heye, ev disturekî (qaydekî) ye ku **"H"** werdigere dibe **"j"**; binêre ev lêker dema ku bibe emir, em dibêjin bavêje. Her wekî wêtin (wêhtin> wêtin) dibe biwêje, sohtin (sohtin> bisoje) gava ku dibe emir; dibe bisoje. Wekî vana ne: Rêhtin-birêje, mêhtin-bimêje û hwd.
- avgîr/m** : **av+gîr (girtin)**. Sûnger.
- avir/m** : **ava+har (ax)**. Hariya ser ban, ser avayiyî.
- avkêş/m** : **av+kêş (kişandin)**. Pompa.
- avis/m** : **ava+zê**. Ew însan û heywanê ku ber girtibe û zikê wê hinkî werimî be, xuya be ku di nava wî da çêle heye, ji wî însanê û heywanê ra tête gotin: Eva ha avis e. Yanî zêya wê ava ye, şên e. Bn. ava, zê.
- avke/m** : **avge> avke**. Ciyê avê, ser şuştin û cil şuştinê. (banyo).
Bn. D. awke
- avrêj/m** : **av+rêj**. Daşil-tiwalet.
- avrû/n** : **ava+rû**. Rûyê şen, rûmet û qîmet. Bn. ava, rû.
- avtawe/m** : **av+tê+ve**. Firaqa avê: tas, satil, kup,...
- aware/m** : **a+we+trê**. 1. Hatin û çuyina ku îş û karekî nebîne, vala bimîne. Wekî ku tête gotin: Ez vame têm, tu aware nebe. 2. Ew tiştê ku ji wê rê û ciyê ku divê ew têda be, dema ku ji wî ciyê durkeve ji wî ra tête gotin ew aware ye. Yanî ji rêya xwe ya bi tevayî veqetyaye. Bn. ve.
- averê/m** : **a+ve+trê**. Tevger û çuyina ji dervayê rêya normal. Wekî ku tête gotin: tu ji vê şopê averê nebe. **Averê** û **aware** di hîmên xwe da dibin yek.
- awaz/n** : **a+waz (xwaz)**. Gazî û daxwaza mezin. Dema ku kesekî bikeve zorî û tengiyek, bang kirina wî ya ji bo alîkarî û piştgiriye. Di mana xwe ya gelemperî da deng e. Bn. a, xwaz.
- avzun/n** : **Hevzîn> avzun**. Ew qayişê ku di bin zikê hespê da derbas dibe ji bo ku herdu kêlekê zîn bi piştê hespê ve werin şidandin. Ew toqeya ku li serê wî qayişî ye, ji wê ra tê gotin avzun. Di nava zeman da ji hemu toqeyan ra hatiye gotin avzun.
- awur/n** :
- ax/m** : însan di dema xwe ya îptîdaî da ji ber ku şuştin û pak kirina xwarinê hîn ne bûbû, tiştê xwarinê ji nava axê hil dida û dixist devê xwe. Eger ax bi wî tiştî ve gelek bûya, ew tişt ne dihat qurûtandin. Wê demê bivê nevê wî tiştî

- ji devê xwe diavêt derve. Di avêtina wî da dengêkî derdixist ku digot: Ax... jibo ku ev dengê tabîî jibo avêtina ew tiştê di dev da tête derxistin. Ev deng bûye navê wê, yanî ax... bi vî hawayê bûye nav.
- axa/n** : **ax+a**. Ev a'ya ku di piştê kelîma ax'ê da hatiye, weka wê a'ya ku di dawîya westa, zana, xwenda û hwd. hatiye. Di vir da ev **a** ji navê (ax) wesif çê dike. Axa, yanî xwediyê ax'ê, di nava zeman da bûye bernava xwediyê ax'ê, yanî bûye navê çînek (sinifek).
- axlêfe/m** : **ax+li+hev+e**. Zemanê qedandina kar û barê debrê. Di herêma Zirk û Silîavan û der û dorê wan da meha havînê ya paşîn (tebax) ku ber bi payizê ve diçe, gundiyan qut, put û tovê xwe bi cî dikir ew bermayê ku di qada benderan da dima, ji ber ku ax, ka û zad di nava hev da bûn, ji wê demê û bermayê ra dihat gotin "axlêfe".
- axu/m** : **av+xwê**. Ew tiştê ku pir şor be ji wî ra tête gotin "axu". Ji jehrê ra jî tête gotin "axu".
- axur/m** : **a+xew+ra**. Ew ciyê ku heywan bi tevayî tê da tene hewandin û di xewra tene kirin. Li vê derê **a** ji bo pirranî û tevayiyê ye.
- aya/m** : **ay+a**. Gaziya bê daxwaz û îrada însan ji devê wî der dikeve. Ji hayê hatiye piçuk kirin. Wekî ku êşekî yan jî bêkeysîkî bi ser meriv da were û meriv gazî yekî bike ku ew ji wî haydar bibe. A'ya dawî jibo zexim kirina gazî kirinê ye.
- ayre/n** : **aw+hêr+e**. **Awhêre> ayre (arye)**. Ew aletê ku zad dihêrehur dike; jibo ku pehtin û xwarina wî hêsa be. Ji vî karî ra tê gotin hêran. Ev gotin û "hur" bi hev ra têkiliyê da ne. Ev ku derbasê Tirkî bûye, di zimanê Tirkî da bûye "ayırmak".
- ayrî/m** : Bi mana veqetandin û cihêti da tê karanîn û di bingeha xwe da ji ayre'yê hatiye sivik kirin. "Ayrî"ya Tirkî jî. Ji wê tê.
- az/n** : **a+zê**. Malbat. Di vir da **a** jibo mezintî û fireyîyê ye, yanî ewan zindiyên ku di zêkî da dibin yek. Wekî ku tête gotin; di zayinê da ewan zindiyên ku ji kokekî hatine. Bn. a, zê, zî.
- azbat/m** : **az+ba+tf**. Ewan zindiyên ku di azê da derbas bûn, dema ku li ba hev bi tevayî bijîn, ji wan ra tê gotin azbat: ew ayla ku nava hev da ne. Bn. **az**.
- azîn/m** : **a+zîn(jîn)**. Jiyana mezin. Ev gotin jibo pîroz kirina tiştên girîng ku bi civakî tene kirin, tê karanîn. Di vê gotinê da **a** jibo mezinatiyê ye. Bn. a, jîn.
- azinc/m** : **a+zîn (jîn)+cih**. Ew ciyê ku ji bo jiyanê her tiştê wî bes û têr be.

- azmîn/n** : **a+zemîn**. Zemîn=rûyê erdê, yanî aliyê ling. Azemîn, tersê
rûyê erdê, yanî alî serê me. Bn. a, zemîn.
- azmun/m** : **a+zimun(ziman)**. Teftîş û muayene. Famkirina tişt, bi bingeh
û koka wî. Wekî ku doxtorekî nexweşkî muayene bike û
nexweşîya wî fam bike.

Ferheng-Vajname'yê

(KURMANCÎ - HEWRAMÎ - DIMILÎ - SENENDAJÎ - V)

Abdurrahman UÇAMAN - Seîd VERROJ

P

PIÇUDANK

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DIMILÎ	SENENDAJÎ
PIÇUDANK rehîm qûz	piçedan —	kiss —	piçedan —
PIÇUKTÎR PIÇUKANE PÎDU pidî	wirdeyter zawlane haru —	wirdêkêr wirdêkê goştê didanî —	piçuktir menalane haru —
çî	—	—	—
PÎF —	pif fu	pif —	pif —
PÎF KÎRÎN —	faw kerde —	pif kerdiş pif kerdin	pif kerdin —
PÎLAW	pîlaw	pîlaw	pîlaw
PÎLE pêlik derece	pilekanî — —	nerdiwan derence —	pile pilêkan —
PÎLÎNG	piling	piling	piling
PÎNCAR pancar	terebar —	pincar —	terebar —

PÎNDÎK

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
PÎNDÎK(1) movik —	serpel — —	pind movik serpel	qelepope — —
PÎNDÎK(2) gul —	qopke gopîte —	pind gul vil	weç wil —
PÎR PÎRÇ purt	pirdî pirze —	pird pirç purt	pird pirze pirzole
PÎRR(1) gelek zaf —	pêşu meşmer — —	pirr gelek zaf vêşî	pêşu meşmer — —
PÎRR(2) herî —	tîskin tukin kolkin	pirçin muyin takin	tîskin tukin kolkin
PÎRRBÊJ çene sist çeneketî —	mirya çenewer çenake delo	qalzaf çenesist çenekewte —	herze çene firrewêj firre delo
PÎRRXWAR gelexwar PÎRTÎK kirp	firrewer lemdirya pil —	zafwer pîzexişin pirtik —	firrexwer çilês pil cincik
PÎRTÎK biryan PÎRPÎZEK PÎSPOR	pil — pitrok axe	biryan — kûzbilikî zanaye	pil cincik pitro axe
PÎŞARE dîharî	sewqat deste rêkane	xelat (xelata ki cayo durî ra bêro)	sewqgat deste rêkane
PÎŞÎK kezeba sipî	şoşî —	pişik qesba sipî	sî —

PIŞK

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
PIŞK beş par parçe pay nîfş	pişk beş — — — —	pişk birr bar parçe — —	pişk beş moçe parçe — —
PIŞKDAR beşdar şîrîk	beşbar beşdar moçeber	wayîrê bar hîsedar bare	beşbar beşdar moçeber
PIŞKOJ pişkof qomçe dûgme	dûgme — — —	gojak zirar qoçma sedef	dûgme — — —
PIŞT(1) —	mazî —	mane mone	pişt —
PIŞT(2) dawî duwayî paş pey	şun ramal ret — —	pey peynî dima peyra —	şun rêwal ret — —
PIŞTEVAN paşmêr paşgîr —	piştîwan pena la girtay —	paşmêr paşgêr paştî girotox —	piştîwan pena la girtî la koşke
PIŞTÎ —	derzelo —	derze —	pişte şexre
PIŞTÎVAN dêreke	tîrek —	pişteka dêşî —	şemek çilmerde
PIŞTWANÎ piştgermî paldayîn sipartin	piştwanî — — —	paştî dayîş paldayîş — —	piştwanî piştgermî — —

PÎÇ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
PÎÇ	zol	bînc	zol
—	—	xilt	molekî
PÎN	şeq	paşkil	şeq
zîtik	leqe	zîtik, loq	leqe, ordeng
PÎNE	pîne	pîne	pîne
—	perû	—	—
PÎNEÇÎ	pîneçî	pîneçî	pîneçî
pîneduz	—	sewlderz	—
PÎNEKIRÎ	şire	pîne kerde	şir
kevn	—	keyen	çek
—	—	kihên	rîpal
PÎR(1)	pîr	pîr	pîr
kal	—	kal	konsol
kevnasal	—	—	salxûrde
PÎR(2)(mûzmîn)	kohe	keyen	kohe
—	—	pîr	pîr
		kihên	
PÎROZ	pîroz	pîroz	pîroz
—	—	bimbarek	—
PÎROZE	pîroze	pîroze	pîroze
PÎS	pîs	pîs	kisîf
xerab	xerab	xerab	xiraw
bedgel	napor	bed	bedteşk
çepel	çepel	—	çepel
genî	genî	boyin	genî
girêd	nakolokar	—	nakolokar
PÎSGO	xerabwac	xerabwatox	bedwêj
—	—	xerabwac	bedgo
—	—	—	xos
PÎSÎ	pîsî	pîsî	pîsî
—	—	—	çepelî

PÎVAN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMILÎ	SENENDAJÎ
PÎVAN	sengayî	setiş	sengayî
qas	taqî	—	taqî
—	berawerd	peymawitiş	berawerd
—	—	—	beqet
PÎVAZ	pîyaz	pîyaz	pîyaz
PÎVEK	peywane	peymawitox	pêwane
kod	kewçe	kod	—
PÎYALE	pîyale	qedeh	pîyale
kasik	—	—	—
POL	po	dendika mêwî(fêkî)	pol
sikil	sikil	berze	sikil
POLA	pola	pola	pola
POLDAN	paldawe	pal dayîş	paldan
sipartin	warîs paryay	paştî dayîş	piştan
—	hors paryay	—	—
PONÎÎN	weriwawî	venek	xewalut
çav lixew	—	—	—
POST(1)	poz	sitare	şater
çeper	çapar	çeper	çeper
pusî	—	—	—
POST(2)	pos	poste	pos
çerm	tokal	çerme	pês
kevil	—	—	—
POSTÎN	kepos	posteyin	kelpos
POŞMAN	poşman	poşman	poşman
POTÎN	potîn	potîn	potîn

POZ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMILÎ	SENENDAJÎ
POZ	poz	pîmos	poz
vinik	kepoz	pîrnik	kepoz
kepu	lut	vinik	lut
dîfn	birnax	zincî	birnax
bêvil	—	—	—
PUÇ	puç	puç	puç
—	puçel	rizyeye	puçel
—	hurol	helisyaye	holol
—	pêv	—	fîrol
PUNG	pune	pune	punge
PURT	purtke	purt	tuk
qij	kij	—	qij
PURTO	kolkin	purto	kolkin
pirço	têskin	pirço	têskin
—	tukin	pirçin	tukin
—	—	muyin	—
PUSÎ	milas	dam	milas
dafik	—	kozîk bestîş	qolax
duzax	—	duzax	—
PUŞ	puş	puş	puş
palax	pelaş	palax	pelaş
—	şexal	—	poşal
PUŞÎ	rûpene	puşî	rûpene
perde	pêve	perde	pêvek
PUT	put	put	put
PUZİK	puleke	pelik	puleke
—	—	pulik	pulek

Q

QAHPE

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
QAHPE orispî ttol — —	cinî sazne gander çeqalte —	qahpik orispî qunda ttol —	qahpe sazne gander çeqalte cone
QALLÎB	qalib	qalib	qalib
QALÎND stur istur	qol — —	qalind — —	qol hoz —
QALÎNDÎ sturî isturî	barsayî — —	qalindî — —	barsayî — —
QAMÇÎ qemçî şelaq taziyane	taziyane şelax — —	qamçî — — —	qemçî şelax — —
QASEK gavek tan	tan — —	gomî gamî —	tan — —
QASÎD —	pîya —	qasid —	pîyak belepa
QAŞ	murxane	qaşa giştirî	neqîm
QAYÎŞ qemçî —	qayîş duwale şelax	qayîş qamçî —	qayîş qemçî şelax
QAZ	qajî	qaz	qaz

QAZANC

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
QAZANÇ –	muçe bare	qezenc bare	behre bare
QEBUL KÎRÎN mildaber	milniyay –	qebul kerdiş mil ronayîş	milniyay –
QEDEH –	cam –	qedeh –	cam wendey
QEDR rûmet –	hûrmet – –	hûrmet rûmet qedr	hûrmet rêz –
QEFES	qefes	qefes	qefes
QELEM sertu – –	tiwîşotî tiwî mîdad –	qelem – – –	serşur sertu mîdad tujik
QELEMTÎRAŞ –	qelemtiraş qelebirr	qelemtiraş –	qelemtiraş qelebirr
QELEW serxwe xurt –	çax goştin xîpîş kîpin	qelew goştin xurt –	çax goştin xîpîşne kîpne
QELIYAY qelandî	birjiya –	qilênaye surkerde	birjiyak –
QELP sexe	qelp –	qelp sexe	qelp –
QELUN –	qilyandemî sebil	qelun –	sewîl sebil
QEND (şekirê nebat) QERANFÎL	qen qang	şekerê nebatî qeranfîl	qen qang

QEREBÎNE

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
QEREBÎNE (çelebek tifing)	pemleperî	qerebîne (yew bêj tifing)	pemleperî
QÎRÊJ çirk —	zirg çilk dirn	qirêj gemar —	zirk çilk dirn
QERN —	qern —	qern (nesil) az	qern —
QERQÎTİK —	halî jêlî	qaxî qalî	hale jêle
QERTEL leşxur lorî —	helu leşxur holinc dal	qertel humo leşxur —	helu leşxur — —
QEST	qirm	qest	qirm
QEŞENG narîn xuwan	qeşeng kelan —	rind narîn —	qeşeng kelan —
QEŞMER mesxere qirdik	mesxere — —	qeşmer — —	delqek — —
QET — —	qet — —	qet qes qirt	qet — —
QETANDÎN dirandin çirandin tîşkirin —	rinay dirzey helar kerdey tîşnay —	qerfnayîş dirnayîş çirnayîş tîş kerdîş qelişnayîş	dawêşanin diranin piçranin — —
QETREKÊŞ cubirr sinik —	qetreçekîn hole — —	karmê bostana — — —	qetreçekîn besîlebire aludizek hole

QEDEXE

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
QEDEXE	qedexe	yasax	qaxe
—	—	qedexe	—
QEYD	pawen	qeyd	pawen
—	—	—	paben
QEYSÎ	şêlanî	qeysî	qeysî
QEYTAN	qeytan	qeytan	qeytan
—	—	—	ben
QIJİK	qijqere	qijik	qijqere
QİR(qirbûn)	qir	qir	qir
QIRİK	qorqoraçke	qirik	qorqoraçke
gewrî	—	—	—
gilaloçik	—	—	—
QİR KETÎN	—	qir kewtiş	—
QÎÎN	qîje	qîîm	qîje
qîrîn	çîqe	qîrîn	çîqe
QÎR	qîr	qîr	qîr
zîft	—	zîft	—
QÎRÎN	carr	qîrayîş	carr
gazî	coş	gazî	coş
canîn	—	—	bangewaz
—	—	—	helale
QÎYAFET	qîyafet	qîyafet	sekut
—	sekut	—	—
QEYTAN	qeytan	qeytan	qeytan
QÎZÎTÎ	kinaçîyî	keynekê	bin kenêşkî
bakîretî	—	bakîretê	—
nîşan	—	—	—
qîzanî	—	—	—

QOL

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
QOL qût	qol kol	qol (boç qol) kîrr	kol —
QOLÎNC —	qolin —	qolinc —	qolinc birk
QOTRE — —	hawlerû rûş —	dirno rî bizrikin hawlerî	hawlerû —
QU puşî	qu —	pîyay —	qu —
QUL (reşîkê şevê) —	hol —	qeraqure —	hol mêrdezime
QUMATEK quntax paçolik	qunaxe papule —	qundax bûxça —	qunax papole —
QUN qît —	inîne — —	qîy qîn —	komî qînk pîzî
QUNCİK qoşe kûncik — —	kûnc qoşe kolesuç suç —	qûncik qoşe kûncik — —	kûnc qoşe kûncol suç kolsuç
QUR qure keşmekeş	narefî — —	teşxele — —	erbede — —
QURBAN xêre — — —	zaq xêre waq — —	qurban xêrat — — —	zaq xêre waq maq zêt
QURTİK birî	qulpîne qurpîne	qurtik —	qurpîne —

QUŞ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
QUŞ —	quşqun paluwe	paldim —	quşqun ranekî
QUWET hêz şîyan zor — —	quwet hêz gor zor werge taw	quwet hêz şîyan zor — —	quwet hêz gor zor berge —
QÛLÎNG —	qazîqûling —	qûling —	qûling qazîqûling
QÛLUZ xuz qembur kuz	qox çemyawe kiwer —	qûluz xûz qembur —	qox çemyakewe kom —
QÛMAR	qûmar	qûmar	qûmar
QÛRE xere — — —	xere fîzin keleba — —	qûre xwirazî — — —	xere fîzin keleba bayhewa mirqîn
QÛRNUÇÎK qirmîçik niqurçik	qolîncê — —	nequsikî — —	niqkurçik — —
QÛRT —	çor —	qût —	çor qum
QÛTÎ sendoq bahol —	qûtûwe ceyb bahol micrî	qûtî sendoq bawil —	qûtu ceyb micrî senoq
QÛZ	kûs	kiss	kûz

R

RA

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAÎ
RA rê rêk	ra raga —	rayîr — —	ra rê rêge
RABÛN bilindbûn —	wirîste horsaywe horsey	werzayîş warîştîş hêzdayîş	rasewbûn berzepabûn helsan
RAGÎRTÎN	tewqîf	tewqîf	tewqîf
RAKÎRÎN hilgirtin	wergirtey horgirtey	berz kerdîş hewanayîş	laberdin hilgirtin
RAM amac —	ram lênî wey	meram mexsed amac	ram lênî gorî
RAN rehn rêk	ran — —	hêt — —	ran — —
RAST(1) dûrûst —	— dûrûs —	raşt dûrûst —	ras dûrûs saq
RAST(2) tîr qîd	ras qenc —	raşt tîr —	ras qenc qîd
RASTBÊJ — — — —	raswac rase rizin xet qetar	raşt wacox raşt vatox dûrûst — —	raswêj rase rizin xet qetar
RASTBÛN — —	rasew bîyey qencew bîyey horosey	raşt bîyayîş hewl biyayîş hewley	rasewbûn qencewbûn sêxbûn

RAST GOTÎN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
RAST GOTÎN	rasawtey	raştê	ras witin
–	dûrûs watey	raşt vatiş	dûrûs witin
RASTHATÎN	ras beramay	raşt ameyîş	rasewbûn
–	dil ameyî	raşt omeyîş	ras derhatin
–	rêkewtey	leqa yewbin biyayîş	hatine dil
–	werkewtey	–	helkeft
RASTÎ	rasî	raştî	rasî
RASTKIRÎN	rasew kerdey	raşt kerdiş	rasew kerdin
–	hornîşnay	–	–
RAWÊŞANDÎN	–	weşanayîş	şekanin
RAWESTAN	eremdiray	vindertiş	wêsan,
–	–	arisyayîş	ladan
RAY	rawêj	ray	ray
–	–	–	rawêj
–	–	–	ra
RAZ	razê	sirr	raz
sirr	–	–	–
RAZYANE	razyane	sirr limitoxê	razyane
–	rezle	xorînê	–
REF	refe	ref	refe
dereg	–	tereg	balerefe
texçik	–	–	–
REH	rîşe	rîçik	rîşe
kok	retewe	kok	retewe
bineke	binetu	bin	binetu
bineto	turim	reya	rek
resen	resen	–	resen
–	rek	–	–
REHET	asude	asan	asude
–	–	rehet	–

REHETÎ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎÎ	SENENDAÎÎ
REHETÎ	asayîş	asanê	asane
–	weqre	rehetê	berderga
–	star	–	tekye
–	siyaywe	–	–
REHÎN	rehn	rehîn	rehm
girew	barimte	–	barimte
–	–	girew	girew
REJÎDAN	zuxaldan	kûçlan	zuxaldan
rejudan	xeluzdan	–	suxaldan
kûçik	–	–	–
REMZ	remz	zaf limitikî	remz
–	–	pinikî	goşe
–	–	–	dirke
RENANDÎN	rene kerdey	rende kerdiş	rene kirdin
rindandin	–	–	–
RENCBER	rencber	rêncber	rencber
–	–	destirman	–
–	–	–	xerbende
RENDE	rîş	rende	xeraj
rene	–	–	–
RENG	reng	reng	reng
RENGÎN	rengame	rengin	rengîn
–	–	–	rengame
RENGREŞ	reştale	sîyatale	reştal
reşkele	sewze	–	reşkele
–	–	–	sewze
RENÎ	herse	hewrêş	herêş
aşît	–	–	–

RENÎN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
RENÎN terişandin kotin	riş kerdey — —	rende kerdiş taştiş kotiş	rokanin kiranin —
REPÎN xezeb rapîn	qîn cehir —	xezeb — —	qîn cehir —
RESÎM bab rê	resim baw yasa	resim bab —	resim baw yasa
REŞAYÎ tarî tarîfî şevreş	siyawî tarma tapo —	siyayî tarî tariyê —	siyayî tarmayî reşayî —
REŞANDÎN —	pijknay —	pijknayîş rişnayîş	pijanin —
ROŞEKÎ	reşokî	reşokî (yew bêj tîfing)	reşokî
REV silik — —	rem sil tar silme	rem — — —	rem sil tar silme
REVANDÎN silikandin — — — — —	remaywe silkerdey silemaywe tarnay erfanay — —	remnayîş — — — — —	remanin silkirdin lîlemiyanwe taranin rifanin tarkirdin rewdan
REVOK ttor —	sirk tor —	remok remayox revok	sirk tor remok

REWAV

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
REWAC —	rewac birew	rewac —	rewac birew
REWAN xoşçu	weşrewit —	rewan —	rawar —
REWŞ(1) tewrr tterz — — —	resm yasa — — —	tewrr — — — — —	rewş tewrr tterz resm yasa rîwî
REWŞ(2) — — — — —	şîwe çeşn tehr baz deng xeber	wezyet hal hal û hewal — — xeber	şîwe çeşn tehr baz deng xeber
REXT — — —	fîşeklo berg — —	rext — — —	rext berg fîşeklo fanosqe
REZ — —	bax mêwewî baxmeywe	bax rez —	bax mêwsan baxemêw
RÊDA (cayîz)	ricuwa	ca de (cayîz)	rewa
RÊDAN	raday	rayîr dayîş	rêdan
RÊDARÎ rêbirrî	radarî —	rêberî —	radarî radarane
RÊ GÎRTÎN ber girtin	ber girtey —	rayîr birnayîş vernî girotiş	ber girtin —
RÊK	rêk	serraşt	rêk

RÊKETÎN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMLÎ	SENENDAJÎ
RÊKETÎN –	kewtey bi ra cimayre	ray kewtiş ray manayîş	rêketin –
RÊL qorî dehl daristan satar	darsan cengel – – –	daristan qorî dehl – –	darsan cengel – – –
RÊNC (kûla goşt)	like	wesîn	lik
RÊS	pezmîne	rês	peşmîne
RÊŞÎ gûrz	girze lewer	girze tewe	girze lewer
RÊWÎ rêkar	rawyay –	rayan rayon	rêwkar rêkbar
RÊXISTÎN sazkirin –	weseweray – –	rayîr vistiş sazkerdiş rayvistiş	rêketin rêkirdin
RÊZ xet	xet –	xet rêz	xet –
RÊZÎN qetar –	rêzin qetar –	rêze qetar –	rêzin qetar rase
RÎJANDÎN –	micyay mityey	rişnayîş –	rijanîn weranin
RÎJDE (meqarne)	rişte	rişte	rişte
RÎK (îsrar)	rik	rik	rik
RÎND	rind	rind	rind
RÎSQ –	tefaq azuxe	risq –	tefaq azuxe

RİSWA

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
RİSWA tirol	riswa tiro	riswa tiro	riswa tiro
RİŞK	rişk	rişk	rişk
RÎTTAM littam telp têtir dûrd lîm	herhesî — — — — —	dûrdî — — — — —	herekulête lête — — — —
RÎYA —	riya —	riya payedar	riya ruwaletbazî
RÎYAKAR	riyakar	riyakar	riyekar
RÎZGAR azad	rizgar riskar	xelas azad	rizgar riskar
RÎAYET —	rîayet —	rîayet —	rîayet pas
RÎDÎNO — —	rîşdar — —	erîşin — —	rîşo rîşin rîşdar
RÎŞE rih rehe binç —	rîşe bêx rîx, bin, binç kote, binçe	erîş rî — — —	rîşe bêx binetu, bin, retewe, binçe
RÎX ters —	qerseqol sewru sewreqîl	rêx — —	qerseqol senêr las
ROBAR beravî	awbare —	vervay(verê vay) —	cubar deraw
RODÎ rêvî	ruxle —	loqla —	êlexw —

RAST

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
ROHELAT	meşriq	rojhelat	rojhelat
ROHN	tilîz	awên	awekî
ROJ	rocîyar	roj	roçîya
—	wer	roc	xwer
—	weretaw	roz	xweretaw
—	—	—	xwerşî
—	—	—	afîta
ROJANE(yewmîye)	royne	rojane	rojane
—	—	yewmiya	—
ROJÎ	rocî	roce	rojik
ROJ LÊDAN	beremay	roj pirodayîş	rojew bûn
—	werkewtey	—	—
RONAHÎ	ronahî	roşnayî	roşnayî
—	roşnayî	roşnê	—
—	aso	—	aso
—	diruşe	—	diruşe
—	soma	—	soma
RONDÎK	hesrî	hesrî	fîrmîsk
istirî çav	—	estirî	—
RONÎ	roşer	roşin	roşer
ROJNAME	rojname	rojname	rojname
RONÎKIRÎN	roşen kerdey	roşin kerdîş	roşen kirdin
ROVÎ	riwas	lî(lûy)	riwî
ROZÎ	rozî	risq	rozî
—	risq	—	risq
RRUT	rrut	rrut	rrut
rrik	—	—	rrik
tazî	—	—	bêperde

RUMET

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
RUMET — —	awru nigîn bawer	rumet ercîyaye entîke	seng nigîn —
RUN tam —	run tam cerbî	riwen tam —	run tam çewrî
RUNÎ	riwenin	riwenin	runî
RUŞ —	qolteşe —	sextekar zexel	ruş qolşe
RUT xîzan — —	rut rutle qut — —	rut xîzan feqîr — —	rut rutle qut qutel petî
RUV birzik binzik şermga	wer banega şermga —	rumî berzik — —	zehir banega şermga zarga
RÛ serûçav —	rûwe sekut beçek	rî — —	rû sekut beçek
RÛ BÎ RÛ —	rû be rû çene be çene	rî bi rî rî bi rî	rû be rû beraber
RÛDAR cilq çors	rûdar perrû —	awa rî rişayîş bêar —	rûdar perrû —
RÛ DAYÎN	ruweday,qomyay	rî dayîş	qomyan
RÛH	rûh	rûh	rûh
RÛ GÎRTÎN	rû girtey	rî girotiş	rû girtin
RÛKÊŞ (quafûr)	rûkêş	—	rûkêş

RÛNAS

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
RÛNAS	rû nîyas	rî nas	rû nîyas
RÛREŞ	rûsiyaw	risiya	rûreş rûçerek
RÛSÎPÎ	rûçermî	risipî	rûsipî
RÛT	rût	rût	rût
—	qot	qot	qot
—	qotel	—	qotel
—	rûtel	—	rûtel
RÛTÎRŞ	rûdirş	rûtirş	rûdirş
rûçiqirî	luteluteker	rûçiqiryaye	pilulutker

S

SABUN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
SABUN	sabun	sabun	sabun
SADE	petî	sade	petî
pak	pak	pank	pak
paqij	sepol	—	sepol
xwirû	—	—	sade
li xwirû	—	—	—
SAF	sa	saye	sa
—	sayeke	saf	sayeke
SAL	sal	serr/m	sal
SALANE	salane	qezencê serr	salane
SALA TÊ	salê weter	serrna	salêtir
sala bê	—	—	—
SAR	serd	serd	serd
—	çiya	—	—
SARÎNC	—	sarinc	awsark
SÎWARÎ	siwarî	siwarî	siwarî
SAX	sax	sax	sax
xweş	xweş	weş	xweş
—	zîne	—	zîne
SAYE	tapo	saye	tapo
xêr	—	xêr	tarmayî
SAZ(1)	saz	saz	saz
hazir	teyarek	hezir	teyarek
amade	—	hedre	—
xir	—	—	—
SAZ(2)	tan	saz	tan
—	—	tanbur	—

SAZKÎRÎN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
SAZKÎRÎN lêkdanîn	tamîr —	sazkerdiş tamîr	tamîr —
SAZ LÊDAN	sazjay	saz cenayîş	saz lêdan
SEBEB semed sedem esbab	espaw espab — —	sebeb semed — —	espaw espab ewzar —
SEKU dik	seku —	serku dik	seku —
SELÊTE (jinemêra caris) —	selête kawle demzem	cenîya bêar şiltek —	selête kawlê demzem
SEMAWER	semawer	semawer	semawer
SEMÊŞ mêşse sepêşî	mêş seganî — —	meysa kûtikan — —	mêşe sekane sek mekaz —
SENDOQ bikirr — —	sendoq micrî xerîdar hezarpîşe	sinoq sendoq — —	sinoq micrê xerîdar —
SENDOX mişterî	bisîn —	girotox mişterî	bisîn —
SENET	binçax	senet	binçax
SEQETÎ topalî lengî —	topay — — —	topalî seqetî lengayî kûlekî	seqetî topîn (ji bo heywanan) —
SER —	ser ban	ser ban	ser ban
SERAV	seraw	seraw	seraw

SERBÎLÎND

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
SERBÎLÎND serfiraz	serbullen serfiraz	sereberz —	serbullen serfiraz
SERDAN —	ser dayune —	ser bide kerdîş ser piro dayîş	serda —
SERDE merdiwan derence pêlik	peyce — — —	nerduwan nardon derence —	peyce — — —
SERJÊR — — —	serwecêr lêj xiz —	serecêr acêr ver be cêr —	serewjêr serewlêj lêj xiz
SEREJÊRÎ — — —	serewcêrî lêjî xizî —	seracêrî acêrî ver be cêrî —	serewjêrî serewlêjî xizî lêjî
SERENCAM serborî serhatî	serencam — —	— — —	serencam sernixun —
SERÊŞ	serêş	seredej	serêş
SERGERDAN vêleme —	sergerdan tefre tuna	sergerdan — —	sergerden tefre tuna
SERGERM —	sergerm xerîk	sergerm —	sergerm xerîk
SERGÊJÎ	serekêçe	sergêjî	sergêce
SERGÎN peyîn kêle terde	peyne sewro qerseqol(1) —	sergîn silo sil(1) rêx(2)	peyîn — qerseqol(1) las(2)

1) Sergîna hesp.

2) Sergîna ga.

SERHED

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMLÎ	SENENDAJÎ
SERHED	serhed	serhed	serhed
SERHÎLDAN serkeşî	toqe horemay	sere hewanayîş serkêşî	toqe serkeşî
SERÎ tîtalek zîrme poz —	qelepope serpope kel — —	sere lewe serpelik — —	qelepope pope kele perzî ewc
SERJÎNÎK (mêrê jin xwîy)	kinaçlereng —	jino —	jînereng bileknaçî
SERKANÎ serçavî	serçeme —	serçime —	serçawke —
SERKÊŞ	serkêş	serkêş	serkêş
SERMAYE maye	sermaye —	sermaye —	sermaye maye
SERMÎL kolekan	kopan —	serpol —	kohan —
SERNÎVÎŞ sernixwn	serese nunyawe	serenizm sernux	serevkere nixun
SERRAT	keme	serradî	seren
SERRAT KÎRÎN	keme kerdey	serradî kerdîş	seren kirdin
SERSERÎ — — — —	serserî hako nahal newerd çetun	serserî — veradaye mandew —	serserî hako nahal newerd çetun
SÎTARGAH qarargah —	sitargah qerargah hewar	sitaregeh qerargah ware	sitargeh qerargah hewar
SETERENC şetrenc	şetorec şetorunc	setrenc —	şetorinc —

SEWDA

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DİMLÎ	SENENDAJÎ
SEWDA bayê sewdayê	for –	sewda vay sewda	for keleba
SEWUL(1) –	awder kenaw	peyşîyayîş ragnayîş	awder kenaw
SEWUL(2) –	mileka kîye	şîp –	awrêz –
SÊGOŞE –	yeregoşe yerepalu	yerêgoşe hîrêgoşe	sêgoşe sêpalu
SÊL –	binkir sac	dewq/m tewq/m	binkir sac
SÊPÊ sêling	dîspa –	sêpî hîrêling	sêpaye dîspa
SÊŞEME –	yereşeme –	sêşeme yerêşeme	sêşeme –
SÊV	sawî	say	sêv
SÊVİK	sêwe zemînî	sayek	sêva zemînî
SÊZDE –	seyngize –	hîrêş desûhirê	sîyangize –
SÎBE – –	ban serûbanû kelk	siba – –	ban banmal kelk
SÎFRE	sifre	sifre	sifre
SÎKE	sike	sike	sike
SÎLQ çikindir	çunerî –	silq teraw	çuner –
SÎM	sim	sim	sim
SÎMAQ	simaq	simaq	simaq

SÎMÊL

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
SÎMÊL	simêlf	simêlf	simêlo
—	—	zimbêlf	—
SÎNBÎL	simil	sinbil	sûmbûl
—	simletêf	—	simletêf
SÎNDAN ûrsa çilingîr	dezga(hesinî)	dezge(dezgew asinên)	dezga(hesinî)
—	—	—	—
SÎNG (singê kon, singê dîwar) seke	xîxaxur mîxtewle golmîx wawaşî bindes	qazux mihîn	mîxaxur mîxtewle golmîx binkeş bindes hingil axiye
—	—	—	—
—	—	—	—
—	—	—	—
SÎPARÎŞ	sipariş	sipariş	sipariş
—	pinxam	—	siparişt
SÎPARTÎN	esparî	şendiş(bide şendiş)	sipardin
SÎPARTÎ	esparay	şendaye	esparde
—	—	dusnaye	siperde
—	—	—	siperyak
SÎPENG dîlber şeng	şeng	şeng dîlber	şeng
—	—	—	—
SÎRA ssef rêz	qetar ssef rêzin	qat	qetar ssef rêzin
—	—	—	—
SÎST şil	sis şil fil silp	sist	sis şil fil silp
—	—	—	—
—	—	—	—
SÎSTÎ	sisî	sistî	sisî

SÎTEMKAR

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
SÎTEMKAR zorba zalim	zalim — —	zalim zorba —	zalim sitemkar —
SÎTEWR	—	estewr	neşor
SÎTÎL satil	sitil —	sitil satil	sitil —
SÎTUN istun pêşmal — —	koleke paye tîrek şemek —	estun istun tîr — —	koleke paye teje paçke çilmerde
SÎTUR istur qalin	barsayî kolofît qilet	qalind — —	barsayî kolofît qilet
SÎVÎK (merivê sivik) pexme dîn —	sepul pexme serûsepol —	sivik qeşmer dîno —	sepul pexme çil fil
SÎVÎK	siwik	sivik	siwik
SÎVÎKBAR barsivik	siwikbar —	barsivik —	barsiwik —
SÎVÎKÎ	siwikî	sivikî	siwikî
SÎWAR	siwar	siwar	siwar
SÎWAX seya — —	siwax awîye banenaw —	siwax sebox — —	siwax awîye banenaw kagil
SÎWAXKÎRÎN seyandin — —	siwaxday awiyeday nawan goleban kerdey	siwax kerdiş sebox kerdiş sawitiş sawitine	siwax kirdin awîye kirdin — —

SÎWEKAR

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
SÎWEKAR seyandox basewat	sewada — —	siwaxkar siwax kerdox —	basewa xewnewar —
SÎWÎL —	awrêj kîye	—	awrêj, awrêz
SÎWUT faîz	siwu qezanc	faîz —	siwu —
SÎ sih	sey sîber	sey —	saye sîwe
SÎLE şirmaq şileqê — —	şexplaxe çepale çek — —	şemaq şilpa leqmat sîla —	şepale şexplaxe çek zîle şegezîle
SÎNG	palu	sêne	palu
SÎNÎ necem	sînî —	sînî —	sînî —
SÎR	sîr	sîr	sîr
SÎPER senger tapê	senger — qelxan	sîper — —	qîyanpena canepena qelxan
SÎŞÎRK	sîsîrk	karmikê hemamî	sîsîrk, sifrebire
SÎWAN çetir	sayewan çetir	şemsîya —	sayewan çetir
SO —	nijand —	so cis	nijad —
SOBE —	sobe —	sobe —	soba buxarî
SOFÎ	sofi	sofi	sofi

SOLL

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
SOLL pêlav	pala —	sewl çekal	kewş —
SOLL DÎRUN qoşkar	palawraz —	sewlderz koşkar	kewşduz —
SOLE sap puş palax qewş kalik	xamîne pawerî paberî pala — —	sap puş palax — — —	kewş kale — — — —
SPAS	spas	spas	spas
SEPÎDE şefeq	seher —	şefeq —	seher —
SSE kuçik	tute gemal	kûtik —	sek gemal
SSED	ssed	se	ssed
SSÎNÎT pendero	beremu —	ssinît şimma	beremu berje
SSOND	qesem	siwend	qesem
SSOR —	ssor —	sur —	ssor qirmiz
SSORBÛN —	ssorew bîyey kîsnayne	sur bîyayîş sur biyayere	ssorewbûn —
SSORİK SUNE	sorley sune	sorinc/m werdeg	sorîçe sune
SUX qir suxar	alişte — —	qir — —	zuqim — —
SÛNET —	xetene —	sûnet —	sûnet xetene

Ş

ŞABAŞ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
ŞABAŞ	şabaş	şabaş	şawaş
ŞAGIRT berosta	şagirt çakir	şagirt —	şagirt çakir
ŞAHÎ	şahî	şahî	şahî
ŞAHÎN(teyrê nêçîrê)	şahîn	şahîn	şahîn
—	—	hurhur	—
—	—	marrgêr	—
ŞAL şotik(şalê bi qayîş)	şal bêbin	şal —	şal piştewîn
ŞAL piştewan —	şal piştewîn pişt bend	mundî — —	şal piştewîn piştben
ŞAN(şana hingiv) mil	şane —	ş'an —	şan şane
ŞANA HÎNGÎV —	kojawî —	ş'anê hingimênî —	henguje hemuje
ŞANS bext hat — —	amedî bext hat migîyîn nigîn	şans bext — — —	amedî bext hat amew îqbal
ŞAQL	şaqul	şaqul	şaqul
ŞAREZA — —	şareza aşna belet	şareza zanaye —	şareza aşna belet

ŞAX

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
ŞAX	şax	şax	şax
ŞEFEQ nevreqe	şeweq roşnayî	şefeq roşnayî	şeweq roşnayî
ŞEH	şane	şane	şane
ŞEHWET —	şehwet —	şehwet —	şehwet mirx
ŞEKÎL sikum ceneb —	şikil çeşin — —	şikil — — —	şikil çeşin ceneb sequ
ŞEKÎR —	şeker şukir	şeker —	şeker şukir
ŞEL çolax milqot	şel — —	şel çolax —	şel — —
ŞELELE — —	qelwez — —	çirre — —	awşar abşar qelewez
ŞEM roj	şeme —	şeme roj	şeme —
ŞENE narb xifle	lawec xane paroş	narbe xifle xilf	bincil binlik pacoş
ŞEQ(1) rrep —	şeq rep rreq	şeq rrep rreq	şeq rep rreq
ŞEQ(2)(cîraxa zirav) kenare —	serenaz — —	şeq şa/m —	serenaz kenare lakêş

ŞEQDAR

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
ŞEQDAR lûh qûtor	şeqdar birêgedar werîşedar	qosp lûh —	şeqdar birêqedar werîşedar
ŞEQÎL dac	şeqil —	şeqil ebre	şeqil —
ŞER(1)(ezyet)	wey	şer(ezyet)	wey
ŞER(2) qirîn	demqire —	şerr pêrodayîş	şer demqire
ŞERAB	şerab	şerab	şerab
ŞERÎT kindir	tîrînc tîrce	şerît kindir	tîrînc tîlme
ŞERM fedî bor	şerm terêq —	şerm — —	şerm terêq —
ŞERRT pêwist	şerrt —	şerrt —	şerrt mere
ŞEV —	şan —	şan şew	şew —
ŞEVA ÇU	pîreşewê	abîşo	pîreşew
ŞEVANE	şewane	şewane	şewane
ŞEVEKOR —	şewkor —	şewkor —	şewkor gerekor
ŞEVÎN	şewlewer	şevîn	şewlewer
ŞEVŞEVOK çekçekole	şamşemekore —	şewşewik —	şemşemekore —
ŞEVEYE reşî	tarmayî tapo	şîyayî siyayê	tarmayî şewe

ŞEWAT

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
ŞEWAT (şewata birînê) —	cilê —	veşate (veşatê birîn) cile — cil	
ŞEWATA DÎL — —	qirçew dilê kezew dilê kolew dilê	zerr veşayîş zere veşayîş pîze veşayîş	çoqey dil kizey dil koley dil
ŞEWATA LÊDANÊ şelaq —	tuze kize kawê	şewata darb şelaq cay darb	tuze kize kawê
ŞEWQ çiris pirîş —	şewq werîşe zirîwe —	şewq roşnê çiris beriq(beriqyayîş)	şewq werîşe dirîşe berîqe
ŞEYTAN gêw — —	şeytan dirinc — —	şeytan — — —	şeytan durinc ehrîmen* dêw
ŞEYTANÎ	şeytanî	şeytanî	şeytanî
ŞEYTANOK —	şeytankile naxune şeytan	şeytanok goşê şeytanan	şeytanok —
ŞÊLIK	desrêj	şêlik	desrêj
ŞÊN	sewzelanî	şên	sewzelanî
ŞÊWÎR —	pirsura rawêj	mişewriyayîş şêwir	pirsura rawêj
ŞÎDANDÎN —	sift rawêj	şîdênayîş —	sift sext

* Li gor baweriya ola **Zerdûst** (B.M.3000 sal) ,di dinyê da du hêz hene ku herdem bi hevra şer dikin: yek **Hûrmûz** e, yê din jî **Ehrîman** e. **Hûrmûz**, xûdayê qencî, asîman û ronahî ye. **Ehrîman** jî, xûdayê neqencî (nebaşî) û tarîfî ye. Herdem di nav **Hûrmûz** û **Ehrîman** da, yanî di nav qencî (başî) û neqencî (nebaşî) da şer heye. **Zerdûst** alîkarê **Hûrmûz** e. Kitêba wî ya bi rûmet, (Pîroz) **Zend Awesta** ye.

ŞİK

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMİLÎ	SENENDAJÎ
ŞİK dudil	dudilî —	şik guman	dudilî —
ŞİKANDÎN	maray	şiknayîş	şikanin
ŞİKEFT nawûs —	merre — —	zag nawûs mexara	eşkeft — —
ŞİKENCE îşkence — —	şikence — — —	îşkence — — —	şikence eşkele mawîş çiyocîle
ŞİKESTÎ —	mirya qirp	şikyaye —	şikyak qirp
ŞİMŞAT	şimşal	şimşat	şimşal
ŞİMÎTÎN şiqitîn zelîn	xizay xişyay —	sirmityayîş şuşbiyayîş gûvbiyayîş	xizay xişyan xilişkîyan
ŞÎRŞÎR xurxur limlim	çoreçore — —	şirşir xurxur —	çoreçore şoreşore —
ŞÎTÎL —	şetle kane	şitle —	şitle kane
ŞÎTÎLGE cî şitil	yake şitil —	cay şitlî herunda şitlî	cîkê şitil —
ŞÎVAN gavan	şiwan —	şiwane gawan	şiwan gawan
ŞÎYAN berxwedan — —	werge girtey — — —	xwivero dayîş — — —	şîyan berge girtin taw hawirdin tawîşt hawirdin

ŞÎ

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
ŞÎ hêz şîyîn şîn tab	tawîşt hêz werge go —	şê(şênayîş) hêz — — —	tawîşt hêz go hara gêr
ŞÎLAV — — —	paşaraw çilkaw paşuraw —	— — — —	paşaw çilka paruraw paraw
ŞÎN(1) serxweşî tazîye hewarî reşk	şîwen çilkaw paşuraw — —	şîn — — — —	perse çilkaw paraw — —
ŞÎN(2)(reng) — —	awî kewle kewe	mawî kiho —	awî asîmanî kewek
ŞÎNE zîl çixzê zîx —	wec zîl çuze gopke gomîte	zîl zingilok xirxir — —	zîl wec çûze çûzele çekere
ŞÎRE duşav —	şîre duşav —	şîre — —	duşav — —
ŞÎRÊZ debûş — —	deqaq — — —	zemq — — —	deqaq ahar aş şo
ŞÎRÎN ŞÎRÎNÎ	şîrîn şîrînî	şîrîn şîrînî	şîrîn şîrînî
ŞÎŞ sîx zîx	zerg sêx —	şîş sêx —	zerg sêx —
ŞÎT —	şît —	şît vît	şît —
ŞÎWE taswîr ŞÎYAN taw	şêwe — tîn —	şêwe — qebul —	şîwe — tîn tar

ŞIYANDÎN


KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
ŞIYANDÎN henardin	kîyasey —	erşawitiş —	henardin henaryak
ŞOBERBER —	melewan —	asnawber asnawwer	awbaz melewan
ŞOBE asirm bapêş	peşukiyan şêwyay —	serd girotiş asirm —	peşukiyan şêwyay jilwiyan
ŞOLEXÎ hengame —	hera koban —	gurrî hayagumî grmî	hera koban helela
ŞOP rêç şun —	yakepa — — —	şop rêç herund/m —	ciyê pa pey şun eter
ŞOR(1)	solin	solin	şor
ŞOR(2) nesaxî	şor —	nêweşî —	şor —
ŞORAW şorak avxwey	paşore — —	solaw — —	paşore — —
ŞORBEŞÎR	şitbirinc	şitbirinc	şîrbirinc
ŞOREŞ werger — — — — — — —	xoroş gelekome aşup peşîwe şerûşor bişîwe ajawle aşu —	— — — — — — — —	şoriş gelekome aşup peşîwe şerûşor bişîwe ajawle aşu xoroş
ŞOREŞGER	şeraşu	—	şeraşu

ŞOREŞGERAN

KURMANCÎ	HEWRAMÎ	DÎMÎLÎ	SENENDAJÎ
ŞOREŞGERAN	pêşune	—	pêşune
—	weyşume	—	weyşume
—	kolebine	—	kolebine
—	koleweywa	—	koleweywa
ŞUJÎN	goçewenî	goçîn	suzin
ŞUM	şum	bêxêr	şum
bêoxûr	weyşûm	bêoxûr	weyşum
xerab	—	xerab	xerab
—	—	bêyom	—
ŞUN	şunî	herund	şun
nîşan	wirg	nîşan	su
eser	—	eser	eser
şop	—	şop	alk
rînc	—	—	mahek
ŞUŞE(şuşa avê)	lîwan	şuşa aw	lîwan
—	awwerî	—	awxwerî
—	kuzele	—	kuzele
—	—	—	kilîne
ŞUŞTÎN	şitey	şitiş	şitin
—	—	—	şordin
ŞUŞTÎ	şorya	şite	şoryak
ŞUV	şum	filhan	şêf
—	—	—	çift
—	—	—	hêş
—	—	—	wirde

DOSYA ROMANA KURDÎ:

MEHMED UZUN



Romannivîskarê Kurd Mehmed UZUN

ROMANA KURDÎ

Naci Kutlay

Min du-sê sal berê li ser romana Kurdî ev çend rûpel nivîsî lê belê pey vê xebata min, çend romanên din jî hatin weşandin. Çendên wan min xwend û hinek jî agahdar bûm. Demeke pêş de, meriv dikare derheqê yên van ên dawiyê jî binvîse.

Ez pir xemgînîm kû li ser romanên Kurdî nikarim pir tiştan bêjim. Di vî warî de xebardan wisa ne hêsa ye. Ji ber kû hejmara romanên Kurdî ne zêde ne. Em Kurd di warê edebiyata nivîsandî de pir ne dewlemendin, nemaze di rewşa romanên Kurdî de hêjî paş ve mane. Min dixwest kû di prosesa edebiyata Kurdî de cîyekî fireh bidim romanên û li ser vê babetê bikaribim hêjî zêde bipeyivim. Lê hêvîdarim kû ew demên bîn, romanên Kurdî yê her zêde bibin û salên pêş de Kurd dê firsetên fireh bibînin û minaqeşe bikin.

Yên kû ez zanim romanên Kurdî berê 1935'a çap nebûne. Li Erîvanê romana *Erebê Şemo*, "*Şivanê Kurd*" 1935'an de hat weşandinê. Pirtûkên din, wek *Mem û Zîn*, *dîwana Melayê Cizîrê* û afrandinên olî hatibûn çapkirinê, lê romanên Kurdî negihîştibûn xwendewanan.

Berî hertiştî, ez dixwazim di vî warî de çend pirsan bêjim. Min gelek caran ji xwe û hevalan pirsî, gelo çima helbest, çîrok û pirtûkên dinî hatin nivîsandinê, lê belê roman nivîsandin awqasî pêş de neçû?

Bi dîtina min çend sebebên girîng hene. Yek, ew hemû dewletên kû Kurd tê de dijiyan, Kurdî nivîsandin ne serbest bû. Li Turkiyê qedexe bû, li Îran û Sûrîyê dem dem pir zehmet bû û li Iraqê her hêsan bû. Di vê rewşê de zimanê Kurdî firsetên pêşde çûyinê nedît. Enstîtû, çapxane û pirtûkxanên taybetî tunebûn. Lewra jî zimanê Kurdî, nemaze di nav Kurdên kû li Turkîyê dijîn, qels ma. Roman nivîsandin zimanekî dewlemend dixwaze. Meriv xwestinên xwe dikare bîne ser ziman, lê, teswîr, îfadekirina bi cî û tem, zimanekî her dewlemend dixwaze. Wisa nebe, tem û leze-ta afrandinan kêma dibe. Wek xwerineka bê xwê, bê tem, pêre kêfa meriya nayê. Kurdî bi xwe zimanekî dewlemend e, lê di nav xwendîyan de feqîr maye. Di bajaran de Kurdî bûye zimanê çarşî û bazarvaniyê. Ev ziman têra pêvîstiya jiyanê dike, lê her sal û her çûyî di hêlekê de jî feqîr bûye. Bo afrandinên çandî û edebiyatê ev Kurdiya me ya kû li bajarên Kurdistanê de tê xebardan, têrê nake.

Tiştêkî din jî heye, roman nivîsandin û xwendin karê civateka pêşde çûyî ye, xwendayên wî welatî gerekê zêde bin, ji xwendinê hez bikin. Gere em qebûl bikin kû, civata Kurdî di vî warî de gelekî şûn ve maye.

Jimara xwendiyân, di van salên dawî de hinekî zêde bûn. Hetanî meriv gelekî û him jî gele gelekî romanên nexwîne, bi xwe nikare roman binvîse. Mêjî gerek bi roman xwendinê têr bibe, tijî bibe, wê çaxê demekê, meriv bi xwe jî dikare tiştên nû bîne holê. Lewra, ez têdigihêjim kû çima romanên Kurdî kêmtir in.

Ez dixwazim bêjim kû, gelek astengên me yên din jî hene, ezê tenê wan binim bîra we.

Em Kurd cur be cur elfabeyan kar tînin. Taybetî Kurdên Turkiyayê herfên elfaba Erebî nizanin, ji ber vê yekê, ew romanên kû Kurdên Îranê, Sûriyê anjî Iraqê nivîsîne, em nikarin wan bixwînin. Bi vî tehrî yên Sovyetîstan a berê jî, bi tîpên Krîlî ne. Her çiqasî jî Kurdên Îran, Iraq, Rûsyayê û Sûriyê tîpên latînî bizanibin, dîsa jî zehmetiyê dikişînin, bi tîpên latînî re pir kêfxweş nînin.

Xênjî van zehmetiyan, em dizanin kû, niha Kurd li hemû welatên Avrûpayê bela bûne, li wan deran bi halê penaberiyê de dijîn. Hinek ji van Kurdan roman anjî pirtûkên din dinivîsin. Lê belê pirtûkê belav kirin di nav Kurdên Avrûpayê de nehatine organîze kirin. Lewra jî, romaneka Kurdî li van welatan kû çap dibe, dereng anjî qet nagihêje destê Kurdên kû welatên din de dijîn. Caran haya meriya jî qet pê nabe. Ev hal bi serê xwe astengeka mezin e.

Di nav van astengiyan, yek jî eve kû, di Kurdî de zaravên me yên cur bi cur, ji hev dûr in. Yê kû Soranî, Kurmancî anjî Zazakî (Dimilî) binvîsin, gelekî ji hev fêmtir nakin. Zaravên romanên girîng e, dema kû meriv wî zaravî baş nizanibe, meriv tem û xweşiya romanê hilnade. Kêfa meriya pêre nayê. Bo xwendin û nivîsandinê gere meriv wî zaravî baş bizanibe.

Kovarên li ser edebiyat û çanda Kurdî, yên merkezî kêmtir in. Ev kêmasiyeke mezin e. Yên heyî jî bi heremîn e, nagihêjin destên pir xwendewanan. Lewra jî gelek xwendewanan jî romanên çapbûyî bêxêber dimînin. Di vî warî de înstîtu û rêxistinên kulturî kêmtir in û hewcedariyê nikarin binin cî.

Zimanê Kurdî bi rîtm û dengê xwe ve, ji bo helbestan gelekî baş e. Yekê jî, tradîsoyna helbest nivîsandinê di nav Kurdan de pir kevn e. Bi çend sed salan vir de helbestên devkî hatine gotinê û nêzîkî 7-8 sed salin kû helbestên nivîsî di edebiyata Kurdî de cîh girtiye. Ji bo wê jî, helbest nivîsandinê her hêsa ye, em Kurd him jî bo aheng, rîtm û dengên wê yî kû hez û kêfê dide însanan, gelek helbest hatine nivîsandin. Kêmtir kesan berê xwe dane nivîsandina romanên.

Lê belê, gere em tu carî bîrnekin kû ji bo van kêmasî û astengan yek çare heye, ew jî her zêde Kurdî bixwînin û binvîsin.

Van zehmetî û astenga, yek ji nivîskarên Kurdên Sovyetîstan a berê, Çerkezê Reş di pêşgotina romana *Elîyê Evdirrehman* "*Şer Çîyada*" bi vî tehrî tîne ser ziman: "...Pirs ewe, wekî romanê janra lîteraturîyê ye herî giran, çetin û sexte."

Hine nivîskar bi eslê xwe ve Kurd in, lê, afrandinê xwe bi taybetî Tirkî, Farisî, Erebi, Rûsî anjî bi zimanekî din nivîsîne. Naverokên van berhemên di derheqê Kurdan de bin jî, wek edata dinê, ev kesan û ev pirtûk û romanên “berhemên Kurdî” nâyên qebûl kirin. Nivîskarên wisa, yên bi gelek giranbiha di wan hemû welatên kû Kurd tê de dijîn hene. Ne hewceye em yek yek navên van hunermendan bêjin. Lê ev hevalên bêhempa, bi qedr û qîmet in, bi kîjan zimanî nivîsîne bi wî tehrî “nivîskar” tên qebûl kirin.

Di jiyana hemû gelan de demek hatîye, pirsên civakî, yên gundîtiyê li pêş hemû pirsan ketiye. Ji ber vî sebebî, ev babet, gundîtî di romanên da cîh girtiye. Lê jiyana kû hatiye guhartin û ber bi bûrjûwaziê - bazarvaniyê- çûye, vê guhartinê xwe di hemû curên edebiyatê de nîşan daye, her wisa, di romanên de jî. Ev naverok guhartin ne bi xwestina me dibe, ji ber zordayîna jiyana ev bûyer pêk tên. Bi ya min, ev tişt wê di edebiyata Kurdî de jî wisa bibe. Ana durîfê “gundîtî” yê li ser edebiyata Kurdî ye. Meriv ku li roman, çîrok û helbestên Kurdî dinêre, vê rastiye dibîne. Hela edebiyatê bidin alîkî, babeta gundîtiyê xwe pir alî ve nîşan dide. Hûn navên me yên “anonîm” binihêrin, “Gundî, Gavan, Şivan, Çiya, Berxvan...” navên herî zêde ne. Ev tiştêkî pir normal e kû edebiyata me jî demeka dûr-dirêj wê “gundî” be.

Civat kû pêş de diçe, meriv hêdî hêdî ferq dike kû lîteratura wê civatê jî, ne bi lez be jî, pêş de diçe û tê guhartinê. Îşaretên guhartinê di nav edebiyata Kurdî de xwe dide xuyakirin. Guhartina edebiyetê di pey guhartinê civatê xwe nîşan dide.

Lê bi pîvanên navnetewî ve, ez romanên Kurdî qels dibînim. *Rohat*, ji bo Kurdên kû kîmesî 20 mîlyon in û meriv tenê dikare navên qasî 20 romana bîne ser ziman, wêya kîmasîke mezin dibîne. Lê dîsa jî di kovara “*Nûdem*”ê de pêşerojên gelekî tarî nîşan nade.

Nivîskarê romana “*Labirenta Cinan*” *Hesenê Metê* di hevpeyîvîna xwe ya di *Nûdem*’ê de, di vî warî de awha dibêje: “...Kê zêde romana Kurdî jî di rewşa çîroka Kurdî de ye...” “... Em vegerin ser romanên xwe. Min berhemên hêja bi Kurdî jî xwendine. Lezeta roman û novelên kû min ji pênûsên biyanî girtiye, di berhemên Kurdî de jî ez rastî wan lezetan hatime. Lê mixabin, hebûna nivîskarekî û romaneke bi vê lezetê ji bo min têr nake kû ez behsa romana Kurdî bikim û bidim ber romanên navnetewî...”

Yekî kû di nav Kurdan de pirtir roman nivîsiye, *Memed Uzun* e. Ew di vî warî de rojên pêş ronahî dibîne.

Ez dikarim bi kurtî hinekî jî qala van romanên kû min bi destxistine û xwendine, anjî yên kû derheqê wan de zanadariya min heye, bikim.

ROMANÊN KURDÊN SOVYETÎSTANA BERÊ

Ez dikarim bi taybetî çend xûsûsiyetên wan nivîskar û romanên wan bêjim. Gelekên wan Kurdên Osmanî bûn û piştî Şerê Dinyayê yî Yekemîn

ji Kurdîstana Tirkîyayê, derdora Qers'ê, Wan'ê û wîlayetên din revîbûn, çûbûn Ermenîstan û Gurcîstanê. Hema gişt ji Kurdên Ezdî ne. Serpêhatiyên xwe de dibêjin kû, "em ji ber zora Romê revîyan." Naveroka berhemên wan gelek cara li ser wê demê ye. Piştî wan rojên bi birçîbûn, rev û qirbûnê, di bin rejîma sosyalîzmê digihêjine jiyaneka bêtirs û baş. Dibistanên Kurdî de dixwînin û radyoyên Kurdî guhdarî dikin. Piraniya romanên wan di vê naverokê de nin. Wek nivîskarên din li Sovyetîstanê, ew jî sosyalîzmê meth û sena dikin. Bi ya min di vî warî de hinekî jî pêş de biçin û wê çaxê lezeta van romanên kêm dibe.

Lê ev êşkera ye kû, romanên Kurdî berê pêşîn bi destên Kurdên Sovyetê tînê nivîsandin. Yê herî ewil jî *Ereb Şamîlov* e. Ji bo wî gelek kes "Bavê romanên Kurdî" dibêjin.

Romanên Erebb Şamîlov:

Di romanên xwe de xezanî, feqîrî û jiyana Kurdên wê demê -salên piştî Şerê Dinya yî Yekemîn- tîne pêş me. Bindestî, feqîrî, rojên reş û dîsa di wê demê de dilsaxî, azadî û hêvîkirinê wek sêveka tîrş bi me dide xwarinê. Romana wî ya ewlîn, "*Şivanê Kurd*" e. Serpêhatiya nivîskar bi xwe û rewşa Kurdan di romanê de bi hev re diçe. Roman li Erîvan'ê sala 1935'an de çap bû. 1978'an de li estenbol'ê hat weşandin. Paşê Şivanê Kurd bi navê "*Berbang*" dîsa li Erîvan'ê, 1959'an de çap bû. Roman serpêhatiya *Ereb Şemo* ye.

Romana "*Jîyana Bextewar*" û "*Hopo*" li Erîvan'ê 1969'an de di "Beravok"ê de çap dibin. Kurdên koçer ji Tirkîyê çawa direvin tîne Sovyetîstanê û paşê rojên genc dîlşayiyê dibînin, naveroka van romanên e. *Ereb Şemo* behsa jiyana nû, pêş de çûyin û avakirina sosyalîzmê dike. Romana wî ya çara "*Dimdim*" 1966'an de dîsa li Erîvan'ê çap dibe. Romaneka dîrokî ye. Li Kurdîstana Îranê *Ebbasê Duyem* re şer dike. Kurd di kela *Dimdimê* de, Îranî ava wan dibirin, lê jin, bûk û mêr heta mirinê ber xwe didin. Romana *Dimdim* li *Swêdê* sala 1983'an de dîsa çap bû.

Elîyê Evdirrehman

Romana "*Xatê Xanim*" 1958'an de hate weşandin. Li ser kurdên Tirkîyeyê hatiye nivîsandin. *Xatê Xanim* Dêrsimî ye, mêrê wê kû dimre, wek mêran eşîra xwe rêva dibe û dijî dewletê şer dike.

Romana "*Gundê Mêrxasa*", dîsa rewşa Kurdên kû li Tirkîyayê piştî şerê Şêx Seîd penaber bûn hatin Sovyetîstanê, pêşberî xwendewanan dike. 5700 mal mihacir dibin. Di Sovyetîstanê dergê xêrê, xweşiyê, xwendin û pêş de çûyinê dibînin. Lê bi ya min di vê romanê de Eliyê Evdirrehman xwe dike zehmetîke giran, dema kû *Xezal* a keça serokê eşîrê dike komînîstê ciwan -*komsomol*-, bi destê wan rêxistinên sosyalîstî pêşberî xwendewanan dike. Ev roman jî li Erîvan'ê, 1968'an de çap bû.

Romana “*Şer Çiyada*”, 1989’an de li Erîvanê hat weşandin. *Eliyê Evdirrehman* ji bo naveroka vê romanê bi xwe dibêje kû: “...Eva nemaze li ser şerê Kurdan, di nav salên 1928-1930’an li bereka *Girîdaxê* ye, wekî Kurdan nava wan salan da li pêşa *Girîdaxê* şerekî çawayî giran danîne...” Meriv ji nivîskar û pêşgotinê fêr dike kû gere ev roman du pirtûk bin. Di ya duemîn de li ser rêvabirên Şerê *Girîdaxê Îhsan Nûrî û Biroyê Hesikê Tellî* bihata nivîsandinê. Lê mixabin ev pirtûk derneket û nivîskar çû ber rehma Xwedê. Qehremanê yî sereke di romana *Şer Çiyada Şêx Zahir* e. Min bi xwe jî derheqê *Şêx Zahir* de gelek tişt bihîstin. Meta min *Besê* di nav Şerê *Girîdaxê* de bû, her tim qala *Şêx Zahir* û *Simbil*’ê dikir. *Simbil* qîza *Mehmûd Begê Torina Mala Kose* bû. *Şêx Zahir Simbil* bi zorê revandibû. *Simbil*’ê ev yek qebûl nekir û xwe bi tivinga *Şêx Zahir* kuşt. Wê demê meta min jî li wir bû. Ev bûyer di romanê de tunin. Roman *Şêx Zahir* bi tehrekî din nîşan dide. Bi ya min ev şaş e, xeletî ye.

Di romanên dîrokî de meriv “şexsan” û “qehremanên romanê” nikare bi tehrekî din nîşan bide. Taybetî qehreman kû di nav xelqê de yekî nas be, meriv nikare şexsiyetê wî biguhurîne. *Şêx Zahir* nexwendibû, li hêla *Qersê* û *Girîdaxê* bû. Di romanê de yekî xwendî ye hezkirîya xwe, li Wan’ê jî dibistanê hildide, tên *Girîdaxê* û bi tev şer dikan. Ya din, *Eliyê Evdirrehman* di romanê de Kurdan gelekî qehreman nîşan dide û *Tirkan* bi zanebûn nebaş pêşber dike, lê dawî yê de nikare bo serneketina Kurdan re sebebên taybetî bibîne... Hêlek bi sîlah û jimar zêde ne, bi top û balafir in. Lê di romanê de Kurd wisa qehreman in kû meriv tênağihêje kû çima Kurd bindikevin.

Nivîskarê ezîz *Eliyê Evdirrehman* di 1984’an de di hevpeyivîneka xwe de eşkere kir kû li ser romanekê kû bi navê “*Murtule Beg*” dixebite. Lê mixabin kû em nîzanin ev xebata çi bû. Ji bo *Murtule Beg*’ê nivîskar, “çawa tê zanîn ew xweşmêrê navça *Mûksê* bû...” dibêje.

Romana *Hecîyê Cindî “Hewarî”* di sala 1967’an de li Erîvan’ê çap bû. Di vê romanê de jî naverok ew Kurdên kû ji Tirkîyayê koç dikan û diçin Êrîsetê nin. Belengazî, zordestî û tedaya kû dibînin, bi zimanekî zelal hatîye nivîsandin.

Romana *Seîdê Îbo “Kurdên Rêwî”* jî li Erîvan’ê sala 1981’an de ket destên xwendewanan. Çawa min di destpêkê de gotibû, ev roman jî qala Kurdên ji Tirkîyayê direvin diçin Êrîsetê û Sovyetîstanê dike. Kurdên bêsitar, mal-milkên xwe, hemû tiştên xwe bi cî de dihêlin, dixwazin xwe xelasbikin. Paşê tevî avakirina Sovyetê û jiyana nû dibin.

Romana piçûk “*Dê û Damarî*” bi alîyê *Egîdê Xudo* hatiye nivîsandin. Bi ya min gelek heyfe kû vê romana modern, bi naveroka xwe ve pirr dewlemend, pedagojîk û felsefî, bala xwendewanan zêde nekişandiye. Di Şerê Dinyayê yî Duemîn de xelqên Sovyetîstanê bi dil û can diçin tevî şer dibin. Dê û bavê *Aleksander -Kurd* jî wî re *Îsko* anjî *Îskender* dibêjin- jî diçin şer û *Îsko* zarokê çend mehî ye, di gundekî Kurdên Êzdî de mezin dibe. Hebûna dê û bavê xwe nizane û wek yekî Kurdên

Êzdfî dijî. Di romanê de diya *Îsko* ya rastî û diya wî ya Kurd bi dîtînen însanî û terbiyetên modern pêşberî me dibin. Roman li Erîvanê 1986'an de çap bû û îsal bi tîpên latînî li Swêd bi tevî pirtûkên Nûdem'ê hat weşandin.

ROMANÊN KURDÊN SÛRÎYÊ

Romana *Bavê Nazê "Çîyayên Bi Xwînê Hatine Avdan"* anjî "*Çîyayên Bi Xwîn*"; ev roman cara pêşîn ji Kurdî hatiye wergerandinê û Erebfî çap bûye. Paşê ji Erebfî, bi Rûsî hatiye wergerandin û 1981'an de li Moskova'yê çap bûye. Prof. M.S.Lazaref pêşgotineka giranibiha nivîsiye. *Bavê Nazê* bi eslê xwe ji hêla Merdîn'ê ye, di vê romana xwe de asteng û problemên Kurdên wan herêman nîşanî me dide. Xortekî cotkar, hişyarbûna însanan, xwestina jiyaneka nû û pêş ve çûyî xwe pêşdar dike. Qehremanê romanê Çeto, di civatê de, gundîtî û bajarvaniyê, olperestî û kevneperestiyê datîne pêş me û li pey nûbûnê digere.

Romana duemîn ya Bavê Nazê, "*Stokholmê Te Çi Dîtiye Bêje*", piştî kuştina serok wezîrê Swêd *Olof Palme* hatiye nivîsandin. Di romanê de *Bavê Nazê*, gelek gotinên pêşyan û fikrên gelêrî tîne bîra me. Qala gelek dîtînen felsefî tê kirinê. Biyanî û Swêdî bi çî tehrî difikirin gele caran, ew cuda dîtî û çandên cuda li ser însanan bi çî tehrî tesîr dikin, em di vî warî de digihêjin çend xeleqên nû.

Çi heyf kû, ji ber sebebên kû min di rûpelên berê de gotibû, ez kêman roman nivîskarên Kurdên Sûrîyê nasdikim. Wisa tê xuyanê kû jimara wan ne pirr in. Yên kû min bîhistine, lê belê romanên wan nexwendine, yek *Azad Bavê Şehîn e*, romana "*Yên Perîşan*" nivîsiye û ev roman 1991'an de li Beyrût'ê çap bûye. Yê din jî Xemgîn Temo ye. Vî hevalî jî romana "*Pala Bê Şop*" nivîsiye.

ROMANÊN KURDÊN ÎRANÊ

Ez gelekî li ber xwe dikevim û xemgîn im kû ez nizanim Kurdên Îranê çî roman nivîsîne. Tenê haya min heye kû *Rehîmê Gazî* romanek bi navê "*Pêşmerge*" nivîsiye.

ROMANÊN KURDÊN ÎRAQÊ

Ez dixwazim rexnekê li ser Kurdên me yên Îraqê bêjim. Ev 75 salin, mecala wan bi Kurdî nivîsandin heye û dibistanên Kurdî û dezgehên kulturî hene. Gelek rojname, pirtûkên helbestan û dîrokî hatine nivîsandin. Lê belê roman di nav wan de pêş de neçûye.

Romana "*Jana Gel*" bi aliyê Abûqat, nivîskar û sîyasetvanê bi nav û deng *Îbrahîm Ehmed* hatiye nivîsandin. *Elî Şêr* ev romana Soranî wergerandiye Kurmancî û 1992'an de li Stockholmê çap bûye. Nivîskar

Sebrî Botanî, di kovara Nûdem, hejmara 9'an de dinvîse kû: "...Lê her çawa be, lê mala Elî Şêr ava be kû wî pirtûk ji Kurdî wergerandiye Kurdî..." Nivîsarê romanê *Îbrahîm Ehmed* di hevpeyvînekê de qala romanê dike: "...Min rast û rast nikaribû behsî gelî Kurd û Kurdistanê û raperînên wê bikim. Ji ber kû qedexa bû. Loma min bi mebesta Kurdistanê di romanê de behsî şoreşa Cezayîrê kir, mîna kû bûyer û hedîse li Cezayîrê dibihure û min roman pêşkêşî şoreşgerên Cezayîrê kir..." -Kurdîstan Press, hejmar 89-

Îbrahîm Ehmed 20.06.1969'an de dibêje kû, "Di Nîsana sala 1956'an de min dest bi nivîsandina vê romanê kir." Ji ber sansora rejîma *Nûrî Seîdê* kevneperest û polîsên wî, *Îbrahîm Ehmed* "cî, wext û navên qehremanên romanê" eşkere nekiriye.

Bi alî serpêhatiya qehremanê romanê Camêr, em pirr tiştan hîn dibin. Hîşyarbûn, heps, îşkence, demonstrasyon û hêzbûyîn... Halê siyasî, aborî û civakî wek neynikekê tên pêş me.

Di van salên dawiyê de kek *Îbrahîm Ehmed* romanek din nivîsî, di van nêzîkiyan de çap bûye. Bi zaravê Soranî ye. Lê çi heyf, ez derheqê vê romanê de nikarim tiştêkî bêjim. Navê wê jî nizanîm.

Huseyîn Arîf, zêdetir çîrokan dinivîse, lê romanek bi navê "*Şar*" jî nivîsiye. Roman qala civata bajarê Slêymaniyê û dîroka vî bajarî dike.

Mihemed mukrî jî romanek nivîsiye û navê wê "*Herest*" e. Naveroka romanê li ser Şoreşa *Mele Mistefa Berzanî* ye. Min ev herd romanên dawiyê nedîtin û nexwendin. Bi tîpên Erebi ne û Soranî hatine nivîsandin. Ev astenga girîng mecal neda kû ez wan bixwînim.

ROMANÊN KÛ KURDÊN TURKÎYÊ NIVÎSÎNE

Waxta meriv qala roman nivîskarên Kurdên Turkiyayê dike, berê pêşîn *Memed Ūzûn* tê bîra meriya. Li ber sebebên kû min di destpêkê de qal kiribû, nivîsandina romanên Kurdî li Turkiyê pirr dereng destpêkiriye.

Eger şaş nîn bim, ya herî ewlîn, romana *Memet Ūzun* bi navê "*Tu*" ye. Memet xwastiye romanê bi curekî modern binvîse. Lewra, ne bi tehrê klasîk e romana "*Tu*". Rewşa xelqê me Kurda kû li gundên derdora *Sîweregê* dijîn, tên ser ziman. Nûbûn, dîtînen felsefî dike tev. Romanê bala gelek kesî kişand, lê ne bi tehrê romanên kû heta niha Kurdan xwendibûn, lewra bi gelek kesan re jî "ecêb" hat, lezet û tem jê negirtin. Îşkence û ruhiyeta girtîkî tê analîz kirin. Roman 1984'ande li *Stockholmê* çap bû.

Lê *Memed Ūzun* xebatên xwe yên li ser roman nivîsandinê her pêş de bir. Naverokên romanên xwe ji kesên dîrokî yên Kurdan digirt. Wek li ser jîyana Dengbêjê bi nav û deng *Evdalê Zeynikê*, Sekreterê *Xoybûnê Memdûh Selîm* û hîmdarê elifbaya Kurdî ya latînî, zimanzanê mezin *Celadet Bedirxan* roman nivîsî.

1987'an de romana Mehmet Ûzûn ya duemîn dîsa li Stockholmê çap bû. Navê wê, "*Mirina Kalekî Rind*" bû. Di vê romanê de kultûra Kurdan, ya nesla kevn û nû tîne pêş hev. Ev herd çîn bi hev re şerekî bêdeng dîkin... Memed Ûzun, tradîsyona kevn û nû nîşanî me dide. Tradîsyona nû bi çi tehrî dixwaze li ser bikeve? Xetatekî kal, qehremanekî romanê ye. "Kalo" û qehremanê din yê ciwan jî *Serdar Azad* e. Kalo yê xetat afrandinê *Melayê Cizîrê* bi destên xwe yên hunermend neqîşandiye. Dawiyê de hatiye li gundekî de cî bûye. Wek yekî penaber e. Bilûrê, tebîetê, rindiyê û başiyê hez dike. Di roman de halê penaberiye, mihaciriyê tê analîz kirin. Meriv halên wanên hîssî û ruhî dixwîne.

Di van herd romanên Memet Ûzun de taybetî hinek kes û bûyer ne zela in. Lê di romana xwe ya sêemîn de ji "anonîmî"yê derdikeve, her tiştî eşkere û zela dide pêş me. Romana sêemîn, "*Siya Evînê*" ye. Qehremanê romanê *Memdûh Selîm* e. *Memdûh Selîm* ji hêla Wanê ye. Li Etenbolê ronakbîr û welatparêzekî Kurd e. Paşê, dema kû Cûmhûriyeta Tirkîyê ava dibe, diçe li Sûriyê cî dibe. Kesekî modern e. Yek ji hîmdarê *Xoybûn*'ê ye. Li wir keçeka Çerkez hez dike, lê wê demê berê xwe dide Araratê –Girîdaxê–, tevî *Şoreşa Araratê* dibe. Piştî belavbûna *Şoreşa Araratê* vedigere. Lê dibîne kû keça Çerkez bi yekî din re zewiciye. Di romanê de rewşa ciwata Kurd, rêvabirina *Şoreşa Araratê* û evîna keça Çerkez xweş hatiye pêç xwendewanan.

Romana Memed Ûzun ya çaremîn, "*Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*" ye. *Evdalê Zeynikê* dengbêjekî gelekî bi nav û deng e. Ji derdora araratê, *Elaşgir*, *Qereyazî*, *Milazgir* û *Dutax*'ê ye. Bi tehrekî din kû ez bêjim, *Evdalê Zeynikê* hembajariyê –hemşehrî– min tê hesab kirinê. Em serhedî, derheqê wî de gelek tiştan zanin. Bi kurtayî dikarim bêjim, ew qurna 19'an de jîyaye. Dengbêjê *Surmeli Mehmed Paşa* bû. *Surmeli Memed Paşa* li *Elaşgir*'ê –Topraqqelê– rûdinişt. Begê Serhedê yî mezin bû. Bi eskerên xwe ve çû alîkariya Siltanê Osmanî kir li Kozan'ê, şerê Kozanoxlî kir. Li ber germa Edenê pirr kesên wî qir bûn. Kilama "*Li Xozanê...Li Xozanê*" li ser vê bûyerê ye. Dengbêjekî navdar, navê wî *Silê*, xelqê Dîyarbêkrê re bi kilaman ve ber hev didin, dikevin lecê. Ava reş tê li ser çevên *Evdalê Zeynikê*. Demeke dûr–dirêj *Evdalê Zeynikê* êdî nabîne. Navê kurê wî Temo û jina wî Gulê ye. Qulingekî topal û bask şikestî xwe re dike heval û quling pak dike. Kilamên xwe li ser "Quling, Temo, Gulê û tebîetê" gotiye. Di romanên Yaşar Kemal de, pirr caran qala *Evdalê Zeynikê* tê kirinê.

Lê di romana Memed Ûzun de qala bûyerên *Surmeli Memed Paşa* û şerê Kozan'ê nayê kirin. 1935'an de yên kû kovara *Hewar*'ê derdixin, du bira *Celadet* û *Kamûran Bedirxan Beg* dixwazin kû hevalên wa yî dengbêj *Ehmedê Fermanê Kîkî* qala *Evdalê Zeynikê* bike. Ev bûyerên romanê ji alî *Ehmedê Fermanê Kîkî* hatine gotinê. Roman nîşan dide kû "edetên dengbêjî ye" gere bijîn. Ji bo vê hewildanek heye. Ji dema *Evdalê Zeynikê*

heta bê bigihêje Ehmedê Fermanê Kîkî, çi guhartin bûye û van edatan çi tehrên nû girtine?

Lê ez dixwazim tiştêkî din bêjim, di romanên dîrokî de, dema kû jiyana kesên bi nav û deng tîne nivîsandin, gere meriv van şexsan bi raste rast bide pêş xwendewanan. Zêde an kêr kirin neheqî ye.

Bi kêfxweşbûn haya min bû kû Memed Êzîz romaneka pêncemîn nivîsiye, yê li Turkiyê çap bibe. Naveroka romanê, jiyana Celadet Bedirxan e û navê wê, “*Bîra Qederê*” ye. Tê zanîn kû Celadet Beg li Sûriyê bîreka avê dida kolandinê, ew li cem bîrê bû, erdê bîrê kû hulweiya, Celadet Beg birîndar bû û çû ber rehma xwedê. Di vê romanê de jiyana Celadet Begê, dîroka malbata Bedirxaniyan û dawiyê de çilo ji dîrokê radibin, tê pêşber kirin.

Romana *Mehmûd Baksî “Hêlîn”* li Stockholmê 1984’an de çap bû. Serpêhatiya Hêlîn’ê, ya qehremanê romanê, bi zimanekî xweşik hatiye nivîsandin. Ji ber zordestiyê, malbata Hêlîn’ê, ji Turkiyê, bi sînoran ve direvin diçin Lubnan’ê û ji wir jî diherin Swêd’ê. Roman bi kêfa dilê ciwan û xortan e. Tirs, zehmet û xeterên li ser sînoran pirr baş tê tesfîr kirin. Rohat, van beşan “edebiyata li ser sînoran” qebûl dike.

Romana Mehmûd Baksî, ya duemîn, “*Gundikê Dono*” ye. Dora 1950’an, traktor û motor kû dikevin gundên Xerzan, jiyana jî tev li hev dibe. Şerê gundî û axan zêde dibe. Di vê romanê de ev meselên nûhatî tîne pêş me. Rewşa jinan, ya zahmet û zewaca wan a bêdil tê li ser ziman. Mehmûd ciwata kurdî baş nasdike.

Hesenê Metê jî romana “*Labîrenta Cinan*” nivîsiye û 1994’an de li Stockholmê çap bûye. Qehremanê romanê mamoste Kevanot e û roman li serpêhatiya wî hatiye avakirin. Ev mamosteyê îdealîst tê li dibistana, gundekî de kar dike û demekê şûn de dîn dibe, tê li ser rîya gundiyan. Qil û qalên gundiyan, ayîn û bûyerên mîstîk hêdî hêdî mamoste jî wek wan dike. Ev romana sosyo-psîkolojîk numûneyeka pêşîn e, pîrsegirêkên Kurdî, yê civakî û psîkolojîk tîne ser ziman. Meriv kû romanê dixwîne analîzên Gogol, Çehov û Dostoyewskî tîne bîra meriya.

Şahîne Soreklî eslê xwe ve ji Sîwereg’ê ye, li Sûriyê cî bûye û ana jî li Awûstralyayê dijî, romanek bi navê “*Wundabûn*” nivîsiye. Di romanê de dijî “nezanîn”ê disekine. Ji bo serketinê zanebûn lazîm e. “Sûcê kêmasî û bêçarebûna yê bindest” derdixe pêş. Di vî warî de carcaran ji heywanan mînak dide.

Medenî Ferho jî di van nêzîkiyan, dawiya sala 1994’an de romana xwe “*Berxwedan Jiyane*” çap kir. Min bi xwe hela hê roman nexwend, ji ber kû min li Swêdê destnexist.

Nacî Kutlay 1988’an de li Stockholmê bi navekî anonîm -Nûrî Şemdîn- romana “*Zeviyên Soro*” pêşkêşî xwendewanan kir. Dêdora 1950 de, dema kû makîne û traktor nû dikevin li gundên Kurdistan, şerê axa û gundiyan, li ser erdê her pêş de diçe. Li gundê Tendûrek’ê de berê Ermenî jî hebûn. Di Şerê Yekemîn ê Dinyayê de ew hatin kuştin û sirgûn kirin.

Erdên wan jî ket destê axayên Kurdan. Romaneka axa, gundî, zordestî û bertîl xwarina rêvabir û memûran tê nîşandanê. Abûqatên durû, bajar-vaniyên kû gundiyan dixapînin hene di romanê de, lê hişyarbûna gundiyan û Fata Jinebî jî heye. Romanê gere di demeka din de dom bikira, min ev pirs da xwendewanan kû wê jî binvîsim, lê hela hêjî min pirsra xwe nehanî cî.

Derheqê hinek roman nivîskar û romanên wan de dibe kû min çend nav bîrkin. Lê yên kû ez dizanim ev bûn.

Di nav me Kurdan de nebûye edet kû em li ser romanên dîtinên xwe û krîtîkên îlmî binivîsin. Rohat di vî warî de hewil dide xwe kû vê bêdengiyê bişikêne.

-ROMANNIVÎSÎNA MEHMET UZUN-

"Nivîskarê jîr, xwendevanên xwe jî
jîr diheibîne." (Feuerbach)

Remezan ALAN

Navder:

Roman, berhema edebiyata Rojava ye. Ji wî, tilpa wê çandê tê heye, û di nav de jî, riya ku dîroka "şexis"ê dihûne. Loma em dikarin bibêjin roman, şibaka şexis û dinyaya wî ye.

Dema ku burjuvazî di meydana dîrokê de cîhê xwe girt, ji bo însaniyetê rûpeleka nû vebû. Bi rastî jî tevgera wî, bayekî nû bû. Bi vî bayê nû re bejin da dara vê **pêşaniyê** (fiction). Loma jê re digotin "enovel".* Belê di tûrê kevneşopê de wek **Satyricon û metamorpheseon**** berhemên balkêş hebûn, lê ew **epîromanên** vî cûreyî bûn tenê. Emilandina matbaayê, di bajaran de hijmara xwendayan zêde kir û kesên xwenda jî, belavbûna romanê teşwîq kirin. Di bin navkirina Hegel de, ku digot "*roman, destana burjuvaya modern e*", ev guherîn hebû. Ev guherîn, di tevna dîrokê de bû neqşekî nû; roman jî li ser wî neqşî xwe hûnand û dest xaliça xwe kir.

Milekî din, "romans" çavkaniya vî navî dikir. Romans, Pêşaniya ser-pêhatî, tevger û eşqên şovalyan bû. Bi wî awayî ve îşaret li pêvajoya şexisê dikir. Ji ber ku segûzeşt, eşq; û rastiye gerîn ... tevgerên şexsî bûn. Van tevgeran, azadî û serbestiyê jî îşaret dikirin. Hebûna wan, çawa Mihaîl Bahtîn gotî, di nav azadî û cerbandinên (jihevdanîn) nivîskar de bû.

Li Rojava'yê dema ev dibûn, Rojhilat*** çî dikir? Di mecra wî ya edebî de, ku bi vî cûreyî dişibiya, pêşaniyek hebû?

Li Rojhilat'ê, derketina burjuvaziyê dereng dixist çend faktorên aborî û civakî hebûn. Em ê li vir qala wan nekin; lê em dikarin bi kurtî bibêjin li Rojhilatê, ku burjuvazî, şexis û romanê dereng dixist pêvajokeka bi hêz

* :Di Latîni'yê de nû(nî), "novus"e; "novel" a di Îngilîzi'yê de ji wir tê; wata vî "roman"e.

** : "Satyricon" a Gaius Petronius û "metamorpheseon" a Lucius Apuleias, piştî îsa sed-sala 1 û 2'an de hatibûn nivîsîn. Berhemên pexşan bûn û jiyana insanên qata jêr qiset dikirin; mekanên wan mey xane, mal û şikak bûn; bûyeran ne bi teolojiyê, bîaqil izah dikirin; ziman ne giran bû, zimanê rojane bû. Berhemên wê demê û piştî wê demê epîk, diltepinî û ahlakî bûn, lê ew ji van taybetiyan dûr bûn.

*** : Ji Rojhilat'ê qesta min, çanda Arap, Ecem, Tirk û Kurdan e.

hebû. Û ew pêvajo nig dabû erdê, xwe bernedida. Aliyekî din, mekânêkî ku jin û mêr li rûyê hev dixist tunebû; prisgirêka hebûnê, hawaleyê tecelliyeka îlahî dihat kirin. Ev têgiha (feraset) jî, deriyê berhemên dîdaktîk vedikiriya. Ji wî li Rojhilatê mesnevî, ku di nav cûreyan de ew nêzikî romanê bû, diçû û dihat pêşîra pîrsgirêkên ahlâqî vedikir. Esasen mesneviyên wek *Leyl û Mecnun*, *Yusuf û Zûleyxa*, *Sûheyl û Newbihar*, *Hûsn û Aşk*, *Mem û Zîn...* de jî, rastiyên tasawwufê, bi awayekî allegorîk dihat qisetkirin.

Dema em têne cem Kurdan, hal û rewş çî ye?

Me gava dî got, Rojava, romanê, li qonaxeka nû, di nav hoyên xwe yên dîrokî, aborî û civakî de afirand. Ev qonax gorê bû, lê dihat. Lê pîr netew, taybetî jî ewên ku Rojava ji xwe re “*modela medenî*” dihesibandin, vê cûreya edebî, parçeyekî modernizasyona xwe qebûl kirin û wî wisa hilanîn. Kurdan jî romanê, di nav wê çanda ku bi modernizasyonê hatibû veguherînê de naskirin. Yanê romanê, bêirada xwe, rasterast, nas kirin.

Esasen riyeka din jî tunebû. Ji ber ku, ne qewimîneka aborî û çandî hebû ku jê şexis biza, ne di bajaran de silsila nivîskar û xwendayan geş bibû û ne jî daxwaza edebiyatê hebû ku êdî rû ji nazmê ba bida û berê xwe bida pexşanê. Ev hoyên nerênî, ji bo romanê dibûn asteng û wî dereng dixistin. Encamê de roman, ne tekamulê çanda wan bû, parçeyekî wî nîn bû. Belkî jî ji wî, ne li Kurdistan’ê bejin da; li Sovyet’ê, li Swed’ê şîn bû.

Dema rewşa kevneşopê wisa bî, çarenûsa çandê wer bî, “nivîsandin” dibe rênçberiyek, zahmetiyek. Pol, mil û mejî, ji wê xebatê hertim jan didin. Cefa dibe fêkiyê wê. Lewma **Xanî** beriya çend salan weha gotibû:

“*Saftî şemirand, vexwarî durdî*
Manendê durê lîsanê Kurdî
Aniye nîzam û întîzamê
Kêşaye cefa jiboyê amê.”⁽¹⁾

“**ji bo amê (xelkê) cefa kişandin**” dibe çarenûsek. Divê em vê janê bibînin, dema ku nivîskarê kurd ji bo roman, hikaye û helbestê zimanek diafirîne ka çî tê serê wî !..

Ev zaniyarên ha ji bo keleşor û pêvajoya dîrokê lazim bûn. Lê emê li wî warî ewqas jî xwe mijûl nekin. Zira ew nepeniyên li paş derî gazî min dikin; û yeka dî, ronahiya hundir daye navderê û ez jî **hinekê din ronahî (Mehr Licht)** dibêm û dikevîm hundir.

Hundir:

Belkî îro sedemên roman nivîsandina Kurdan Pragmatîst e; baneka temasa çandekê ye, an jî çawa ku **Michel Butor** gotî, spehitiya şeyda ya

(1) Ahmedê Xahî : “Mem û Zîn” Weşanên Hasat, Çapa Sêyemîn, Cr.60

pêşaniyê ye belkî. Çi bî bila ew bî; Kurdan îro, di van wextên modern de ji bo xwe û zimanê xwe dest nivîsandinê kirine. Ji van yekê -ku berê di wî cûreyî de tenê Erebb Şemo înat kiribû- şeş lib roman nivîsand; û dibê ezê hê çendê din jî binivîsinim.

Qey lazim e ez bibêjim “xwendin” amelekî ferdî ye û dûmena tê dîtîn, ji keyfîyeta dûrbîn girtinê ye! Ez ê niha dûrbîna li destê xwe, li ser romanên **Mehmed Uzun** bigerînim. Li ser Siya Evînê, Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, Bîra Qedrê û Ronî mîna evînê Tarî mîna Mirinê. Ji xwe dema ku ez bibêjim “**romanên Mehmed Uzun**” bila ev bêne bîrê. Ji ber ku “Tu” û “Mirina Kalekî Rind” min dest nexistkî, ku ez heta bixwînim.

Em, bi Siya Evînê dest pê bikin.

Siya Evînê, romana jibîrbûnêkê nefîtiyêkê û tenêtiyêkê ye. Belkî jî zêdetir romana “jibîrbûn”ê ye. Zîra, zemanekê ku bûye yek ji damezrevanên *Komela Xwendekarên Kurd, Teşkilat-ı İctimaiye, Kurd Tealî Cemiyetî, Partiya Xoybun’ê* û nivîskar û berpirsiyarê kovara jîn’ê, vî kesî, Memduh Selîm Begê Wanî, em bi xwe, bi xêra vê romanê hîn nebûn?

Ev jibîrbûn e ku romanê xemgîn û mirûz dike. Xayintiya felekê careka din serdikeve, cilekî davêje ser hiş...

Romana ku bi heşt beşan tê pê, bi “dawi”yek dest pê dike. Çimkî lehengê romanê li ber mirinê ye, Ruhsitên dor de çerx dide. Lê, di ser wê dawiyê re gav dide û “destpêk”ek tîne pê. Wî emrî bextreş, li Stembol’a 1922’an hiltîne û tîne li Şam’a 1976’an. Rêwîtiya welatê xerîbiyê rojeka payîzê destpêdike û dîsa rojeka payîzê diqede. Mirin, weke nefîtiyeka dirêj, hêdî hêdî tê. Eynî mîna gotina **Witold Gombrowicz**: “Goristanek e nefîtî.”

Em dikarin bibêjin, di wê jiyana nû de, du reng xwe çetir eşkere dikin: “evîn” û “welat”! Dema rejîma Kemalîst, muxalîfan re deriyê welatê xerîbiyê heta piştê vedike, Memduh Selîm jî tê Antaqiya’yê cîwar dibe. (Wê demê, Antaqiya, di bin hukmê Fransîzan de ye.) Li wê derê bi taya evînê dikeve. Dil diberde qîza Çerkez Ferîha’yê. Ev evîn, weke her evînê dibe tebatek, dermanek. Memduh Selîm li wê çola welatê xerîbiyê siyek peyda dike. Lê ew roj, rojên giran in. Rojên ku ji bûyarên nû re avis in. Divê ramangîr û ronakbîrên Kurd hebûna xwe nîşanî cihanê bidin. Celadet Alî Bedirxan, Ekrem û Qedrî Cemîlpaşa, Îhsan Nurî Paşa, Xelîl Ramî Beg, Memdun Selîm Beg û yên din. Damezrandina Xoybun’ê, hêvî û hazirîn...

Li ser riya zewacê, xaçeriyeka nû, Agirî, derdikeve pêşiya Memduh Selîm. Divê ew jî daxilê haziriyên serhildanê bibe. Halbikî di wê hengame û jiyana siyasî de, di nav hin zevkên nazenîn de, daxwaza wî jiyaneke sade ye. Em hê destpêka romanê de rastê vê daxwazê tîn:

“*Memduh Selîm Begê niha şevên geş û germ divê. Şevên bi çirûsk û pêtên êgir tijî. Wî jinekê divê jineke ku weke dilopeke şîr, dilopeke xwîdan, dilopeke hêsirê çavan e. Jê re kahrikên hûr, yanê zarok, malraxistin û li qeraxa Gola wanê xaniyekî spehî, biçûk û xwedî baxçe divê.*”(r.21)

Ev daxwaz piştî naskirina Ferîha'yê gestir dibe:

"Bi xêr, gava em vegerin welêt, min dil heye ku xaniyekî li kêleka Gola Wanê ava bikim. Hingê ez û Ferîha dikarin li wê derê bi cîh bibin.(...)"

Wan, Gola Wanê, kêleka avê, xanî, baxçe, jin, zar û zêç, xweşî, serfirazî, rindî..."(r.51)

Ev daxwaz û xewn, bi biryara Memduh Selîm re tezadiyeka trajîk tîne pê. Romannivîskar, vê pozberiya însanî, awayekî realîst û objektîf pêşkêşî me dike:

"Bi dû biryara zewacê re niha ev rêwîti. Wekî ku sêleke xişor bi ser dil û hinavan re wer be."(r.138)

"Germiya evînê jî bi ser Memduh Selîm Begê re tê. Dil di şewateke yeman de ye. Gelo ew çi bike?.. Rabe pê û wê hembîz bike, ramûse, ji destê wê bigire û bi xwe re bibe? Çi bike? Ew nikare xwe, li ber nêrîna van çavên kelgirî regire. Tişteki divê, Xezalê divê fahm bike ku ev rêwîti ne rêwîtiya mirinê ye. Ew rêwitiyeke mecburî û kin e."(r.139)

Lê ew ronakbîrekî niştimanperwer e jî. Ji ber wê yekê, rûyê xwe ji leyistika felekê ba nade û xwe diberdê. Êdî ew Îskender Begê serhildana Agirî'yê ye. Lê dema diçe jî, bawer e ku dê piştî du mehê dî vegere. Çimkî dil û aqilê wî, li ser wê jiyana ku li dû xwe hiştiye ye. Paşî? Binketî, ciyawazî, jan û jibîrbûn... Ev çarenûs, taybetiya ronakbîrên Kurd ên wê demê ye. Ji ber ku çarenûs dê li Celadet Bedirxan jî biqewime. (Dema gotin hate li ser Bîra Qederê emê qala vê taybetiyê bikin) Belkî jî ji wî Mehmed Uzun, di gotûbêjekê de "Memduh Selîm daxwaz, tekoşîn û trajediya 300 salan ya ronakbîrên Kurd e" digota.

Her çi qas di vê romanê de çalakiyên Xoybun'ê, serhildana Agirî û kesê bi çîroka Memduh Selîm Begê vedigere; çepera xwe li ber evîna wî û rojên Antaqiya'yê vedide. Çend rêgezên artistîk, Ji bo danasîna wî dikevine romanê. Mesela "xewn". Belkî ew beş di çavê hinekan de negirîng bî, an teferuateka beredayî bî. Lê ez dibêjim ew beş hem dinyaya leheng ronî dikin û hem jî atmosfera romanê vebirî (kurtayî ... xulasa) dikin. Çawan? Çi awayî?

Di romanê de çêla pênc xewnan tê kirin. (Ku eger di beşa destpêk û dawiyê de em dîtînen li ber sekeratê jî lê bikin, pênc xewn hene.)

Ya yekemîn; aidê wan rojên qafilqeda-ku liberal û demokrat ji ber xezeba Mistefa Kemal û hevalên wî xwe didin alî-ye. Memduh Selîm xewneka Şehvanî dibîne. Qîzeka çavxezal, awirxweş, hinaroksor wî maçî dike, heşar dike. (Romannivîskar, di wan demên tevlihev de, barkirin, veqetîn û terkkirinan de, xwestiye ku hesreta maleka germ û jinekê nîşan bide. Binêrin:r.20-21)

Ya duyemîn; du kevokên spî bi firê ketine, li ser gelî û newalan, der û deveran, çal û çîyan de difrin û dikevin sînorên çîyayên nas, cîh û warên bav û kalan. Golek, Gala Wanê derdikeve pêşîya wan. Bêhnêkê, di nav daristanê de rê dibrin û paşî berê xwe didin xaniyekî du qat ê spî. Di nav baqxê xênî de jineka bedew û pordirêj heye. Her du kevok bi

qesta venîştina ser milê wê dikin, du perwaz mane ku venîşin jî. Lê, ji nişka ve agir bi daristanê digre, her tişt di nav pêt û şewatê de dimîne. Her du kevok ber bi jor dibin; li jêrê jî xanî, daristan û jinik di nav êgir de ne. Kevok divên xwe bigihînin hewara wan, lê nafiye, agir geş û gurr bûye. Û li esmanan jî teyrên goştîxwar, dirinde, ref bi ref li ser kevokan de tên. (Binêrin, r.74-75-76)

Di ya sêyemîn de Memduh Selîm û Ferîha li Stembol in; ketine milê hev, digerin. Memduh Selîm derbarê derî û sûrên Stembolê de, ji destgirtiya xwe re hikayetan qiset dike. Du kevok li ser milê wî ne. Tav germ e, gîya şîn bûne. Lê ji nişka ve ji koşeyekî polîs û esker derdikevin tîn. Dinya reş dibe, tav dibe hûtekî xwînîxwar, gîya dibin marên reş û kor. Her tişt li wan tê xezabê. Ew jî bazdidin, direvin. Dibe vizîna berik û gulan. Yek li Ferîha'yê dikeve û wê hildiweşîne erdê. Dibe qîrîna Memduh Selîm. (Bnr. r.124-125-126)

Di ya çaremîn de sahne, goristan e. Zarokek û ixtiyarek heye. Zarok Memduh Selîm e, ixtiyar jî bapîrê wî. Li goristanê şênîyek heye. Jin hatine li ser miriyê xwe. Herkes sergirtî ye û kincên reş li xwe kiriye, lê li ser yeka bedew û pordirêj tûlîneka tenik heye, kincên wê spî ne. Nêrîna wê nerm û nas e. Ew û zarok ji hev re dibişirin... Lê dîsa ji nişka ve tiştêk diqewime. Li esmanan balafirên eskerî xuya dikin. Balafir li ser goristanê difirin û bombe berdidin. Ji axê toz û dûman radibe, herkes direve. Ew jîna kinc spî xwe digihîne bin darekê. Kalemêr û zarok jî ber bi aliyê wê ve direvin. Lê nabe, bombeyek li ber wan dîteqe û zarok milek ve, kalemêr milekê din ve dipeke. Axîn, xwîn, barûd... Mirin xwe nîşan dide. (Ev xewn, aidê wan rojên jandar û zor ê serhildana Agirî'yê ye. Binêrin: r.170-171-172)

Ya pêncemîn, ya dawiyê ye, xewna zilamekî ku li benda mirinê ye. Ew xewna koçê ye; ji wî jî dijminahî, xirabî, hesed û xwînri-jandinê dîr e. Ev sekerat e, barkirin e; xewneka xatirxwestin e; loma "Memduh Selîm Beg, hosteyê xewnan, di nav xewneke rengîn de ye. Koça wî di eynî wext de xewnek e jî "dibêje romannivîskar. Ev xewn, ji wan xewnên xoftijî û malkambax dîr e; ne xweş e û ne jî xirab e. Lê dîsa jî dişibe wanê dî. Dîsa di tê de du kevokên spî ku bi fireka giran ketine; dîsa qîzeka bedew a por dirêj; dîsa daristan û dar; di nav daran de xanî; çiya, zinar û teyr û heywanên dirinde hene... (Binêrin beşa pêşî û ya dawî.)

Ev xewn, hesretek û daxwazek tînin ziman; lê ne bi awayekî rasterast. Ji wî plandûna metnê dewlemend dikin; di romanê de dibîne **"regezê berhema-vekirî"**.

Carl Jung, *însan. di nav îmaj û sembolên xewnên xwe de dixuye, gotibû. Yanê xewn ji bo kesek eyne ye. "meriv dikare xewnan objektîf an jî subjektîf*

şîrove bike. Awayê objektîf de tşkiliya xewnê û ya hawîrdorê tê danîn. Ew kes û tişt, rastî tîn hesêbkirin û analîza wan û xwenê tê kirin. Awayê subjektîf de, figûrên xewnê, hin aliyên şexsiyeta xwediyê xewnê tîn qebûl kirin.”(2)

Loma em dikarin bibêjin di xewnên Memduh Selîm Beg de ew her du kevok evîna jin û mêr; daristan û xanî, mekanê bi dil; baz û dirinde jî dijminan, niyetxiraban temsîl dike; jina pordirêj jî, bext û mirazê.

Diyar e ku Uzun, xewnan, ji rûyekî jiyane dihesibîne. Loma hin kesan, bi sembolan, ew jî bi simbolên basîd qiset dike. Bi vî awayî xewn, dibin REM; Yanê dibin siketina tiştên ku çav vekirî tîn dîtîn. Bi vî awayî xewnên Memduh Selîm, dibine jiyana wî bi xwe.

Di romanê de, regezeka artistîk a herî kevin heye. Di hin beşan de, di nabeyna hawîrdor û hawîrdora insan (ruhiyat) de paralel tîn danîn. Demên coş û dilgeşiyê re bihar û spehitiya dinê; demên jan, keser, bêgaviyê re jî baran û birûskên payîz û zivistanan, hevaltî dikin. Mesela di beşekî de, gava ku Memduh Selîm berê xwe dide nefitiyê û ji Stembolê vediqete, baran û hêstir, wî, bi rê dikin:

“Hê jî destpêka payiza 1923’an e. Galata. Keştî. Baran. Meriv. Hêstirên çavan. Destmal. Dilên keserkûr. Kona Sirguniyê, kona macîriyê tê vegirtin. Şeytanên sererd û binerd di kincên serdest û karmendên nû yên Tirkîyê de hatine xezebê.(...)”

Rehmet hûr hûr dibare. Dilop li ser kevirên reş yên peravê diçilkin. Dilop diçilkin ser pêlavên Memduh Selîm Begê...” (r.21-22)

Di dawiya zivistana 1931’an de (kî ji bo wî felaketa ferdî dest pê kiriye) dema vedigere malê, xebera reş û nexweş dikeve nav rengên hawîrdorê:

“Ji derve dengê baranê tê. Bêdengiya hundir ewçend zîz e ku meriv derzî bavê erdê, dengê derziyê dê were bihîstin.

Êvareke tahl, kirêt, zîz, ji agirê dûjehê xirabtir. Êvareke ewçend dilsoj ku bi peyvên nayê salixdan.”(r.81)

Wê êvarê dinya li ber wî reş dibe, dikeve nav cehennemekê. Dilopên baranê dibin pêtên êgir û dikevin paşîla wî.

Halbikî ew rojên ku bi destgirtiya re diçû parqan, gerê, an jî wê bidîta, her tişt bi dil û spehî bû. Di wan beşan de demsal bihar e: Kulîlk dipişkivin, hûnikahiyeka sivik xwe ba dike û xweza di nav bedewiyekê de ye. Mesela di wan rojên xweş û dîlşad de, lêbinêrin ka xwezaya der û ya Memduh Selîm çawa tê qisetkirin:

“Wekî dengê saeteke dîwêr. Ewçend xweş, ewçend bi rêk û pêk. Tov hawîrdorê vedigire. Dinya û tebiet vedije. Jin û keç li pey derî û penceran, li Memduh Selîm Begê dinihêrin û dipeyîvin. Wî jî tava germ daye ber xwe, dimeşe û kolanên Antaqiya’yê dihejîne.” (r.119)

Ku di vê romanê de bala meriv dikişîne taybetiyeka din heye: Ziman. Ev ziman, ji hevokên Kurt û birrî(qut) hatiye pê. Bi zimanekî wisa ûslup

2) Fordham, Frieda: “Jung Psikolojisi” Say Yay. (s.127)

çêbûye. Gerçî ev ûslup ne nû ye û dibe ku ji edebiyata der û dorê(mînak Tûrkiye) an jî ji ya dinyayê hatibe wergirtin. Lê vî, li ser edebiyatê gerandin "nûvedan" ek e. Her beş bi wan hevokên kin û qut dest pê dike û fotografek neqîş dike. Teferuat lib lib, giran giran dikevin pê hev; kompozisyonê û dekorekê tînin pê... Qareya fotografekê... Meriv dikare bibêje bi vî awayî ve Sîya Evînê rê li romana Bîra Qederê vedike. Ji ber ku, nehatibe navkirin jî, bi bêtên fotografê dipeyîvin beş. Jixwe ev roman, ji Yılmaz Güney re hatiye pêşkêş kirin. Herhalde ev pêşkêşî ne tesadûf e.

Herçend regezên dîrokî derxe pêş jî, romaneke biyografîk e Sîya Evînê. Çimkî korsa bûyerê ji jiyana Memduh Selîm qet û qet venaqete. Roman dor de diçe û tê; qibla romanê ew e. Ji wî em bedbaxta din, Ferîha'yê jî intewe nas nakin. Aliyên wê yên **psîşik** xwe nîşanî me nakin. Qey meriv dibêje nivîskar tenê fotografê Memduh Selîm dikişîne! Gerçî romanên biyografîk, ji xwe re piranî tevgera leheng topografya dikin. Yanê awayekî ve jî "bisînorî" şert e. Hem ji xwe romannivîskar, qisetkirina romanê, bi Memduh Selîm ve çarçove kiriye kî, ev taybetî jî, taybetiyeka romana modern e.

...

Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, romana Mehmet Uzun a çaremîn e. Di vê romana biçûk de, dengbêjê efsanevî yê Kurdan, Evdalê Zeynikê, tete qisetkirin. Jiyana dengbêjekî, kê qiset bike baş e? Ku **pîrê dengbêjan** tê hesêbê vî kesî, kî qiset bike dê bi cih be? Tabîî kî dengbêjekî din. Uzun jî wisa biryar dide û jiyana wî êdî ber bi efsane û çirokan re dere vî dengbêjî, bi dengbêjekî din, Ehmedê Fermanê Kîkî, dide qiset kirin. Bi vî awayî aqilane tê çareser kirin pîrsgirêka pêşanîkar.

Dema pêşanîkar dengbêjek bî, ji me re jî gotinên wek "guhdar û xwendevanên ezîz, me ji strana wî derxist, belê Evdalê Zeynikê Kor bû'an" "Em çirokê dirêj nekin" an jî "ew dengbêjekî dilê we bû" xerîb nayê. An em nikarin bibêjin romaneka modern de ev çi **kîp** û **qalib** ê kevnare ne!.. Em fêm dikin ku zimanê were pê, dê li ser tewereya çîrokbêjîyê here û were.

Li berê, taybetiyeka vî kîpê **mûsecca** bû. Loma Uzun jî bi mûseccayê dihûne vî zimanî:

"Hûn her sê dengbêjên navdar, Evdal, Şêx Silê û Gula bi nav û deng, bi tenê bi kilam û stranan bikine ceng." (r.94)

"Wan qîma xwe bi xwarina pariyekê, bi vexwarina ava tasekê, bi kêfa bîstekê, bi axa bihustekê, bi gotina doştekê dianîn." (r.174)

"Em ê bibêjin bi îzin û destûr, heta em digihîjine derecê kûr." (r.97)

"Agirê eşqê germ e, dikeve nav hestî û çerm e, ne dibe fedî ye û ne jî şerm e." (r.42)

"Li derve xelk û şênî li hev civiyan, hejmara wan gihîşte sedan. Hewş, baxçe û ber dîwarên qonaxê tijî bû bi merivan." (r.99)

Ku vî ûslûbe qaîm dike taybetiyeka din navlêk û gotinên pêşiyar in. Di romanê de intewe navlêk û gotinên pêşiya hatine emilandin. Û dîsa hin cihan de regezeka din a çîrokbêjîyê hatiye pê: mûbalaxa(fîşal)!

"Ew Evdalê ku bi qasî kulmekê mabû, niha bûbû fêrîste. Sîpanê Xelatê bûbû gewriya wî, deşt bûbû devê wî, lehî bûbû dengê wî. Ew bêhed û bêhudûd mezin bûbû." (r.217)

"Mehrûmo Evdalo, de destê xwe bavê ber guhê xwe bistrê û bibêje, royê bigirîne, ewran li hev biqulpîne, baranê bibarîne, çiyar li hev bîne û deng û awaz û şîna xwe li hemû alemê bigihîne..." (r.205)

Dema hin beş û jimarên "**formel**" jî dikevin nav rêzên romanê; ew kîpa çîrokî çêtir êşkere dibe. Mesela di nabeyna hin beşan de **borîn**, bi formela "*emê niha, hinekî li çîroka xwe vebin û filankesê filan derê bihêlin û werin cem filankesê*" çêdibe. An dawiyê de "*Herçî em in, ji me re jî hew gotin ma...*" tê gotin. An, ew e **heft** sale ku Evdal kor bûye; dema ser Newrozê de **çil** roj derbas dibe, berê xwe dide Sîpanê Xelatê.

Heta carna, tertîba qafiyên destanên kevnare(...'ane) jî kartîne pêşanîkar:

"*Reşa şevê ez xistime ser rê û rêwitiyane. Bi stranan, ez digerime li nav gund û bajar û welatane. (...) xweziya dilê min ew e ku agirê dilê min bişewitîne kirasê şevê, tariya zindanane.*" (r.123)

Ev tev, ji pêşanîkar re mantiq, repertuar û zimanekî pîrr lihevhatî (mûnasîb) çêdikin. Wî çaxî roman, bi sentaks û fonetikeka Kurdî, xwe tîne vicûdê. Jê bêhna zimanê bav û kalan tê. Lê dîsa jî "ziman dirûvandin" nîne roman nivîsandin. Ya rastî zimen tenê regezek e. roman pirtir, bi neqîşandina korsa bûyerê, bi atmosferê derdikeve pêşî. Mixabin ji vê taybetiyê dûr e romana Evdalê Zeynikê. Çawa?

Ku ji navê wê jî diyar e, roman, qala rojek ji rojên Evdalê Zeynikê dike. Li wextê berbangekê dest pêdike û, li berbangekê din jî diqede. Ê baş e, di rojekê de, çi tê qisetkirin?

Ji piştî heft sal koritîyê, roja Newroz a şêrîn, Evdal berê xwe dide Sîpanê xelatê. Wisa bawer e, ew dermanê ku hekîman jê hêvişandibû, dê vî çiyayî, Sîpanê xelatê, bidayê.*

Beşa didiyan"Piştî Nîvroyê"ye. Em wî rûniştî dibînin; rûniştîye û ji şagirtên xwe re serpehatiya "Siyabend û Xecê" dibêje. Ji wan re zangon, rastî û nezaketa dengbêjiyê qiset dike. Û roj diçe ava, şev perda tariyê dikişîne.

* : Di romanê de cihekî taybet ê Sîpanê Xelatê heye. Heta em dikarin bibêjin ev çiya lehengekî romanê ya. Beşa pêşî bi navê wî destpêdike. Hin cihan de jî, roleka "xwedayî" jê re hatiye danîn: "Evdalê Zeynikê berê xwe daye Sîpanê Xelatê û xwe li ber **sebr**, **hikmet** û **qudreta wî** girtiye." (r.30)

"Gulê mehrûmê... dengê Sîpanê Xelatê di mejîyê min de alan dide, **rehm û qudreta Sîpanê Xelatê** di hundirê min de pêl dide." (r.214) (Binê wan min xêz kir. R. Alan.)

Loma navê beşa sisêyan “Şev”e. Kesên ku bi Evdal re derketine serê sipanî, kom bi kom li dor agirên gurr rûniştine û guhê xwe didine stranên Evdal. Evdal jî bawer e ew şev, şeveka pîroz e û bi stran gotinê dê çavê wî vebibin! Loma dibejê, dibejê û dibejê... Herkes, quling bi xwe jî, bêdeng lê guhdarî dike. derengê şevê, dema şênîyên li dor agiran hêdî hêdî dikêşin bin konan, xeberek tê: Sê siwarî** li rê ne.

Beşa dawî dîsa “berbang” e; wextê dawîya wê rojê û romanê. Ev beş, bi tasvîra roja nû destpêdike. Kulîlkên nû dipişkivin; çûk hêkên xwe dişkênin... Li nêzikî çadîran mehînek dizê... Teyr li jor dixwînin û qijeqîj dikin... Bihar bi spehîfî û xweşiya xwe ‘merheba’ dibê... Evdal û Gulê benda xeberan in... Bûka wan Zînê lawek tîne dinê... Lê xebera reş jî tê: Wan siwaran xebara kuştina Bengîn û Meyro anîne... Hingê ew dengê ku dinyayê neqîş dike tê birrîn, Evdal dilerize, ditewire erdê... Gulê û çend kesên din kulavan digirinê...

Çava ku roman jî behs dike, berbanga wê sibehe berbangeka têkel û tével e. Melayîk û îblîs, nûhatin û windabûyîn, kêfxweşî û xem bi hev re ne.

Û dîsa li wê berbanga sibehe Evdal, şîna Bengîn û Meyro digerinê. Û paşî vî dixwaze: “*Hûn min, bi kevîr û zinarê herî bilind ê Sipanê Xelatê bigihînin.*” Jê re, “*tu bêhal î, nexweş î*” tê gotin. Ew jî “*eger mirîna min bi dilê we ye, fermo, min mebine... ez divê, her çi jî be, xwe bi cihê bilintirîn bigihînimê...*” dibê. Piştî van gotinan Gulê, dostekî Evdal, Temo û Quling, bi Evdal re dikavine rê. Derdikevine serî noqtêya herî bilind. Li vî cihî her dever, bi hêsan dixuye. Evdal careka din dest bi stranê dike. Dibê, dibê, û dibê... Çiqas dibêje û distrê dengê wî çêtir vedibe. Herkes berê xwe dide dengê wî. Evdalê ber mirinê jî nû ve tê dinê. Çavên wî jî bironahiyê dikevin. Di vî wextî de tiştêkî qenc ê din diqewime: Quling jî bi firê dikeve, li esman xwe çerx dike û ser serê şênîya Sipanê Xelatê ba dibe. Roman, bi vî sehna dilşad xelas dibe *

Lê, roman tenê wê bûyerê qiset dike? Na. Belkî vê bûyerê ji hemûyan kêmtir qiset dike. Çimkî her çar beş -Bebang, Piştî Nîvroyê, Şev û Bebang- bi 61 yek rûpelî hatiye gotin. Dema em 21 desen (nigar) û rûpelên vala jê derxin, 120 rûpelê di dimîne. (Ez vî jî bibêjim, tu qen

** : Belê ev sê siwarî ne, lê di rûpela 204'an de dibin du lib. Herhalde ji bêhayiyê, an jî ji xeta çapê wisa dibe.

* : min vê beşê bi taybetî wisa dirêj qisetkir; çimki ev bûyer û tevger, di wî demî kin de, berbangê de, diqewimin. Q ey meriv dibêje ev beş bûye depo û nivîskar vî zemanî razber spehî montaj nekiriye. Lê dema pêşanîkar, lehengê çîrokê û kîpa qisetê tê bîra meriv, meriv fêhm dike ku ew zeman, zemanekî efsanel e û gora romanê ye.

ciya wan desenan bi romanê nîn e û wana, romanê “folklorîktir” kirinel! Di vî 120 rûpelî xerîta nivîsê de çi hatiye qiset kirin? Evîna Evdal û Gulê; kurrê wan Temo; Qulingê brîndar; pevçûna Evdal, Gulê û Şêx Silê; şer û pozberiyên eşret ên Kurdan; dersdariya Evdal û şagirtên wî; fermana Ermenan û zirkeça Evdal û Gulê, Meyro; Bengîn; Evîna Bengîn û Meyro; xirabiyên Egîd Begê; Firariya dildaran; Êzîdî; Şerê Êzîdî, Kurd û Osmaniyan; kuştina Bengîn û Meyro... û di cihekî de jî, serpêhatiya “Siyabend û Xecê” bi ser van ve hatiye kirin.

Ez wisa bawer im Mehmed Uzun ji xwe taqet nedît tenê hikayeya denbêjekî kor binivîsîne. Ji bo vekêşan û pevçûna romanê koritî ne regezê bes bû, ji wî van teferuatan û bûyeran Lê kir. Yanê hawîrdora romanê fireh kir. Tewereya vekêşan û pevçûna romanê stûrtir kir.

Gerçî di “korsa bûyerê”de têkiliya hawirdor û leheng, regezeka girîng e. Ji xwe korsa bûyerê, ku bi lehengan diqewimin silsila bûyan e; tê wê watê. Lê di nabeyna van bûyeran de, çawa ku E. M. Forster gotî, divê “sedemîtî”hebî. Sedem, di navbera pare û yekpare de korelasyonê pêktîne. Dema sedemîtî nîn bî, bûyer û taswîr li hev nagurivin û çawa ku herine civîna saloneka ku tu kes hev nasnake.

Di vê romanê de hin Pêwendî û teferuatan, ez, ji badekên hundirê romanê dûr dibînim. Mesala serpêhatiya “Siyabend û Xecê” ev teferuat ji bo romanê ne parçeyikî organîk e. Her çiqas di romanê de “Derd û kulên Evdalê Zeynikê li serpêhatiya Xecê û Siyabend dihat” (Cr.33) hatibe gotin jî, ev pêwndiyeka zorakî ye. Belê her romannivîskar dê ji berhemên edebiyata xwe ya devkî fayde bigre. Nitekim Uzun, di Siya Evînê de “Cembeliyê Hekkarê û Binevşa Narîn”ê emilandiye. Ji bo dinyaya psişikê kesên romanê, carna teferuat û motifên wisa, alîkarî li meriv dîkin. Bi vî awayî metna xwe tekûz dike û rehekî din didê nivîskar. Wê jiyabûna ku ji rabirdûyê ji zimanê bav û kalan hatiye pê, careka din, di nav zeman û mekanê nû de vedijîne. Ji bo fayda xwe edebiyata modern, divê, eleqa xwe ji “kevneşop”ê nebire. Lê ev faydedîtin, divê ne li ser rehekî dînokî ** bî; awayekî xwezayî, sedemî û ahengdar bî. Jixwe eger armanc, ku rê li muhakemê veke telmîhek bî, rê ev e.

Serpêhatiya “Cembeliyê Hekkarê û Binevşa Narîn” li Memduh Selîm û Ferîhayê tê; ji wî ev teferuat, li romanê jî tê. Lê çîroka “Siyabend û Xecê” li dengbêjekî kor nayê. Herhalde nivîskar, zahf jî vê çîrokê hez dîkir û diva ku wî romanekî de qiset bike !.. (Belkî Mehmed Uzun jî weke me pîr kesan di nav “romantizmeka nîyetqenc” de ye. Wisa dibêjim, zîra, weke li dewra romanîkan, em nêzikahî li çanda gelêrî dîkin; em hin parçên wî darêj dîkin û terennûm dîkin. Lê divê em cîh û zemanê wî jî bizanibin.)

** : Minak, postmodern, parîyekê bi dîrokî û xinzîrî li kevneşofpê dinêrin.

Di romanê de çîroka Bengîn û Meyro, hingê ya Evdal giranî digre. Pozberî û pevçûnên di nabeyna eşîretên Kurdan de, têkiliya Osmaniyan, Çiyayê Şengalê û jiyana êzidiyan... Nivîskar xwestiye ev tefaruat bibine plandûra dîrokî ya romanê. Lê wî carî jî çîroka esil, di bin siya wan de maye. Yeka dî, hin başan de nivîskar, lib·lib kesên malbatê daye nasadin; di wan cihan de roman bûye “biyografiya malbatê”. Ew beşên ku qala Evdal û Gulê, Temo, Bengîn û Meyro dikin, bûne parçeyên “**entwicklungsroman**”^{*} ê.

Halbikî romana modern de carana seruvena saetekê, an ya rojekê ji bo korsa bûyerê bes e. Ji ber ku “pevçûn” pirr caran ne “**derveyî** (zahîrî) ye, **hundirî** (batînî) ye. Lê di romana Evdalê Zeynikê de pevçûna derveyî derketiye pêş; pevçûna hundirî ya Evdal, bûye gazindek ji felekê.

Dereng jî bî nivîskar di dawiya çîrokê de bi xwe dihesê û keda xwe bi çîroka esil xerc dike. dawiya romanê heqîqeten spehî û fonksiyonel e. Ku Evdal radipêçe her tişt, piştî kêliyekî, dê wê rewşa taybet qiset bike û dê alîkariya qisetê bike. Bêje dibin kevanên vekêşanê:

“Tavê rûyê wî germ kir. Qulingê jî xwe livand û qîre qîr kir. Li wir tava royê û bayê sibê diketin nav hev û Evdal û yên din vedijandin. Evdal ji Temo xwest ku ew quling bidîyê. Quling nedihewiya û deng dida. Wî hewl dida perwazan jî, lê her di hembêza Evdal de dima. Evdal hêdî hêdî serê xwe zivirand û li dora xwe nihêrî wekî ku tava royê didît û bayê sibê hîs dikir... Guhê wî li ser dengên bû. Refeke teyran, bi wîçewîç, di ser serê wan re firiya. (...) Ji jêrê, ji aliyê konan hîrehîr bi hesapan ket. Çend zarok bi qîrîn girîyan.” (r. 215-216)

Taswîr, di van beşan de **erka** xwe tîne cih. Çimkî sînoren wê tevahîyê û insanên di wê tevahîyê de diyar dike. Ew taswîrên bi “çav”an ku hatine kirin, dîrahî û nêzikahiya di nabeyana insanên û objeyan de baş diwezêne.

Herçiqas roman, pirsgrêka pêşanîkariyê, bi awayekî hoste çareser kiribî jî, her çiqas di sentaksê de tameka Kurdî afirandibî jî, morfa wê ya folklorîk û korsa bûyera wê ya desbelav, jê re dibin serêş. Mîna ji bo xwe, di vê romanê de, bi gora filozofekî gundî şîrova rastiyeke na, ku bi ferasetê rê distîne rêwitiyeke hundurî dixwest.

...

Bîra Qederê, Celadet Alî Bedîrxan, wî ronakbîr, weşankar û nivîskarê Kurd qiset dike.

Li ser mirina Celadet de heftêyek boriye; jina wî Rewşen Xanim, di oda Xebatê de, ku çend serpêhatî, jîyan, pêwendî, têkilî, tekoşîn, hîs û heyecanan xef dikin li fotografan dinêre û ji xwe re “*Kî dê niha li van resman binihêre û paşê wan bîne ziman? Kengê ev fotograf dê dest peyîvînê bikin?*” dibêje. Nivîskarê romanê, tam hîngê sozê werdigire û dest biyografiyêke dike. Roman wisa destpêdke.

* : Jiyana lehengê romanê, ji zoaroktiyê heta ixtiyariyê qiset dike cûreyekî romana bildungsroman'ê ye.

Li serê her beşê, fotografek heye. Romanivîskar, lib lib her teferuatên wî qiset dike, bi bêjeyan wêneyek çêdike. Statikiya fotografan piştî çendekê ji galiban derdikevin û xwe dilivînin. Ev livandin hêdî hêdî ritmîk dibe, tempo digre û rûpelên jiyana kesekî û dewrekê vedike.

Rûpela yekemîn a vê biyografîyê, zayîna Celaldet e. Lê hostetiya vê beşê, di wanê din de nadome. Ji nasandina Malbata Bedirxaniyan, ji taswîr û zaniyarên bêerk, roman pariyekê giran dibe. Qey meriv dibê, di wan beşan de ji bo rêveçûnê nigan dixwaze; neyseki, salên şerê cîhanê, xurbetê û eşqê tên hawarê. Bêgaviyên salên Şam û Munîxê, windakirina eşqê, rewşa Kurdan, salên weşanê yên bêçaretîyê, bêbasîretiya kesên dorê hwd. dibineregezên naskirina Celadet. Di van beşan de aliyên wî yên psişik xwe nîşan didin.

Di wan xebatên zor û qenc de, ku dinyaya Celaldet a ruhî dike dojehek, du pêt hene: Xurur û xişm. Drama wî ji pêl û mewcên dîrokê reng digrin. Demekê Veysel Öngören, tevgera Celadet, hesaba statûya xwe pirsîyarîkirin e,⁽⁴⁾ gotibû. Rast e. Ew pirsîyarî berê xwe dide rejîma Kemalîstan û cumhuriyeta Lozan'ê. Ji xwe kelopora malbata wî, vê riyê li ber vedikir. Terciha polîtîk a şexsî jî faktorek bû. Damezrandina Xoybunê, tevgerên siyasî, Hawar û Ronaî, gerîna statûyekê nîşan didin.

Sedemên xişma wî, di dewrên malkambax de xîmên xwe diavêje. Dema neçarî û bêgavî nefes lê diçikîne bêhuzurî dest pê dike. Nav û şan mezin e, lê dewlemendî tune ye. Mesref pirr, lê hatin nîn e. Halbikî keça kekê wî Sureya, bi birayê Qiralê Urdinê re zewiciye; reîsê cumhurê Sûriyê nas û xîzmê Bedirxaniyan e; Mala Qiral Evdillah dostê malbata wî ye... Lê Celadet tu carî xwe hewceyê wan nake. Betrana (xurur) wî ya mîrekî di bestrobara xwe de diherike; taa ku mirin li ber bendek radike!

Metafora romanê "bîr" e. Ew bîr dê çarenûsa wî biwesfîne û paşê jî bibe çarenûsa wî. Heqet jî çarenûs e êdî ew, çimkî ji zayînê heta mirinê wî teqîb dike. Bi Celadet re dijî bîr. Ji wî, di her qareya fotografan de heye, bi xef an jî bi eşkere... Ew "Hebûn"ek e; ya rastî kesekî romanê ye êdî.

Siya Ewînê, aliyê ziman û dîmenê ve Bîra Qederê hazir kiriye, min gotibû di rêzeka wê nivîsê de. Ez lê dinêrim, nêzikahiyên wan zahf cihan de digihêjin hev:

Her du jî, romanên ronakbîrên weletparêz û kozmopolît in.

Her du jî, ji lêlâteka dîrokî û biyografîk hereket dikin.

Her du jî, hêvî û bendemayînen qurmiçî, tevgerêka şikestî, emrekî xemgîr qiset dikin.

Û dîsa her du jî, evînên ji dest derketî qiset dikin. Memduh Selim û Celadet, evînê, hinekê ji îhmalkariyên xwe û hinekê jî, ji qergeşa wê demê û dewranê wînda dikin. Halbikî ne Memduh Selîm ji destgirtîya wê

(4): Öngören, Veysel: "Kuşkudan Süregelen Yol". Kovara Amîda, Hejmar 4. Nisan 1998

Ferîha'yê û ne jî Celadet ku ji Canan'ê veqetîne pozberiyeka bihêz û tofan heye. Ew her du pariyekê tiralên evînên xwe ne. Evînên wan bi hêsan ji dest derdikevin. Vê rastiye paşî hîn dibin. Her du jî -Memduh Selîm Zêdetir- jan û belavbûna windakirinekê dijîn. Û herdu jî, di dema navseriyê de "dizewicin" Ev Zewac ji wan re dibin îstîrahatgahek. Ew zewac ne bi zora eşqê, bi tenêtiyê, bi sitarîxwestinê hatine pê.

Her du roman pirr cîhan de li hev dinêrin. Eger ku li ser xebateka danberhevî çêbibe, dê pirr khevî derbikevin.

Aliyekî din vê romana Bîra Qederê, du eyne li ber jiyana Celadet Begê digre. Yekê ji der ve, ya dinê jî ji hundir ve. Yê ku ji der ve eyne daniye ber Celadet, nivîskar e û derbarê Celadet de romanek dinivîsîne. Yê ku ji hundir ve eyne digre Celadet bi xwe ye. Yanê roman, bi du pêşanîkaran rê dibre. Bi vî awayî, regezên biyografîk û otobiyo-grafîk di nav hev de bender dibin. Ev regekî xweş, regekî entellektûel dide romanê.

Bîra qederê, gorî Sîya Evînê, têkiliya leheng û hawîrdorê bîhnfirehtir, dîrokîtir, psişikîtir vedike û qiset dike. Bîra Qederê, di qisetkirinê de tecrûbeka kemilî (gîhayî] nîşan dide.

...

Romana Ronî mîna evînê, Tarî mîna mirinê, -ku em ê jê re "Ronî û Tarî" bibêjin- wekî Siya Evînê û Bîra Qederê bi "dawî"yekê dest pêdike. (Herhalde Mehmed Uzun, ku koka wî heta destanê Homeros diçe ji vê metodê, "bi dû vegeyîyê qisetkirin", pirr hez dike.) ji ber ku, lehengê romanê dê bêne kuştin. Eve beşên din, ku vê encamê hazir kiriye bûyeran dê qiset bike.

Rêza bûyeran, du welatên xeyalî(!), li welatê mezin û li Welatê Çiyan dibore. Welatê mezin koloniyeka kevna Fransîzî*ye ku ji çend welatên biçûk hatiye pê. Li vî welatî her pênc-şeş salê carekî "darbe" çêdibin. Ji bo selameta gel û welêt, ordî dest datîne ser hukim. Di desthilatiya generalan de, li her cihê welêt tevgerên karker, ronakbîr, xwendevan û zehmetkêşan tê qedexa kirin. Nivîskar, ronakbîr û hûnermend ji bo gotinên xwe dikevin zindanan. Dîsa jî insanên kor ên vî welatî, dev ji strana "bi dil, bi can, bi xwîn em bi te re ne ey serek..." bernadin.

Welatê Çiyan jî, ku warê insanên esmer û qemer e, eve çend sale nig dide erdê û navê bibîte parçeyekî vî welatî mezin û "medenî". Kesên vî welatî, ji çiyayên xwe yên bilind bawer in. Lê nesîbê wan hertim bûye nêçîr, nefî û mirin. Ev welatên ku xwediyê du çemê navdar e, bûye dergûşa kabûsan. Hertim Ferman Lê rabûye. Îro jî serhildêrên wî, tevgerekê pêkanîne. Ji wî çend hezar meriv, serhildêr û leşker hatine kuştin; çend cîh û war hatine kavil kirin; daristan hatine şewitandin. Armanca ordiyê tefandina vî şerî ye, ji bo wî, her nêçîrê lê serbest kiriye...

*: Nivîs, siketin e, siya rastiyan e û zimanekî binavgîn e

Eva korsa bûyera romanê, li van her du welatan dibore. Ev girînge, ji ber ku dê kes û lehengên romanê li ser rewşa van welatan bejin biavêjin. Ev erdnigariyên ha dê li ser wana rêç û bandorên kûr bihêlin. Dê ev welat bibine çarenûsa wan. Dê navê wana bi xwe jî-Baz û Kevok-vî erdnigariyê îşaret bikin.

Lê bila xelet neyê fêhm kirin, ev her du nav, wan welatan simbolîze nakin. Ji ber ku Baz û Kevok, întewe kes û şexis in; ne kartontîp in. Lê navên wan, deng li nêçîrvantî û nêçîrekê jî dikin!...

Baz herçiqas ji welatê çuyan bî jî (çimkî hê du salî, ji qirkirinekê xelas bûye û paşî jî li welatê mezin. li mala zorokên sêwî mezin, bûye) ji kok û rastiya xwe dûr ketiye; ji adet û nîrxên xwe bêhay mezin bûye û bi îdeolojiya welatê

mezin, li xwendegê û akademiyan wî yê leşkerî perwerde bûye. Mensubiyet û aidiyeta wî Ordî ye êdî. Ew “dewşîrme”yek e. Lewra bi can û eşq wezîfeya xwe ya li welatê çuyan pêktîne. Di wî şerî kirêt de dibe lawê êrîşên şevan û mînan. Wekî gurekî ji xumama şevên tarî hez dike. Wezîfa wî, di tariya şevê de nêçîra însanan; di berbang û danê êvaran de leza li pey rêç û şopên serhildêran e. Baz, hingê di tariyê de ye, ew tarî ye.*

Kevok jî ji welatê çuyan e. Ew qîza malbateka celîbûyî ye; li welatê mezin, mezin bûye; yeka evîndar e, dildarê wî jî çûye gihaye serhildêran; ji wî, ewê jî daye pay. Ev bi hebûna xwe ve di nav ronahiyê de ye, ew ronî ye.

Esasen, li serî heta binî, ji beş û bêjeyên simbolî hatiye pê roman. Mesela epîgrafa ku ji destana Gilgameş hatiye girtin: Gilgameş di nav deristanî de rê dibere. Ew, di nav tariyê de ye; ne pêşiya xwe, ne jî paşiya xwe dibîne. Di her qonaxê de tarîti li hember e, li dora wî rapêçaye. Lê dema digihêje qonaxa yanzdan, tîrêjên berbangê xuya dikin; û piştî qonaxa donzdan, tîrêjên royê mîna lehiyekê diherikin.

Qey di romanê de Baz jî, heya beşa donzdan (jan), ne di tariyekê de ye? Û piştî beşa donzdan (Awir), ronahî serê xwe dernaxe? Di beşa “Awir” de ku qala spehitiyê, zelaliyê û bedewiya Kevokê dikin pîrr monolog hene. Diyar e ku guherînek li Baz diqewime. Ronahiyek ji bo wî hiltê. Ew ronahî “evîn”e. Gerçê hin faktorên guherîna Baz hene: Zewaceka bedbaxt kiriye, bêkokiya xwe hîn bûye û êdî wekî berê, ji wî şerî kirêt ne bawer e... Lê germî û coşa dilê wî, li ser wan sedeman in. Êdî dest xwendina şîran û guhdariya mûzika klasik kiriye. Evîn, wî kiriye insan careka din. Ji ber ku di vê tariyê de gihiştîye qonaxa ronahiyê. Loma dema tê kuştin jî, di wê tariya şevê de, bi hemû quwet û taqeta xwe radibe ser piyan û berê xwe dide çemê ku ronahî û şewq jê diçe.

* : Roman, romana Baz e. Ji 17'yan 14 beş, wî û hawîrdora wî qiset dike.

Ji romanê re ku kesekî “noqsan, biqusûr hu nerênî” hatiye bijartin, “pevçûn”ê berdewam kiriye. Bi vî awayî ve Ronî û Tarî, ji wan romanên din “heroktir”e. Regeza pevçûnê, ji bo romanê tiştekî hayatî ye. Hem, kesên noqsan û biqusûr, ji bo qisetkirina prsgirêkê mûnasîbtir in.

Bi vî awayî: Baz, dema ji evînê û fêmkirina ruhê insanan dûr e tariyê simbolîze dik; dema bi taya evînê jî dikeve, Gilgameş'ê di nav ronahiyê de simbolîze dike; Kevok jî evînê, spehîtiyê, çiraya şevê; Rênas, ronahiya heyvê ye, rê nîşan dide û paşî jî winda dibe, diçe; Jîr, wekî navê xwe jîr e, zîrek e; General Serdar, serdar e; Mader, mader e...

(Niha romaneka Îtolo Calvino hate bîra min: "Şovalyeyî Tuneyî"[il cavaliere Înesistente]! Di wê romanê de Agilulfo, îrade û zanîna tunebûnekê; seyîsê wî Gurdulu, ji îrade û zanînê bêhay hebûnekê; Ramboaldo, tecrûba hebûnê, ya dîrokê; Tuorrismondo, mutlaqê; Sofronia jî aştîyê simbolîze dikira.)

Lê dîsa jî romaneka "bedbîn" e Ronî û Tarî. Herçiqas jî "Teqîna Mezin" û bi vir ve ronî û tarî dorê ji hev distînin jî, piranî, tarî serdikeve îro. Di romanê de jî wisa ye. Piştî her ronahiya mistekê tariyeka ferîşte tê. Piştî her beşa ku ronahî jê diherike, hukmê tarîtiyê tê:

"Niha, ji dûr, çem dixuye û dengê ava çem tê. Çem di nav zerahiyê de bêpayan de ye, ronahî jê diherike. Heyv û stêr li ser ava çem dîlan girtine; çem bûye kaniya geş a ronahiyê." (r.25)

"Giyanermik hêşîn hatine, bihar, li rê ye, germahî, geşî û hişyarî li rê ye. Tîrêjên tavê kulavê spî yê berfê difirkîne, berf hêdî hêdî dihele û radişe.(...) Jîn bi reh û rêçên dar û dahlan dikeve, dar kirasekî nû yê hêşînahiyê li xwe dikin" (r.41)

"Jibilî dengê nerm ê ava çem tu dennîn e. Ev bédengiya ku tu gotin nikare salix bide, ev rengên mor, binevşî, zer û sor ku bi hev re rengêkî nû yê nedîtî li dardixin, ev bîhnên têkel ên dar, çiya, av, pêl, giya û axê, ev hmû bi hev re, hîseke ecêb, bihîstiyareke gelekî zirav tînin pê. Û li serê çiyên jî tav, ronahî, tîrêj ku gav bi gav, pêl bi pêl, lê gelekî hêdî, giran, bilind dibe, pêtên çirîskên şewqê li vir, li wir tîne pê û desthilatî hemû rengan, hamû deveran, hemû hawîrdor dibe." (r.264)

Lê çi fayde! Piştî kêliyêkî ew karê kevnare yê Qabîl tê pê. Ronahiya heyv û stêran, bîhna axê, giya, dar û ber dikevin bin hukmê Ehrîman. Piştî beşa yekemîn (r.25), Kevok tê kuştin; piştî ya didoyan (r.41), hêzên ordiyê, di şikeftê de gundekî qirdikin; piştî ya sisêyan (r.264), êrîş dest pê dike û çend însan tên kuştin.

Loma tîrêjên rojê jê biherikin jî romana Ronî û Tarî, romaneka bedbîn e. Di tê de tarî, rengê serwer e. Tevgera ehlê Ehrîmanîyan serdikeve. Baz'ê ku di payîza emrê xwe de careka din rastê tîrêjan tê, qey nayê kuştin? Kevok, Rênas, gundî û yên din dîsa ne wisa?

Lê ev bedbînî, bedbîniyeka realist e. Zîra îro jî perda tarîtiya mirînê li ser rûyê Welatê Çiyên e. Hêvî û bedewiyên wî têne qetilkirin...

Di nav romanên Mehmed Uzun de Ronî û Terî, çetir nêzîkî "niha" û "rojane"yê ye. Yên dî li ser lêlateka biyografîk û dîrokî bûn. Lê ew, ku bi sembolan hatiye hûnandin ji rastiyeke re, derî vedike.

Di odan de:

1- Oda Pêşanîkaran:

Berna Moran, ku li ser romana tirkî, xebatên girîng aniye pê, di berhemeka xwe de weha digota:

“Her metnekê, du aliyê wî hene; ya yekemîn ‘çîrok’ê, ya duyemîn ‘gotin’ê. Çîrok, ji rêza bûyer, kes û hawirdorê tê pê û bi pirsra ‘çi tê qisetkirinê’ ve girêdayî ye; gotin jî bi pirsra ‘çîrok’ çawa tê qisetkirinê’ ve.”(5)

Yanê ji bo romanekê gotin, çîroka ku hatiye rêzkerin e. Ev regez jî, pîrsgirêka pêşanîkariyê diyar dike. Dê kî çîroka plankirî û programkirî qiset bike? Dê bi nêrîna kî bûyer bibiriqin? Dê mesafa di nabeyana çîrok û pêşanîkar çawa bête eyar kirin?..

Pêşanîkarê Siya Evînê, zanînên xwe rûbarê nêrîna lehengê romanê dike; bi wî xwe sînar dike; hin cîhan dikeve navberê, lê ew cîh kêma in. Dema zaniyarên dîrokî tîne ziman jî, ne di nav zanîneka “xwedayî” de ye. Asan û dilsoz e pêşanîkar.

Pêşanîkarê Evdalê Zeynikê, weke Evdal dengbêjek e. Dengê wî yê gurr û jixwebawer, gotinên wî yên destanî û çîrokî, bêjeyên wî yên devkî, zêde gorî bûyerê ye. Di beşên ku dinya ruhî ya Evdal qisetdikin de, hinekî xwe paş ve dikişîne û gotinê ji Evdal re dihêle; lê hefsarê bêjeyên çîrokê ji destê xwe dernaxe.

Yên Bîra Qederê du lib in. Alîkariyê li hev dikan, şaşiyên hev rast dikan carna. Pêşanîkarê yekemîn romana Celadet Bedirxan dinvîsîne, yê din jî rê lê vedike. Bi vî awayî Bîra Qederê wateyeka didoyî diafirîne: Bîra Qederê ya nivîskar; Bîra Qederê ya Celadet!

Lê di romana Ronî û Toarî de pêşanîkar dibe regezeka eslî ya romanê. Uzun, serî li parodiyekê dide ku romanivîskarên modern û post-modern pîrr jê hez dikan: “Ev romana ku niha di destê we de, wî kî nivîsandîye?”

Pîrr cihên romanê de pêşanîkar, bi gotinên wek “romana me”, “beşên vê romanê”, “çil û heft sal berî nivîsîna van rêzan” îşaretê li fonksiyonekê dike. Lê di beşên “Biyani”, “Ronahî” û “mîrin” ê de nivîsandîna romanê qiset dike. Ew kesê ku dibê, ez/min” hêdî hêdî derdikeve holê. Pêşanîkarê Ronî û Tari’yê dibe kesekî romanê. Bi vî awayî, romana Ronî û Tari, pêşnûmakirîna xwe tîne ziman. Yanê vê romanê meriv dikare, bi parodîya “**romana ku xwe qisetdike**” ve girêbide.

Belê meriv dikare romanê rûbarê vê parodiyê bike, lê, trajediyên ku îro li pêş me ne, ji sînoren rastîyan derketine. Ji wî weheye ev parodî “rast” bî jî, yanê ji jiyanê qewimî bî. Û pêşanîkar û romannivîskarê romanê, Mehmed Uzun bi xwe bî!

Wisa dixuye, Uzun di riya nivîskariyê de çiqas bê, dê xurttir bibe. Ji ber ku aliyê pêşanî û fiksiyonê, romana Evdalê zeynikê ji Siya Evînê; Bîra Qederê tekûztir in. Di bergeha qisetkirinê de, perspektîfa xwe dewlemend dike nivîskar.

(5) : Moran, Berna: “Türk Romanına Eleştirel Bir Bakış 2” İletişim yay.(r.37)

Taybetiyeke pêşanîkarên Mehmet Uzun ji ev e: Ew diji **Andrê Breton** un, çimkî ji taswîrê pirr hez dikin. (Diyalogên romanên Uzun, ji wî, kêman in.) Ew hez kirin, meriv dibetilîna û herikîna bûyerê giran dike carna. Car bi car jî pêşanîkar ji xwe ve diçe û bal û dîqatê ji dest berdide. Ji debdeba zaniyarên berhevkirî, şaşıyan dike. Mesela pêşanîkarê Bîra Qederê, di eynî beşê de, van her du zaniyarê diji hev dide:

“Samiha Xanim di nav êşêke mezin de ye. Mêrli qata jêr, li salonê rûniştine, jin jî li jor. Ew zarokê ku niha li rê ye, dê bibe zarokê dudiyar ê Samiha Xanimê. Berî niha bi deh salan jî wê zarokek, lawê xwe Sureya anîbû dinê. Lê ne bi vê êş û ecêbê.(...)”

Emîn Beg wê dîsan bibûya bav. Lawekî wî hebû; Sureya. Diya Sureya zû wefat kiribû. Sureya hê nebûbû du salî, diya wî bi nexweşiya seretanê ketibû û di demeke kurt de wefat kiribû.” (r. 15-16)

Dîsa eynî pêşanîkar, li ser gora mîr Bedirxan, vê gotine dike malê Memduh Selîm: “Tu rehet bijî.” (r.186) Di şona “razê” de “bijî”!

Elbet ji bo romaneka bîyografîk û dîrokî, gelek zanîn û matesryal lazîm dibin. Di van zanînan de belkî em tu car li hinekan germ nebin. An, xwendina hinekan dê, tu car balê nekişîne. Lê ev zanîn û teferuat mecbur in alîkariya herikîna çîrokê bikin. Ew girîng bin û ne bin, balkêş bin û ne bin, divê bi kompozisyonê ve bin. Divê nivîskar, pêwistî û nepewistîya matayalên xwe baş biwezîne. Metin, ne kîlerek e.

2- Oda Ziman:

Çi bikeve binetara metnê, gelek bibe parçeyekî wî yê organîk. Divê ew parçe lê bigurive, jê re bibe taqetek. Di nava van parçeyên organîk de bêje, cîhekî taybet digrin. Edebiyat, dinya bêjeyan e.

Di romanên xwe de, tenê bi bêjeyên zarava Kurmancî qîma xwe nayne Uzun. Car bi car destê xwe dirêjî bêjeyên Dimilî û Soranî'yê jî dike. Gulên ji wan baxçan jî bîhn dike. Qenc jî dike, zîra ji bo kurdan rîya ji kevir û sitirîyan pakij ev e. Ziman, pariyekê bi repertuara bêjeyên xwe dewlemend e.

Uzun, bêjeyan, gorî mekan û waran dixebitîne. Dizane, dinyayên wan ên cûda û xweser hene. Ji wê yakê bêjeyên wî, ji çiya, dest û şikeftan tî û xwe dirêjî civîn, salon, meyxane, mal û odên otêlan dikin. Dekor, bi wan pêk tê:

“*Rê dijwar e, rê dirêj e, xuloxwar e, bi çiv e. Zinar li pey zinar, gir li pey gir, pal li pey pal, pozik li pey pozik, kuç li pey kuç Kaş li pey Kaş, çal li pey çal, av û co, li pey av û co tî.*” dibê dema, wekî çîrokbêjekî berê, xwezayê dîneqîşîne. Hûn, bi van bêjeyan der û dorê dinêrin.

“*Stembol, bajarê xwediyê ewr û esmanên şîn û av û behrên şîn; bajarê xwediyê mizgeft, dêr û sinagogên bedew û rengîn ên herî xweş; xwediyê ziman, ol û çandên dewlemend û cihê; xwediyê keleh, birc û sûrên bilind, dirêj û bêdawîn; xwediyê qesr û qonax, saray û koşkên medeniyetên cihê; xwediyê kuçe û kolanên teng, minarên bilind, sûk û bazarên gemarî, xan û hemamên tarî; xwediyê çayxane û meyxanên germ, esrar û heşîşxanên*

dûmanti jî...” dema dibê, hûn şahidê cûdatî û tevliheviya bajêrekî dibin. Wê demê di nav bajêr de dipeyive nivîskar û gorî wî dibijêre bêjeyan.

“Salona zabîtan a germ di nav ronahiya elektrîkê de dibiriqe. Her aliyê salonê, bi sûret, kaxizên zêrhêlî, stêrên zêrhêlî hatiye neqîşandin. Orkestra leşkerî ku hertim marşên leşkerî lêdixe, niha, li kêleka pîsta dansê, li mûsikeke nerm dixê. Li salona modern, bi qasî çil maseyên fireh û gulover, li gora dûzana dawetê, hatine danîn.” dema dibê jî, detayên hundirê mekanekî eşkere dibe.

Lê di vê xerîta bêjeyan de, ku ji rewşa rojane hiltê desbelaviyek jî dixuyê. Û ev desbelavî îhtimal e di “dahatû”yê de, ji metnê re bibe astengiyek. Çi ye ew tişt? Uzun, hemberê bêjeyên wek sedem, çarenûs, fêkî, tebat, dîlşad, dîrok, bext, xweza(hawîrdor), çêl, serpêhatî hwd. belkî jî piştî pênc-şeş salî dî, ji pexşaneka pêş ve çûyî re bibine bar, bêjeyên sebeb, qeder, meywe, sebr, mesud, tarîx, siud, tebîet, behs, xatire hwd. derdixe.

Û car bi car jî bêje, qetînek û hevokên wek “rûnîştewan”, “gundiyên parêzger”, “lebatên çandî”, “hîç tiştekî-hîç kesek”, “dînya wî hilweşî”, “şev rengand”... Kartîne kî ji tam û lezeta Kurmancî’yê dûr in. Lê esil tiştekî din bala min kişand. Mehmed Uzun, di her çar romanê xwe de bêjeya “Stûr” ê xelet diemilîne: “Dijminahiyên Stûr”, “çavên stûr”, “welatên stûr”, “masiyên stûr”, “stêrên stûr”... dibê! Yanê vê bêjeyê di şona “mezin” de diemilîne. Halbikî stûr, “qalind”e, ne mezin e! (ya ku ez dizanim, di Kurmancî’yê de tenê du qetînekan de wata wî “mezin” e: “dewarên stûr-heywanên stûr”).

Eger ku ev karanîn, her çar romanên de neboriya, min ê qala wê nekira. Lê mixabin tevan de heye û êdî gerek e bête gotin.

Û eger nivîskar, an jî weşankarê wî, ji kerema xwe re, wan hevokên Fransîzî û Alemanî, bi jêrenotekê rave bikin, dê çêtir bibe.

3- Oda mazzmûnekê:

Dema hûn metnan bi danberhevî bixwînin, hûn ê du tiştan bibînin: **wekhevî û cihetî.**

Di van romanên de teferuatek heye kî, ji wekheviyê derbas dibe û dikeve qonaxa eynîtiyê: Taswîrên jin û mêran! Ew taswîr wisa xwe dubare dikin kî, dibine “klîşe”, yanê “mazzmûn”. Ji bo vê tespîtê, mînakên li jêr bes in:

“Heyva çardehê mehê. Kew. Dilop: dilopeke av, dilopeke xwîdan, dilopeke hêstir, dilopeke spehîfî û xweşî” (Sîya Evînê, r.38-39, taswîra Ferîha’yê)

“Ew çilkeke zêr, dilopeke şîr bû.” (Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, r.39, taswîra Gulê)

“Çaxa umrê keçikê gihîşt dehan, keçik bû çilkeke zêr û tava destpêka havînê.(...) meyro bûbû wek heyva çardeşevî.” (Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, r.132-134, taswîra Meyro.)

"*Samîha ku mîna çilkeke zêr û dilopeke av bû*" (Bîra Qederê, r.16, taswîra *Samîha Xanim'ê*)

"*Stûyê wê mîna sitûnekê, dirêj e, tilî û pêçiyên destê wê jî. Keçik bejindirêj, pordirêj, stûdirêj, tilîdirêj.*" (Ronî mîna evînê, Tarî mîna mirinê, r.145, taswîra *Kevok'ê*.)

"*Canan mîna sitûneke romî lihevhatî, mîna Afrodîteke jîndar spehî ye.*" (Bîna Qederê, r.90 taswîra *Canan'ê*.)

Û dîsa ew jin, xwediyên porên zer û dirêj in; çavên wan hinguvî (genimî) ne; zik, navteng û hêtên wan mîna tîrên vekîşiyayî ne.*

Memduh Selîm, Evdalê Zeynikê, Bengîn, Celadet Bedirxan, Baz? Ew jî mînak-model'ên qeşengiyê ne: xwediyê bejnên zirav û dirêj in; xweşlihevhatî ne; çav reş û enîfireh in... (Binerîn: Ronî û Tarî: r.57; Siya Evînê: r.14; Evdalê Zeynikê: r.37 û 142; Bîra Qederê: r.62.)

Di edebiyata modern de, ku ewqas xwe dubare dike û paşî jî dibe mazmunekê, meriv çawa rave bike? Ev taybetî, ji ziman tê, an ji terciha hûnermend?

Ya rastî di van beşên taswîran de, hin "gazel"ên edebiyata dîwanê hatin bîra min. Ji ber ku, nêzîkî manzûna "yar" a wê helbestê bûn. Mîna mînak-model'ên spehîtiyê bûn ew: loma ji min re pariyekê ji jiyane dîhatin. An jî ziman, wana ji jiyane dîr dikir...

Tam jî hingê divê meriv bipirse: Ecêba, di zimanê kurdî de, di taswîrkirina kesan de, hin qod û qalibê ku meriv nikare pîsera xwe ji wan xelas bike, hene? Qey portre (taswîra kesan), tenê di bin hukmê edebiyata devkî de ye? Mehmed Uzun, belkî jî ji bo rexneka psîkanalîst, serriştekek dide? An jî nivîskar, ji vê mazmûnê bêhay e?

Xatîrxwestin:

Wextê çûnê hat. Ezê niha ji van malan derkevim. Tê rûniştinlê gerîn û nêrîn, dê dû bimîne. Gerçî rêdana danberheviyekê hebûya dê qîmeta van romanên diyartir bibûna. Mixabin min fersend nedît; bila ew, ji xebateka din re bimîne. Lê dîsa jî ez dikarim vana bibêjîm:

Ez, ji temaşe û dîtîna memnûn im. Êdî bawerim, di zimanê min de roman-nivîskarekî jîr heye. Xebata wî pîroz e; quleka kevn a edebiyata Kurdî-ku di wê de av distîne keştî-digre. Êdî ez dizanim, dê guhê min li ser xebatên wî bin: ka çi dike; çi dinivîsîne; dê kengê romaneka din çap bike?..

Em ê çi bikin? Em: xwendevanên edebiyata Kurdî? Divê em jî xwe tekûz bikin û pêş bibin. Divê em bizanibin, Rastiyê, wekî eynekê nabirqîne edebiyat. Dema em vê rastiyê hîn bibin dê bejn û bal û qeşengiya Evdal; dê teferuata *Tahar Xan* û *Sirmelî Mehmed Paşa*; dê dar û beş û şînahiya Sîpanê Xelatê negirîng bibe... Dê bête dîtîna ku di rûpelên edebiyatê de Celadet, Memduh Selîm û Evdalê Zeynikê, kesên **spesîfîk** in... Dê bête fêhm kirin ku lîzet û tama edebiyatê wisa xweş e.

* :Di nav wan de Kevak, tanê çav û por reş e.

Jixwe romana Kurdî hê tefal e, hê **romana tekaneyan** e. Di derbarê Evdalê Zeynikê, Celadet Bedirxan, Memduh Selim de çend roman hene? **Roland Bartes**, ku “rewşa xemnak” gotî, ew “mêla dubare” yê, hê di romana kurdî de tune. Xwedêkirî jî tune. Ji ber ku, dubarekirin, **rêdan qetandinek** e. Lê zeviyên edebiyata me hê neçandîne, hê bakire ne.

Nivîs, nikare “Rast”yê biqedîne. Ji wî ew ne rastiye, lê rûyekî rastyê ye. Di nav gerduneka mezin de gerduneka biçûk. Loma tu rastiya edebî, ne objektîf e. Loma rastiya edebî ya Mehmed Uzun, rastiyeke subjektîf e. Û wekî her rastiya subjektîf jî kême e, dildayî ye, însanî ye... Jixwe ne eve ku tam dide, tov direşîne?

SERBILINDÎ Û SERKEFTINA ROMANA KURDÎ

Maruf YILMAZ

Mizgîn ji romanhezên Kurd re, ku Mehmed Uzun romana “*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*” nivîsiye! Bêguman ev roman, romana baştirîn a kurdî ye, ku min ta îro xwendiyê.

Îro hejmara romanên ku bi kurdî hatine nivîsîn, ji hejmara tiliyên destekî ne bêhtir in. Herçendî çend roman hatibin nivîsandin jî, romana Kurdî ya nûjen tune bû. Lê di romana “*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*” de, tiştê ku bala mirovî dikişîne, warê herêkbûn, kûrbûn, psikolojiya hundirê mirovî û raxistina teknîka temaya romanê ye. Lewra, xala girîng e, ku romanê ji romanên nivîsî cihê dike; kûrahî, berfirehbûn, neynika hundirê mirovî û psikolojiya têkoşîna hundirê mirovî ye. Ev yek, vê romanê, ji romana klasîk cihê dike. Ev roman weke kok û gevde dara tiriye, ji şûneke dest pê dike, derdihê, şax dide û ji koka xwe hinekî dûr dikeve, dawiyê jî, li koka xwe vedigere... Ji serî ta dawiyê, “*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*” diwar û dijberiya du hêzan li ber çavan radixe. Ji nav van diwariyan, bala min bi tundî çû ser bûyera trajîk, li “Welatê Çiyan”, ku ev bûyer di kesitiya *Kevok û Bazî* de diteqe. Ez bawer im ku, xwendevan dê bala xwe bidin vê derê. Li vî Welatî, malbat bela-wela ne û heta ku yar ji yarê dûr dikeve; dê û bav ji keç û kurên dûr dikevin, weke beşên 13-17an nîşanî me dide. Tiştê ku cîhana Kevokê serûbinê hev dike, wê dixê nav wê helwesta sosretiyê û herdu lehengan rûberî nîgara neçê dike, tarîtiya bêdewletbûn û bêkesbûnê ye...

Bi taybetî romana hunernûjen a ku şax vedide li ser darê cîhanê, pêwîst bû ku, em li ser vê romanê rabiwestin, çimkê ev roman cihê vala dadigire û bingeha avahiya wêjeyeke Kurdî ya nûjen demazrîne. Mehmed Uzun, ji aliyê karê wêjeyî û çandî ve xwediyê taybetî û hunereke mezin e. Ev nivîskar, di warê fantazî û teknîkê ve jî, ne kême *Franz Kafka, Thomas Mann, Tojstoy, Dickens, Abriyêl Garcia Marquý*. ye.

Beriya ku ez vê romanê bixwînim, min romana Mehmed Uzunî ya bi navê “*Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*” xwend û min nivîsek di derheqê wê de nivîsand û ew di kovara “*Helwestê*” de hat weşandin.

Tamxweşî, çêj, xoş û lezeta wê romanê di bin zimanê min de bû, min dest bi xwendina romana “*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*” kir, wê ez birim nav cîhana xwe, ez ketim nav şer û şoreşan, nav lorîna dayikan û girîna zarokan, wan ez girtim û berê min dan Kurdistanê, ez çûm Kurdistanê, min li wir laşên şehîdan dîtî, bi hêviya dermankirina birînên wan ez jî wekî Kevokê, li ser çîyan digeriyam, min dayikek dît,

wê digot; “*de lorî, lorî, lorî, lorî kurê min*”. Bi lorîna dengên wê, ez li xwe aqilim û min dît ku ez ji şer û cengan dûr im, li Swêdê me, lê bi şoreşa romana Uzunî, berê min dabû Kurdistanê, li wir, min li dijî dijminên Kurd şer dikir. Ez li romanê vegeriyam, min tê de, dît ku Welatê Çiyan dişewite, dar û berên wî dişewetin, gun dû dahlên wî, devî, daristanên wî, war û wargehên wî dişewitin..., ez di deriyê romanê de çûm nav refê şoreşê, min kirasê pêşmergan li xwe kiribû û ketibûm nav refên wan.

Romana Uzunî, romaneka nûjen e, neynika hundirê mirovî, psîkolojiya hundirê mirovî, hest û têkoşîna hundirê mirovî dide dihîne zimanî.

MEHMED UZUN BI TENÊ YE

Nivîsîna vê romanê; “zorê dide me da ku em bibêjin; **Mehmed Uzun** hem hîmdarê romana kurdî ya hunernûjen e û hem jî hevalbendê Kafka, Mann, Tojstoy, Dickens, Gabriyel Garsya Marquy, Balzac, Joyce û Hemîngwayî ye. Ew nivîskarekî neteweyî û navneteweyî ye. Ew nivîskarekî piralî û zîrek e. Ji aliyên çand û wêjeyê ve, xwediyê taybetmendî û hunereke mezin û bi çandê ve tijî ye. Di derheqa hunera zimanê wêjeyî de zanîna xwe ya taybetî heye. Ji ber hindê, ew di nav nivîskarên hem-dein de, bê şik yê rêza pêşîn e. Uzun xwedî sê zimanan e, lê ji tevan bêhtir bi kurdî romanên xwe dinivîsîne.

Uzun hemû romanên xwe li sîrgûnê nivîsîne, ew nivîskarekî sîrgûnê ye. Sîrgûn gelekî kesan pûç û vala kir, wan bêwar û bêziman kir, lê sîrgûn ji bo Uzunî, bû cih û warê afirandina zimanekî ku ber bi mirinê diçû, Uzunî ew ji mirinê azad kir û kir zimanekî wêjeyî û jîndar. Bi hebûna vê romanê, em dikarin bibêjin ku Romana Kurdî ya nûjen heye. Herçendî dereng mabe jî, ne xem e. niha heye... Heger Uzun nebûye, Kurdistan çolekî bêdar û ber, çolekî rut, ziwa, hişk, çilmisî, pûyî, wekî darên bexçeyê yên bêav em li ber tavê hişk bûn, ava kahniyên me vemirî, ew ziwa bibin.

Uzun ji bo zimanê kurdî dîrokekê diafrîne. Ew nivîskarekî dogmatîk nîn e, divê em wî wek navneteweyî yê pêşîn bibînin. Ji xwe ev romana ku di destê we de, çirandina sinoran e. Mehmed Uzun pirhevoksaz û nêrengsaz e, ew zimanekî nûh diafrîne. Ew pispor çêkerê yekemîn yê zimanê roman e. Yanê ew hîmdar û avakarê zimanê romanê yê modarn e. Ew nivîskarekî navbervan e û bi du çavan bûyeran derbasî ser kaxizan dike. Ji ber hindê, ew wekî *Sarte* existentialist, humanist û mirovhez e. Yanê ew wehş û kirinên nemerovane dadgeh dike.

Di romana wî ya nûh de vegotina teknîk û temayê bilind e. Ev yeka dihêle em bibêjin, Uzun zimanekî nûh diafrîne, ji ber hindê, hîmdar û avakarê romana Kurdî ya nûjen e û hem jî nivîskarekî navneteweyî ye. Uzun *Joyceyê* Kurd e. Romana wî dê cihê xwe di nav romanên cihanê

yên modern bigire. Ew bi romana xwe, di sala 1998ê de, bû xwedî şohreteke mezin. Piştî nivîsîna vê romanê, ew jî qonaxekê re derbasî yeka dinbû. Di vê dema me de bi pêşveçûna zanyariya dinyayê re û bi îcadên nûh re nêrîn û dîtînen mirovên Kurd jî binî ve guhêrîn. Uzun nûnerê dema niha ya tîpîk e, tê de dijî. Ew dibîne ku di warê zanyariyê de riyên pir fireh li ber mirovahiyê vedibin. Ji ber hindê, ew dixwaze ku di hunera romana xwe de aliyekî zanyarî jî hebe. Uzun diyar dike ku, gava ew di berhemên xwe de qala mirovekî bike, divê karaktera wî mirovî bi hawayekî zanistî şîrovebike. Ev jî bo serpêhatî û bûyerên "*Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirîne*" wisan e. Yanê bûyer û serpêhatî, bi çi hawayî û çima dest pê dikin, diqewimin û çima pêşve diçin û bi çi hoyan dawîya wan dihên; divê ev tev bi metodên zanistî yên wêjeyî bihêne eşkerekirin û zelalkirin... Bi rastî Mehmed Uzun, van hizir û baweriyên xwe di vê romana xwe de bi kar hanîye. Wî, bi vê romanê, şopeke nûh damezrand û wêjeya kurdî jî propaganda û siyasînameyan rizgar kir. Wî bi qayde û hawayê dualîzma Mezobotamî ya kevn, mîna dualîzma Gilgamişî ya ku di derheqa mirin û jîyanê de ye, nivîsîye. Dualîzm di wêjeya nûh de jî cihekî girîng digire.

Ez di Romana Kurdî de serkeftinekê dibînim, lê di novell, çîrok û berhemên kurdî yên din de nabînin, pê xemgîn dibim, li ber xwe dikevim, serê xwe dixurînim, lê ev sûcê min e; sûcê wan.

ASTENGÊN LI PÊŞIYA NIVÎSKARÎ

Heger mirov qala astengên li pêşiya Uzunî bike, ew pir in. Ez nizanîm ka hêja ye ku ez yek bi yek qala wan bikim? Lê yek jî wan, astengên; gelşa şerê kirêj, rastiya tahl û trajediya me ye ku pîrçaran hunerê vedigere û dide ber darê lêdan û kuştinê. Di şert û hoyên wisan de, dewsa ku mirov romaneke bedew pêk bîne, sloxanname, derdname, siyasîname dihê pêk. Ev tahlûke li ber Mehmed Uzunî jî hebû, lê ew biserket. Ev rastiyan tahl yên gelê me, bê guman cihê xwe di vê romanê de digirin, lê bi hawayekî wêjeyî ku li romanê bêhnê neçikandine û roman nebûye warê propangandaya siyasî ya partî û rêxistinan. Çimkê qeydên wêjeyê, nemaze yên hunera romanê, xwediyê zimanekî wêjeyî ye, zimanê romanê û zimanê perwergarî jî hev pir dûr in; roman ne rasterast berdevka bîrdozî û ramanan e, di vê romanê de bîrdozî, konevanî, têkoşîna neteweyî û mesaj hene, lê ew bi cih û bergên wêjeyî û hunerî hatine honandin û xemilandin.

NAVEROK

Mehmed Uzun wekî kamerabanekî hovîti, jakamî, dirindeyî û wehşeta ku li Welatê Çîyan dibe, dikişîne, wan bûyeran, bi hawayekî zanistî dihonîne. Hinek berhemên kurdî wekî çoleke bê dar û ber, ziwa, rût û repal in. Lê ev

roman ne wisan e. Em vebigerin ser hizir û ramanên vê romanê, em tişteki nûh, kûr û berfireh dibînin; berxwedan û têkçûnên Kurdan.

Naveroka romanê rojane ye, qala şerê Welatê Çiyan dike. Bi problemên civakê ve girêdayî ye. Ev berhem, berhemeke monoton nîn e, çimkê berhemeke monoton bala kesî nakişîne ser xwe. Ev roman bi bûyerên rojane ve tijî ye. Mehmed Uzun di vê romana xwe "*Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê*" da qala şerê rizgariya neteweyê Kurd yê ku li Welatê Çiyanan dibe, dike. Ew bi du çavan li bûyerên şerî mêze dike, yanê bi çavên herdu aliyên li şerî dinêhêre. "Welatê Çiyan" Kurdistan bixwe ye û "Welatê Mezin" Tîrkiye, Îran, Îraq, Sûriye ye. Çend sal berî niha, Helepce bû hedefa êrîşên kîmyewî yên dewleta faşîst a Îraqê û 5000-7000- keç, jin kal û zarokên Kurd hatin şehîdkirin û bi hezaran jî hatin birîndarkirin û bi hezaran jî berê xwe dan çolistanê. Di romanê de, Uzun qala Welatê Çolê dibe. Dibe ku "Welatê Çolê" Çolistan Kurdistan başûr be, dibe ku derekî din be jî. Çimkê bi hezaran jî Helepceyê reviyên, li çolê, çiyên, newal çolistanê bi cîh û war bûn. Ew ber sar, serme û baranê bûn. Dewleta Îraqê di sala 1975 ê hinek Kurdan sûrgûnî *Kewatê* kiribû. Dibe çolistan *Kewatê* be. Dîsan, ev roman qala Kurdên ku ji bajarên Kurdistanê (Dêrsim, Axrî, Sasûn, Geliyê Zilan, Amedê) reviyane û paşê di dibistanên dijminan de xwendine, dike, li ba wan xwe înkarkirin heye û ew jî dijî neteweyê xwe derkevin, hene, Baz yek ji wan tîpan e. Dê û bavê wî di serhildaneke Kurdan de hatin kuştin û ew sêwî û bêxwedî mezin bûye, paşê bûye dostê dijminê dê û bavê xwe.

Baz çil û du salî ye û Kevok bîst û du salî ye. Baz di zarok û piçûkahiya xwe de sêwî û bêxwedî mezin bûye û paşê dibe zabitê ordiya ku dijminên dê bav û kalikên wî bûne. Baz bi saya *General Serdar* dibe zabîtekî binavûdeng û dîroka zaroktiya xwe înkare dike. Ew bi xwe hebûna welatê xwe qedexê dike, bi darê zorê binax dike. Ordîya Welatê Mezin, bi alîkariya wî, welatê wî diket warê şer û cengan, kuştin û hilweşînê... Bi gotîneke din, jiyana dê û bav, pismam, ap û merovên xwe, cîhan zaroktiya xwe, li welatê xwe dike "gayrî meşrû".

Ev roman, ji serî ta dawiyê, du hawayên tekoşînan ango karekteran li ber çavan radixe, ku ew herdu jî li dijî hev in. Yanê di kesitiya qehremanên romanê *Kevok*, *Rênas*, *Çekdar* û *Jîrî* de rîya mafxwaziya neteweyî, adaletxwazî heye û di kesitiya *Baz* û *General Serdar* de jî, xirabî, xwînxbwarî, bêtoleransî, monoteîzm û yekneteweyî heye. Ew zorker, zorbaz, hov, dilkevir, dilreq, dilhişk, nedilvan û bêînsaf e. Ev dualîzm di ola *Zerdestî* û destana *Gilgamişî* de cîyekî girîng digire.

Gernasê yekemîn Baz e, kok Kurd e, lê bûye zabitê ordiya Tirk û gernasî duyemîn li bajarekî welatê Mezin (Tirkîyeyê) dimîne, navê wê Kevok e (keça awukat), ew zilm û zordariya dewleta Tirk nepejirîne û li dijî wê zilmê derdikeve ser çiyên; tevî pêşmergan dibe û berxwedaneke li ber çavan radixe. Herdu gernas jî hatine çêkirinê, sembolik in. Jîr, Rênas, û Çekdar jî, wek Kevokê ji Welatê Çiyan, sembola xweşî û azadiyê ne,

ew li dijî welatê Mezin (ordiya Tirk) şer dikan, dixwazin tola şehîdên xwe hilbidin, lê bisernakevin û dijmînên wan jî bisernekevin. Welatê wan di nav xwînê de ye, bûye gola xwîna şehîdan, lehengên ku di çîyan û newalan de dihê kuştin, laşên wan, bêgor ji teyr û heywanan re bûye xwarin, dihê bîra wan û ew dixwazin bi şoreşeke çekdarî Welatê Çîyan azad bikin. Ji lewra jî, Kevok dikeve nav refê şoreşê, di nav komek pêşmergan de cihê xwe digire. Kevok di kesitiya xwe de şoreşekê çêdike û diqulibe ser kesitiyeke nûh, miroveke nûh.

Di vê romanê de General Serdar heye; ew dîktatorekî mezin e; aqilmendê Baz e, lê li piştî Baz dijmînê wî yê veşartîye. Ew hemû aliyê jiyanê yên ronak û bedenên wê qedexe dike. General Serdar, li ba Baz dostê wî yê yekemîn û li piştî wî jî dijmînê wî yê yekemîn e. Digel vê yekê jî, ji bo Baz, ordî, dewlet, netewe û ala dewletê, şan û şerefa wî ye. Baz bi çavekî mezin li General Serdar mêze dike, Xwedê li jor, li jêr jî ew. Baz aîde, û kopiya wî ye, wekî wî dilive. Baz navekî qod e, navê wî yê rastîn ne diyar (di romanê de) e. Em du karakterên bingehîn dibînin, ku yek jê; karaktereke mirovhez, nerm û têgiştî ye. Ev karakter di kesitiya Kevok û Rênas de heye, dikare mirovahiyê biafrîne, lê bi sernakevin.

Di dawiya romanê de, gotinên Zabitê Simbêlqîtî, Bazî didin hizirandin. Ew mirovekî kal dinyadîtî ye. Baz û ew, herdu hûrê dipeyivin. Zabitê Simbêlqît dibêje: "Bajar guherîn, kinc, cil û berg guherîn, tank û top, erebe û otomobîl guherîn, balafir û telefon guherîn, lê însan mîna xwe ma, rik, kîn û îlada insanen herwekî xwe ma..." Yanê dewlet û ordiya Tirk wekî xwe maye.

Baz baş guhdarî dike, dibêje: "*Ez ketime bextê te, ji min re bibêje, bi qasî ku tê bîra te.*"

... *Yanî tu dibêjî... yanî ez ji wan deran im... yanî bav û diya min, ne qezayeke trfîkê de mirin? Li wan deran.... ez sêwî mam? Bav û diya min ji wan in? Ez ji wan im...?"*

Baz sedema kuştina dê û bavê xwe dihire. Mader qala cîhana dê û bavên wî (Welatê Çîyan), war û wargehên wan dike, dîsan ew cîhan li Bazî vedigere rabûn û rûniştin, tevgêr, ziman û çanda wê cîhanê. Bazî ber bi xwe dikişîne, ev jîyan di zargonên fermî yê Welatê Mezin de qedexe ye. Baz di van rêzên jorîn de em têdigihîjin ku ew li Kurdiya xwe e, vedigere, hindî ji Welatê Çîyan e, ji Kurdistanê ye, lê pir dereng e. "...*yanî ez ji wan deran im...*", dibêje. Kumê xîço li serê Piço, ne hat û ne diçû. Yanê Kumê General Serdar li serê Bazî, ne hat û ne diçû serê wî.

Di romanê de bi navê Mader, jinek heye. Ev jin dostika Baz ya kexaneyê ye, lê weke diya wî ye jî. Mader bi xwe allegorîk e, ne bi tenê bûyer û ziman allegorîk e. Mader bixwe xwediyê du karakteran e. Baz ji Maderê re wisan dibêje: "*Ez dê ji te re tiştekî bibejim lê şaş mebe, min dest bi xwendina şîran kiriye. Şîrên li ser aşq û sewdayê,*"

şîrên ku qala evînê dikin..." Mader, hinekî şaşbûyî, "bi xêr be", dibêje, "ev jî tiştêkî nûh e!... Kurê min ê sêwî û şîr!". Ez têdigihîjim Mader hem diya wî û hem jî aqilmendê wî ye. Mader du mirov e, allegorîk e.

Em vegerin ser Maderê, ew wisan dibêje: "...dînya bi dor e, ne bi zor e. Zor nikare dewsa dorê bigire. Rûyê bayekî gur, bi dereke din ve badî, an şevê bikî roj, dora wan biguherînî, stêr û heyvê biqulibînî ser tavê? Ruhê însanan jî weha ye. Ruh, bi zorê terbiye nabin... Ji ber ku nexweşîyeke weha ruh, dil û hîsên însanan derdixê pêş. Ji ber ku insan, heta niha, ji bo te, ne însanan bûn, jina te zarokên te, ez jî tê de, em hemû, ji bo te, wasite bûn, alet bûn, diranên çerxa nêrîn û qaydeyên te bûn, em hemû diranên kêfa pergala mezin bûn, pergala ku tu jê re xizmetê dikî. Ji ber ku ji roja ku min tu nasî û vir ve, tu carî, te însanan, dil ruh û hîsên însanan nedît û te xwe nehêşand ku tu bibînî. Lê niha, tu dê bibînî. Ji ber ku taya evînê, tayeke hîsî, tayeke insanî ye... Ji ber ku evîn, nexweşîyeke insanî ye, însanan dike insan..." Mader kelegirî dibe û nikare gotinên xwe dubare bike. Em di van hevokên jorîn de dibînin ku derd û kulên Maderê giran û mezin in. Ew ji kêfê re neketiye Kerxaneyê. Mader bêgav dimîne. Şert û şûrtên jiyînê wê ber bi Kerxaneyê ve kaş dikin. Yanê ew ji bêgava jiyânê ketiye kerxaneyê... Di dilê wê de mal, zar û zêç...

Di vê romanê de lehengên ku karakterên wan li dijberî hevûdu hene û di nav wan de têkoşîn û hêvî û bêhêvî, heye, hene. Karaktereke General Serdar heye xwînêrjî, zilm û zordarî... Baz jî xwînêrjî û zordar e, lê poşman dibe. "Yeşil"ê ku îro li Tirkiyê zahf tê peyivandin dikare bibe Bazekî...

Em vebigerin ser Kevokê, keçên mîna wê pir in. Keçên serhildêr yên di şerî de dîl dikevin û dikevin destên dijminî pir in, bêhejmar in û paşê dibin îtîrafkar cih û stargehên keleşan nîşanî leşkeran didin, pir in. Dîsan di vê romanê de Rênas heye, ew Kevokê ji mirinê rizgar dike. Ew wê dide ser piştê xwe, ji sar û sermayê azad dike. Gava ku Kevok dihê girtin stargeh û warên Rênas û keleşan ji Baz ra dibêje. Rênas û hevalên xwe ji rûyê Kevokê ve dihên kuştin û girtin.

Naveroka romanê kom dibe ser van xalan:

1) Kurd hezkarên tebiyetê ne; 2) Tunebûna azadiya ramanî û çape-menî, 3) Qedexkirina kovar, rojname û pirtûkên kurdî; 4) Qedexkirina partî, rêxistin, civîn 5) kesitiya Kevokê ya kevn û nûh (porkurt, niha keleşkokeke lûlekurt li ser milê wê ye, li ser rûyê wê şopa krem û boyaxê nîn e, lê berê hebûye; 6) Girtin û kuştina rewşenbîran, siyasetzan...; 7) Sirgûnkirina giregiran, malmezinan, rewşenbîran, gundiyan; 8) qedexkirina mafên grev, lokawt, xwepêşandan, meş û civînan, hestê mirovane...; 9) Evînî, dildarî...; 10) Problemên Bazî yên zarokî, sêwîmayînê; 11) Metodên îşkenceyê; 12) Şewitandin gundên Kurdan, rewşa kambax a niha; 13) li dijî têkoşîna neteweyê Kurd şerkirin; 14) yeknetewebûn û yekdewletbûn..

WEKHEVIYA JIN Û MÊRAN

Neteweyê Kurd ji hebûna xwe û ta îro tu cihêti ne xistiye nav jin û mêran. Mehmed Uzun vê wekhevbûnê, bi lehenga xwe ya bi navê Kevokê îspat dike li gorî gotinên pêşyan “*şêr şêr e; çi jin e û çi mêr e*” (di romanê de). Bi alîkariya vê gotinê, em dikarin bibêjin, wekheviya jin û mêrên Kurd hebûye, lê bi hatina ola Ereban ve winda bûye, miriye, olê kesitiya jinan nizm kiriye û bêrûmet kiriye. Ev roman pîrekî nûh di navbera kevneşopî, adet û cihên jin û mêrên Kurdan de datîne û wekheviya wan bi hawayekî wêjeyî û çandî zelaltir dike. Di çanda me de gelek gotinên pêşyan hene. Yek ji wan gotinan ev e: “Jina çê mirov dike wezîr, jina xerab mirov dike rezîl”. Hemû jin jî ne wek hev in; hemû mêr jî ne wek hev in, mêrên baş hene; yên ne baş jî hene.

KELEŞÊN WELATÊ ÇIYAN Û ORDIYA WELATÊ MEZIN

Dema mirov vê romanê dixwîne, mirov dibîne ku gelê me li ber xwe dide, şerê “Serxwebûna welatê xwe” dide. Em serûçavên van probleman di jiyana gelê xwe ya rojane de jî dibînin. Di romanê de hertişt diguherin, lê dewleta Welatê Mezin weke xwe dimîne. Çima? Uzun hemû xirabî û metodên ne mirovane dike stûyê sîstem û nîzama Welatê Mezin (Tîrkiye, Îran, Îraq û Sûriye). Ev dihe wateya ku xirabî û xwînrêjiya Baz jî, ji sîstemê dihe.

Cihan guherîn, kinc û cil guherîn, mal û xanî, tank û top, kevîr û xwelî guherîn, lê insanên Welatê Mezin mîna xwe man, kîn û îrada wan herwekî xwe ma. Li ber hindê, zargonên wê xwe naguhirin. Di romanê de jî wekî xwe dimînin. Zargonên Welatê Mezin yên çandî rêzanî, civakî û leşkerî li dijî rûmeta mirovan e, ew bêrûmetiyê diafrîne û ji lewra jî Baz û tevî ordiya xwe, li dijî mirovahiyê ne. Hebûna rûmetê jî girêdayê azadiya Welatê Çiyan e. Welatê Mezin ku demokratiyê pêk nehanîye, ji lewra jî leşker û ordiya wî dijminê Welatê Çiyan e, ji bo welatê General Serdar hebûna rûmatê ne pêwîst e. Leşker û zabitên welatê wî ji mêjiyên xwe yên dema hovitiyê azad nebûne. Yanê General Serdar, dewlet û zabitên wê, tenê bi şekil û dirûyên xwe yên fîzîkî ve mirov in; ew bi dil û mêjiyê xwe nemirov in.

KEVOK, RÊNAS û ÇEKDAR çavên xwe yên çepê digirin û çavên xwe yên rastê li nîşanê digerin û **BAZ** û ordiya xwe çekên wan li milên wan mîna Dijlê û Firatê, pêrgî hevûdu dihen. **KEVOK, RÊNAS û ÇEKDAR** ji milekî, Baz û ordiya xwê jî li milekî, ew rûberî hev dibin. Şerekî giran dest pê dike, dê weledê xwe davêje. Di vî şerî de rewşa Kevokê û hevalên wê çawan e?

“*Xanî, mal dişewitin. Derî, pencereyên xaniyan, banên wan ên bi ax û ka, axur û kadînen wan dest pê dikin û dişewitin. “Mala minê”, Kevok dibêje...*

Hewş, hesf dişewitin. Dar, ber, dahl devî dişewitin, giya, pûş dişewitin”.

Em di van rêzên jorî de hestên Kevokê yên mirovane û bi derd û kul dibînin.

“Belê”, Rênas dibêje, “meraq meke heta helîpkopter werin, em di nav çîyan de ne...”

“Lê, em gelekî dûrî çîyan in?

“Na, na, em xwe digihînin çîyan...”

“Hingî hazirî bikin, Baz... hedefa yekemîn Baz e. Kî dê lêbixe?

“Ez”, Rênas dibêje, “ez ê bi guleyekê mêjiyê wî belav bikim.” Şervan, bi lez, dest bi haziriya êrîşê dikan. Didu bi didu, sisê bi sisê, li der û dorên bilindahiyên giran, li cîhên ku bi çeperan dişibin, rûdinin û lûleyên çekên xwe ber bi gund dikan.”

“Li gundiyan hayîdar bin”, Çekdar dibêje, “Baz, zabî, kamyon, leşker, û gundiyan parêzger hedef in”....

Em di van rêzan de jî hedefa şervanan dibînin, ku hedefa wan ya yekemîn Baz e, ew jî Kurd e, lê xwe wek Tirkek dibîne. Di jiyana wî de hemû tişt hene. Ango jiyana wî ser derewan avabûye. Baz xwediyê karaktereke têkilhev û têkil e û ji lewra carna dikeve bin hîkariya Kevokê, çimkê hundirê Kevok paqij e. Xerabiya Bazî ya ku ji dijî Kevokê bûye ji nîzam û sîstema dewlet dihê. Tawan, tawana Baz nîn e, ya dewletê ye. Herçendî Baz, dewlet û kontra li alîyekî û Kevok û pêşmergan li aliyê din bin jî dîsan Baz dihizirî û dikeve bin hîkariya Kevokê û dilê wî bi wê dişewite. Carna hestên Bazî yên kurdane (kurdîtiyê) wî hembêz dikan û wî ber bi xwe ve dikişin. Ji ber hindê, Baz ji deng û helbestên Kevok hez dike, li dengê wê guhdarî dike û hestên wî yên hişk şûna xwe didin yên nerm û mirovane. Ew hêdî-hêdî li xwe û li rastiya xwe vedigere, lê pir dereng e. Bi gotîneke din, di dawîya jiyana Bazî de bûyerên baş diqewimin. Ew li xwe û kurdîtiya xwe vedigere, lê dereng e, pir dereng e. Karakter û psîkolojiya wî ya kurdane xwe dide der, lê çi heyf hindî hertişt qediyaye, çûye. Ji ber hindê. Baz Kevokê teslîm nake û ew jî bi wê re direve. Lê herdu jî, ji destên dewletê azad (xelas) nabin. Baz û Kevok di havîgehekê de bi dizî dimînin, lê paşê hin kes wan dibînin û li giliya wan dikan. Kevok dawiyê, di îşkencexaneyê de stargeha Rênas û hevalên wî ji Baz re dibêje. Baz û ordiya xwe êrîşeke mezin dibin ser stargehê. Di vê êrîşê de Rênas dihê kuştin.

Piştî êrîşê keleş direvin (...) Kevok dide pey Rênas. Kevok dar, ber, kevir, xîç, çal, kort dide ber xwe û direve. Keleşkova ku agir dibarand di destê wê beden, serî û gewriya wê bi tayek nediyar ketî, ew dilezîne û “mala min” dibêje. Mala min, di vî danê êvarê de mirin, şewat, barûd, berik, windabûn”. Lê kevok birîndar û dîl dikeve.

KEVOK di îşkencexaneyê de çi dibêje?

Hemû xirabî û pîsitî li Kevokê hatiye kirin. Ew nexweş û westayî ye. Baz û generalên wî Kevokê dihêşînin da ku ew bipeyive. Lê ew naxwaze bipeyive; matmayî û bêdeng dimîne, bi tenê, bi hewayekî erênî, serê xwe dihejîne. Baz lê vedigere dibêje: *“Du rê li ber te hene; tu dê pipeyivî, alîkariya me bikî û bijî. Yan jî tu dê nepeyivî, alîkarî nekî û bimirî”*. Gotinên Baz weke guleyên lûleya tifingê lê dikevin, wê ditirsin...

Baz, dîsan li Kevokê vedigere, dibêje:

“Keça min, înad meke, bipeyive” Baz, gelekî nerm, kite bi kite, li ber guhê Kevokê, dibêje. Ji Kevokê deng dernakeve.

“Hingî bikuje...”

Zabit, dîsan, gundorê çend caran dizivarîne, lûla demançê datîne ser eniya Kevokê, tiliya xwe dibe ser tetikê û radiweste.

“Keça min, heyfa te ye, bipeyive...”

Di beşa 12 emîn de, Baz û zabitên ku li dora Kevokê ne, hemû serbûriyên ku Kevok qal dike, pê didin nivîsîn. Ew sade û samîmî û zelal hemû tiştî dinivîse. Baz jê re dibêje:

Xwedê çend?...

“Yek”e, Kevok, bêrawest, bersiv daye.

Bav çend e?

“Yek”e, Kevok dubar kir.

“Dê çend e?”

“Yek e”.

“Dewlet çend e?”

“yek e...”

“Baş e, keça min, serek çend in?”

“Yek e” Kevok, bêtî ku bifikire, bersiv dayê.

“Ala çend in?” Baz, ji bersivan kêfxeş, dîsan bi nermahî, pirsî

“Yek...”

Welat çend in?

“Yek e”

“Baş e, keç min, pir baş e...”

Piştî îfادê û xiyaneta Kevokê, demeke nûh dest pê dike. Di vê dema nûh de Kevok îtirakar. Kevok, bi serê xwe hejandinê re rûpeleke nûh di jiyana xwe de vedike. Hindî ew îtirafkar e, stargeh û kampên keleşan nîşanî Baz û ordiya wî dide.

Rênasê ku Kevokê xelas dike, bi îtirafên Kevokê dihê kuştin...

Beriya ku Kevok dîl bikeve, ew ji Rênas re wişan dibêje:

“Te ez ji dijminê herî mezin ê cîhan, ji sar û sermê, berf û seqamê xelas kirim. Te ez ji dijminê herî hov, herî dijwar, ji tebiyeta hov ku bûbû cinawerekî û ketibû pey min, xelas kir.”

(Rênas lê vedigerîne)

"Dev jê berbide, tu dê jî rojekê alîkariya min bikî, min xelas bikî... dev jê berde û pêşiya xwe binêhêre, diqet bike, tu li derekê neqelibê..."

(Kevok jî lê vedigerîne, dibêje)

"Te ez xelas kirim, jiyana min ji mirinê rizgar kir, te jiyana min li min vegêrand. Te jiyanê nûh da min..."

(Dîsan, Rênas lê vedigerîne)

Kevok, dev jê berde, ev çendîn care ku tu dibêjî. Bes e, bibire."

(Kevok lê vedigerîne)

"Te ez ji dijminê herî dijwar xelas kirim..." Bibore... Dijminê herî dijwar ne tebiyet e, însan e, ji bîr meke, însan dijminê herî dijwar ê însan e..."

ZIMANÊ ROMANÊ

Zimanê vê romanê, zimanekî nerm, bi aheng, herikbar û şêrîn e. Ev ziman, ne wek zimanê propaganda û ajîtasyonê vekirî ye; veşartî, sembolîk û allegorîk e. Rastiya peyvê ne huner e, راستiya wê bi qeydên wêjeyî huner honandine. Ev roman peyv û gotinên nûh dirêse. Mehmed Uzunî gotin û hevokên gotinên pêşyan û berê çêkirî bikarnehaniye, hevokên nûh dirêsandiyê, peyvên ciyan, darîştina hevokan û wêneyên helbesta nesirê afirandiyê; raman û baweriyên nûh pêşkêşî xwendevan dike. Zimanê romanê, zimanê helbesta nesir e (prosa-poem), zimanekî herikbar, nerm, bi aheng e. Yanî Uzunî, bi hawayekî wêjeyî û allegorîk bûyerên ku di romanê de diqewimin di hîne zimên. Zimanê Uzunî sade û sivik e, hevokên wî kurt in, lê bi xwîn û goşt in. Wek ava çemekî zelal yê ku diherike... Bi gotineke din, zimanê Uzunî, zimanekî çêkirî û mekanîk nîn e. Dîsan, di vê romanê de bikarhanîna demên lêkeran; dema bihirî, dema bihirî ya têdayî, dema bihirîya çîrokî, dema niha, dema niha ya çîrokî, dema pêş ûhw hevûdu digirin. Herwisan bêhnok(.), niqtebang(!). niqte(.). niqtebêhnok(;) Niqtêsê(...) niqtepirs(?).

Hema hema di hemû berhemên kurdîde, dema mirov li dema lêkeran mêze dike, mirov dibîne ku bêserûberiyek heye. Lê Mehmed Uzun, di vî warî de jî, bi serkeftiyê.

Ev roman bilind e, di warê huner honandinê de blind e, di warê hunera zimên de bilind e. Zimanê *Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê*; zimanê **helbesta nesir (prosa poem)** e, lê yê "*Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*" Zimanê stranbêjî û dengbêjiyê ye û yê *Bîra Qederê* jî zimanê rewşenbîriyê ye.

Bi rastî zimanê Uzunî, zimanekî zelal, şêrîn û sivik e, nerm nerm diherike, wekî çemên Dijlê û Firatê. Gava diherike jî, bêhn û helma xwe ya nûjentiyê li derdûdora xwe belav dike. Ev romana nûh ji aliyê serhatî (macera), serinc, xoroş û poroş (heyecan) ve biserkeftiyê. Yanê ji aliyê macera û heyecana zimên ve jî hêja ye. Tam, tama ku xwendevan bi dev û zimanê xwe bigirin. Tehl û tûj tede nîn; ev ziman marî ji qulê tîne der. Yanê Uzun zimanxweş û rûken e, dikare bi zimanê xwe marî ji qulê bike der...

Û ev roman bi zimanekî allegorîk hatiye nivîsîn. allegorî, gotineke Grêkî ye. Di bingeha xwe de ji peyva “allegoria” dihê. Alleglorî du wateyên xwe yên wêjeyî û hunerî heye. Nivîskar nexwestiye ku rasterast bûyerên siyasî binav bike... Allegorî, ew e ku mirov bi alîkariya wêneziman, suret, navên çêkirî û sembolan çî bixwaze wî dinivîsîne.

Nimûne, di vê romanê de “tarî” mirin e, têkçûn e, xwînrejî ye, zalimî ye, xwe înkâr kirine. Allegoriya ku em qal dikin, allegoriyeke wêneziman û wêjeyî ye. Di allegoriya wênezimanî de du ziman hene, zimanê veşartî û zimanê vekirî. Nivîskar bi zanebûn, bûyereke siyasî dide ber çavan ku ew bûyer qedexa ye, di bin siya berçav de ye. Divê hawayekî din bêne eşkerekirin.

Di vê romanê de zimanê allegorîk û zimanê vekirî baş li hev hatine honandin û nexşandin, ku hevûdu tam dikin. Yanê bûyerên rast û fantazî têkilî hevûdu bûne. Di vî warî de ev roman biserkeftiye. Ev yeka hanê, dilê me şad dike. Çimkê, zimanê kurdî, bi hawayekî nûjen, dikeve warê nivîsandinê, romana kurdî ya nûjan pêk dihê û wêjeya me dibe; xwişk û birayê wêjeya mirovahî ya navneteweyî. Ev jî serbilindiyeke mezin e. Em dîsan vedigerin ser zimanê romanê, ew kom dibe ser van xalan:

1) Dubarekirin/carkirin: Dubarkirin, di wêjeya kevn a “Gilgamêş û ya “Oysséuê” de heye. Ev dubarekerin di romana Uzunî de jî heye, nimûne: “Kevok.

“Kevoka jiyane. Kevoka strana jiyane. Kevoka jiyana Welatê Çiyan. Kevoka çiyayên Welatê Çiyan. Belê, Kevok li Welatê Çiyan, li ser çiyane. Belê, em vegerin ser Kevokê.” Ev dubarekirin e û hem jî zimanê helbesta nesil e (prosapoem).

2) Wêneziman: Wêne, tablo, suret û simbol û navên çêkirî dipeyivin...

3) Allegorî: Allegorî ew e ku mirov di zêdayiya wêjeyê de wêneyên neditbar (nenêrbaran) çêdike. Dibe ku ev wêne mirov bin, dibe ku ev wêne navên simbolîk û suret bin. Mader bi xwe allegorîk e; ew xwediya du karakteran e, du mirov e. Wateya allegorî ya din; şubandin e. Bi zimanê gundiyan, bi dek û dolavan, dewletê bi zerar xistine, bi derew û fêlbazî kesên ku ne ji miriv bin, mirov wan dide bawerkirinê.

4) Helbestziman: Zimanê helbestkî, hellesta nesil...

5) Peyvdewlemendî: Dewlemendiya peyvane, pîrbikarhanîna peyv û gotinan; pîrhevokzanî

6) Şirovekirin: Mirov di nav hevokan de mirov dizane ku peyv û gotinên Uzunî dihên çî wateyê; nerme nerm diherikin.

Hin kesên ku bi van qayideyên wêjeyê nizanin, gelek tiştan şaş fam dikin.

Nimûne:

M. Xarpetî di derheqa Uzunî de nivîsekê nivîsiye, rexneyan li Mehmed Uzunî digire, serê hespê xwe berdide, bê ku bizanibe çî dibêje û çî

dinivîse. Navê nivîsa wî “Çend Taybetiyên Berhemên Edebî” de ye, tê de wisan nivîsiye”: Mesela heger mirov Sîpanê Xelatê nebîne û bi nêçîra pezkuyîyan nizanibe, dikare binivîse li Sîpanê Xelatê bi hespan çûn nêçîra pezkuyîyan... (li romana Mehmed Uzun a *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê binêrin*). Bêhna nezaniyê ji van dîtinan dihe, çewt in.

Binêre: M.Xarpet Çend Taybetiyên Berhemên Edebî” Welat, h.10, 18-24, Nîsan sal 1993

Roman, berhemeke perwergariye (fack tteratur) nîn e, ji ber hindê, dikare li ser avakarî, fantazî, mîtolojî û bûyerên nerast ava bibe û dikare ser bûyerên rastîn nerastîn jî avabibe. Yanê mafê nivîskarî heye ku riya hespî avabike, çêbike, ku ew rê tune be, jixwe yê ku romana “*Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*” dike roman; avakarî û fantaziya Uzunî ye, ne rastgotina wî ye.

Heger em bi pîvanên M. Xarpetî nêzikî romana Uzunî ya bi navê “*Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê*” bibin, ez dê bibêjim; *Franz Kafka* (1883–1924, Çek; romanivîs û novellîst) derewbêj e. Ji ber ku lehengê wî “*Grîgor Samsa*” dibe kêzikeke lingşil. *Jorge Amado* (jidayikbûn: 1912, Brazîlyanî) jî derewbêj e, çilo lehengê wî “*Kankan*” dimire û dîsan sax dibe. *James Joyce* (1882–1941) yek ji wan hîmdarê romana nûjen e, di romana xwe ya bi navê “*Odysseusê*” de li pey monologa hundirî ya ku dikeve nav xwîn û laşê mirovî û tê de dilive. Wî romana xwe ya bi navê “*Odysseusê*” li ser avakarî, mîtolojî û fantaziye avakiriye. Dinya dibêje “*Odysseusê*” romaneke nûjen e, herçendî li ser fantazî û mîtolojiyê avabûye jî, ew roman e. Em Kurd jî li dinyayê dijîn, divê em hay ji wêjeya cîhanê hebin.

GIRÊDANA BÛYER Û PARAGRAFAN

Romana Uzunî, di warê dîsîplîna teknîka romanê de jî bis-erkeftiye, tê de hunera honandinê heye, zanebûna teknîk û temayê heye. Ev berhem, berhemeke wêjeyî ye, bi naveroka xwe ve jî xurt e, forma wê ya wêjeyî heye. Her berhemeke wêjeyî berî ku formeke cîhanî bigire, divê orîjînalîteya xwe neteweyî hebe. Ev roman cîhana mirovî ya hundirî dide der. Ji lewra jî, romaneke cihanhundir û civakî ye. Hevokên romanê bi gotinên xweşik û mînakên hatine xemilandin û xurtkirin. Hevok û paragraf bi hevûdu ve girêdayî ne. Çi di bihevixistina hevok û kêşanên wêneyan de be û çi jî di honandina wan de be, pêşketineke nûh heye.

KAREKTERÊN LEHENGÊN WÎ

Gernasên Uzunî xwediyê kesîtî û karakterên taybetî ne. Nimûne Evdalê Zeynikê bi serê xwe bûyereke wêjeyî ye. Lehengên romanên Uzunî yên

wek Memduh Selîm Beg û Celadet Bedirxan xwediyê karakterên cuda ne. Di romanên Uzunî yê kevn de lehengên wî çalak û jîr in ango perîşan û belengaz in. Lê di vê romanê de tersê wê heye. Di romanên wî yê berê de, dijberiya di nav lehengên wî de kêm e, lê di vê romanê de zêdetir e, kînd û jehrên lehengên wî, li dijî hevûdu wek bombeyekê diteqe û belav dibe.

DI ROMANÊ DE TESWÎRA CÎH Û WARAN

Naveroka romanê hûrûkûr û biserûber e, ji ber hindê, navên leheng û welatên tê de hene, hatine veşartin, navên din, li wan hatiye kirin... Ji ber hindê, di vê romanê de pesnê cîh û waran bi zimanekî allegorîk û veşartî hatiye nivîsîn. Nimûne, navên bajaran, çeman, gundan, dewletan, welatan ûhw. bi wênezman û sembolan hatiye eşkerekirin û navandin. Dîsan, di warê erdnigariyê (coğrafî) de jî, navên rastîn derbas nabin. Em navên bajar û gûndên xwe nabînin, ji ber ku ew bi navên din hatine navandin.

Nimûne: Welatê Çiyan (Kurdistan) Paytextê Welatê Mezin Baxdad, Tehran, Ankara, Şam... Welatê Mezin dikare îran be, Îraq, Tirkiye... be.

Mehmed Uzun nivîskarê romanê ye; ne ku dersên erdnigariyê dide. Di nivîskariya wî de rastiya sazgerê ji erdnigariyê girîngtir e.

TARÎ Û RONAHÎ DIBIN YEK (Baz û Kevok dibin yek)

Mader sembola tarî û ronahiyê ye; diya cêwîyan e. Dê û bavê Baz ji hêza keleşan (Pêşmerge) bûne, piştî kuştina wan paşê dibe sembola tarî û mirinê. Baz Di dawîya jiyana xwe de, dîsan, li xwe vedigere, dibe yek ji wan, lê pir dereng e. Ev dualîzm di mîtolojiya *Zervanîzmê* de jî heye. Zervan xwedayê tarî û ronahiyê ye, bavê *Angro Mainyu* û *Ahura Maz* e, bavê cêwîyan e. Di romanê de tarî (Baz) û ronî (Kevok) dibin yek. Çimkê tarîtiya Bazî ji ronahiyê hatiye. Herwisan dualîzma ku di destana *Gilgamêş* (mirin û jiyan) û *Zerdeştî* (tarî û ronahî) de jî heye, cihê xwe di vê romanê de (nota min) digire.

Baz li strana Kevokê guhdarî dike û pê re hestên wî yê nerm û mirovane xwe dide der û ji Kevokê re dibêje:

Ew stran bû, te digot “Baz, bi ken; piştî çend qultên din, dibêje,” dengê te gelekî zîz bû...”

Kevok bersiv nadiyê. Baz qedehê datîne ser maseyê, ji cixarê nefe-sekê dikişîne û israr dike, “ez bi tenê meraq dikim... Metirse... Stranê behsa çî dikir?”

“Dadê, diya min ev stran digot”, Kevok bêyî ku li Baz binihêre, çavên wê li ser tiliyên wê yên dirêj, dibêje, “*bavê min dawiya heftan di hate gund. Her êvara yekşemiyê vedigeriya bajêr.*” Wê êvarê, êvarên yekşemiyên, gava Dadê ez dikirim xew, wê ev stran digot. Baz û Kevok di havîngehekê de bi dizî dimînin, lê paşê hin kes wan dibînin û li giliya wan dikin. Piştê, tîmên taybetî yên leşkerî Baz û Kevokê digirin û destên wan kelemçe dikin. Yanê di dawiya romanê de herdu jî bi destên General û leşkerên wî dihên kuştin û qedera wan jî dibe yek.

ATASÖZLERİ VE ETNİK SATAŞMALAR : AYRIMCI RETORİK ÜZERİNE

ROHAT ALAKOM (*)

Türkçe söylenen atasözlerini incelediğimizde, bunlardan bir kesiminin Türkiye'deki etnik azınlıklar ve topluluklar üzerine söylendiğini görürüz. Değil sadece atasözleri, Türk halk edebiyatının diğer türleri arasında da bu tip etnik sataşmalar ve yergilere rastlamaktayız.⁽¹⁾ Bu ayrımcı yargılara hedef olan toplulukların başında Kürtler, Lazlar ve Çingeneler gelmektedir. Çingeneler hakkında söylenen şu atasözü bilindiği gibi meşhurdur: Çingeneye beylik vermişler, önce babasını kesmiş (asmış). Kürtler ve Çingeneleri birlikte ele alan atasözlerine de rastlamaktayız: Çingene çalar, Kürt oynar gibi... Türkçe atasözlerinde bu topluluklar aşağılanmakta, incinmekte ve verbal (sözel) bir saldırıyla karşı karşıyadırlar. Atasözlerinin bazıları direk bu etnik azınlık ve toplulukları hedef olarak göstermekte, bazıları da Kürtleri malzeme olarak kullanıp ama başka gerçekleri dile getirirler yani ikincil anlamları vardır, bunlara mecazi ve temsili atasözü de diyebiliriz.⁽²⁾ Ne olursa olsun, bu atasözlerinde diğer etnik topluluklar horlanmakta, küçük düşürülmekte ve yukarıda da söylediğimiz gibi sözel bazı saldırıların hedefi haline gelmektedirler. Bilindiği gibi her atasözü, daha atasözü haline gelmeden önce bir olay ve bir öykü üzerine gelişir, daha sonra son biçimini kazanır. Toplumdaki haksızlıklar, eşitsizlikler, farklılıklar veya kültürel ayrılıklar zamanla öyle büyük bir düzeye ulaşır ki, bu kez toplumda bazı ön yargılar ortaya çıkar ve sonunda bu tür yargılar dile de yansır. Artık dilin frenlenemediği bir ortam yaşanır. Kimi yazarlar her ne kadar bu atasözlerinin şaka ! amacıyla söylendiğini tezini öne sürerek, durumun ciddiyetini yumuşatmaya çalışırlarsa da, durumun hep böyle olmadığı görülüyor. Kullanıldıkları biçimiyle sözcüklerin iğneleyici yanını bir kenara atıp, inkar edemeyiz.⁽³⁾

Kürtlere ilişkin olarak söylenen atasözlerinden hemen hemen hepsi yazılı hale getirilerek, değişik edebi yapıtlarda farklı bağlamlarda kullanılmışlardır. Özellikle roman ve öykü türlerinde bu sözlere sık sık rastlarız, örneğin Kemal Tahir'in Kürtleri konu edinen bazı romanlarında bu tür atasözlerinin sayısında belli bir artış görülüyor: " ...Ne demişler? "Kürdü kovalıya kovalıya dövme" demişler. Kediye bile bir yere sıkıştırırsan yüzüne sıçar. Biz şimdi Musa Çavuşla Abuzer Ağaya harp açtık ama herifleri büsbütün azdırmak da olmaz".⁽⁴⁾ Burada kullanılan Kürdü kovalıya

kovalıya döğmeli atasözü, saldırganlık konusunda söylenen tipik atasözlerden birisidir. Kemal Tahir'in başka yapıtlarında da bu tür Türkçe atasözlere yer verilir. Damağası adlı yapıtında, Erzurum yöresinden gelen Kürt göçmenlerinin, Orta Anadolu'ya yerleştirilmesi zamanla tepkilere yol açar ve bu durum Kürtlere ilişkin bazı atasözlerinin tekrarlanmasına yol açar" ...Erkekler kamilen askere gittiğinden köyler ihtiyarlara ve kadınlara kalmıştı. Gözünü budaktan sakınmayan Erzurumlular, vaziyetten istifa ettiler. Birkaç sene içinde Orta Anadolu ovasının uyuşuk, manda gibi zor kımıldar ve zor öfkelenir insanlarını sindirdiler. Elli haneye karşı, bir tek Kürt evi köyü zaptetti. Eşkiyalık, hırsızlık, bilhasa çerçilik aldı yürüdü. "Köylü için Kürtle kurdun farkı yok", "Kürten evliya, koma kapıya", "Allah Kürdü, Kürd Allahı sevmez", "Dokuz keçili Kürt, bir küçük hükümet" sözlerini Çorumlu, Erzurum muhacirleri geldikten sonra öğrendi. Sürüler adeta yağma edildi. En meşhur yaylalar, tapuda üzerlerine yıkılmadan, Kürdün yedd-i tasarrufuna geçti".⁽⁵⁾

Değil yalnız Kürtler, başka halklar da bu tür sözsel saldırı ve baskıların hedefi haline gelmişlerdir, bunlardan birisi de Türklerin kendisidir. Biraz gerilere gittiğimizde Alman, Fransız ve İtalyan kaynaklarında, örneğin saldırgan, acımasız ve vahşi bir Türk imajıyla karşılaşırız. İtalyan Edebiyatı'nda Türkler konusunu inceleyen Ümit Erol, eski İtalyan kaynaklarında Türklerin nasıl "karşı taraf" ve "düşman" olarak gösterildiğini çeşitli örneklerle açıklamaya çalışır. Türklerin "tembelliği", "harem maceraları" ve "köle ticareti" ne olan düşkünlükleri, İtalyan Edebiyatı'nda işlenen Türkler konusundaki en ana temalardır.⁽⁶⁾ Alman kültüründe Türklerin yerini saptamaya çalışan Onur Bilge Kula da iki ciltlik incelemesinde, yukarıdaki Türk tiplemesine benzer bir durumla karşılaşır. Martin Luther'in Türkler konusunda söylediği "Türk şeytanın son ve tehlikeli öfkesidir" biçimindeki.⁽⁷⁾ sözleri, bu çalışmayı özetler gibidir. Fransız kaynaklarında da aynı tablo ile karşılaşmaktayız. Hadi Uluengin, "Avrupa Çizgi Romanında Türk İmajı" adlı çalışmasında, Avrupa'daki Türk imajının "barbar Türk" anlayışı üzerine kurulu olduğunu saptıyor.⁽⁸⁾ Hatta Osmanlı kaynaklarında bile Türkler için bir dizi aşağılayıcı sıfatlar kullanılmıştır. Osmanlı kimliği konusunda bir çalışma kaleme alan Taner Timur, Türklerin Osmanlı İmparatorluğu döneminde aşağılandığı görüşündedir, örneğin "kaba Türk, idraksız Türk, cahil Türk" gibi sıfatlar Türkler için kullanılmıştır.⁽⁹⁾ Bu tür örnekleri daha da çoğaltabiliriz.

Türkiye'deki etnik yapılanmalar ve değişik halk topluluklarının bulunması, bir motif olarak ister-istemez Türk folkloruna da yansımıştır. Özellikle Türk atasözlerinde Kürtler, Lazlar ve Çingeneleri öne çıkaran birçok atasözünün olduğunu görüyoruz. Bu atasözlerinin ayrıca değişik varyantları da bulunmaktadır.

Yaptığım derleme sonucunda Türkçe'de Kürtleri konu edinen elliye yakın atasözünün var olduğu ortaya çıktı. Bunlardan bir kesimi günlük konuşmalar dışında, değişik edebi yapıtlarda da yer alarak, yukarıda

değindiğimiz gibi yazılı hale getirilmişlerdir. Kendim bundan birkaç yıl önce Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler konusunu incelediğimde, özellikle Türk romanında bu tür atasözleri ve yakıştırmaların bol bol kullanıldığını gördüm, bu konuya ayrıca değinmiştim.⁽¹⁰⁾ Bu konu başka araştırmacıların da ilgisini çekmiştir. Bu kitabım piyasaya çıktıktan sonra Gazi Üniversitesi'nden sayın Ali Hanioglu, gönderdiği bir mektupta bu konuda kendisinin de bazı derleme çalışmaları yaptığını belirtmiş, ayrıca bu konuda Ş.K. Seferoğlu'nun kaleme aldığı bir incelemesinin fotokopisini de bana gönderme zahmetinde bulunmuştu. Ama Seferoğlu, bu incelemesinde Kürtlerin etnik kökenleri konusunda kendisiyle paylaşmadığım bir görüşü öne sürüp, Kürt diye bir halkın olmadığı tezini savunuyor yani Kürtleri "Türk" olarak kabul ediyor. Araştırmacının bu tespiti ister istemez bazı atasözleri konusundaki yorumlarına da yansıyor. Her iki araştırmacının Türkçe atasözlerindeki etnik yapılanmalar konusuna eğilmeleri, doğrusu ilgimi çok çekmişti.⁽¹¹⁾

Türkçe'de kullanılan Kürt motifli atasözlerinin temeline indiğimizde, son derece ilginç bir tablo ile karşılaşmaktayız. Bu atasözlerinin kendi aralarında bazı alt-kümeler oluşturarak belli alanlarda bir yığılma gösterdiklerine tanık olmaktayız. Diğer yandan bu atasözü kümeleri değişik gerçekleri ortaya sererler. Bunlardan bir kesimi kültürel ayrılıklar üzerinedir. Örneğin Kürtçe'nin Türkçe ile aynı dil ailesine girmemesi, Kürtlerin başka bir dil konuşması, Türkçe konuşan ve çoğunluğu oluşturan topluluğun acayibine gitmiş olmalıdır ki, sonunda Kürtlerin dil bilmediği! sonucuna varılmıştır. Bu yanlış anlaşılma atasözlerine de yansımış ve bu atasözlerinin değişik varyantları türemiştir, örneğin:

- * Dil bilmez Kürtler
- * Dil-diş bilmez Kürtler
- * Dil bilmez, yol bilmez Kürtler
- * Dili dönmez Kürt

Kürtler kendi aralarında son derece rahat anlaşırlar ama Türkçe onlar açısından yabancı bir dil olduğu için, Türkler gibi Türkçeyi düzgün konuşamazlar. Eğer yasal zorlukları hesaba katmazsak, Kürtlerin Türkçeyi kesin olarak öğrenmeleri diye bir kural da yoktur, tıpkı Türklerin Kürtçeyi öğrenmeleri zorunlu olmadığı gibi. Dilsel haklar konusu hukuksal bazı düzenlemelere gereksinim duyduğu için ve başlı başına bir konu oluşturduğu için burada üzerinde daha fazla durulmayacaktır. Bizim burada üzerinde durmak istediğimiz asıl sorun, atasözleri eşliğinde meydana gelen sözselsal saldırıları incelemektir. Türk folkloru üzerine çalışmalarıyla tanınan İlhan Başgöz'ün Almanya'da yaşayan Türklere yönelik olarak Almanlar arasında söylenen bazı şakaların tehlikeli boyutlara varması

karşısında haklı olarak, endişelerini dile getirmek zorunda kalmıştır.⁽¹²⁾ Dilden dile dolaşan folklor ürünleri zamanla, bazı kesimlerin "katkılarına" zenginleştirilmeye! çalışılır. Bu sözsel seferberlik! zaman zaman tehlikeli sınırlara ulaşır. Kürtler açısından da durum böyledir, örneğin bazı Türkçe atasözlerinde Kürtlerin "animal"(hayvan) laıştırıldığı görülüyor:

- * Allah Kürt kısmını yaratmasaydı, eşeklere baha biçilmezdi.
- * Ayıdan post Kürtten dost olamaz
- * Kürdü de eşek sanma!
- * Kürt ile itin Allahı birdir

Kürtlerin eşek gibi bir hayvanın eşliğinde bazı atasözlerinde anılması, Kürtlerin eşek gibi saf olduğu, laf anlamadığı ve her türlü cezayı hak ettiği konusunu çağırıştırıyor, hatta bazı atasözlerinde Kürtler eşekten daha değersiz bir konumdadırlar:

- * Eşeğe Kürt demişler, eşek kırk yıl yem yememiş
- * Eşek hoşaftan Kürt laftan anlamaz

Kürtlere ilişkin olarak söylenen atasözlerinde Kürtler etnik bir topluluk olarak aşağılanmakta ve hedef olarak gösteriliyor. Bir kısım atasözlerinde saldırganlığın şiddeti daha da artıyor ve sert ifadeler kullanılıyor. Kısacası bu atasözlerinde Kürtler etnik bir topluluk olarak "onlar" kümesine yerleştirilir.

- * Acemler demiyeli bir Kürt de böyle gitsin
- * Allah Kürdü, Kürt Allahı sevmez
- * Ayıdan post Kürtten dost olmaz
- * Kürdün iyisi olmaz ama bu Kürt Kürtten iyidir
- * Kürt kısmında akıllı olmaz
- * Kürt milleti adam olmaz
- * Kürtlük makbul sanat sayılmaz da...

Kürtlerin yaşadıkları yörelerde bilindiği gibi yoksulluk ve gerikalmışlık son derece büyüktür. İnsanlar günlük geçimlerini sağlamak için değişik yolları denerler. Yaşamak için yapamayacakları şey yoktur. Yoksul insanlarda baş gösteren davranış biçimleri, ruh halleri ve tepkileri son derece farklıdır. Yoksul insanlarda genellikle yoğun bir endişe duygusu yaşanır. Bu durum bazı atasözlerine malzeme oluşturmuştur:

Kürde bir verme iki ister

- * Kürde bir verme iki ister, yatmaya da yer ister
- * Kürt getirdiğini yemez, yemeden de gitmez.
- * Kürt vereni sever,
- * Kürt yer çarığına bakar
- * Kürtten evliya koyma havluya, ya samı çalar ya sama bağı

Kürtlerin feodal dağınıklığı ve aşiretsel yapısı toplumda farklı kümelerin doğmasına neden olmuştur. Bu dağınıklık zaman zaman bazı iç çatışmalara ve bölünmelere yol açmıştır. Bu durum sadece Kürtlere has bir durum değildir. Bu toplumsal macera tüm toplumların başından geçmiştir. Bazı atasözleri bu toplumsal yapıdan kaynaklanan olayların etkisiyle ortaya çıkmıştır, örneğin dokuz keçili Kürt, bir küçük devlet atasözü bu nedenle söylenmiştir, bu durumun daha da abartılmasıyla üç buçuk Kürde bir hükümet atasözünün ortaya çıktığını görüyoruz. Kürtlerin uğradığı başarısızlıklar, sonunda Kürtler adam olmaz sözünün temelini oluşturmuştur. Kürtler Cumhuriyet döneminde sık sık ayaklanmışlardır, Kürtlük devri (geride kaldı) ifadesi bu yıllardan kalmadır. Hatta Kürtlük makbul санаат sayılmaz da... ifadesi de bu yılların tecrübeleri üzerine kurulmuştur.

Değil atasözlerinde diğer bazı dilsel yakıştırmalar, deyişlerde de Kürtlere yönelik bir düşmanlığın izlerine rastlamaktayız, bilindiği gibi "Kuyruklu Kürt" yakıştırmaları meşhurdur. Diğer kalıp yakıştırmalardan bazıları da şunlardır: Allahın Kürdü, çarıklı Kürt, kıllı Kürt, Kürd oğlu, yaban Kürt, yabanıl Kürt, Kürt dölü, Kürt uşağı, Kürt bozması, mendebur Kürt, vazalak Kürt, Kürt damarı..⁽¹³⁾ Cumhuriyet döneminde meydana gelen Kürt ayaklanmaları sırasında, özellikle Türk medyasında bol bol kullanılan asiler, şakiler, eşkiyar, haydutlar gibi ifadeler Kürtleri çağırıştırıyordu. Daha sonraki yıllarda bu ifadelerin modası geçti, yerlerine yeni ifadeler medyada kullanılmaya başlandı: teröristler, bölgeciler, ayrılıkçılar, bölücüler, Kürtçüler... Eskiden beri Avrupa'da bu doğrultuda bir kanı yaratılmıştır. Alman yazarı Karl May'ın Vahşi Kürdistan'dan Geçiş (Durchs wilde Kurdistan) adlı kitabının bundan yüzyıl önce basılmasıyla, bu kanı daha da güçlenir, bu sav yukarıdaki Türk atasözleriyle örtüşmektedir. Türkçe atasözlerinden birisi bu doğrultuda söylenmiştir: Kürde silah verirsen önce komşusuna, sonra da devlete çevirir.

Türkçe söylenen atasözlerinden sadece ikisi, Kürtlerin olumlu bazı özelliklerini ön plana çıkartmakta, Kürtleri övmekte ve onları aklamaktadır, görüldüğü gibi bu tür atasözlerinin sayısı oldukça azdır.

- * Kürtlükte kahpelik yoktur
- * Kürd sözünden dönmez

Tüm bu atasözlerinin temelinde kuşkusuz bazı yaşamsal gerçekler vardır. Yukarıda da değindiğimiz gibi her atasözü, daha atasözü haline gelmeden önce

bir olayla veya bir öyküyle yoğrulur. Bu hazırlık döneminden sonra son biçimini kazanır. Dil sosyolojisi açısından, bu süreç son derece dinamiktir, günlük sohbetler vasıtasıyla bu atasözleri kuşaktan-kuşağa sözlü olarak aktarılır. Bu durum dil-toplum arasındaki etkileşimin önemini gösterir.

Kültürel çoğulculuk, çokkültürlülük ve mozaik toplum anlayışlarının cesaretlendirilmediği toplumlarda, çoğunluk kültürünün yarattığı hakimiyet, azınlık kültürü karşısında kaçınılmaz olarak bir tehdit oluşturacaktır. Azınlık kültürü prestij kaybına uğrayacak, bu "*alt-kültürlerin*" rütbeleri tek tek sökülecek, kısacası bu kültürlerle birlikte halkların kendisi de ister-istemez aşağılanacaktır. Türk halk edebiyatında Kürt imajının bu denli zayıf olmasında, bu iki kültürün eşit koşullarda geliş(tiril)mediğinin etkisi büyüktür. En büyük tehlike de, Kürt kültürünün başlıbaşına bir kültür oluşturmadığı, bu kültürün inkar edilmesi, Kürt kültürünün Türk kültürünün bir alt-kültürü olduğu tezinin öne sürülmesidir.

Bir ülkedeki farklı kesimler arasındaki siyasi gerginlik ve çatışmaların, bazı genellemeler ve önyargıların ortaya çıkmasına zemin hazırladığı kesindir. Bu durum bir yolunu bulup dile de yansır, bir atasözünün de vurguladığı gibi: dilin kemiği yoktur. Bu kez bir halk kesimi dilsel planda yargılanmaya, hatta mahkum edilmeye başlanır. Zaman zaman "fısıltı gazetes'i'nin de devreye girmesiyle insanların, bu seferberliğin etkisinde kalarak, zamanla bir "sessiz savaş" ın kurbanı olduğunu görüyoruz. Kürtlerin dilsel düzeyde taraf olarak gösterilmesi ve düşmanca saldırıların hedefi haline getirilmesi veya böyle gösterilmesi, her iki kardeş halk arasındaki düşmanlığı körüklemekten başka hiçbir işe yaramıyor. Bu bakımdan yazarlara, araştırmacı, gazeteci ve sade insanlara büyük görevler düşmektedir: "dil bakımı"na önem vermek ve Türkçeyi bir kardeşlik ve diyalog dili haline getirmek gerekir. Bu kez başka bir atasözüne sığınmak zorunda kalacağız: tatlı dil yılanı deliğinden çıkarır. Yani dil, bazı sorunların çözümüne yardımcı olabilir. Gelin dilin gücüne dayanarak düşmanlıkları biraz da dil yardımıyla ortadan kaldırmaya çalışalım, anlatım stiline, sözcüklerin seçimine daha fazla önem verelim. Benim görüşüme göre ayrımcılığa (discrimination) karşı nerede olsak olalım mücadele etmenin en iyi yollarından birisi, dilsel mücadeledir.

Atasözleri bir ulusun değerlerini yansıtan en özlü sözlerdir, bir toplumun aynasıdır. Türklerin Kürtler konusundaki yargısını yakalamak için bu atasözleri elbetteki önem taşıyorlar. Bu atasözleri Türklerin yıllar boyunca Kürtler konusunda geliştirdikleri görüş keskinliğinin birer işaretidir. Türkçe atasözlerindeki bu kötü Kürt imajının ortadan kalkması süreç sorundur. Çünkü atasözlerinin kalıpsal, donmuş yapılarını değiştirmek o kadar kolay değildir. Bu güçlükler ancak toplumda Kürtler konusunda var olan uç ve keskin anlayışların değişmesiyle ortadan kalkabilir.

ATASÖZLERİNİN ALFABETİK SIRALANMASI:

- * Acemi nalband Kürt eşeğinde dener kendini
- * Acemler demiyeli bir Kürt de böyle gitsin
- * Ağaçtan maşa, Kürtten paşa olmaz
- * Alavere-dalavere Kürt Mehmet nöbet başına
- * Allah Kürdü, Kürt Allahı sevmez
- * Allah Kürt kısmını yaratmasaydı, eşeklere baha biçilmezdi.
- * Allah Kürtleri yaratmış dağlar hali kalmasın diye
- * Ayıdan post Kürtten dost olamaz
- * Bin koyunlu Kürt gibi püfürdet
- * Çingene çalar, Kürt oynar
- * Dil bilmez Kürtler
- * Dil-diş bilmez Kürtler
- * Dil bilmez, yol bilmez Kürtler
- * Dili dönmez Kürt
- * Dokuz karılı Kürt beyi gibi yatmak
- * Dokuz keçili Kürt, bir küçük hükümet
- * Eşeğe Kürt demişler, eşek kırk yıl yem yememiş
- * Eşek hoşaftan Kürt laftan anlamaz
- * Gavurla karşılaştığında Kürt müslümandır
- * Hasılı kelim Kürt müslüman değil vesselam
- * Herkes sakız çiğner ama Kürt kızı tadını çıkarır
- * Kürde bir verme iki ister
- * Kürde bir verme iki ister, yatmaya da yer ister
- * Kürde silah verirsen önce komşusuna, sonra devlete çevirir
- * Kürdü de eşek sanma
- * Kürdü kovalıya kovalıya dögmeli
- * Kürdü koy çuvala vur duvara yine de Kürt, yine de Kürt
- * Kürdün bir yanı dağ olmazsa yaşayamaz
- * Kürdün deniz görmüşüne laz derler
- * Kürdün kocayanına keçi götürürler
- * Kürdün iyisi olmaz ama bu Kürt Kürtten iyidir

- * Kürdün yağı çok olunca, hem yer hem de yüzüne sürer
- * Kürt ateş eder sonra düşünür
- * Kürt buldu tanışı kaldı
- * Kürt değneksiz olmaz
- * Kürt getirdiğini yemez, yemeden de gitmez
- * Kürt ile itin Allahı birdir
- * Kürt kırmızıyı sever
- * Kürt kısmında akıllı olmaz
- * Kürt, Kürt kışına dürt, yağını çıkar başına dürt
- * Kürt milleti adam olmaz
- * Kürt sözünden dönmez
- * Kürt ne bilmiş bayramı zır-zır içer ayranı
- * Kürt vereni sever
- * Kürt yer çarığına bakar
- * Kürtle Laz emmi oğludurlar
- * Kürtlük devri geride kaldı
- * Kürtlük makbul sanat sayılmaz da...
- * Kürtlükte kahpelik yok
- * Kürtten evliya koma avluya, ya samı çalar ya saman bağı
- * Kürttür ne bilmiş
- * Pire itte, bit Kürtte çok olur
- * Üç buçuk Kürde bir devlet

KAYNAKÇA:

- 1) Pertev Naili Boratav, Türk Halk Edebiyatı, İstanbul, 1988, s.92.
- 2) Ömer Asım Aksoy, Atasözleri Sözlüğü, Ankara, 1984 (Bu sözlükte örneğin Kürdün yağı çok olunca, hem yer, hem de yüzüne sürer atasözünün mecazi anlamı şöyle açıklanmıştır: " Malı çok olan akılsız kişi, bunu gerek olan iş için kullandıktan sonra kalanını tutmasını bilmez" s.311).
- 3) Mustafa Ekmekçi, Sözüün Özü, Cumhuriyet 22.6.1986. Mustafa Ekmekçi, Yeniden Kavuşurken Cumhuriyet 14.1992. İlhan Selçuk, Kürt, Cumhuriyet 1.2.1989 (Türk medyasında Kürtler konusunun son yıllarda daha fazla tartışılması nedeniyle bazı köşe yazarları bu tür atasözlerine zaman zaman göndermelerde bulunarak, eski Kürt-Türk kardeşliğinin önemini sık-sık okuyucuya anımsatırlar. Bu nostaljik tutumların önemi elbetteki büyüktür. Diğer yandan bu atasözlerinin ortaya çıkış nedeni üzerinde durulmalıdır. Geçmişte meydana gelen olayların ve gerçeklerin altındaki asıl nedenler ortaya çıkarılmalıdır. Geçmişte bazı tarihsel gezintiler yaparak yeni kuşakları eğitmek bu bakımdan son derece önemlidir. Böylece okuyucu dün, bugün ve yarın arasında bazı bağlantılar kurma olanağına kavuşur).
- 4) Kemal Tahir, Köyün Kamburu, İstanbul, 1976, s.233.
- 5) Kemal Tahir, Damağası, İstanbul, 1994, s.32.
- 6) Ümit Gürol, İtalyan Edebiyatında Türkler, Ankara, 1987
- 7) Onur Bilge Kula, Alman Kültüründe Türk İmgesi, Ankara, 1992-1993, cild: II s.85.
- 8) Hadi Uluengin, Avrupa Çizgi Romanında Türk İmajı I-IV, Cumhuriyet 12.2.1989-15.2.1989.
- 9) Taner Timur, Osmanlı Kimliği, İstanbul,1986.
- 10) Rohat Alakom, Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler, Stockholm,1989
- 11) Ş.K. Seferoğlu, Kültürümüzde Milli Etnolojimiz-Atasözü Türünden Sözlerimizde Milli Etnoloji, Azerbeycan -Türk Kültür Dergisi, no 264.
- 12) İlhan Başgöz, Almanya'da Türkler İçin Çirkin Şakalar, Cumhuriyet 19.7.1986
- 13) Ali Püsküllüoğlu, Yaşar Kemal Sözlüğü, İstanbul, 1987 (Burada Vazalak sözcüğünün tanımı şöyle yapılmıştır: "Kürt kökenliler için şaka yollu kullanılan bir söz", s.116).
- (*) Rohat Alakom İsveç'te yaşayan bir Kürt yazarıdır. Şimdiye kadar Kürtler üzerine değişik araştırma ve incelemeleri Kürtçe ve Türkçe olarak çıkmıştır: Kürdoloji Biliminin İkiyüz Yıllık Geçmişi (1987), Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler (1989), Yaşar Kemal'in Yapıtlarında Kürt Gerçeği (1992), Kürt Folklorunda Bir Kadın

Gotineke Pêwîst

Mehmed Uzun

Sala 1984-5-6'an, gava ez li ser romana **Bîra Qederê** dixebitîm, bi hênceta xebatê ez gelek caran çûm Sûriyê. Min li Sûriyê gelek kesên ku Celadet Alî Bedirxan dinasîn, tevî Osman Sebrî, Melle Hesenê Hîşyar, hin rêberên civata kurdan a salên 40 û 50'an, dîtî. Ez bi wan re gelek caran peyivîm.

Herweha ez bi Rûşen Xanimê, dotmam û bermaliya Celadet Alî Bedirxan re jî peyivîm. Gelek caran, bi dirêjahiya hefte û mehan. Sohbetên me ji bo romana ku min dil dikir binivîsiya bûn, lê bi xêra sohbetan min Rûşen Xanim çêtir nasî û wê jî ez nasîm. (Hê jî panzdeh kasetên ku min bi Rûşen Xanimê re dagirtine, li nik min, li hêviya weşandinê ne.) Piştî sohbetan welê bû ku ez her bihar, berî Newrozê, diçûm Sûriyê, nik Rûşen Xanimê û min Newroza xwe li wir derbas dikir.

Di nav vê hatin û çûyin, xebat û sohbetê de Rûşen Xanimê hin destnivîs û sûretên Celadet Beg jî dane min. Ev destnivîsên ku niha tên weşandin ji wan rûpelanan in. Hin destnivîsên din jî hene. Ez ê, bixêr, wan jî peyderpey bidim weşandin.

Ev destnivîs heta niha li derekî nehatine weşandin. Nivîsara ku di deftera kurê Celadet Beg Cemşîd de hatiye nivîsîn, bi gelek celebên din, di **Hewarê** de weşiyaye. Ferhengoka biçûk a stêrikan a Kamuran Beg, birayê biçûk ê Celadet Beg e. Jixwe destnivîs jî ya wî ye. (Jiber xebata salan a li ser **Bîra Qederê** ez êdî destnivîsên herdu birayan û celebên nivîsîna tîpên wan dinasim.)

Min bi tenê destnivîs, her wekî xwe, veguhezandin ser kaxizan. Ez wan, bi kêfxweşî, bi bîranîna herdu birayên gorbehîşt ku hemû jiyana xwe dan ziman, çand û edebiyata kurdî, pêşkêşî xwendevanan dikim.

Stên

Komika sêwîya ji rojhelat dihete
Qeşl û mecnûn yekê nexê bayîner e (rojhelat)
a dîtin li rojava ya.
Lermê mezîla heft stên in.

Bîr û Mîrên ji rojhelat dihete dîce
rojava.
Kerwan kuj ji rojhelat dihete piştê
mîrê serê.

Qurux spîşîyê de ji rojhelat
dihete.

Megênî ezmên di mîrê ezmên de ye.
ji cihê xwe naco ku deves.

Stêra mîrso mîrso ji rojhelat dihete.

dîgdiqan naxbana balên û rojava ya.
x x

culhîkê kengîrîya ji roj helat
dihela

Dîwana Eshaba ji roj helat dihelin
piştê dîqin rojava.
hejmarên man deh in.

Bûpîşt heî dem li quble ye.

Stêra culhîtari di mîrê ezmên de ye.
reşî rojava.

Gerx û Telok rezeşî gawr e, di mîrê
ezmên de ye.

~~Qozet~~

Qozogor rezeşî zîn û sor û gawr e
kêşî sor.

STÊR

K.A Bedirxan

Komika sêwiya	: ji rojhelat dihele
Leyl û mecnûn	: yek rexê bayêreş e (rojhelat) a dîtir li rojava ye
Tîrmê mexila	: mexila heft stêr in
Pîr û mîzên	: ji rojhelat dihele diçe rojava
Kerwankuj	: ji rojhelat dihele piştê nîvê şevê
Qurux	: spêdeyê de ji rojhelat dihele
Meqerê ezmên	: di nîvê ezmên de ye. Ji cihê xwe naçe tu dever
Stêra nîvro	: nîvro ji rojhelat dihele
Dixdixan	: navbera bakur û rojava ye
Cuhtikê kewgeriya	: ji rojhelat dihele
Dîwana Eshaba	: ji rojhelat dihelin piştê diçin rojava. Hejmara wan deh in.
Dûpişk	: herdem bi quble ye
Stêra cuhtarî	: di nîvê ezmên de ye, rexê rojava
Çerx û felek	: rêzeke gewr e, di nîvê ezmên de ye
Qozeqer	: rêzek şîn û sor û gewr e. Keskesor.

Qesrek spî bê derî (hêk)
Ez di devekî ve diçim, di du deva ve derdikevim (derpê)
Suwarê şeqrikêba (mîzan)
Qasimko erdê simko (dilop)
Banderûk li xer bänderûkê, wîste li destê bûrê (cester)
Tigtekê min heya şewlîyê bî berêkê de diko ji kibêhê
hete êvarê (gêsin)
Kor xirî biçûkî xirî (berê tîrîngê)
Tendêra hûdûmê tije klurê çenî (kewrê mûşan)
Tigtekê min heya di rêda, yê rakê heta pay de, yê xirî yê
rakê li erdê de (xetk)
Şektek tije mîkê spî ye, rakê xer li ewê derî ye (dev, cîsan
û zûm)
Gêlîngê li bînya ye tîngê (dûstên)
Tendêra dedayî tije klurê dedayî (kewrê kewrê mîngivî)
Kusê hûtik tije hûtik (hejîr)
Di bra ne nav her du bra pardak e (gûs)
Li avê dixim ne gûs, li kêvir dixim diqê (pelê tîtiş)
Tigtek dikere avê çil nê (sîh)
Li kêvir dixim neqê, d'awêjim belîkê diqê (nokanêk)
Tigtek heya hesar gav diçe * û bî mî e (deng)
Gavê kejo li hesar de (lîngê tîrîngê)
Gîva ter li gûhar (kar) gûhar, mîngîlek fîrê ji gîvê
Ez gûmê ewe carê diyarekî, min di heft beran li pay berîkê
(pînd mûşan)
Daxana Fêrê sibêhê rabûn yek jê nê (stêrk)
Hênikê hênikê, fêrê devê kênîkê, xê nêde hoyanêkê (qeqê)
Ji vir heta Kûmîlê hêst kulavê çûyî (ser) çûyî çûyî xîl
Ji vî carê dînyeyê heta vî carê dînyeyê hêst kêşê çavêkê (xetk)
Dorê kûkî lîngê derê (kon)
Tigtek heya tîrê li payanê de mîngîlê (berêkê)
Tigtek heya ke gîvê dixim diçe, ke dîvêkê dîvêkê (xetk)
Fêrê ne-gêrêndî, yêrêkê hêstîyêndî û carê ji gîvê (xetk)
tendî (bîhîşt, adê û hêrê, çeytan)
Gûmê nêrê diyarekî dîkê (bîhîşt) dîkê (xetk)
(qîrîngê xetk)
Tigto tîstî, li bîngê gûrêkê, ji xetê paye (xetk)
(pîrêkê bîhîşt)
Kêstê e ew e (xetk), ewê şeqrikêba e, (mîzan)
Mîzanê pîrê mîzan, derîngê, pel-şî, mîzanê (mîngîlê)
Zîg û şîg, heştîngê (xetk) heştîngê û du şîg (xetk)
Qasimê paqûrê paqûrê gû derê lîngê, lîngê kîrê xetkê (xetk)
çîkê, çîkê, çîkê mîngî tî, neqêşêr e, e (xetk) (qûrê)
çêr çêr, derîngê hêstî (xetk) (xetk)
Gê brêkê ne, her e (bra xetk) (dûstên)
çêrîngê çêrîngê, gûrêkê biçûkêkê, xîrê bîdêkêkê (kar û
xetkêkê xetk)
Kêşê e wêkê xîr, şîrê wêkê çîrê çîrê û xetkê e wêkê çêrê
jîngê xîr (xetkêkê) çîrêkê e.
Wextê derîngê çîrî, wextê dîvêkê dîvêkê (çêrê)
Hêstîkê çêrîngê li carê çêrîngê (xetk)
Amê min û çêrê, çêrê çêrîngê ji çêrê (xetk)
Kîdîngê li her çêrê, ne dîngê dîngê, ne çêrê dîngê (çêrê)
Dêrîngê berêkê, derîngê çîrêkê (xetk)

- * Qesrek spî bê derî (hêk)
- * Ez di devekî ve diçim, di du deva ve derdikevim (derpê)
- * Suwarê şeqrikêba (mîzan)
- * Qasimko erdê simko (dilop)

- * Sênderûk li ser sênderûkê, mifte li destê bûkê (destar)
- * Tişteke min heye: xweliyê bi serê xwe de dike ji sibehê heta êvarê (gêsin)
- * Ker zirî bişkul firî (berê tifingê)
- * Tenûra humhumî tije klurê genimî (kewarê mêşan)
- * Tişteki min heye; di rê da, yê sax hate pey de, yê mirî yê sax li erdê da (xefk)
- * Şikeftê tije mihê spîye, sehkî sor li devê derî ye (dev, diran û ziman)
- * Sêlingo li binya tingo (dûstan)
- * Tenûra dadayî tije klurê badayî (kewarê hingivî)
- * Kumê hûtik tije nûtik (hejîr)
- * Du bira ne, nav her du bra perdek e (gwîz)
- * Li avê dixim naşkê, li kevir dixim dişkê (pelê titinê)
- * Tişteke dikeve avê şil nabe (sih)
- * Li kevir didim naşkê, davêjim beltikê dişkê (nok, nehk)
- * Tişteke heye hezar gav diçe û bê sih e (deng)
- * Gayê kejo li hawa dajo (lingê tifingê)
- * Şiva ter li guher (mar)
- * Ez çûme serê diyarekî, min dî heft beran li pey beranekî (pinê zebeş)
- * Garana Mema sibehê rabûm yek jê nema (stêrk)
- * Hanikê manikê, fêrşê kehnîkê, rê nade heywanekê (qeşa)
- * Ji vir heta Mûsilê hemî kulavê sûyî (ewr)
- * Ji vî serê dinyayê heta wî serê dinyayê hemû keçê çavkildayî (stêrk)
- * Porta kara li serê dara (kon)
- * Tişteke heye, tucar li pey xwe namezîne û birevê diçe (çem)
- * Tişteke heye, ko girê didim diçe, ko dikevîm disekine (çarox)
- * Mêrga neçêrandî, zarokên nemijandî û kerê ji garanê veqetandî (bihuşt, adem û hewa, şeytan)
- * Çûme serê diyarekî, dikutim bizmarekî, deng çû hezarekî (qîrîna ewra)
- * Tiştê tiştanî, li bin doşega sultanî, ji xwedê pêve kes nizanî (pîreka bihemle)
- * Eceb e ew ecêb e, suwarê şeşrikêb e (mîzan)
- * Sibhan şahê mezin, darşîn, pel*spî, îwanzer (nêrgiz)
- * Zîq û zîq, heşt ling û du pîq (coht, cot)
- * Qasimê paqxwehr çû serê latê, lat kire xwar (cûzan)
- * Çîtê, çîtê, çît mamî tê, neqşehûr e, ecemîtê (quran)
- * Qesr goştî, derince hesinî (hesp û rikêb)
- * Sê bra ne, her sê bra zikreş (dûstan)
- * Şêrîno darîno, guhrepo biçolêketo, pîpo biderêketo (kerû xwediyê kerî)
- * Reş e wekî qîr, spî wekî çira, şîr û sor e wekî qapûtê jina mîr (xecxecok)
- * Wextê drajimê digirî, wextê dideynim dihedinê (qeyd)
- * Rêzika daniya li serê xaniya (stêrk)
- * Mamê min ê qucûr, serî meztir ji ûr (mîro, gêrik)
- * Himhimo li ber çemo, ne diz dibin, ne gur dixwin (aş)
- * Derxwinê beroşê, dermanê girarê (dûv)

-
- * **guher** : memesîlek fireh li çiyê.
 - * **sûy** : şayik kirî.
 - * **xecxecok** : giyayeyk e.

PÊŞIYA KURDAN

C.A. Bedirxan

Kurê min!

Carinan ji te re hin tiştan dibêjim. Tu bi wan bendewar dibî. Ew bi kêrî te tên. Hinekan ji bîr bikî jî, hinekên din di bîra te de dimînin. Lê heke min ew ji te re nivisandin û xistin deftera te tu tucaran ji bîr nakî. Ji ber ko, hergav, wan ji nû ve bixwînî û xwe li ser tiştên ji bîr kirî serwest bikî.

Ev çend roj in, min li deftera te hin tişt nivisandin. Min dil heye ez wan berê berê di rûpelên **Hawarê** de belav bikim.

Tiştên ku tene bîra te û tu ji min dipirsî, bivê nevê ew tên bîra zarûwên din jî. Ew zarûwên hemû çêliyên kurdan, brayên te û wek te kurên min in jî.

Divêt, tiştên ko tu dixwazî bizanî, ew jî bizanin. Bi belavbûna wan di **Hawarê** de herkes bi wan agah dibe. Û welê, bi piyana te brayên te jî tîhniya xwe vedukijînin.

Berî çend rojan te ji min re digot:

Bavo! di dibistana me de qet qala kurdan nakin. Ser ziman û pêşiya me, tu tiştî ji me re nabêjin. Ma wek miletên din, me jî esl û nijad nîne? Belê di dibistanê de em ne bi qasî bajariyan in. Ew gelek in, piraniya dibistanê ew ditînin pê, lê em jî çendek in.

Min ji te re gotibû: Me her tişt hebû, îro heye. Lê îro me hikumet nîn e. Ji lewre di dibistanan de bi zimanê me ê şêrî naye xwendin. Bê şike, ew roj jî dê bêt, em ê jî xudan dibistan û xudan her tiştî bibin. Lê heta hingê nabit ko em bê xebat rûnin. Berî her tiştî divêt em ji pêşveketîna zimanê xwe re bixebitin. Ji ber ko ziman hîmê heyina miletan e. Dibêjin, miletê ko dîl ketiye lê zimanê xwe winda nekiriye wek wî hepsiya ye ko mifta hebsa wî destê wî de ye, rojkê ew ê radibit û deriyê hebsa xwe vekit û jê derkevit.

“YİĞİTLİK İNKÂR GELİNMEZ”

Şeyhmus DİKEN

Diyarbakırlı şair Ahmed ARİF’in şiirinin yatağı yiğitlik üzerine kuruludur. Ahmed ARİF, “*Otuzüç Kurşun*” adlı uzun şiirinde;

*“Yiğitlik inkâr gelinmez
Tek’e–tek döğüşte yenilmediler
Bin yıllardan bu yan, bura uşağı
Gel haberi nerden vererek
Turna sürüsü değil bu
Gökte yıldız burcu değil
Otuzüç kurşunlu yürek
Otuzüç kan pınarı
Akmaz
Göl olmuş bu dağda...”* der.

Otuzüç kurşun şiirinden bu alıntının ışığında, ortak bir coğrafyanın iki ayrı mekânında, muhtemelen birbirlerine yakın zamanlarda yaşamış “*Liceli Rûsto*” ile Raman-Reşkotan bölgesinden “*Kadirê Bêndur*” un ortak yazgısını anlatmak gerekir.

Doğaldır ki, anlatılmaya çalışılacak olan ortak yazgıdır. Yoksa yaşam öyküleri değildir. Yaşamlarına yön veren hayata ve dünyaya bakış tarzlarıdır.

Kadirê Bêndur’un öyküsünün, anlatmaya çalışacağımız bölümü 1920’lerde Cumhuriyet’le birlikte başlar. Cumhuriyet’in ilk dönemlerinde, isyanların sıkça yaşandığı dönemlerde, Cumhuriyet’in, beylikleri tehlike olarak saydığı yıllardır söz konusu olan.

Başlarında Garzan bölgesinden *Cemilê Çeto*’nun bulunduğu yedi boy’-dan oluşan “*Pencenari Aşireti*”⁽¹⁾ ile *Elîyê Ünîs* ve *Remezanê Teter*

(1) **Pencenari Aşireti:** Siirt’in Kurtalan ilçesi, Garzan bölgesinde bir aşiret. Kaynak Yayınları’nın Aşiret Raporları kitabına göre Onbin dolayında taraftarı var. Kaynak kişi Esat CEMİLOĞLU’dan aktaran Felat CEMİLOĞLU’na göre aşiret lideri Cemilê Çeto’ya Cemil adı, Cemil Paşa’ların büyüğü “Cemil Paşa”nın Siirt mütasarrıflığı döneminden etkilenilerek konulmuştur.

bölgede hüküm sürmekte. Sonraları isyanlar nedeniyle uzun süre “*yasak bölge*” ilan edilen ve halk arasında da “*Sasunê, Hazoyê bê kanûn*” (Yasa tanımayan Kozluk ve Sason) olarak ifade edilen çiyayê Meleto ve çevresidir mesken tutulan.

İşte bu Çiyayê Meleto ve çevresi, isyanlar nedeniyle, uzun süre Askeri Memnû Mıntika (Askeri Yasak Bölge) ilan edildi. General Cemal MADANOĞLU, 1930’lu yıllarda Yüzbaşı olarak görev yaptığı Sason civarından, Meleto’dan bir anısını anlatıyor.

“Birgün bizimkiler yasak bölgede dolaşan bir kürdü yakalayıp getirmişler. Baktım zavallı bir adam... Sordum, anladım ki çocuğu çocuğu var. Ben şimdi bu adamı ne yapayım? Görevim aşağıya teslim etmek. Oradan da kim bilir nereye gönderirler? İçimde birden bire oluşan bir duyguyla yanımdaki mavzeri aldım. Biliyorum silah boş, ama, şöyle arkaya dönüp mekanizmayı kurdum, verdim kürde...”

– *Yat dedim şu leyleğe ateş et vurursan seni salıveririm.*

Leylek ikiyüz metre kadar uzakta dolaşıyor.

Adamı izliyorum. Kimbilir aklından neler geçiyor? Eğer leyleği vurursa, karısına, çocuklarına, evine kavuşacak. Kolay değil durumu... Yüzünden tüm düşünceleri, kaygıları okunuyor.

Kürt nişan aldı, hedefe baktı, bir daha baktı, kıvrandı, işi uzatıyor.

– *Aşsana ulan, ne duruyorsun?*

Yalvarır gibi döndü bana adam, insanlığı sanki gözlerinde toplanmıştı, ağlamaklı bir sesle;

– *Yüzbaşı Beg, dedi, hacı Leylek yahu?...*

Bunun üzerine, elinden mavzeri aldım, çok duygulanmıştım:

– *Hadi git dedim, ortalıkta görünme...”*

(Cemal MADANOĞLU- Anılar I. Çağdaş Yayınları - 1982 Sayfa 300)

Evet, isyan bölgesi Meleto, işte bu türden anıların bolca yaşandığı bir coğrafya.

Yukarıda sayılan aşiretlerden *Elîye Ünîs* ve etrafındakiler devlete karşı ayaklanmışlardır. Bazı başka aşiretler ise kendi hükümlerinin dışında başka kaygı taşımamaktadırlar. Bazen devletle dost, bazen de devletin karşısında yer almaktalar. Dönemin koşulları, tavır alışlarına yön vermede etkili oluyor.

İşte *Kadirê Bêndur*, ortak sonları nedeniyle *Cemîlê Çeto* ile birlikte tarihe geçenlerden.

Cumhuriyet’in ilan edildiği ilk yıllardaki isyan dönemlerinde *Cemîlê Çeto* Garzan’da “*Kasr*” denilen konağında yaşıyor. Erzurum ve Sivas Kongrelerinin yapıldığı dönemlerde *Mustafa Kemal*’in *Cemîlê Çeto*’ya

“*Kardeşim*” diye hitap ettiği yaygın bir söylem. Bu nedenle Cemil rahat. Fakat isyanlar tehlikeli boyutlara varınca, *Cemîlê Çeto* birgün konağından Diyarbekir’e götürülmek üzere alınır. Aynı tarihlerde *Kadirê Bêndur* da Meleto Dağı’nda çatışma sonucu yakalanır.

Konaktan normal şekilde götürülen *Cemîlê Çeto*’nun kıyafeti düzgündür. Halep işi gabardin şalvarı, acem kuşağı ve ipekli gömleği tam tekmildir. *Kadirê Bêndur* ise çatışma sonucu yakalandığından perişan bir durumdadır. Üst baş yırtık ve traşsız bir yüz görüntüyü tamamlamaktadır.

Diyarbakır’daki yargılamalar çok hızlı yürümektedir. İnfazlar peş peşe yapılmaktadır. Son güne kadar bırakılma ümidi ile yaşayan *Cemîlê Çeto*’nun, okuma yazması olmadığından Hani beylerinden *Ömer Bey*’e, Ankara’ya bir dilekçe yazdırdığı, dönemi bilenlerin ifadesidir. Dilekçesinde “*Kardeşime söyleyin beni serbest bırakırsın*” diye yazdırdığı söylenir.

Dilekçe yazılmış mıdır? Yazılmışsa adresine ulaşmış mıdır? Bilinmez. Tarihçilerin araştırma konusu. Birkaç gün sonra ise sırayla asılmaya götürüldükleri bilinenlerden *Cemîlê Çeto*’nun serbest bırakılacağı umudu son güne kadar var ve vakarlı duruşuna da yansımakta. Son gün, umut, yerini hüznü ve şaşkınlığa bırakmıştır. Ve kendinden önce *Kadirê Bêndur* önlerinden geçirilerek asılmaya götürülür.

Cemîlê Çeto, hırpani görüntüsünden dolayı tanıyamadığı ve acıdığı *Kadirê Bêndur*’a hitaben çevresindekilerin de duyacağı bir ses tonuyla şöyle der:

“*Ez Cemîlê Çeto me. Hakimê Xerzan û aşîreta Pencenarî me. Ê ku êrîş dibir li ser gundan û talan radikir ez bûm. Ji vî ez fêm dikim çima dê min bixenqênin. Lê ji vî belengazî çî dixwazin*”⁽²⁾

Kadirê Bêndur, söylenenleri duyar. Daha önceden de tanıdığı *Cemîlê Çeto*’ya cevap verir.

“*Ez Kadirê Bêndur im. Li min binêre. Ewê k li serê çiya ne, dizanin. Ê ku şevêkî de alayek leşker re şer daniye ez im, çavê xwe veke. Ka te çî kiriye?*”⁽³⁾

Bu cevaptan sonra *Cemîlê Çeto*, gaf yaptığını ve hatasını anlar. Ne de olsa, tanışmasalar da *Kadirê Bêndur*’un ününü duymuştur. Pişmanlık ifadesiyle yakın çevresine söylenir:

“*Cemîlê Çeto, Ji kerê keto*”⁽⁴⁾

(2) Ben ki Cemîlê Çeto’yum. Bütün Pencenari aşiretinin ve Garzan bölgesinin hâkimiyim. Köyleri basan, talan kaldıran, yüzlerce süvarisi olan biriyim. Beni asmak istemelerini anlarım. Peki şu garipten ne isterler?”

(3) “Ben Kadirê Bêndur’um. Bana bak. Dağ başındakiler beni bilirler. Bir gecede bir alay askerle çatışan benim. Gözünü aç! Hani sen ne yapmışsın?”

(4) “Cemîlê Çeto, eşekten düşmüşe dönmüş.” anlamındadır.

İfadelerin ve davranışların gizi belki de bir başka yaşamda saklıdır. “*Liceli Rûsto*”nun yaşamında.

Lice; Diyarbekir’in kuzeydoğusunda, haşin doğasıyla örtüşen ve insan unsuru da doğasında ifadesini bulan bir yerleşim yeri. Yılmaz Odabaşı bir şiirinde;

“*Lice’ye güven olmaz
o hep illegal.*”

dese de, eski Licelilerde söz esastı. Söz vardı, öncesinde ve sonrasında.

Lice’de eskiden, iyi bir tüfeği ve güzel bir atı olan, baba-dede mesleği kaçakçılık ile at sırtında ticarete, nakliyeciliğe, diğer adıyla katırcılığa soyunurdu. Atlardan söz ederken, Liceliler için atın önemini anlatan bir deyim var. Vurgulamadan geçmek olmaz.

Hespê ji sûwarê xwe ra gotiye;
“*Wexta ku tu li min sîwar bû,*
Mîna neyarekî li min mêze bike.
Wexta ku tu ji min peya bû,
Mîna birakî li min mêze bike.”⁽⁵⁾

Ayrıca katırları anlatmalı; her bir tarafına ortalama elli kilogram yük yüklenen katırlar. Lice’de mimari yapılarda evlerin kapıları bile katırlara göre düşünülmüştü. Katırların, yükleriyle birlikte rahatlıkla içeriye girebilecekleri büyüklükte yapıldı kapılar. Yağmurda, soğukta ve de dışarının meraklı gözlerinden kaçınmak için ihtiyaca göre düşünülmüş bir yapı tarzıydı eski Lice evleri.

Kaçakçılığın bugün için övünülecek bir yanı olmasa da, o günlerde yürek işiydi kaçakçılık. Ve o denli yürek işi ki; Licelilere bir yakıştırma:

“*Licî, meriv dike dû cî.*”⁽⁶⁾

(5) At sürücüsüne şöyle der.

“Bana bindiğin zaman,
Bana düşman gibi bakacaksın.
Üstümden indiğin zaman,
Bana kardeş gibi bakacaksın.”

(6) “Liceli, insani ikiye ayırır. İki parça eder” anlamındadır.

Kaçakçılık sonuçta sınır tanımazlıktır. **Ahmed Arif**'ce sınır tanımazlık.

"Bir yanım çığ tutar, Kafkas ıfkudur.

Bir yanım seccade, Acem mülküdür."

Misali; Şam'dan, Bağdat'tan başlayıp, İran içlerine kadar süren kaçakçılığı, bu coğrafyada Licelilerden daha iyi yapabilenin olmadığı halen söylenir.

Kendilerinin çizmediği sınırlarda, kendilerinin olan malları, kendilerinin dışında konulan yasaklarla yürüten kaçakçılar.

Licelilerin yaşamı, haşin doğası gibi; sanırsınız ki kaçakçılığa endekslenmiş. Oysa Liceli de ne çok isterdi, yasal yaşamayı. Lice'nin çevresinde yetişen sebze ve meyvaların işleneceği bir tek konserve ya da salça fabrikası, köyleriyle birlikte Lice'nin kaderini değiştirebilirdi. Olmadı. Sanki gizli bir el, Liceliye, kaçakçılık sizin için tanrı buyruğudur, dedi. Ve Liceli de yazgısına razı oldu.

Motorlu araçların hiç olmadığı ya da çok az olduğu dönemlerde: Liceli katircılar, ağırlıklı olarak Diyarbakır-Erzurum- Hınıs hattında, katırları ve atlarıyla nakliyecilik yaparlardı. Doğu'nun bir ilinden bir başka iline tayini çıkan memurların eşyalarını bile taşıdıkları olurdu. O günlerin Lice'sinde, katır o denli önemli bir nakliye aracıydı ki; katırı ve tüfeği olup da sefere çıkamayanların bunları kiraya verdikleri bile olurdu.

Liceliler 1970'li yıllara kadar "Afyon" maddesini sakız olarak çuvalarla Malatya'dan ve Tokat sınırlarından satın alarak Van ve İran sınırına, bazen de İran içlerine kadar katırlarıyla götürerek satarlardı. O dönemlerde Afyon'nun nasıl işleneceğini ve ne işe yarayacağını bilmezlerdi. Onlar için sadece taşınması gereken yasak bir maldı ve sonuçta da eve ekmek götürülmesini sağlayan kaçak bir kazanç kapısıydı.

İşte Rûşto bu ünlü kaçakçılardan biri. Çoğu kez ünü, kendisinden önce, gideceği yerlere giden biri.

Rûşto'nun kendisi gibi ünlü bir sözü var. Halen de söylenir.

"Eger yekî li we xist,

Mebêjin em Licî ne.

We li yekî xist,

Bêjin em Licî ne."(7)

(7) "Biri sizi vurursa,

Lice'li olduğunuzu söylemeyin.

Siz birini vurursanız,

Ben Lice'liyim deyin."

Vurulmayı, düşmeyi ve de düşürülmeyi, Lice'sinin, memleketinin, coğrafyasının adına kara çalan bir düşünce ve davranış-bakış sayar, Rûşto ve Rûşto gibileri. Bingöllü *Yado*, Silvanlı *Koçero* gibi...

İşte bu *Rûşto*, "*Liceli Rûşto*" bir gün İran sınırından geçerken, hem de yüküyle, kaçağıyla geçerken sınır güvenlik görevlilerince bir çatışma sonucu vurulur.

"Vurulmuşum,
Düşüm gecelerden kara."

dercesine vurulur. Düşer Rûşto. Üstüne ilk yetişen bir rütbeli olur. Ve daha önce tesadüfen, Lice'de görev yapmış bir subay.. Rûşto'yu tanır. Heycanla sorar. "*Ulan Rûşto sensin değil mi? Liceli Rûşto?*"

Rütbelinin tavrı insanidir. Daha önceden tanıdık biri ya! İnsanî olan yan baskındır ve öne çıkmıştır. Rûşto'nun yarasına müdahale edilmelidir, edilecektir. Fakat ne mümkün! Rûşto kurşun yarasını almış ve düşmüştür ya. İnadi inat, düşkün, düşmüşken, çaresizken Liceli değilim denilecek ya! Liceli değilim demede ısrarlı.

Sonuç Rûşto için İran sınırında kan kaybından ölümdür. Ve Rûşto ölürken bir *kılam*'dan yine bir parça:

"*Em Licî ne, em Licî ne,
Bav û kalan da qaçaxçî ne.*"⁽⁸⁾

01.08.1998

(8) "Biz Lice'liyiz, biz Lice'liyiz,

Baba ve dedelerimizden kaçakçınız."

DIYARBEKÎRA ŞEWÎTÎ

Silêmanê DERÎHESÎNÎ

Diyarbekir a şewitî li nava dinê
Çê û xirab neman, tev dikişîne
Nava taxima sîng û berê te, ji min re mîna bostanekî zebeşanî,
ku tim û tim av liser, ji nû de xet ketine.
Eman, eman çi cef aye Gewrê!

Diyarbekir'a şewitî di rastê de,
Kê dîtîbû, kê bihîstîbû? Digotin beden xwar bûbû di ser Dîclê da
Îro xeberek xirab didane min, digotin xwestiya te nexweş e,
waye di nexweşxanê da.
Eman, eman çi cefa ye Gewrê!

Diyarbekir'a şewitî dor beden e,
Liser bedenê ez û te ne.
Kevirên dorê tev birrîn e,
Tû yê were qapaxa dilê min veke, mêze ke, bi çavên serê xwe bibîne,
ku tev kul in, merez in, jibona te ne
Eman, eman çi cefa ye Gewrê!

Diyarbekir'a şewitî liber milikan.
Şewitiye bajêr, tev hêlînên teyran û tûyan van girtikan.
Xelq aşîqê mal û melalê dinê, ez maşuqê belek bejna zirav,
xan û xetên rûyan, zêr memikan.
Eman, eman çi cefa ye Gewrê!



HINEK VEKIRÎNA PÊWÎSTÎ

Ev helbesta bi kilamî dihate gotinê. Ez hîn ciwan bûm. Min gotinên vê kilamê ewilî, di serî da ji *Ehmed'ê* me yê stranbêj guhdarî kir. Durra, di nava demek dirêj, di nav salan da gelek caran, pirr caran min dît û guhdarî kir ji *Ehmedê Mamê*.

Wê demê, ku *Ehmed'ê* me yê Bêrtî yê dengbêj va kilama distra, bi min pirr balkêş xuya dikir. Di nava zemên de, bi zemên re zêde zêdebala min kêşand û qelibî ser van gotinan. Wê tawê min di dibistana navîn de (Orta û lîse) dixwend. Min dest bi berhemên pirtûkên derveyî dersan kiribû. Min liser wêje, tevgerasî, civaknasî, mantiq, felsefe, bîrdozî, sazûman, dîrok, siyaseta, raman û helbestan bêrêberî, bêrêvekirî, bi bêkesî pirtûk digirtin, dikirrîn, disitandin û dixwendin.

Jibona vê yekê ez di destpêka cudatî û bingehîna pîvana hinek mijar û tiştan da bûm, bûbûm.

Di nava mercên jiyana me ya ku zêde di bandora dilîn û hestê de, gotinên dengbêjan jî pirr bandorî û tesîr li min dikirin. Min wexta ku vê kilamê jî wî dengbêjî guhdar dikir, awaha bi rêk û pêk, bi pergala nebû. Pirr peyvên wê xelet bûn, hinek biyanî bûn. Rêzil û komrêzil di nava hev da qelibîbûn. Hinek jî tede tune bû. Helbest di nava dest, lilep, dev û zimanê nezanan de mabû. Bi halê xwe yê xwezayî nehatibû parastin. Berhem pirr perîşan bûbû. Lê dîsa jî van gotinan bi vê halê xwe va bala

min kişande ser xwe. Bi çandekê navîn di van gotinan de, rûh, raman, dilêrî, amac, çand, wêje, evîn, evîndarî, helbesteke berz û dîrok û hûneriya kûr e, bingeşhîna welatiyeke fireh heyîtî dihate fêmkirin, nasandin û navandin. Dîsa jî hêsinê(cewherê) berhemê tete xuyakirin, ku bi rûh hostayîtiyeke mezin, kûr û fireh hatiye nîrixandin. Ji dev, dil, rûh û mêjiyê mirovekî zana û serek herikiye, berdar bûye. Van navandinana ji şikil û naveroka helbestê diyar dibûn.

Min ji Ehmed ê dengbêj pirsî, tu nizanî vê kilama kê gotiye, nivîsiye? Wî di bersiva xwe da got: Ez nizamî kê gotiye. Lê di wê demê de *Evdila Qantoz* ê payan jî got: “Di van gotinan de wate û wêjeyeke kamil û girîng heye.”

Min di nava zemanekî dirêj de ev gotinana berve hev anîn. Peyiv, qezî, qise û bêjeyê biyanî ji nav eşêf kirin. Rêzil û komrêzil ji nû de şûn kirin. Goranî naveroka berhemê min pergal, rêk û pêk daye. Peyiv û tiştên resen şûn kirin. Ev halê hanê qedîm bû, domîn bû. Hîmandin hate holê.

Rojek min jibona vê mijarê ji *Apê Mehmed* pirsî. “*Gelo van gotinana yê ne, tû dizanî yan na?*” Apê Mehmed hîn jî di jiyane de ye. Lê 80-90 salî ye, bûye kokim. Tewr û timşet û naveroka jiyana wî û ya welat û welatiyan mîna hev e. Heta jiyana wî zîlamî di nava dişwariyeke giran de ye. Merivên kokim, nexweş li şûna waran mayî, ji hevalên xwe da ketî, mayî ewê çawan be?

Apê Mehmed got: tê bîra min, ez hînê sivik bûm, ciwan bûm, xort bûm. Birayê *Şêx Seîdê Kal*, *Şêx Mehmed Tahîr Efendî* dihate nava malanên me. Şêx merivekî, zatekî zana bû. Ji helbest û kilaman pirr hes dikir. Du heb jî stranbêjê wî wêrre bûn. Navên wana yekî *Fêzullah* bû, yê dinê *Mehmed Emîn* bû. Herdu jî xort bûn, dengxweş bûn. Şêx wexta ku emirî gotina wan dikir, dest pê dikirin, digotin. Carnan yek yek digotin, carnan jî herduya bihevra digotin. Qasê ku tê bîra min, vê kilamê şêx Tahîr Efendî gotibû. Helbesta wî ye.

Di xortiya min da, min jî şêx Tahîr Efendî û dengbêjên wî Mehmed Emîn û Fêzullah dîtîn. Herdu jî kal û kokim bûn. Şêx Efendî diyariya wî pirr pak û paqij bû. Pirr jî xweş qise dikir. Merivekî kamil û maqûl bû, peyayê ser, pêş civak bû. Merivekî bi mêjiyekî xurt, mêjî şûxilî, dil û ruh fireh, bi mebest û ji jiyane berpirsyar bû. Ez wê cudatiya wî hîn bûm. Îhtimaleke mezin e ku mîna apê Mehmed be. Va berhema hanê ji merivên nezan sadir nabe. Va ne gengaz e.

Ji vê vekirinê şûnde, ez hewceyî şîrova hestê nabînim. Pêwistî nemaye. Goranî zanîna min wateya helbestê- berhemê berçav e. Lê va berhema dîsa jî helbesta/kilama gelêrî, gelî, gelemperî, komdarî, hevparî bihê, bête zanîn û pejirandin baştir e, goranî wezîna min.

BABA TAHIR URYANÎ (HEMEDANÎ)

BARAN

Baba Tahir Uryanî, li gora dîtinek di navbera salên 928(30)-1010 an da jiyaye. Li gora hin çavkaniyên din jî, tarîxa jî dayik bûna wî naye zanîn, lêbelê heta 1055'an jiyaye. Li Hemedanê hatiye dinê û temamê jiyana wî di herêmen Hemedan û Loristanê da bûhuriye. Baba Tahir, endamekê bijartî û giragirê tariqata *Ehl-i Haq* û girêdayê felsefeya sofîzmê bû. Wî fikrên xwe yê derheqa sofîzmê, di kitêba xwe ya "*Kelîmat û Qisar*" da diyar kiriye. Ev kitîba wî di nava sofîyan da pîr tê nasîn.

Rawendî di pertuka *Raxet û Sidur* da wesa dibêje: Dema ku min bihîst *Sultan Toxrul Beg* hatiye *Hemedanê*, sê pîr hebûn; *Baba Tahir*, *Baba Cexfer* û *Şêx Himşa*.



Girek li ber deriyê Hemedanî hebû ku jêra digotin Xidir û liser wî girî rawestyayî bûn. Çavê Sultanî (*Sultan Toxrul Beg*) bi wan ket û emir kir leşkerê wî rawestîn. Hate xwarê û digel wezîrê xwe *Ebunesir Elkundirî*, çu bal wan û destê wan ramusî. *Baba Tahir* hinkî aciz bû û got: Tu dê çi bi xelkê xûdê bikî? *Sultan* got: Her tiştê ku tu emir bikî. *Baba Tahir* bersiv da: "wî bike ku xûdê emir dike." *Sultan* giriya û got ez dê wê bikim. *Baba Tahir* destê wî girt û got; "Te jî min wergirt?" Got "belê". *Baba Tahir* serê mesînî ku pê destnivêj digirt ku bi tiliyê xwe mîna gustêrkê jî tiliyê xwe der anî û kire tiliya Sultanî û got; "min hosa welatê dinyayê kire destê teda, tu ser adil be". *Sultan* dikire tiliyê xwe.

Ew kevintirîn û bi nirxtirîn nûçe ye, ku ji *Baba Tahir* arifê *Hemedanî* hatiye gotin û her ji vê rûdanê dikarin. Li wê pertukê tête zanîn ku *Baba Tahir* di sala 928- 930' an da li Hemedanê bûye.

Ji hozanên**Baba Tahir* komeka kevin û bibawer liber destê me nîne. Di derheqa Hozan û serbihura wî da çavkaniyên kevin di destê me da nînin. Lewra em nikarin biryarek liser rastiya tevayê hozanên liser navê wî bidin. Kevitinrên giruvê ku hinek ji hozanên (helbestên) *Baba Tahir* nişan dide, komek destnivîsar li *Mozexa Qon* ye (hejmar: 2546- Ji sala 1428), ku nivîskarê wê komê ji *Baba Tahir* ra dibêje serkêşê arifan.

Hinek vekolerên mîna *Reza Qulixanê Hidayet* (di pertuka Riyazul Arifin da) û *Reşidê Yasemî* ku bi xwe kurd e, hinek ji hozanên liser navê *Baba Tahir*, di dîwana *Mele Mihemedê Sofiyê*, *Zenderaniwa Şatir Beg*; *Mihemed Hemdanî* da dibêje: dibêjin ku *Baba Tahir* ji bilê dubeytiyan komek peyvên kurt bi navê “*Eşerat*” bi zimanê Aerebî heye û hatiye nivîsandin ku *Eynulkuzat* şirove kirine. Her wesa şirovekirinek din, zanayek wenda (bênav) binavê *Elfotuxat Rebaniye Fi Eşaret El Hemedanî* ye, wê nê wî di *Pertukxana Millî ya Paris* da heye, ku bahsê *Baba Tahir* dike.

Reşid Yasemî di derheqa *Baba Tahir* û afirandinên wî da wesa dibêje: “*Hozanên (Helbestên) dînî(olî) û mistîkî yên Mele Perîşan û Kurd Mele Ranim, xazelên Seyid Yaqub Mahideştî û kitêba Newroz Guwaran evro jî di navbera xelkê rojhelata Îranê da tête nasîn û xwendinê. Hozanên destanî yên Mele Mistefa, Talî, Fikrî, Mahvî û hozanên Seydî yê Kurdistanî ji zimanê xelkê nakevin. Lêbelê jiber ku Dubeytên Baba Tahir hîn kevintirîn û tasawîfî ne, bala însanan hîn bêtir dikşînin. Lewra afirandinên Baba Tahir, piştê îslamiyetê ji kevintirîn afirandinên edebiyata Kurdî têtin qebulkirin*” (1).

Warê ku *Baba Tahir* têda rehê xwe berdaye, bûye çavkanî û warê gelek olan (dînan), çand, felsefe û medeniyetan. *H. Bektaş, Y. Emre, Mewlana* û wd. jî berhemên vê kevneşop û warê ne, di şopa pîrê xwe da çune.

Dîwana wî cara yekemîn di sala 1927'an da ji aliyê *Hûseyin Wahid Destgerdî* va li *Taxranê* tête çapkirin. Di dîwana wî da 296 dubeyt û çar xazel hene.(2) Dubeytên *Baba Tahir* di sala 1998 an da ji aliyê *Weşanên Nûbihar'ê* ve bi zarava kurmancî nûve hatin weşandin.

Hozanên (Helbestên) *Baba Tahir*, pirranî lîrikî û tasawîfî ne. Di vê babetê da gelek qasîde û xazel nivîsiye. Wî helbestên xwe bi wezna *mefailûn mefailûn mefail* (4 + 4 + 3) nivîsandine.(3)

*) **Hozan:** Helbest, şîir. Hozan: Ho + zan. **Ho**, di Kurdî de tête mana hînbûnê, fêrbûnê. **Zan**, tête mana zanînê. Hozan, tête mana nivîsana hînbûnê, fêrbûnê, hînkirin û fêrkirinê.

1) Dr. Ömer ULUÇAY, Ehl-î Haq, *Baba Tahir URYANÎ, Zerdûşt*, R. 32

2) Dr. Ömer ULUÇAY, Ehl-î Haq, *Baba Tahir URYANÎ, Zerdûşt*, R. 69

3) Dr. Ömer ULUÇAY, Ehl-î Haq, *Baba Tahir URYANÎ, Zerdûşt*, R. 32

Baba Tahir di helbestên xwe da evîn û heskirinê, xizanî û belengaziyê, xerîbî û bêwariyê tîne ziman.

Pîştê ku me bikurtî behsa jiyana Baba Tahir kir, nûha jî em dixwazin ji hozanên (helbestên) wî hinek mînakên pêşkêşê we bikin:

Di helbestên wî da mana pirr kûr e.

LORÎ:

Bi sehra bingerum sehra te wînem
Bi derya bingerum derya te wînem
Bi herca bingerum kuh û der û deşt
Nîşan jê qametê re(i)na te wînem

KURMANCÎ:

Berê xwe didim deştê di deştê da te dibînim
Berê xwe didim deryayê di deryayê da te dibînim
Berê xwe didim her cihekê çiya û çol û deşt
Nîşanên bejna te ya rind dibînim.

LORÎ :

Mu kê yarum serê yarî nedared.
Mu kê derdum sebu kibarî nedared.
Hemu wacen kê yaret xabê naze.
Çînu xabe kê bidarî nedaret.

KURMANCÎ:

Ez kul yara min naxwaze alîkariya min bike
Ez ku êşa min naxwaze sivik bibe.
Her dibêjin ku yara te di xewa xweş da ye.
Ew çi xew e ku hişyar bûn jêra nîne.

LORÎ :

Sê derd Muselmanan amu be yek bar
Xeribî û esîrî û xemê yar
Xeribî û esîrî sehîl wa bû.
Xemî yar muşkule ta çûn şewedkar.

KURMANCÎ:

Gelî muslimanan sê êş bi carekî hatin.
Xerîbetî û exsîrî û xema dîlberî
Xerîbetî û exsîrî bi sanahî dibin
Xema dîlberî zehmeta û şewitînit.

LORÎ:

Te ke zuni bimu çare biyamuz.
Gehî wajem kê key bi ruj wabî
Kê ên tîre şewan wake kerum ruz
Gehî wajem kê hergiz wa nebî ruz

KURMANCÎ:

Tu ku dizanî rêkî nîşana min bide.
Car dibêjim dê kengê bibe roj.
Ku ez wan şewên tarî digel kê bikem roj.
Car dibêjim ku çi car roj nabe.

LORÎ :

Dila dengim dila dengim dila deng.
Zi destem şîşeyê namus ber seng.
Hemu wajen be mu bî nam û nengî
Kesî kê aşqe çîş nam û çîş neng

KURMANCÎ:

Dilo hawar dîlo hawar dîlo hawar
Ji destê min şîşeyê namusê kefte xwar.
Hemu dibêjine min tu bê nav û bê rûmetî
Kesê ku aşiq e dê çi bi navî û rûmetî bike.

LORÎ:

Dilî mu xeyrî te dilber nagire ,
Bi cayê cewherî cewher nagire
Dilî mu mihre te sote azar
Mihre sotê azar der nagîre

KURMANCÎ:

Dilê min ji bilê te yar nagîre
Cihê cewherek cewherekî dî nagîre
Dilê min bi dîtina bejna te sotiye
Ew sotinê dilê min de ne derbêxe.

KURMANCÎ:

Ku destê min bighe çerxa felekê
Ez dê bibêjim; pirr şerme ev karê te,
Tu sed texlît nîmet didî hinan,
Hin nanê ceh bidest naxînin, jibo xwarinê

Ji van rêzên wî jî tête zanîn ku Baba Tahir bi alîkî ve bûye deng û gaziya însanên feqîr û belengaz, jibo vî yekî gazindên xwe ji xwedê dike.

FOLKLORA KURDÎ: V - VI

GOTÎNÊN PÊŞIYAN: CERÎBANDÎN Û ŞÎRETÊN BAV Û BAPÎRAN

Seîd VERROJ

Wekî ku ji aliyê kurdnas û zimanzanên ku liser Kurdan lêkolîn çêkîrine, dane diyarkirin, ku wêje û çanda kurdî gelek dewlemend e. Jiber ku, Neteweyê Kurd di Rojhilatanavîn da netewekî herî kevnare ye û xwedî dîrokekî dûr û dirêj e. Wî di avabûna şehrezayiya Mezopotamya'yê da rolek gelek girîng lîztiye. Gelê Kurd di nava pêvajoka dîrokî da, di avabûna şehrezayîkî kevnare û mezin da xwewedî cihê girîng bûye, lê hezar mixabin ku evro bindest maye û heta nûha jî afirandinên wî yên çandî û wêjeyî bi awakî serrast û qîmhatî (bes) nehatine berhevkirin û nivîsandin. Her weha xebatên zanyarî û aqedemîk jî pirr hindik çê bûne. Li alîkî zûlma dagirkeran û hoyên (şertên) neyînî, aliyê din da jî jiber teraliya me, ewan berhemên çandî û wêjeyî (edebî) derbasê nivîsê nebûne, Heta nûha bi devkî hatine. Ev berhem û afirandinên çandî, ku bi sedsalan û hezarsalan vir ve di nav civata kurd da têne gotin û îro jî jîndariya xwe wekî yê berê dewam dikin. Çand û zimanê kurdî gelek dewlemend e, lêbelê çawa ku hebûna kurdan tête înkarkirin, her weha hebûna çand û zimanê kurdî jî tête înkarkirin ji alî dagirkeran ve.

Gotinê pêşiyar jî dirûbandina navbeyna bûyeran, tiştan, xwenasî û pêşteçûna şehrezayiyê û ceribandina pêvajoka dîrokî da, ji jiyana xelk yan jî netewekî dizên û di hemu çand û zimanan da henin. Di gotinê da jibo ku hîn bêtir tesîr bikin; bi tevayî wekî hevokek yan jî bi kafeyê (hevdengî) têne gotin.

Gotinê pêşiyar yê kurdî, ji sed yan jî hezar salan vir ve hatine gotin û beşek (birrek) jî çanda kurdî ne. Jiber vê yekê, berhevkirin û lêkolîna gotinên pêşiyar gelek girîng e. Berhevkirin û lêkolîna gotinên pêşiyar, di alîkî da yekbûniya zimanê kurdî û aliyê din da jî di derheqa pêşteçûna çand û folklorê Gelê Kurd û rewşa jiyana wî da jî çavkaniyek girîng e.

Gotinê pêşiyar yê kurdî, ji ceribandina jiyana Neteweyê Kurd yê sedsalaniyê dizê, dîrok û ceribandinên wan yên derbasbûyî û kevnare diguhezînin evro. Jeber vê yekê, gotinên pêşiyar jibo me çavkanîkî girîng e. Pirranî bi hevdengî têne gotin. Hinek jî ji wan, liser dirûbandina bûyerên ku di tabîatê (xwezayê) da çêdibin têne gotin.

Dema ku em gotinê pêşiyar yê kurdî bikolînin, em dibînin ku, bi yê xelkên ku di pêvajoka dîrokî da demek dûr û dirêj bihevra jiyana xwe dewam kirine û cîranê (hemberyanê) hev bûne ji yê wan, yê wan jî ji yê Kurdan

ra pirr dirûbandiyî dide nîşan. Ev drûbandiyî û nêzikayî, di demek dûr û dirêj de ji dawiya têkiliya wan ve pêkhatiye. Ew gotinên ku gelek dirûbandiyê hevin yan jî wekhevin, di kevnare de bi kîjan zimanê hatiye gotin, nîşankirina vê yekê nehêsa ye. Jihev nîşankirin û cudakirina wan, xebatek pirr fire û kûr dixwaze.

Jibo ku afirandinên me yên çandî û folklorî (yên ku bi devkî hatine heta vero, ji wendabûnê xelas bin, hewceye em li ser mehu berhemên zaravayên zimanê kurdî bixebitin. Jibo nêzandina zaravayên (lehceyên) zimanê kurdî, divê liser hemu zaravayan lêgerîn û lêkolîn bête çekirin ku yekitiya ziman û nivîsandinê pêkwere.

Gotinê pêşiyar ji Wêjeya (edebiyata) Gelêrî têne hejmartin, ferqê wan ew e, ku tenê biserê xwe nayin gotin. Dema ku mirov bi hevra gengeşî dikin, dîteriqînin yan jî di nivîsandina nivîsarekî da jibo ku rastiya nêrîna xwe bidine qebulkirinê, ji gotinên pêşiyar referans û wekokan nîşan didin.

01.02.1992

A

- * Agir bikeve dehlê, tern û hişk bihevra dişewite.
- * Agirê xweş kes jê nareve.
- * Axa mêr e, gel şêr e.
- * Axa li kêfê ye, xulam ber zikrê ye.
- * Axura tarî ji gayê rêxo ra ye.
- * Axa û dilê xwe.
- * Ax a min e, namîne bo zaliman.
- * Axa bi xulam e, xulam bi ulam (berdestî) e, ulam bi tantane ye.
- * Aqilê sivik, barê giran.
- * Axa ji xulam ra got, xulam ji seyê xwe ra got.
- * Axayê sipîxur bêxulam dimîne.
- * Av di golê de bimîne sifto dibe.
- * Av zane bin wî de çi heye.
- * Ava bîrê bi bîrê tehl e.
- * Ava gurr netirse, ji ava nerm bitirse.
- * Avabûna malan, destên jinên çê da ne.
- * Ava miriyan nerijîne nava deriyan.
- * Ava rijyayî naye berhevkirin.
- * Av heta nekeve ciyê teng, deng ê naye.
- * Av rêya xwe bi xwe nas dike.
- * Av ku avête ser serî, çi bohustek çi du bohust.
- * Adar e, dew li dar e.
- * Agir bi serê min ketiye, tu jî rûnê xwe li ber diqijirînî.
- * Agirê kuçlana timê germ e, dereng sar dibe.
- * Ap biraziya radike, xal xwarziya radike.
- * Aqil li seriyan ne, ne li dirê jayiya çokan ne.
- * Aqilê giran mu kerr dike.
- * Aqil taca zêrîn e, di serê her kesî da nîne.
- * Ava golan bê tevger e.
- * Ava xurta serhevraz e.
- * An diçe aşê aşvan dikuje, an jî naçe aşê.
- * An mêrekî mêrxas be, an cindîkî libas be, An bimre ji rihê xwe xelas be.
- * An mêrê baş be, an bivir û das be, an bimre ji xwe xelas be.
- * Aşê nezana xwedê digêrîne.
- * Aşê dîna bêav digere.
- * Ardê hevanê, ava yabanê.
- * Arê kewanê, risqê bitenê.
- * Arvanê salê bi salê ra diçe.
- * Axa xulam ra go, xulam ji seyê xwe ra go, Se jî dêla xwe ra go.
- * Av bi bêjingê naye civandin.
- * Avê vexwe ji kaniya, jinê bîne ji eslîya.
- * Av di ciyê nizm de diçe.
- * Avê da ser serî, çi bohustek çi çar tilî.
- * Aqil hemiyê dibhirît, belê bêbextiyê nabîrît.
- * Aqilê kura, aqilê tîra.
- * Aqil diserî da ye, ne rûya (rûya) da ye.
- * Agir ket mala derewînî, kesê pê bawerî neînî.
- * Agir di qurma de dimîne.
- * Adar meriv dike dar.
- * Adar e, berfê da gulîya dar e, nema danê êvar e.
- * Adara se xwe davê siya dara.
- * Ahî vî destî namînê wî destî
- * Ap birazî dadike, xal xwarzî radike.

- * Astenga mezin, terazinka mirovî ye.
- * Aşiq birçî be, qala daweta dike.
- * Aş hindê neavêt, aşvan bixot.
- * Aş û mêş xodanî zevî dane pêş,
Careka dî zevî dikine derwêş.
- * Asinê ne ji madenî, hindî vejenî
dê her biçe ser kure gêsînî.
- * Axaftina xoş û nexoş di devkî
de tê.
- * Axa dara sipîndarê ye,
Ne siyê li xwe dike ne li kesê.
- * Axaftina bê kiryar, wekî dara bê
fêkî ye.
- * An kurê baba bin, an xwarziyê
xala bin.
- * Avê bînin ji kaniyan, jinan bînin
ji eslîyan,
Da hun bibînin ecêbiyan.
- * Avê berê barxaşan birîn,
tu hîn behsa kengirpera dikî.
- * Ava sekinî jê bitirse,
Ava ku diçe ji xwe diçe.
- * Aqilê kurî (kurt) se têkirî.
- * Aş digere aşvan xwe dipesnîne.
- * Afir heye ker tune ye.

B

- * Barê ketiya kes ranake.
- * Bar min naêşîne, binbar min
diêşîne.
- * Barê serê bêaqil ling dikşînin.
- * Baran dibare, erd pesnê xwe
dide.
- * Barana havînê şil kir bin kulînê.
- * Bexçê gulan, para bêaqilan.
- * Bav çi se be, kur jî wê ew se be.
- * Bavê te ku kuştin, çi siyara
kuştin çi peya.
- * Bayê gurgurî, wekî jina virvirî.

- * Bexxê nêr ji bo kêr.
- * Bextê romê tune ye.
- * Berê gul bû, baranê lêkir şil bû.
- * Berf diçe erd dimîne.
- * Berdana jinê edeta dinê.
- * Bera giran di cihê xwe da qenc e.
- * Ber baranê revî, li zîpikê qelibî.
- * Bejnî tîte, konê wê bêçît e.
- * Bejnî tittir î, zikê wî birçîne
quirequr î.
- * Behr bi devê se pîs nabe.
- * Bedewê çav kil kir, dilê xortan
tev kul kir.
- * Belgê darê, dar dixemilîne.
- * Bendê bêkes, jê ra nabêjin bes.
- * Beq nequire, wê bidire.
- * Beranê bisko bûya, wê di nava
pezê bavo bûya.
- * Berhevkir ji deriya, da heqê
miriya.
- * Berê biedilîne, paşê bixemilîne.
- * Bila baş be, bila dir be.
- * Berê dest desta dişon,
paşê vedigerin herdu çavan dişon.
- * Beranê zivistanê, mîna ava piz
danê.
- * Bereket jê tê hereket.
- * Berfa berêvarê, qirê tîne li debarê.
- * Berê goh bide, paşê xeberde.
- * Ber kerê ra derbas dibe, cahşikê
jê didize.
- * Berê xeber bibêje, paşê birêje.
- * Berxa ber mîyê, weke beranê
bêriyê.
- * Bexxê çê, di koz da xuyaye.
- * Ber dîwar bi gohin.
- * Bertîl bera dihelîne.
- * Ber ji besta xelas nabin.
- * Bexxê beranî ji beranî diyar e.
- * Berik di cihê tenik de didire.

- * Beg sîya sipîndarê ne, ne li xwe dîkin, ne li hevalên xwe dîkin.
- * Befir sipî ye, lêbelê her ya tazî ye.
- * Berberojk her dê germ bin.
- * Bexê xelkê di koza mirov de namîne.
- * Benîştê dîna, ji litir e.
- * Bergîr (hesp) têr bixwe, dê di alovê xwe de birî.
- * Beza pisîkê, heta kadînê ye.
- * Berf fiêla xwe nahêle.
- * Berfa adarê da guliyê darê.
- * Bext nadim bi text.
- * Babmirî xew têt, şîvnexwarî xew nahêt.
- * Bab û welleda şer kir, bêaqila bawer kir.
- * Baran hat zeviyê, hîn nû jinga van bezî teşiyê.
- * Babkuştî xew têt, zikbirçî xew nahêt
- * Bavê qîzan sultan e.
- * Bext kela mêra ye.
- * Bêbextî bêderman e.
- * Bênder her yê ba ye.
- * Bêxwedêti dibe, bêxweyîti nabe.
- * Bêje min hevalê xwe, ez bêjim tu kî yî.
- * Bêndera bêxweyî, ji mirov ra nabe bênder.
- * Bêndera dereng nabe xurê xweyî.
- * Bêjin lal e, nabêjin teral e.
- * Bêdev xeber nayê tev.
- * Bêserwêrî, girara pîra nakele.
- * Bilind firrî, nizm ket.
- * Biratî bi baran, hesab bi miskalan.
- * Birîna xeberan ji birîna şûr xirabtir e.
- * Birîndar êşa birîna xwe dizane.
- * Bide bi destan, bigre bi lingan.
- * Bi bîhna fire, bêsire dibe helîr.
- * Bira bira ye, bazar cuda ye.
- * Bila lendan li cihê xwe be, da namusa mêran li serê xwe be.
- * Bi gulekî buhar naye.
- * Bi pîrekî, neçe dîwana mîrekî.
- * Bizin bi lingê xwe, mirov bi emelê xwe.
- * Bila bira be, bila ji gura be.
- * Bila quna mirov derkeve, bila navê wî nederkeve.
- * Bi xwezîya mirov nagîşe pizîya.
- * Bila mirov xwîndar be, deyndar nebe.
- * Bixwe mîna mêran, rabe mîna şêran.
- * Bide aqçe, here nav bexçe.
- * Bi bendê xelkê nekeve bîrê.
- * Bi axaftina xweş, marr ji konê têtê der.
- * Bi çavên zil, berê xwe bide leşê mirî.
- * Biçukê malê seyê malê ye.
- * Biçuk li cihê xwe, mezin li cihê xwe.
- * Bi hêceta silkê xwe gihand kotilkê.
- * Biçukê malê gula salê.
- * Bila di dil da bit, ne li dev da bit.
- * Bi axive piçek, goh bide gelek.
- * Bide netirse, bigre neşerme
- * Bi derziyê, bîr nayên kolan.
- * Bi werîsê xelkê neçe kevira.
- * Bi şevreşî ra tu rengên dî nînin.
- * Bi dest bike, bi dev bixwe.
- * Bi dilê mezina bizewice, bi dilê biçukan hes bike.

- * Bila rê bit bila dur bit,
Bila bor bit bila kûr bit,
Bila keç bit bila pîr bit.
- * Bî qisekî neçe serê milekî.
- * Bî derziyê neçe ser şujînê.
- * Bî ewtîna seyan, kerwan ji rêya
xwe nabe.
- * Bihar û havîn rez, zivistanê jî pez.
- * Bihar hat rakirin, payîz hat
dakirin.
- * Bihara xwe tern neke, payîza
xwe giru neke.
- * Bî çayîrê zil, berê xwe didite
birînê kul.
- * Bî nermî dê gehînîte çermî.
- * Biher hat, zivistan hilat.
- * Bî kevçî berhev dike, bi hesikê
belav dike.
- * Bî kerê nikare, dibeze kûrtanê.
- * Bila bextê mirov hebe çavê
mirov tune be.
- * Bila dax be, li destê sax be.
- * Bizina gêj, karika gêj jê dikeve.
- * Bila meriv dîkê rojekî be, ne
mirîşka sed sala be.
- * Bilind nefire da nizim nekevî.
- * Bilbil bi dengê xwe, mêrxas bi
cengê xwe.
- * Bî nanekî mirov nandar nabe.
- * Bixwe nan û avê, mineta xelkê
bavê.
- * Bimre bo jînê, nejî bo mirinê.
- * Bîhna dê tê ji xaltiyê.
- * Bîhna kiz tê ji mala diz.
- * Bî xwe kiriyan, derman tune.
- * Bipêje hêja bipêje, bixwe hê
bişkrîne.
- * Bila şêr pişta mirovî bişkîne,
Bila mirov ne li ber sîbera rovî
be.
- * Bike kal, bixwe mal.
- * Bira bila bira be, heskê ji dêle
gura be.
- * Bila mêrê min law bî, kirasê
min caw bî, ko mêrê min kal
bî, bila kirasê min al bî.
- * Berxên pirr, ji mîhên pirr in.
- * Betafî, xirabmalî.
- * Beq çiqas kok dibe, gûn ewqas
lê qalîn dibe.
- * Bextê dê, cihêzê qîzê.
- * Bextê reş, mirova dike nexweş.
- * Beza hespê, namusa siwar e.
- * Beza mirîşkê heta kadînê ye.
- * Bawer nedikir mêr bike, mêr kir
dawa malheysteka dike.
- * Bûk li ser hespê ye, kes nizane
qismetê kî ye.
- * Bûka min heye, mala bavan da ye.
- * Bike wek mêra, bixwe wek şêra.
- * Birîna li hevala, tîra li kendala.
- * Bila hindik be, bila rindik be.
- * Bizina kol elimiye berûya.
- * Ba tê, her kes kûma xwe bi
serê xwe digre.
- * Bar naçe ber kerê, ker diçe ber bar.
- * Berf jî sipîye, kuçik li ser dirî.
- * Bin sergo ye, ser sergo ye.
- * Bûkê çi xwarî? serîkî ga xwarî,
teştê nan xwarî,
beroşekî şorbe xwarî!
- * Bûkek anî lez û bez, sivika
malê dîsa ez.
- * Bûka me rind û bilind e, bêjing
û nava gund e.
- * Bûka mam esmana, rojê digirt
bi kulana (zikaka),
bi şevê diçit kezuwana.
- * Bûka xaletê kete lezetê, bûka
metê kete zahmetê.

- * Bûka salê berde malê, da tu bizanî marîfet û kemalê.
- * Botan bi mêrê xwe va, şêrwan (şîrwan) bi şurê xwe va.
- * Bûk ser hespê ye, her xwedê dizane nesîbê kê ye.
- * Bi xêra hevalan ezê bêm seyda xezalan.
- * Birîndar bi birîna xwe zane!
- * Bi tajiye xelkê nêçîr nabe.
- * Bîroşe kerê reş, bixwe tiştê xweş.
- * Bila meriv kuştîyê şêran bit, ne girtîyê roviyan bit.
- * Bizina gur geryayî!
- * Ba ji tehtê çî dibe(!)
- * Ber bi min e, hayî bi xwe nîne.

C

- * Cendek ku ket, teyr zu bîhn hiltînin.
- * Ceger ceger e, belê her nefesa mirovek bixwe fere.
- * Cerê avê di rêka avê da dişikêt.
- * Cihê ku pakî hebe, xêra xirabiyê nîne.
- * Cîyê ku şîn lê, tema şahiyê nîne.
- * Cî heye rev ji mêranî çêtir e.
- * Cî ji mêvana teng nabe.
- * Cîranê baş bira ye, cîranê xerab bela ye
- * Cîranê pak, ji birayê nepak çêtir e.
- * Ciyê ku agir tune be, dûman jê ranabe.
- * Cilê zêr li kera bikin jî, ker dîsa ker e.
- * Caw dibe kitan, dew dibe der man.

- * Cejna salê bi salê re dibore.
- * Cewrên seyên dir timî dir in.
- * Cehşik mezin be jî, ew cehşik dîsa ji ker e.
- * Ceribandî ji neceribandî çêtir e.
- * Cotê bêgêsin, nikûl zu lê dişkê.
- * Cuka (cu) av pêve çuye, dê her pêve biçe.
- * Cûhî û cot, hirç û bilûl, ereb û lakot.
- * Cîvata zilama guwera kavirê nêr e, her kes tede xeber dide.
- * Cotê ra nabe, mozê re baş e.

Ç

- * Çavê li deriya xwelî li serî ya.
- * Çawa sûk e, wisa jî bûk e.
- * Çavê qelişî ji çavê kor rindtir e.
- * Çav ji çava şerm dike, bertîl kevira nerm dike.
- * Çav li rêya dûr be, bila ne li tirba kûr be.
- * Çavê mirîşkê her ê li ser gîfkê ye.
- * Çaxê gur pîr dibe, dibe lêvaka sa.
- * Çavê ku ji mirova ra ronî nede, mirov dê biteqîne.
- * Çend lengerî qurçik, malhazirîkî sivik.
- * Çend tehlî hebît, her dê rojekî şîrînî hebît.
- * Çêl dotin û kezwan kelutin.
- * Çendî zana bî, hindî pirsyarker be.
- * Çêla tirok e, garanekî pîs dike.
- * Çêlek avis be, kengî za.
- * Çêl dotin û qazan kelotin!
- * Çem bê çeql (rovî) nabe.
- * Çi roja çû, ji emrê mirovî çû
- * Çi dar nîne bayê lê nedaye.
- * Çi bikin kuwarê ew diête xwarê.

- * Çi biçînî dê wî hilînî.
- * Çi marr dê bê jehr nîne.
- * Çi ber bi serî bikevit, çi serî bi berî bikevit.
- * Çi roj baran e, ev roj zivistan e.
- * Çi agir bê du nîne.
- * Çi nedîtî danhêrk lê cejn e.
- * Çivî sitêr e, sînôr zêr e.
- * Çiyayên bilind bê berf nabin, newalên kûr bê av nabin.
- * Çiya hewceyên çiya dibin.
- * Çiya çiqas bilind be, wê rojek rê pêkeve.
- * Ciyê şêra, rovî lê dike gêra.
- * Çi li Muşê, çi li piştâ derguşê.
- * Çil roj çile, hespê qule, tajiya tule, mêrikê file, qet pê nebe ewle.
- * Çiyayê bilind jî hewce ê nimz e, ê nizm jî hewce ê bilind e.
- * Çiya bi çîyan nakevin, belê çav bi çavan dikevin.
- * Çiyayê bilind bê dar nabin, geliyên kûr bê av nabin, bejnên zirav bê yar nabin.
- * Çiya ne bi rû, derwêş bi rû.
- * Çend peyvê hirçê heye, her çend jî ser dara hirmî ye.
- * Çermê kuçik nabe post, mirovê hûkometê nabe dost.
- * Çengê wî tije garis be hebek jê narije.
- * Çu heyfa bavo, quna dêk da ser.
- * Çu seydê bi xwe bu seyd.
- * Çeqçeço li berê ro.
- * Çi dehl bê çeql nabit.
- * Çavê kor tune, lê bextê kor heye.
- * Çem ji kaniyan çê dibe.
- * Çêjikê marran bê jehr nabin.

- * Çêlekek bi şîr ji deh mîhên bêşîr çêtir e.
- * Çem ji kaniyan çê dibe.
- * Çi bêjî jî li bejna siwarê min tê.
- * Çileyê reş, debarê xelas dike li gayê reş.
- * Çiqas dibî mîr, xwe neke jibîr.
- * Çiqas sax bimînî, ewqas ecâba dibînî.
- * Çira kesî heta destê sibê naşixule.
- * Çivîkek girtî ji qazek çolê çêtir e.
- * Çîyayê bêgul, weke însanê bêdil.
- * Çav dibîne dil dimîne.
- * Ço bi ço vedigere.
- * Çun şuna mirîyan, her kes li mirîyê xwe girya.

D

- * Dar ku şil be ditewe.
- * Darê sitwîr nabe gopal.
- * Darkukê zimanê zêde, darkukê serê xudanî ye.
- * Daweta mîra, agir ber bi feqîra.
- * Dara jîyanê bi xwiynê tête avdanê.
- * Dar nîne ba lê nedit.
- * Darê di bin xwe ra nebire.
- * Dayê hes jê kir, keçê şuj jê kir.
- * Dawet ferikî, berbûk hetikî. pîresiwar xeriqî.
- * Dara xweziya hêşîn nebûye.
- * Dara ku ji binî hişk be, feyda kezaxê nîne.
- * Destê rehet li ser zikê birçî ye.
- * Destê vala deng jê nayê.
- * Dewê ceribandî ji mastê neceribandî çêtir e.
- * Derdê birçî nan, derdê têr kêf û dîlan.

- * Destê te reş nebe, tama devê te xweş nabe.
- * Dengê defê ji dur va xweş e.
- * Derdê bêkesa giran e, weke diranê bi jan e.
- * Derdê axa ne lor e, penîrê şor e.
- * Derî dar bike, malê sitar bike.
- * Dil dixwaze, taqet tuneye.
- * Deng nekiro deng nake, dengê xwe kir dinê xerabe kir.
- * Dewê ceribandî ji şîrê neceribandî çêtir e.
- * Deriyê kesî neloqîne, da kes yê te neloqîne.
- * Devê ku sîr nexwe, bîn jê nayê.
- * Dema kitik (pisîk) ne li mal e, navê mişkê ebdurrehman e.
- * Destê vala, ne ehle ne sehle.
- * Divê qîra mirov, gora hêza mirov be.
- * Devê te ji agirê dişewite, tu pif dikî avê.
- * Dermanê nevînê, nedîtin e.
- * Dewleta belek gewr e, qîz avis e bûk sitewr e.
- * Devê pisîkê nagîha goşt, go: bila xêra dê û bavê min be.
- * Derdê min nebese, ê xelkê serde hewese.
- * Dar bi belgê xwe geş e.
- * Destê nanê digihe wanê.
- * Delalê malê bila şahne be, meaşê wî qet tune be.
- * Destê vala li ser zikê birçî ye.
- * Derdê kula dila nayê gotin, xem hatiye firotin.
- * Dew xwestin û kodik veşartin nabe.
- * Deynkirin zêr e, ji xeyn namusa vêre.
- * Dest dizane kî derê dixure.
- * Destê dê jêke, pê li ewlada xîne.
- * Dewsin kerê, pencin hirçê.
- * Deve hate pul, pul tune.
- * Dest hilanîn pîrozî ye.
- * Derewker firawînek dixwe.
- * Deriyê xwe bigre, cîranê xwe diz neke.
- * Derpê jinê sor e, mêr kur e.
- * Destê neşê leq bidî, maçî bike.
- * Deve bi kudikê naye avdan.
- * Dermanê xwestinê, dayin e.
- * Devê rovî negîha tîrî, go: tîrş e.
- * Dev dixwe, çav şerm dike.
- * Dayika dizî du tira dike, yek ji tîrsa, yek ji pîrsa.
- * Dewsa şura sax dibe, dewsa xebera sax nabe.
- * Dizan ji dizan dizî, erd û ezman lerizî.
- * Dilê tirsonek, sînga sipî nabîne.
- * Dilê nazik nagihaye çi mirada.
- * Dinya bi dor e, ne bi zor e.
- * Dinya gulek e, bîhn bike û bide hevalê xwe.
- * Dijminê bava nabe dostê lawa.
- * Dinya bûye kes, tu kes negotîye bes.
- * Dilê firreh pîr nabe.
- * Dil ji dila hes dike.
- * Di malê da tu ne ar e, jinikê navê xwe danîye dînar e.
- * Di malê da duva mişk ji arvan nabe.mêrik dawa axatî dike.
- * Dêl bê se be, kopek tê ji helebê.
- * Dêzikê go: ez zêrîn im, heskê go: ez nav teda me.
- * Dinya ne car e, bi dor e.
- * Dinya hemu ka be, devê kerê min pê nabe.

- * Dizê malê ji malê be, ga ji qulekê dertîne.
- * Dinya nediya dinya dî, girarê germ ser agirê xwe dî.
- * Deve nal kirin, rovî çu go: pepikê min!
- * Dil li ser dil e, jêre nîne tu derd û kul e.
- * Dil wek şuşe ye, zu dişike lê dereng diceribe.
- * Diziya bi wijdan, baştir e ji bazarê bê wijdan.
- * Dinya bibî bihust, dîsa min nabî dost.
- * Dinê li dinê, mendo li jinê.
- * Dibêjit belê, nepêjit.
- * Divê piyazê nexot, bîn jê nehêt.
- * Dilê xoş her lê buhar e.
- * Dil dila dihebînit.
- * Dinya war e, ne mal e.
- * Dil şuşe ye, gava bişike nace bire.
- * Dijminê beramber baştir e ji hevalê xerab.
- * Dizî xwe mal e, dergirtin betal e.
- * Dinya dibe bihust, dijmin nabe dost.
- * Dîtina çava, sotina hinava.
- * Dîkê çê di hêkê de bang dide.
- * Dîtina deyndarî, nexweştire ji pêvedana kormarî.
- * Dîwaro ji te ra dibêjim, bûkê tu sehke.
- * Dî nedî kîrê bavê xwe dî.
- * Dî ezim, nedî diz e.
- * Dîkê çil ziman, ji pîra bêdiran her pêştetir e.
- * Dîk diçe şaristanê, leşkerek giran bîne ser pîra bêdiran.
- * Dê bû dêmarî, bav bû babmar rî.

- * Dêla tiruke, seyê baş jê nabin.
- * Dohnî li çirê ke, seyir li melê ke.
- * Dostê bava, nabe neyarê lawa.
- * Du bira neçin gur.
- * Du ser di qazanekî de nakelin.
- * Du hesp li ser afirekî da naçerîn.
- * Du jinik dîwanek in, du fille kerwanek in, du ker garanek in.
- * Dûkel bê agir nabit.
- * Dûrê bide dûrnanan.
- * Dea (deha) dewrêşo, tirba gamêşo.
- * Dilê malê xwemal be, dirûna têyrê betal e.
- * Dê bibîn dotê werîn.
- * Destê tenê deng jê nayê.
- * Du parên xezanîyê nezanî ye.
- * Dinya puç e.

E

- * Eger agir bikeve rêlê, tern û hişk bi teva dişewite.
- * Eger aşê, hevran baş e.
- * Eger hevalê te şekir be, hemiyê nexwe.
- * Eger axaftin zîv be, neaxaftin zêr e.
- * Eger tu nezanî, berê xwe bide cîranî.
- * Eger gurek di xema baranê de be, dê bi xwe ra kepnek çêke.
- * Eger rovî têr xwar, tirî tirş dibe.
- * Eger te dar birrî, di binî da nebirre.
- * Eger gayê pîr reqisî, xêr nîne.
- * Eger li sîrkê nevegirt, li çîpê feyde nîne.
- * Eger mirov landika yekî bihe

- jîne,yek jî dê landika mirovî hejîne.
- * Eger bi tira be, da bi kera be.
 - * Eger mirovên emirdirêj hebin, dê serhatî jî hebin.
 - * Eger destekî bivir ji darê nebe, darê nabirre.
 - * Eger mirov dergehê yekî hejand, yek jî dê dergehê mirov hejîne.
 - * Eger ax mirovan nevesêre, dê her hevdu bibîne.
 - * Eger çavekî mirovî kor be,mirov dê destê xwe bi yê dî venit.
 - * Eger tu çuyî cîyekî biyanî, Li ber xwe bisekine wekî şûrê di kavlanî.
 - * Eger me pez nedîtibit li rêzê, me pişkilêt dîtin li pirêzê.
 - * Eger xwediye malê dengbêj be, ehlê malê hemî reqaskerin.
 - * Eger bêaqilî têr xwar, an dê mêrekî bikuje, an dê jinekî revîne.
 - * Eger çuçika hemiyan hêjîr bixwara, çi bo xelkê nedima.
 - * Eger mezinê zomê (herêmê) Şengo bît, halê zomê dê ho bît.
 - * Eger dê bû jinbab, bab dê bît zirbab.
 - * Eger şûv bi ternî neçemit, êdî naçemit.
 - * Eger deşt e, eger zozan e, eslê tiştî xûda ne.
 - * Ecel ku hat, nade mecal.
 - * Erd birinc be jî, av rûn be jî, ku xweyî tunebe, zu xelas dibe.
 - * Ecelê kuçik tê, diçe nanê şivan dixwe.
 - * Erd tîne, cotkar pesnê xwe dide.
 - * Erebo nefhao, çêtiro bav û birao.
 - * Eger dew heye nan nîne, nan heye dew nîne,
- herdu heye malxweyî nîne.
- * Ehlê parî naçît harî.
 - * Em bi gakî narin cem axakî.
 - * Em pîr mîr in, xelkê me kirin kizîr.
 - * Ewê ku dîzikê çê dike, wê çembilê wê jî bixîte.
 - * Ew çavê ku dijminê xwe nas neke, bila birije.
 - * Ewê masîvan bit, dê quna wî şil bit.
 - * Eva lêlê ye, hîn lolo maye.
 - * Ev bihişt mirovî bar tê nebit, bila ker û golik têda biçerin.
 - * Ewrê xurxur bike baran jê naye.
 - * Ew çu Palo, dewaran berde malo.
 - * Ewr çu Muş, dewaran berdîn puş.
 - * Ew war e, belê ne ew bihar e.
 - * Ew serê ne nav xebera, bila bikevît nav du bera.
 - * Ev dinya xan e, însan jî têda mêvan e.
 - * Eva aş, eva jî çirika aş.
 - * Eva tas, eva jî himam.
 - * Ez dibêjim va hirç, tu dibêjî va rêç.
 - * Ez dibêjim nêr e, tu dibêjî bidoşe.
 - * Ez nanê namerda naxwim, nadim li ser pira qelsemêra.
 - * Ez namirim bi wê derbê, ezê bimirim bi wî kerbê.
 - * Ez ketim navbera nal û bizmarî.
 - * Ezmanê dirêj, darqokê serê xodanê xwe ye.
 - * Ez çiya û tu çiya, kulîlk ma bê giya.
 - * Ezmano (zimano) birrîo, sero vehezhawo.
 - * Ez axa tu axa, kî pez bibe nava baxa.
 - * Ez diz berdidim diz min bernade.

* Ez ji tera, tu ji kê ra?

* Ez li daweta diz im, diz jî li goma pezê min e!

* Ez li zik dixim, tu dibêjê way pišta min!

* Ez ji wî ra weke penêr im, ew jî ji min ra weke kêr e!

* Ez naçim mala axê, çekam diçe mala axê.

* Eynter li der e, Xidlîyas li ser e.

* Elo ne li mal e, ber deriyê wî galegal e.

* Erebb wekî mêş e, hêdî kiş dikî her têne paş.

* Emrê leglegê çu bi teqteqê.

Ê

* Ê masîya bigre, dê quna wî jî şil be.

* Ê birinc bixwe, dê xençera jî li xwe bigre.

* Ê hevalê qirikê be, nikila wî di nav gu de be.

* Ê ser sekiniye, ê bin nasekine.

* Ê ku zane zane, ê ku nizane dibêje baxê nîska ye.

* Ê ku xwest rûkî reş e, ê ku nede herdu rû reş e.

* Ê ku dikeve behrê, destê xwe davê kefê.

* Ê te gerandî ye, min çêrandî ye.

* Êdî avê rêya xwe dîtî ye.

* Êl yeman, beg yeman?

* Ê ku nan nedît bixwe, bila kada (celebek şîrane) mastê bixwe.

* Êkî got mala min e, êkî gat warê min e.

* Êkî got: kerê min kevirî ne, ê dî got: ev e ker û ev e kevir.

* Ê xelkê sor û zer e, ê min ji dinê der e.

F

* Fatromê agir berda komê, çu rûnişt ser zomê.

* Feyda gavana, siwarbûna kera ye.

* Ferqa seyê sipî û reş nîne.

* Feqî bi rojekî nabe mele.

* Feleyê pîr misilman nabe.

* Feqîrî zenga mêra ye.

* Feqîr mirîşk bixwe, an feqîr nexweş e, an mirîşk.

* Fîta hesinê hewêrî ye.

* Feqîr çu diziyê, heyv ji êvar de derket.

G

* Ga dimre, gagiloz pîr dibe.

* Gava ku bi dil be, dixwazî bila nan û gilgil be, gava bê dil be, dixwazî bila goşt û birinc be.

* Garis gol bî, baran lê hat şil û mil bî.

* Girara du kebanîyan, an siwîr (tehliya sîr) e, an jî bê xwê ye.

* Gava ga dikeve kêr zêde dibin.

* Gayê çê li ber kozê de kifş dibe.

* Gayê çê bi baran, mêrê çê bi xeberan.

* Gaziya du siwaran nagihîşe xweyiyê xwe.

* Garan ber bi mal bû, jina şivan bi şuxul û kar bû.

* Gewriya qul bê risq namîne.

* Gelî bêdar nabe, zozan bê war nabe.

* Gayê zayî, ra xwe hesyayî.

* Gede êmîşe malan in.

- * Ger mirov kera li ba hev girê nede, Ji hev hînê tir û fisa dibin.
- * Ger gul nebî, nebe sitrî.
- * Ger kurmê derê ji darê nebe, zewala derê nabe.
- * Ger gul nebe, sitrî nabe.
- * Gêsinî di çavê xwe ra nabînit, Derzîyê di çavê hevalê xwe re dibînit.
- * Girara rijî ji kêmdohnîye.
- * Girê bilind ji çiyayê xerab çêtir e.
- * Girê bi desta vebe, ne hewciyê dirana ye.
- * Giya li nizara, goşt li bêara.
- * Giya di bin kevira da namîne.
- * Giya li beyara, goşt li bêara.
- * Golikê malê ji gayê malê natirse.
- * Go: mîro xwedê rikêba (zengu) te dirêj ke, go! destê min da ye.
- * Gotiye tu ji kiyê, go: min hîn jin neaniye.
- * Go: pisîkê guyê te derman e, rabû ax da ser.
- * Go: ew ciye tu diçînî? go: dema ku hêşîn be tê bibînî.
- * Go: rovî di kunê de nediçu, rabû zengilok li serê duva xwe ve kir.
- * Gotina xweş marra ji kunê tîne der.
- * Go: pisîkê guyê te derman e, pisîk fîrya çu ezmane.
- * Golikek qun bi rêx, navê garanekî xera dike.
- * Go: koro tu çi dixwazî? parikî dohn û çavekî ronî.
- * Gotinên mezinan, nexşê li beran in.
- * Gorg ji kevlê xwe dernakeve.
- * Gozik mu ye, av tezi ye.
- * Gote kerê tu evrazî an nişîvî,

- kerê got: çi berwarî nîn in.
- * Go hekîmo tu bi çi hekîmî? go: bi êşa xwe.
- * Gurrîo navê min li te, keçelo kûma min li serê te.
- * Go: koro te çi divê? go: duçavên ronî.
- * Gurê pîr dibe qeşmerê kuçikan
- * Gundek e, gilorek e.
- * Gundek e, rindek e.
- * Gura kerê min xwar, malan kerê xwe girê da.
- * Gur bi du pariyê nemirî ye.
- * Gura dinya xwar, rovî navê wî derket.
- * Gotin û dîtin nabe yek.
- * Gîsk mir, gîrr vemirî.
- * Giyayê hewşê tehl e.
- * Guliya xwezî belg nade.
- * Gure gure ku ji darê tê ne ji darê ye, ji belgê darê ye.
- * Galgala xweş bihara dîla ye.
- * Gotin edet e, nexwarin dewlet e.
- * Girew ji garanê ye.
- * Golik kadînan, zarok embaran xelas dikin.
- * Gava nan qet bû êdî hev nagre.
- * Giyayê malê tehl e.

H

- * Hat fit, nehat fitanûfit.
- * Hawîr binêre; kûr binêre, dûr binêre.
- * Havîn e, genîn e.
- * Her giya li ser koka xwe şîn dibe.
- * Hezar bavê çê, esil şîrê dê.
- * Hespê çê qamçî nagihîne xwe.
- * Herê kor e, garis bi serî ye.

- * Heyfa bavê xwe digerya xwîna
xwe jî li ser da.
- * Hespê çê êmê xwe zêde dike.
- * Heke heye nan û dims, ez û tû
pismam û pis, heke nîne nan û
dims, ez Hotî tû Botî.
- * Heçî ne ji mêlakê, nabe pisê
makê.
- * Heta mirinê kirin e.
- * Heçî nekê ya mezina, wê pêve
bê siturwê bizina.
- * Her ro qafik di avê de naye.
- * Hemu çuka hêjîr bixwara,
hêjhir ji dehlivan ra nediman.
- * Her ro mal di mêrga da nayîne.
- * Heta me xwe nas kir, me emrê
xwe xelas kir.
- * Hirç û govend!, rovî û seyran!
- * Heyî be kurê kerê be.
- * Heta nede lêvê min ez deng
nakim.
- * Her teyreki bi refê xwe ra qenc e.
- * Hemu çîrok li bejna hêrên tê
gotin.
- * Heçî yê destê xwe bixe bin
gohê xwe, zane wê çi bêje.
- * Hey te girt bernede, hey te
berda pê nekeve.
- * Heta tu li ser desta rê ve neçî,
tu qedra linga nizanî.
- * Here cem wî ê te bigirînin, neçe
cem wî ê te bikenînin.
- * Her kes neyarê kewê ye, kew jî
neyarê xwe ye.
- * Heçî negot û kir şêr e,
Heçî got û kir mêr e,
Heçî got û nekir, kerê nêr e.
- * Heft avzankê kerê hene,
wexta ku dikeve avê her heft jî
jîbîr dike.
- * Heta germiyê beliq da, Rizayê
min dorê çendik da.
- * Heta germiy piyja, can ji Rizayê
min kişya.
- * Heta mirov ji pirê derbas be,
ji yarê dêya xwe ra dibêje bavo.
- * Hûner bazinê zêrîn e.
- * Heta serê xwe nedaye şikandin,
bêşa xwe nedaye.
- * Heta nava destê mirov nebe reş,
mirov naxwe tiştê xweş.
- * Her teyr bi refê xwe ra ye.
- * Hinek ji hesin, hinek ji gêsîn,
hinek ji qora ga ê mezin, hemu
tevda dibezin.
- * Heta bûkê xemilî, govend betilî.
- * Hevalê barê ketî tune ye.
- * Hesp dibeze, siwar pasnê xwe
dide.
- * Hawê pak e, saq leyaq e.
- * Heft mêrên mirî civiyan li barkî
hirî.
- * Hezar sal bimînê li dinê, rokî
dibî mêvanê qebrê.
- * Heta baran nebe, nabe avûherî.
- * Heft kûrê yekî hebûn, başê wan
qunek bû.
- * Heke deşt e, heke zozan e, eslê
tiştî xûdan e.
- * Heke ders e, herfek bese.
- * Heke xiyar e, ji tîtikê diyar e.
- * Her pezek bi pepika xwe.
- * Hemam bi tira germ nabe.
- * Hevy heyve jî, eybek lê ye.
- * Heta sîya darê nekeve, dar
naxweyê.
- * Heso, Reşo nabî Mehmet Beg.
- * Heta meriv însan nas dike,
emrê xwe xelas dike.
- * Heke ti bi mal î, ti bi xwişk û

- xal î, heke ti bêmal î, ti bêşewal î.
- * Heke heye nan û di(m)s, ez mam tu pis, heke tune nan û divs, ez Şêrwî tû Botî.
 - * Her ku ba bê meriv bi ber keve, her ku av bê meriv bi ser keve, dê meriv here ji dinê derkeve.
 - * Her warek buharek, her kêfek lihêfek.
 - * Her sûkek, bazarek.
 - * Her şêrekî bevlekî heye.
 - * Here nav mileta, bigre edata.
 - * Heta derew dibit, rast serê xwe danî diçit.
 - * Hevalî bi sanahî ye, belê jêkevbûn bi zehmetî ye.
 - * Heta marr rast nebit naçit ji kunê re.
 - * Heke heye bi herdu desta, heke nîne req rawesta.
 - * Heta heye şilî milî, gava tune be keser û kûlî.
 - * Her serek aqilek.
 - * Heta dêrekî ava bike, dê mizgeftekî xera bike.
 - * Herçî ê bi tişt e, ê bi pişt e.
 - * Herçî ê bi mal e, bi mam û xal e.
 - * Here ber siya şêrê bila te bixwe, neçe ber siya rovî te bialîse.
 - * Hêviya xelkê, ava li selikê.
 - * Hêlîna teyra kûr e, xwedê çê dike.
 - * Her dergehêk bi kilîta xwe vedibe.
 - * Hezar pes diçin ber siya darek.
 - * Her tiliyek jana xwe jê diçit.
 - * Hevalê qirê, nikil bi gu ve.
 - * Her evraziyek nişîviyek heye.
 - * Hewiyê ji ber hewiyê xwe can kir, jintiyê ji ber jintiyê mal kir.
 - * Heta serê xwe nedaye şikandin beşa xwe nedaye.
 - * Her dîkek li ser serguya xwe mêr e.
 - * Hespa kehêl ne hewceyê taxim e.
 - * Herçî fêr bûye bi şîrî, terk nake heta pîrî.
 - * Heçî neçî govendê xweş reqas e.
 - * Heya meha gulanê nav mehan e, dilê xweyî reza kul û kovan e.
 - * Heta mirinê her kirin e.
 - * Heta min kar kir, wî bar kir.
 - * Hezîran e, hezîna teyrana e.
 - * Heta êvarê çu xebitî, kera xwe girê da çehş filitî.
 - * Hesinê sar, zor tê kutanê.
 - * Hesp li serafirê keran nayên girêdan.
 - * Haspê çê ra qamçî naxwaze.
 - * Heqê Elî ji Welî tê sitandin.
 - * Her bûyereka ji mirova ra şîreteke.
 - * Hespê çê zenguya nagîne xwe.
 - * Hemu mêr nabin şêr.
 - * Hesinê bi esas, ne dibe çakuç ne jî das.
 - * Hê nebûye conega li dewsa ga rêx dike.
 - * Hê nebûye varik li dewsa mirîşkê hêk dike.
 - * Hê hesp çê nekiriye, jê re afir çê dike.
 - * Hina digo malê min e, hina digo halê min e.
 - * Hinek hingiv dixun, mêş li hina va didin.
 - * Hîn kêr li hestî asê nebûye.
 - * Hîrîna hespê ji lingê ga tê.
 - * Hirç û gêre, rovî û çêre.
 - * Hindê nede ber dasê das, das nabirî.

- * Hindî rezvan bîra kurê xwe bît, * Hergav naser naye, qirm û qot
hindî marr bîra duvê xwe bît, bi xwe ra nayîne.
dostanî nabit.
- * Hiriya defa, xweliya sera. **Î**
- * Hîn nekera hîn neke, heke te
- * Hûner çek e, bi dîwar ve ke, * Însan bi dîtinê, heywan bi ajot
çaxê lazim bû bi milê xwe ve ke. inê zana dibe.
- * Hindik bide ber dasê, tê têra
- * Însanê şixulker gula geş e.
- bimînê asê.

Lêkolînên Li Ser Helbestên Cizîrî

Hozanê DÎLZAR

"Tu ji Melayê her bipirs esrarê Îşqê hel dikit

Vê müemmayê çi zanin sed Melayê wek Se'id"

Birastî tiştê ku hişt em vê malika Cizîrî bikin navnîşana vê gotarê, ew e ku em ji van lêkolînvanan re xuyanî bikin ku zanayekî weke Bedûlزمانê Nûrsî xwe li hember ristên bêçare û nezan dît, lew dawîya vê malikê guhert û li şûna peyva "mûsteîd" navê seîd danibû. Çima? Gava ku Şêx Seîdê Nûrsî dîwana Melê şirove dikir giha ber vê malikê hingê zanibû ku çiqas bêje û bêje nikare vê mijarê têrbike û hingê dest ji şirovekirinê berda. Eve çîroka Melavanekî xurt û şareza di derya tesawufê'de. Gelo emêji van kesên ku nû bi ser Cizîrî vebûne û lêkolînan bi dehên rûpelan li ser çêdikin, çi bêjin? Lêkolînên vê awîyê zor balkêş bûn û tiştê balkêş têde hebûn ku ne tenê sûdeyê nedigihandin xwendevanan, lêbelê ziyaneke mezin digihandin heybera wêjeyî. Yek ji van lêkolînan balkêş, lêkolîna *Felat Dilgeş* bû. Ji ber ku ev lêgerîn li gor daxwaza lêgerîvan digeriya, Cizîrî ji bîr û baweriyên wî derxist, û tişteke nemabû ku bêje şoreşvanê Cizîrî ne Melayê Cizîrî, Ku lêkolîn bi vî rengî bardewam bikin ê piştî çend salan lêkolînan li ser markisiyeta Cizîrî derkevin.

Ji bilî şaşitiyên rêziman û tevlihevkirina lêkolîna dîrokî û ya wêjeyî û girêdana ne vacayî di navbera rehberan, û ji bilî derketina ji mijarê, lêkolînan ziyaneke mezin gihand ristên Cizîrî. Ji ber ku kek Felat malikek yan dido ji helbestê tanî û wê şirove dikir bê ku ser û dawîya helbestê bixwîne yan fêmbike. Lew kek Felat ket şaşitiyên bê hempa ango wek yê ku ayeta "*la takrabû Elsalate*" Ji xelkê re bixwîne û bêje wa xwedê gotiye limêj nekin, bê ku dawîya ayetê ji wan re bêje "*We Entum Sukara*" ango ku hûn serxweş bin.

Wisa jî kek Felat nîvê malikê şirove dike û nerînên xwe li ser avadike,

Yê ku bixwaze rêgeha helbestvankî kurd mutesewif û musulman nasbike, divê berî her tiştî helbestên wî birengêkî rast û dûrust şirove bike, ango zîmanê helbestvan nasbike da ku bîr û baweriyên wî ji wan derîne, û çi şaşitî di şirovekirinê de hebe akama xwe digihîne têgihiştina rêgehê bixwe.

Û ya didiwan, divê tasawuf û musulmantiyê ji nêzîk ve nasbike, û ya sisiyan ew jî belkî ne girîng be, lê fêda wê heye, gerek hinekî ji zîmanê Erebi fêmbike,

Naxwe tesawuf çiye? Simbolên wê çine? Ev tişt di van lêkolînan de xuyanî nakin,

Naxwe ku Felat zanibe *Turk û Mexol û Hebeş û Ereb* di wateyên rastî de çi ne, ewê lêkolîna xwe tev biguhertana. Felat dibêje "*turkê xwîn-rêz hid*" nîşanê dide ku Cizîrî di çil saliya xwe de ev rist gotiye û jiyana wî ji ber turkan ji çil salî ve serûbin bûye. Helbet beşê duyem ji malikê dibêje:

Zuhdî çil sale limin zêr û zeberkir ji esas.

Ango Cizîrî di yek saliya xwe de bû mutesawif û Çawa çil salî di xilwê de ye û çawa di çil salîya xwe de vê ristê dihûne??

Lê ya girîng ne eve, ya girîng şirovekirin yan wergerandina peyva *turk* ligor ku ew têdigihîje, ku me malikên berî vêya û yên lipey wê xwend, emê zanibin ku Cizîrî çi dibêje:

Remz û razên ney û nayê ku sema'î ne hemî

Ji mehala te bi êqlê xwe bizanî ji qiyas

û malika li pey xwîn-rêz eve:

Ji leble'îli şeker yar qe ne kir pursa melê

Misriyan gezme reşandin ku kişandin elmas

Raste di vê helbestê de *turk* nîşana zor û zordariyê û simbola xwîn-rêjiyê ne, lêbelê ne *turkên* ku di bîra Felat de ne. Ji ber ku Cizîrî dibêje bi xemzekî ango bi çavdanekî bûye xwîn-rêj û Postnîşîniya me jî berhevkir.

Ma gelo çavên *Cengiz an Temûrleng* hewqe xweşik bûn?!! Cizîrî, di malika di pey wê xuyanî dike ku ev xwîn-rêj yan ev xwîn-rêj kesê dildayî û jê hez kiriye, ji berku Cizîrî bi çêrî lêvên Şêrîn dibe ka kîjan mêtîngerê turkan bi lêvên şêrîn xwîn-rêjî kir? û dawîya malikê dibêje *Misrî* ango ligor Felat gerek me bigota *Misrî* jî Kurdistan dagirkirine, lê ne wisaye, *Misrî* jî mîna turkan livir Simbol in. Naxwe *turk* yar bi xwe ye û *Misrî* Şûrên *Misrî* ne, ew jî çavên yar in

Bi kurtî ev helbest helbesteke sofî ye, ne ji dûr ne ji nêzîk bîhna dijîtiya zulm û zora turkan jê nayê

Û dûre Felat gazina *Melê* ji mîran dide ber çavên me, lê dîsa Cizîrî qeto qeto dike û helbesta wî tevde şirove nake. Lew dîsa dikeve şaştiyan Cizîrî gazinan ji mîran nake ji bo ku wî ji turkan rizgar bikin. Belê Cizîrî bi xwe di zindana hezkirin de ye, lew gazina jê dike ji bo ku wî ji hezkirina bê dûmahî reha bike, lew dibêje: *Er nekî rehîmê tu mîro...*

û dûre dibêje: *Ernekî derman bi weslê*

Gelo çi Cizîrî û wesla ji derb û tîr û gezmeye. Mîran bi hev heye

Cizîrî dibêje:

Hêj nizanîm mîr dibîrîn

Zanî em sî sal esîrîn

Çehvenêrê Pursek emîrin

lew bi rehm û şefqeye

Kek Felat minakekê din tîne,

Sef bi sef tirk û Moxul doguş û Hindî dikemîn

Bi êceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fireng

Bi kurtî wateya vê malikê wisa ye:

Sûpeyên Turk û Mexolan di ser de ne û Hindî di davê de bendewarin, û bi rengê sosret sûpeyên Rom û Hebeşen û Fereng hatin cengê.

Gelo ku bi welat Parêziya xwe Mele li Ser urkan diaxive, çima li ser Hindî û Hebeşîyan diaxive ma kesek bihistiye ku Hebeşî êrîşa xwe birine ser Kurdistanê? Bi kurtî ev tevde simbol in. Turk nîşana hikimbûna yar e.

Hebeşî nîşana şain û xal û biskên reş in û hemû Sûpeyên din nîşana çûn û hatina porê yarê ye, li wê derê.

Di dawiya vê helbestê de Cizîrî wisa dibêje:

Were bê perde Mela vê xezelê bîna meqam

Herdema bîne sema def bi def û çeng bi çeng

ev malik wateya pir tiştan dide lê.....

Helbet kek Felat di hin cihan de peyva belkî û ihtimal bi kartîne, lê ev peyv mirov jiber pirsyariyê nadin alî.

Dûre Felat malika “Feyza me Şubhê nîle” bi sistî şirove dike bê ku xuyanî bike yan karibe xuyanî bike ku Feyz: ev peyva Erebi ne wateye firebûna dilê Cizîrî ji helbestê re xuyanî dike, ev feyz bi zanistên cihankî û ledunî bi ser dilê wî dikeve, ango zanebûna cankî û rewankî mîna Dîcle ji dilê wî bi serdikeve û dûre *Dilgeş* vedigere neteweperestiya Cizîrî û ber bi peritandina helbestê ve nişûv dibe.

Bi rastî Cizîrî bi nenivîsandina ristên netewayî kêr nabe, ji ber ku dema wî ne dema gelparêziyê bû, lê bese ku bi zimanê kurdî nivîsî û qencîniyek mezin ji kurdan re hişt, lew ne pêwiste ku em kirasê welat-perweriyê bi zorê li helbestên wî bikin,

Felat dibêje: “Navê Kurdistanê di helbesta Cizîrî de ji salixdana herêmeke coxrafî zêdetir bi naverokek siyasî hatiye xebitandin”.

Ev peyv zêde zêdetir re ji coxrafiya helbestê, ji ber ku te helbest tevde xwend tê bibînî ku Kurdistan welatê wî ye ku têde dijî, lê tu wateyên siyasî têde nînin.

Û li pey wê dîsa Felat malika “*turkê xwînrêz*” ji me re dide xuyanîkirin, ji bo ku welatparêziya Cizîrî biçesipîne. Ez dixwazim vê malikê bînim bîra Felat..

Cizîrî dibêje:

Min di Seher Şahê Mecer

Lebsê di ber mexmûrî bû

Gelo kek Dilgeş, Şahê Mecer çiye yan kiye?!!

Dûre Felat vê malikê'tîne ber çavan.

Ji re'na nêrgizên tey mest û xwînrîz

Zeman bû ehdê ceng engîzê Cengîz

Ango nazikbûna nêrgizên te "Çavên te" yên mest û xwînrêj bi zulma xwe dema Cengîz û zordariya wî anîn bîra me û dûre ev mînak lipey tê:

Tu binê Rom û Ecem kuştine Zengî dikemîn

Hane her têtê peyapey ji teref Rom xweş û xweş

Ango Zengî şeina reş ya rûyê yarê ye û Rom û Ecem herdû biskîn, ku ba li wan xist hatin ser şeinê û şein veşartin lew Cizîrî got: *Kuştine Zengî di kemîn.*

Û wisa hemû mînakên ku anîn ku ji serî heya dawî bihatana şirovekirin mebesta dildarê xwedahî dê baş diyar bibana. Dûre Felat dikeve warê tesawufê û dibêje: "*Tasawîfa yekbûna xwedê bi îmamê xezalî destpêdike*"

Birastî tasawûfa Islamî bi xezalî destpêdike, lê tasawuf bi xwe kevintire ji misilmantî û Filehtiyê, tasawîf ji dema Aflaton û berê de hebû. Zana dibêjin ku tasawîf ji Sofîzmê hatiye, lê yên ereb dibêjin ku tasawîf ji peyva "sûf" anga "hîrî" hatiye. Jiber ku kesên çilekêş û postnîşîn pirr hiriyê lixwe dikirin da ku ji xweşiyên cîhanê dûrkevin. Û li ba wan yekbûna hebûnê yek ji bîr û baweriyê wan e. Ev tasawîf nakokîya di navbera "*Ehl Elzahîr*" û "*Ehl Elbalîn*" de xuyanî dibe û dûre Felat dibêje: Du yarên Cizîrî hene; xwedê û yara yarîn. Cizîrî bi hêsanî bersiva vê pîrsê dide û dibêje:

Dil yek e dê îşq yek bit, aşîqan yek yarî bes

Qible dê yek bit, qulûban dîlberek dildarî bes

û dûre dibêje:

Muhbeta sîrî du qîsme

Hin ji rûhe hin ji cîsme

Hubbi cîsmî du rojîn

Xef ceger peykan dînojin

Qûfl û muflah û tîlsîme

Nar û nûre hin hewaye

Ger çi dil pur pê disojîn

Mîslî neqşê bê beqaye

Em nabêjin ku Cizîrî di hezkirina mirovatî re ne bûhûrt, na buhurt û jê derbasbû, ji ber ku ev hezkirin bi tecelliya xweda ve hatibû girêdan, ji lew hezkirina mirovatî ji ya xwedahî re kir qurban.

Ji bo wê nabe em bêjin ku du yarê Cizîrî hene, em karin bêjin ku Cizîrî di du koçeyên hezkirinê re buhurî û hezkirina pêşî kiribû pir da ku bigihêje yarê rastî, ji ber ku hezkirina laşkê wek ku ew dibêje hezkirineke demdar e:

Gul heta sohrîn bi têve, bîn tebessum pêve pêve

Bilbilê serxweş dinêve nexme û nal û newaye

Herçî Cilwa bû ji navê , dî gulek girtî xunavê

Ew ji dîl çû muhbeta wê ew bi ya dî re teba ye

Ango kengî gul çilmisî bilbil jê digere û diçe ber bi gula nûxunav girtî û ev nerîn di rewakirina wî ji Şêxê Senanî re, hezkirina qîza şahê Ermenistanê de xuyanî dibe.

“Mislî mûsa ku tecellaya te dî ê tu di kanî hata han? Xelet” dûre Felat helbesta “pur ji dîna te” kêr cemek tîne, lew hemû malik libin guhê hevdikeyin. Lew gerek ev beş:

“lew şubê daire sergerdanîm,” bihata pêşiya

“Bade noşê qedehê hurmanîm”

Û wisa heya dawî helbest biahata rastkirin û rêza dawî ku zêde dimîne dikeve dawîya beş tevde, ji ber ku ev helbest ji celebên “tercî bend”e ango wisa ye

1_____	_____1
2_____	_____2
3_____	_____3
4_____	

Û dûre Felat dibêje: “Herdû yar di çarînekî de weha tîn rûhev:”

Xwedanê latê Azerî tu

Bêçî şêrîn dîlberî tu

Her cihê lê bê werî tu

Bê xîlaf ew keibe ye

Ev beşî beşek ji helbesta “Er nekî rehme tu mûro” ye. Ya ku Felat kiribû helbesteke siyasî û nûha kire du mil, lê nivîsa rastî ya vê beşê wisa ye:

Xundê latê Azerî tu

Bêçî şêrîn dîlberî tu

Her cihê lê bê werî tu

Bê xîlaf ew keibe ye...

Ango Xunde ne xwedan eji ber ku peyva xwedan bi xwe helbestê dişikîne, û ji bilî ku xund watey mîr û fermândaran dide, kama Cizîrî bavê pêxember Îbrahîm, Azer e, yê ku pûtparêz bû. Lew Cizîrî got pûtê Azerî ji ber ku Azer Pûtçêker bû, paşê Felat dawîya lêkolînê bi jimartina peyvên dil û hozanê dil napijirînin, ji ber ku helbesta sofî bihtir ji nerîn û mebestekî dihêwirîne lew divê cihêkirin bi rengekî zanistî be, û em karin dawîya vê gotarê bi vê malika Cizîrî ya ku têde dixwaze hezkirina mirovatî bala bibe û bibe xwedahî, bînim

Di pabosa semen sayê

Me nêrî l' bejn û balayê

Le' ellî Ebluxul esbab

Esbab e Elsemawatî

Heger em kurd in divê em bi kurdî binivîsîn

Zinarê Xamo

Hersê hejmarên kovara "War"ê ku we çendakî berê ji min re şandibûn, gihîştin destê min, gelek sipas û mala we ava. Min dixwest ez tavilê bi nameyekê haya we bigihînimê û sipasî we bikim. Lê belê hin tiştên ne di hesêb de ketin nabênê û lema jî wiha bi derengî ket. Ez hêvî dikim ku hûn'ê ji ber vê derengxistinê li qusûra min nenêrin. Li aliyê din, bi çend gotinan be jî ez dixwazim di vê nivîsa xwe de bîr û bawerîya xwe ya li ser kovara we bînim zimên.

Birayên delal, min kovara we xwend. Di şertên Tirkiyê yê îro de derxistana kovareke wiha, kovareke ku Kurd derxin û qala Kurdan bike helbet ne hêsa ye, li gel hebûna îmkanên maddî, gelek federkariyên din jî dixwaze. Ez bi van dijwarî û talûkeyên li pêş we ne baş dizanim. Yanî ez dizanim karê we ne hêsa ye û ne jî biçûk e. Ev aliyakî meselê ye. Aliyê meselê yê din jî, çi heyf ku we jî wek piraniya hêzên Kurdan, ji dêlî ya rast û pêwîst, ya hêsa û çewt hîlbijartîye. Yanî we jî wek gelekên din ne kovareke xurrî bi Kurdî, lê bi Tirkî û Kurdî derxistiye. Ez wek şex ji kovarên bi Tirkî ya jî Kurdî û Tirkî re nanivîsînim û derxistina wan jî îro rast nabînim. Ez hêvî dikim ku hûn'ê van rexneyên min li dilê xwe negrin û wan wek dijminatîyeke li hemberî xwe telaqî nekin. Çimkî ev bîr û baweriyên min ne nuh in, ji serê salan ve ye ku ez wiha difikirim û min berê jî gelek caran di rojnameya Armanc û hin weşanên din de ev dîtinên xwe anîne zimên. Li gor bawerîya min zirara weşanên bi vî rengî ji feydeya wan bêtir e.

Nuha heger em dixwazin yê me jî wek xelkê edebiyatek, tarîxek û zimanekî me yê milî hebe divê em jî wek her milletî bi zimanê xwe binivîsîn, bixwînin, bipeyivin. Dîsa heger em dixwazin em jî wek milletên din bibin xwedî dem û dezge, bibin xwedî dewlet divê em jî wek wan dezgeyên xwe yên milî bixulîqînin. Û ev

jî bi zimên û bi riya zimên dibe. Heta ku em bi Tirkî binivîsîn zimanê me tu carî nabe zimanekî standart û netewî. Heta ku em bi Tirkî bistirên muzîka Kurdî çênabe. Çimkî edebiyat jî, muzîk jî bi zimên dube. Yanî bi gotineke din, heta ku em di taximê xelkê de topê bilîzin em tu carî nikanin bibin xwedî taximekî milî. Divê em vê rastiyê baş bibînin.

Miletê bi kîjan zimanî bipeyve kultura wî jî ya wî zimanî ye. Heger ne xêra vî zimanî bûya gelo ewê îro çiyê Kurdan li fêzê hebûya? Garantiya me çibû ku em jî wek Lazan, Çerkezan û hin gelên din asîmîle nebûna? Zimanê me perçakî xurt yê nasnameya (îdentîteta) me ye, sebebê hebûna me ye. Gava em vî zimanî wenda bikin tu taybetiyek me namîne, em jî dibin wek her Tirkî. Ne rengê me û ne jî dînê (ola) me wek hin milletên din li hember asîmîlasyonê ji me re nabe mortal û me naparêze, bi vacayî helandina me, wendabûna me hêsantir dike. Lema tiştê bûye nasnameya me ya netewî here were zimanê me ye, roja ew wenda bibe em jî wenda dibin.

Em dizanin di tarîxê de gelek milletên cîranên me dema ku hukum ji destê wan derketiye û ji zimanê xwe qut bûne, bi wendabûna zimên re hêdî hêdî ew jî wenda bûne. Hin tesaduf bûne sebeb ku ev aqîbeta trajîk nehatiye serê me jî. Lê belê ev nayê wê maneyê ku ev tahlûke îro êdî nemaye. Bi vacayî ji bo me gelekî zêdetir bûye. Heger em nikanibin ji vê teknolojiya îro, ji van wasiteyên ragihandinê wek xelkê feydeyê bibînin ez dibêjim tiştê hat serê gelek milletên din ewê were serê me jî. Çimkî îro êdî yê miletan dike millet ne tiving û şûr e, bi tevayî komînîkasyon e. Bi vê teknolojiya îro asîmîlasyona di nav salekê de dibe, berê belkî di nav sed salan de jî nedibû. Divê em vê realîte bibînin û li gor wê tedbîrên xwe bigrin. Dîtina vê realîte jî ji millet bêtir, dikeve ser milê ronakbîr û pêşangên vî milletî.

Heta nuha pêşiyên me ya pêşiya xwe baş nedîtin ya jî li gor xelkê dereng man, lema jî tiştê bi ser avê nexistin. Heger em jî vê çerxa îro baş fêm nekin û li gor wê xwe ranepêçin, tedbîrên xwe li gor van şertan baş negrin ez sond dixum ku di rojên pêş de em'ê pirr û pirr poşman bibin. Di demeke wiha de divê em bi hemû îmkânên xwe zorê bidin pêşxistin û xurtkirina zimanê xwe. Ne ku dîsa wek her tim bi Tirkî binivîsîn.

Nêta me çî dibe bira bibe, gava em bi Tirkî dinivîsînîn, derî îrada xwe em miletê xwe asîmîle dîkin, jî asîmîlasyonê re em dibin wasîte. Ev nayê wê maneyê ku divê Kurd qet bi Tirkî nenivîsînîn, nexwînîn ya û nepeyivin. Helbet çaxa pêwîst be em'ê bi Tirkî jî, bi Îngilîzî jî û bi hin zimanên din jî binivîsînîn. Lê divê negihîje wê nuxtê ku zimanê me têkeve dereca duduyan û sisiyan. Ya jî Tirkî bibe zimanê me yê nivîskî û dan û stendîne. Tiştêkî wiha malkambaxî ye. Divê em bi çavê miletekî li xwe binêrin û wek ferdên miletekî bifikirin, ne wek multeciyeke ku dixwaze asîmîle û entegreyê civata Tirk bibe. Çaxa em rojname, kovar û kitêbên xwe bi Kurdî dernexin, zimanê me yê dan û stendîne ne Kurdî be aqîbeta me ev e.

Nuha gava meriv nikanibe tiştê pêwîst û ne pêwîst, tiştê rast û çewt jî hev bigerîne û jî ber vê yekê jî bi wacibê xwe ranebe û hin şaşîyan bike, dîsa rê tê heye, meriv dikane bibêje, welle me nizanîbû. Lê gava meriv bizanibe, bîr bibe lê belê neke, a wê çaxê ne rast e. Bi raya min rewşa piraniya siyasetdar, ronakbîr, roj-namevan û nivîskarên Kurdan jî ev e, him dibêjin em bîr dibin û him jî bi wacibê xwe ranabin.

Mesela we di kovara xwe de du nivîsên li ser zimên yên gelek girîng, nivîsa Agop

Dîlaçar(hej.2) û ya rahmetî Celadet Bedirxan(Herekol Azîzan, zimanek û zilamek, hej.3) weşandine. Ji bo me Kurdan herdu nivîs jî pirr û pirr girîng in, divê her Kurd bi dîqet wan bixwîne. Agop Dîlaçar di dawîya nivîsa xwe de dibêje ku, “însan zimên çênake, tiştê ku xusûsiyeteke netewî(milî) dide însên ziman e.” Yanî gava em bi Kurdî dipeyivin em xusûsiyetên Kurdan digrin, ruh û şîûrê Kurdayetiyê li ba me xurt dibe û gava em bi Tirkî dipeyivin jî yên Tirkî digrin, yên wan li ba me xurt dibin. Bi gotîneke din hestê(şîûrê) milî raste rast bi zimên ve girêdayî ye. Ziman tesîrê li qerekerê meriv, li fikrê meriv dike, di şikilgirtina meriv de roleke mezin dilîze. Gava meriv di hêza zimên de vê fonksiyonê bibîne meriv bi hêsanî fêhm dike ku dewleta Tirk çima nahêle zimanê me serbest bibe, resmîyetekê bigre, radyo, televîzyon û mektebên me jî hebin...

Herçî nivîsa Celadet Bedirxanê gorbuhuşt e pirr balkêş e. Min bi xwe sêzde çarde sal berê di nivîseke xwe de qala vê nivîsa Celadet beg kiribû. Divê em Kurd jî wê nivîsê ibreteke mezin bigrin. Elyêzer bin Yehûda ferdek bû, lê merivekî dûrbîn bû, xwedî

bawerî bû, lema jî ruh da zimanekî mirî. Ew teslîmî realîtê nebû. Tiştê kir pirr basît bû. Bi zimanê xwe nivîsî, rojname derxist, xwend û da xwendin. Yanî tiştê em nakin û naxwazin bikin, kir. Diyar e Celadet beg ji van kirin û tecrûbeyên Elyêzer bin Yehûda netîceyeke oaş derxistîye. Meriv vê yekê, vê mezinayiyê di hedefên wî de, di berhemên wî de baş dibîne. Berî her tiştî rabûye ji gelê xwe re gramer û elfabeyek çêkiriye, rojname derxistine, gel fêrî xwendin û nivîsandinê kiriye. Û him jî bi serê xwe û ji sifirê dest pê kiriye. Qet şik tune ye ku şertên Celadet Bedirxan ji şertên me yên îro gelekî xerabtir bûn, îmkanên ku îro di destên me de hene di destê wî de tunebûn, lê wî dîsa jî Kurdî ji xwe re kir esas û hemû weşanên xwe bi Kurdî derxistin. Negot nizamim bazar tune ye, nizamim xwendevan kêma in, ma ji bo çi ez'ê weşanên bi Kurdî derxim? Wiha nefikirî, ji ber ku wî dizanîbû miletek bê elfabe, bê gramer, bê rojname û kitêb nabe. Lema jî tim gazî û hawar li Kurdan kir, got heger hûn naxwazin wenda bibin divê hûn zimanê xwe fêr bibin, bi zimanê bixwînin û binivîsin.

Numûneyek din: Bifikire ku Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî ji wek gelek şair û edîbên Kurd yên din tenê bi Tirkî nivîsandibûna, ma îro em'ê bi kîjan şair û rewşenbîrên xwe serbilind bûna? Me yê kanîbûya qala kîjan edebiyata xwe ya klasîk bikira? Divê em ji erd hata asîman şikir bikin ku ev herdu edîb û welatperwerên mezin wek gelek "ronakbîrên" me yên îro nefikirîne, ji dêlî Osmanî bi zimanê dayika xwe nivîsîne. Û ji xwe tiştê ku ji me re wek edebiyatek netewî mîrat maye jî ev berhem in û yên wek wan in, yanî tiştên ku bi Kurdî hatine nivîsîn. Her tiştê ku Kurdan bi Tirkî ya jî bi Erebi nivîsandine bêguman ji me bêtir bûya malê van miletan, edebiyata wan, zimanê wan pêşde biriye û dewlemend kiriye, ne yê me. Û îro jî ev yek wiha ye. Gava em bi Tirkî binivîsin em ji lîteratûra Tirkan re xizmetê dikin, feydeyê digihînin wan û bi Kurdî binivîsin jî digihînin ya Kurdî, ji tarîx, kultur, edebiyat û zimanê Kurdan re xizmetê dikin. Mesele hewqasî vekirî û basît e.

Ez nizamim gelo hûn qet fikirîne ku ji bo çi Ebdulah Pêşewek, Şêrko Bêkesekî Kurdistanê başûr heye, lê yê me tune ye? Gelo ew ji me pirr jîrtir in, pirr edîbtir in lema? Helbet na. Sebebê esasî ewe ku li hember Ereban ew xwe biçûk nabînin, bi çavê miletekî li xwe dinêrin û ji zimanê xwe hez dikin. Lê piraniya ronakbîr û edîbên me ne wiha ne, ew di bîna tesîra kemalîzmê de ne. Her çiqas

her roj li kemaîzmê rexne digrin jî lê di piraktîkê de nikanin xwe ji bin bandora wê rizgar bikin. Ez her roj dixwînim, gav û seet li dewletê rexne digrin, xwedêgiravî serbestiya kultur û zimanê xwe dixwazin. Lê ew bi xwe ne bi zimanê xwe dipeyivin û ne jî dinivîsînin. Yanî tiştê ku ne hewceye ji dewletê destûrê bigrin jî nakin. Ev paradoksek mezin e!

Çendakî berê li Stenbolê bi munasebeta sedsaliya rojnamegeriya Kurdî civînek çê bû. Bi qasî ku ez dizanîm nêzî bîst rojname û kovarên Kurdî ku li Stenbolê derdikevin beşdarî vê civînê bûn. Ji van bîst rojname û kovaran tenê du heb (Azadiya Welat û Nûbihar) bi Kurdî ne. Yê din ya giş bi Tirkî ne ya jî wek usûl çend rûpel jî cî didin Kurdîya sivik, yanî nivîsên pirr ne giran(!) Diyar e hemû nivîsên “ciddî”, “teorîk”, “edebî” û “siyasî” ya jî “lêkolîn” helbet divê bi Tirkî bin û bi rastî jî bi tirkî ne. Ma ev ne şerm e? Berî ku hûn ji van gotinên min aciz bibin, carê van kovar û rojnameyan hemûyan deynin ber xwe û baş bala xwe bidin wan. Piştî lêhûrbûnek kin ez bawer dikim ku hûnê bi xwe jî vê rastiyê tavilê bibînin û heq bidin min. Maneya vê jî ewe ku em xwe û zimanê xwe layiqî tiştêkî nabînin, Tirkan di ser xwe re û zimanê wan jî ji yê xwe xurttir û girîngtir dibînin. Bi ya min divê Kurd rojekê berî rojekê xwe ji vê kompleksê xelas bikin û divê biwêribin bi zimanê xwe binivîsînin. Her tiştê bi Tirkî tê nivîsandin dikane bi zimanê me jî were nivîsandin. Di vî warî de qet tu kêmasiyek zimanê me tune, kêmasî ya me ye, ya mejuyê me ye. Ji xwe li dinyayê tu zimanek tune ku meriv nikanibe xwe pê îfade bike. Û her wisa zimanê me jî.

Birayên delal, ez gotina xwe ya dawî bibêjim: Bi bawerîya min hemû weşanên bi Tirkî ji feydeyê bêtir zîrê didin ruh û mejuyê Kurdan, me di her warî de dipişefe, asîmîle dike. Îro wezîfeya her Kurdê welatperwer ya esasî ewe ku li dijî vê siyaseta malkambax derkeve û bi zimanê xwe bipeyive, bixwîne û binivîsîne. Ew kesê ku di vê qonaxa îro de ev wezîfeya xwe ya esasî hîn fêmnekiribe maneya xwe ewe ku wî ne ji tarîxa me ye ya nêz û ne jî ji siyaseta dijmin qet tiştêk dernexistiye û fêmnekiriye.

Kasım-Aralık 1998 Yıl:3 Sayı:14 Fiyatı: 300.000.TL. Yurtdışı: 5 DM İki aylık

ROZA

CİNSİYETÇİLİĞE VE İRKÇILIĞA KARŞI
KÜRT KADIN DERGİSİ

•YAYLA BUCAK:

"Politika yapmak, Yayla olarak
varolmak birlikte yürüdü"

•Kürt kadınlarına dair







•GÖÇÜN KADIN YÜZÜ

•İki yıl sonra

ROZA-JUJİN ayrılığı

**Kürt Kadın Konferansı'nda
FEMİNİZM**

14. SAYI ÇIKTI!



Ji bo ku hûn bibine xwediyê pirtûkên
Enstîtuya Kurdî, wan ji navnişana Jêrîn bixwazîn.

Atatürk Bulvarı Ceylan Palas Apt. No: 154/12
Aksaray / İstanbul Tel.: (0212) 527 19 11



Mîrekê Kurd di riya nêçîrê de ye.

Bozger

Stop